
# ABDULAH OCALAN

# DAHÛRÎNA 1. A SALVEGERA 15'Ê TEBAXÊ



**ABDULAH OCALAN**

# DAHÛRÎNA 1. SALVEGERA PÊNGAVA 15'Ê TEBAXÊ

*Weşanên Komîteya Rêbertî*

**Werger:** Ayten Amed
**Redekte:** Sozdar Serbilind, Ayten Amed

**Çihê Çapê**: Çapxana AZADÎ
**Dîroka Çapê:** Nîsan 2019

**NAVEROK**

**EM NEXWEŞIYÊN DI KESAYETA XWE DE
RAST TEŞÎS BIKIN
Û DI TEDAWIYÊ DE BI ÇEKA PARTIYÊ ŞER BIKIN**

**DI TÊKOŞÎNA RIZGARIYA KURDISTANÊ DE
RASTIYA SEROKATÎ Û EZMÛNA PKK'Ê**

**DI PÊŞKETINA PRATÎKA ŞOREŞGERÎ DE
BI RUHÊ ÊRÎŞ Û AFIRÊNERÎ ŞER BIKIN**

**EM WÊREK BIN KU BIKARIN PARTÎ Û GEL
JI BONA ŞOREŞÊ BIRÊXISTIN BIKIN Û RÊVE BIBIN**

**PÊNGAVA NAVDAR A 15'ê TEBAXÊ Û SERKEFTINA
SIYASETA ŞOREŞGERÎ YA RAST**

**PKK, Dİ RASTİYÊ DE BERHEMA KEDA HEVBEŞE,
DİLÊ KU HETA DAWÎ Jİ BO BAŞÎ LÊ DİDE Û
BERHEMA MEJİYÊ HERÎ PÊŞKETİYE**

## EM NEXWEŞIYÊN DI KESAYETIYA XWE DE RAST TEŞÎS BIKIN Û DI TEDAWIYÊ DE BI ÇEKA PARTIYÊ ŞER BIKIN

**Ji Tevahî Xebatkarên Partiyê Re;**

Weke ku di giştî de bûyî, mirov dikare xebatên partiye yên Ewrûpa jî weke hêjî kêmasiya diyarker hevbeşnekirina xebatan, xwe negiyandina komîtebûnê, di komîteyan de pêşnexistina pêvajoya nîqaş û biryardariyê, hemû tişt di safoka komîteyan re nederbazkirin û pratîze nekirin, bi gotineke vekirî navendgeriya demokratîk weke tê xwestin pratîze nekirin rave dike. Lê dema ku em bixwazin nirxandineke berfirehtir ji bo vê mijarê bikin, di nava Partiyê de û heta ji wê jî wêdetir ger em di bingehê civakî de bidin rûnişkandin û bixwazin vê nirxandinê pêş bixin, weke gel, Partî û bêguman weke milîtanên Partiyê em ê bibinin ku, di bin feraseta rêvebirin û rêveberiyên ji dîrokê heta roja me ya îro em tê de ne tê jiyîn.

Dema ku tê gotin rêveberî di serî de dagirkeriyeke dijwar dîktatorî û yên weke nûnerên vê dîktatoriyê tên pêşberî me cendirme, karmendên bacê û kesên ku pir zêde bi wan re di nava pêwendiyê de ne axayên eşîretan, weke otorîteya manewî şêx, mele û hwd otoriteyan re derbasdare. Vana ji sedên salan û heta roja me ya îro otoriteyên ku ji aliyê desthilatdarên bêgane ve tên ferzkirinin. Komên gel di binê serdestiya van otoriteyan de, di nava feraseta rêveberiya wan de her tim bi ruhekî kole, çêrandin û fêrbûna rêveberinê de hatine hiştin. Di nasîna demokrasiyê de, yanî di mijara xwe bi xwe rêvebirin û îdarekirinê de dikare bêje ku em weke gelê herî hejar mane. Tevahî ferd ji ber ku her tim di bin dagirkerî û otorîteyên nokeran de hatine girtin, hema bêje fêrî van otorîteyan bûne. Di nava me de ferd hema bêje bi piranî ji dîyardeya xwe bi xwe rêvebirinê bê xeberin, ger bi qeza jî fêrî xwe birêvebirinê bûbin, di kêliyê de mîna dagirkeran derketine holê. Di rewşên bi vî awayî de dema ku dixwazin mêtingeriya bi şêweyekî hatiye berevajîkirin bijîn, tevgera mîna axayekî biçûk, reyîsê eşîretê, mîna cendermeyekî, weke serdestekî dagirkeriyê ango qeymeqamekî rastiyekî divê ji ber çavan neyê windakirine.

Di demên dawî de di navbera girseyan de çînekî rewşenbîr ê ku derketiye holê, çawa mîna xizmetkarên dagirkeran gelên xwe li ser navê dagirkeran bi rêve dibin û di roja îro de ev çawa tê meşandin ger em paşçav nekin; di rêvebirênê de xerîbiyeke çawa şêwaza revebirinê arasteyî fêrbûnên me û mêjiyê me dike dê baştir bê zanîn. Di tevahiya cihanê de ji bo ku gel bibin hêza rêveberiyê, yanî ji bo pêşxistina demokrasiya gel di

pêşengtiya proleterya de têkoşînên bêhempa dane. Ji aliyekî ve di nava rêxistina xwe ya xas de, bi pêşxistina demokrasiya navendî ku dixwestin hêza xwe ya rêveberiyê pêş bixin, ji aliyê din ve jî li dijberî otoriteya ji derveyî wan her tim di nava têkoşînê de bûne.

Bi taybetî jî bandora burjuvazî, em dizanin ku ji bo otorîteya rêveberiya proleterya ji hêz bixe xwest bêzarî, belavî û hilweşînê pêş bixe. Ger em bihizirin bersiva ku ji aliyê Lenînîzmê ve ji vê re tê dayîn, rêxistinkirina proleterya di serî de jî di nava partiyê de di hemû qadan de bi ferzkirin, regezên rêxistina Lenînîst ji aliyê gerdûnî ve di nava gelên cîhanê de rê ji rêveberî re vekiriye. Di pratîkê de ji bo gelan di gelek welatan de ji bo ku komara xwe ya demokratîk damezrînin, ger em bifikirin ku dê bi vê bikaribin xwe bigihînin hêza xwe bi xwe ya rêvebirinê; em dikarin bêjin ku em hêjî di asta herî lewaz ya vê diyardeyê de ne. Em nikarin vê rastiyê nepejirînin. Divê ku em vê bipejirînin, li Kurdistanê bi sedên salane rastiya ku veguheriye rewşa nenas û di roja me ya îro de dixwaze bila bi otoriteya burjuva, dixwaze jî bila bi otoriteya proleterya jî bê rave kirin otoriteya ku bi van herdu ferasetan re jî hev nagre; bi feraseta revebirin û hatina rêveberinê re li hev nake yanî ber bi girdaba otoriteya derveyî serdemê ve tê herikandin.

Nikarin mirovên me bi rêve bibin û nikarin li ser xwe serwer bin. Gelê me jî hema bêje nikare xwedî li çarenûsa xwe derkeve. Ji ber ku bi awayekî zêde bi fêrbûn û kevneşopên hişk û dagirkeriyeke dijwar re hatiye pêçandin, dema ku tu erkekî biçûk jî didiyê, wê yetkiyê bi usulên ji dê û bav fêrbûye mîna pêwendiyeke pederşahî pêk tîne. Ya mîna otoriteya bavê xwe, ger di nava eşîretekê de be jî mîna otoriteya reyîsê eşîrê yan jî ji vê jî wêdetir mîna cendermeyekî, qaymeqam û otorîteya dadgerekî kî bikar tîne. Bê ku pêdivî bi nîqaşa kesên li ber serê xwe re bibîne, ronîkirinêkê bike, meylên xwe yên şexsî mîna meyla rêxistinê heta mîna meyla gelekî destnîşan dike û bawer dike ku divê herkes li gorî vê tevbigere.

Bê ku di pêvajoyeke demokratîk re derbaz bike, mînak ger komîteyek hebe, bê ku veguherîne biryara hevbeş a wê komîteyê, biryara xwe ya şexsî mîna biryara rêxistinê bi asanî dikare bipejirîne. Biryareke bi vî rengî ya ku bi kesî neşêwiriye, dibê ku divê herkes li gorî vê biryarê tevbigere. Yanî dikeve nava wê feraseta saş a rêvebirin û dayîna rêveberinê ku bi sedên salane tê meşandin. Yan jî berevajî vê heta radeya dawî pasîf, kêrnehatî, tevlînebûna pêvajoya girtin û pêkanîna biryaran, li pêkanîn û pratîzekirinê xwedî dernakeve, hema çi jê re bê gotin bi hewleke kêm yê ku pêk tîne; yanî kesayet û bûyerên bi vî rengî pir zêde tên dîtinin.

Di vê qonaxa dîroka me de, tê zanîn ku me di nava partiya xwe de otoriteya xwe ya gelek sînordar pêş xistiye. Gelê me ji otorîteya xwe ya cewherî mehrûme. Nemaze kes di bûyera rêvebirinê de gelekî teng dimînin, weke ku teng dimînin naveng jî ji otoriteyên feodal, dagirkerî, eşîretî û olî nayê derbaz kirin. Divê ku em jibîr nekin ev jî rê nadin ji pêşketina otoriteyeke demokratîk û pêşverû. Ger ev rastî neyê jibîrkirin hîn dema ku partiya me di pêvajoya grûbeke biçûk a bîrdozî de bû, heta ku xwe veguherand hêzeke polîtîk û çalakiyê, bi van hemû otoriteyan re şer kir û xwe gihand vê demê. Divê ku ev rastî jî di bîra hemû kesî de be. Ji bo ku xwe veguherine hêza otoriteyê jî, xwe spart bîrdoziya xwe bi xwe rêvebirina gelan û proleterya ya ku ji aliyê Marksîzm û Lenînîzmê ve hatî pêşxistin. Li ser esasê xwe spartina vê bîrdoziyê rêzdariyeke çawa afirand, her ku çû ev çawa veguherand hêza partiyê, çawa di nava hewldanên veguhertina vê ya maddî de ye. Her kesê ku li paşeroja me ya nêz binêre wê bibine; ji bo bidestxistina van pêşketinan hejmareke zêde feodal anîn ser rê, bi taybetî jî zimandirêjiya burjuvaziya biçûk, nefêmkirinên wê, nenasiya otoriteyê ji bo ku ji holê rake çawa xwedî hewldaneke bê hempaye.

Ji aliyê dijmin ve kesayetiya ku bi sedan sale ve tê xwedîkirin, di roja me ya îro de jî bi navengeke provakasyonê tevahî çalakiyên belavekirina rêxistinan rewa tê dîtin de û vê jî bi rêbazên ku heta niha qet nehatine dîtin li ser partiya me ferz dikin. Yanî di vê qonaxê de jî dixwazin hêza otoriteya partiya me û gel, hêza rêvebirinê asteng bikin. Yên ku li dijberî vê radiwestin dixwaze bila di bin arasteya dijmin de bin, dixwaze bila bi nîyeteke paqij be, yên ku di nav rêxistinê de li gorî vîna hevbeş tevnagerin, ji pêkanînên pêdiviyên demokrasiya navendî dûr, li gorî xwe, ji gotinê fêm nake, dixwaze herkes mîna axayekî wî/ê pêşwazî bike. Tîpê rêveberiya ku nizane çiye, despot yan jî pasîf di girtin û pêkanîna biryaran de çalak tevlînabe. Ger agir bi rêxistinê bikeve û bişewîte ne di xema wî/ê de ye, yan jî kesên ku layiqî endamên partiyê nabe yê herî nebes nezîk dibe. Kesayetên bi vî rengî ên revebir jî hene û partiya me hewl dide di nava hişmendiyên bi vî rengî de bi hev re pêş bikeve.

Di van mijaran de, gelek nirxandin hatin pêşxistin. Bingeha bêrêxistiniya dîrokî û civakî hatiye vegotin û nebesiyên vê rê li ber vekirine hatine destnîşankirin. Dûbare, dûbare pêdivî bi vegotinê nîne. Lê tevî hemû pratîkên hatine jiyîn, talîmatên hatine weşandin û nirxandinên hatine veguhertin, em dev jê berdin heval di nav gel de serwer bin û bikaribin rêve bibin, tevî hemû derfetên di nav rêxistinê de jî, xwe negihandina feraseta

otorite û rêveberiyê, heta radeya dawî bi êş e û rewşeke neyê pejirandine.

Divê ku ew xal qet neyê jibîrkirin; xwe bi rêxistinkirin otorite ye. Lê ev jî ji xwe razîbûneke biçûk a ku tu bijî, ferdîyeteke biçûk, dikare te di bin navê otorîteyê de xwe di rêxistinkirinê de veguhere nexweşiya hevdû fetisandinê. Vaye mijara ku nayê dîqatkirin jî ev e. Mijara ku em jê re dibêjin bi partiyê û rêxistinê lîstin hem jî bi safîtiya xwe, çavkorî bi rêxistinê ve girêdayî, li ser esasê girêdayîneke bi vî rengî pêş dikeve, lê di gel evîna çarsor de jî, ya ku bi xiyaneta rêxistinê re hev digre; nexweşiya ku gelek heval bê ku ferq bikin pê dikevin jî ev e. Bêgûman ev tenê ne di xebatên Ewrûpa de, nexweşiyeke bandora xwe li hemû xebatên me yên partiyê dike û divê ku ev nexweşî were derbazkirin. Bi kurtî em neçarin xwe bigihînin hêza rêveberiya hevbeş. Ev di nav refên partiyê de pêkanîn, sibê di nava gelê ku ji aliyê dijmin ve bi hemû aliyan ve hatiye dorpêçkirin de tê wateya raberkirina mînaka herî biçûk a vîna kolketîf û demokrasiya navendî. Îro yên ku di nav partiyê de vê nafirîne, nayê fikirandin ku sibê di nav girseyên mezin û berfireh de bikaribin rêxistina eniyê biafirînin. Yên ku komîteyeke biçûk bikarneyîne, zahmete ku rêxistineke leşkerî ya jirêderneketî biafirîne. Ji ber vê partî dibistaneke saxleme. Wê demê ev nexweşiya ku di nav gelek kadroyên me yên pêş de bandora wê tê dîtin em ê çawa ji holê rabikin?

Heval ji hed zêdetir rêxistinê bi van mijaran ve mijûl dikin. Lê piçekî xwe tengav bikin, bi ser meselê de biçin, misoger dê bi asanî bigihêjin çareseriyê. Ji wan kevneşopên heta serdema navîn jî diçin xwe rizgar nekirin, bi rastî jî ji bo şoreşgerên proleterya mijareke xemgîne. Ji xwe ji aliyê pratîkî ve çareserkirina bûyeran li gorî pîvanên roja me ya îro asan bûye. Partiya me bi platformeke sîyasî û bîrdozî, nemaze asta biryardariya vê bi dest xistî ye. Ev hemû weha lê kir ku tu kes nikaribe ji rastiya vê xetê guman bike. Wê demê pirsgirêk, ji pêkanînê re dimîne. Lê pêkanîn jî ne bûyereke ewqas neyê meşandine. Li vir ya ku qet ne zahmete, lê ji ber ku yên pêwîst nayên kirin, rastiya ku vediguhere xaçepirsê rastiya me ya kujer jî ev e.

Serneketina pêkanînê çiye? Îradeya hevbeş a ku gelê me bi sedên sale ji pêkanîna wê mehrûme ne afirandina wê, şênbernekirina wê, di vir de ji xwe hezkirin, yan jî ji xwe bêzarbûn û ketina rewşa kesayetiya berê, di fêmkirina bîrdozî û siyasî de nebûyîna PKK'yî, dema dor tê pêkanînê ji holê windabûn, di dema borî de ger çiraxek be weke çirax mayîn, gundî be gûndî, aware weke aware mayîn yan jî mezinê malê be weke mezinê

malbatê mayîn, bi kurtî di dema borî de di nav civakê de çawa cih girtiye weke xwe mayîne… Vaye gelek xetere û xala girîng a nebûna PKK'yî jî ev e. Lê xala ku herî zêde pêdiviya me pê heye derbazkirina van û afirandina bûyera ku em jê re dibêjin PKK'yî bûne.

Îro ji milîtanên Partiyê, heta sempatizanan û heta welatparêzan, mirovên ji rêzê hema bêje herkes, tesbîtên bîrdozî yên PKK'ê rast û pêşketî dibînin. Lê beşeke pir kêm vê xetê li gorî hedefa ku PKK dixwaze xwe bigihînê birêxistin dike. Di serî de navenda Partiya me, ev bi vî rengî ye. Endamên me yên navendî bi gelek taybetmendiyên xwe ve her yek PKK'yiyek başe. Lê dema ku tê gotin em bibin "rêxistinkerê PKK'ê" em gelek ji wan di rewşeke nenas de dibînin. Hema bêje her kes usulên ji bav û kalan mane li ser navê feraseta rêxistinê dixin çavên me, mîna jîjo xwe tûj dikin û rêxsitina me bi rewşeke neyê karanîn re rû bi rû dihêlin. Eşkereye ku vê jî ne bi zanebûn dikin. Ya bê kelecanî, ya tengezarî, ya pir kêrnehatî, ya pir sar û bê eleqe yan jî weke berhema zimandirêjiyê xwe negihandina rêxistina hevbeş, vîna hevbeş negihandina hêz û bi vî rengî rewşa domdariya valetiyê derdikeve holê. Lê em jibîr nekin ku mêtîngeriya ku bi sedê salane li ser me didome, weke kole me bi rêve dibin, bi kurtî ji hemû tiştî mahrûm mayîna me re rê vekiriye û derdême yê sereke ev e. Wê demê divê heval ji vir ve pir zêde bi ser xwe de biçin.

Ev xala ku paşverûtiya otorîteya serdema navîn û dagirkeriyê xistiye rewşa ku nayê kar anîn, em çawa di nava Partiyê de dûbarekirina vê weke rewşek xetere dibînin, li beramberî vê xala yekem ku bê kirin ev birîna xwe ya ji berê ve ancex dikare birêxistiniya proleterya bê girtin. Ev jî di serî de bandora Partiyê, rêxistina proleterya pêl bi pêl li ser hemû girseyên gelan ferzkirine. Regezên Lenîn yên gerdûnî ku di vê mijarê de tên zanîn. Lenîn dibêje: "taybetmendiya herî diyarker a proleterya, taybetmendiya wî/ê ya rêxistinkirinê ye." Di vê mijarê de dema ku em Syerdloy'û bibîr tînin, em axaftina ku kiriye bibîr bînin. Van xalên ku ji aliyê Lenîn ve hatine destnîşankirin eşkereye ku sed qad ji bo Kurdîstanê derbazdarin. Rêxistinbûna proleterya nebe di Kurdistanê de rêxistin pêş nakeve. Wê demê divê bê ku heval serê xwe biêşînin, bikevin ferqa rêxistinkirina ku bi zorî û zehmetiyê dimeşînin, jibîr nekin bi kiryarên sedan sal ên dijmin çawa dixebitin û di encama vê rêbazê de rewşeke çawa bi metirsîdar re rû bi rû dimînin û hêrsa ku vê derxistiye holê ve, ji bilî hemêzkirina pratîkên rêxistinî û bi rista xwe ya rêxistina şoreşgerî a proleterya ve rabûnê zêdetir ti çareyeke din nîne.

Helwesta ku heval di vê mijarê de raber dikin çîye? Ger di vir de em destnîşan bikin; hevalên me weke ku di gelek mijaran de, di mijara rêxistinî de jî dibêjin ku em gelekî bi Serokatiya Partiyê ve girêdayîne û ji bo ku xalên tên gotin em pêk bînin dikevin pêşbirkê. Lê ger em xebatên ku Serokatiya Partiyê ji kêliya destpêkê heta roja me ya îro bi şehîdên xwe û yên jiyan dikin re meşandiye binêrin, dê bê dîtin ku têkiliyeke pir kêm a gelek hevalên me bi vê rastiyê re heye. Îro veke Rêbertiya Partiyê xala ku em bi gelek endamên partiye re têdikoşin ev e. Em ji girêdana van a bi Partiyê re guman nakin, lê divê ev hevalên me di gelek xalan de jî vê qebûl bikin ku xebatên xwe li gorî feraseta Partiyê û şêwaza xebata Rêbertiyê pêş naxin. Divê ku bê pejiradin di van mijaran de tengin, seranser dimînin, lê divê ku ev weke çarenûsekê neyê pejirandin.

Bi taybet di pêvajoya têkoşîna me ya 15 salî de, bi hewldanek hêza kesî têrê nake û bê ku aciz û bêzar bibin, gelo nayê bibîrxistin bê ku bondoreke herî hêsan biafirîne, heta xwe gihandina hêza rêveberiya berfireh, afirandina eleqeyeke ji rêzê, malbateke ji rêzê bi partiyê dayîna qezenckirin, pêgihandina kadroyekî û ji bo parastina hemû curên xizmetê xebat hatine meşandin. Ger tê bîrê û tê gotin ku ji vê re rêzdarin di wê rewşê de, wê demê em ê ji reftarên tevgerên bêxem û gotinên bêbaldar ku ji aliyê gelek hevalan ve tên raberkirin re çi bêjin? Em ji hemû hevalan re dibêjin tekilhev bibin, şêwaz û vîna hevbeş di nava hemû xebatan de serwer bikin, ji endamê herî saxlem heta yê bi gûman bizanibin bi hemû kesî re bixebitin, bi feraseteke rast a rêxistinî û xebatê ve ji bo rêbertiya proleterya têk neçê, bi hemû hêza xwe tevlî bibin; baş bizanibin ku çeka me ya herî mezin rêxistine, vê fêm bikin û di xebatan de serwer bikin. Lê roja paşê em dibînin ya ku tê kirin berevajî vê ye.

Ger em bixwazin çend mînakên vê bidin, ji hevalên me yên herî pêş û bi nirx re ev kar dê çawa bê meşandin di gelek xalan de em vedibêjin. Lê em carekê dibînin ku, hevalê me li cihê ku çûyê, di qada erkê de axatiyeke biçûk bikar tîne. Bi rasti jî otoriteya ku Rêbertiya Partiyê cesaretî pêkanîna wê nake, li ser her kesî pêk tîne. Dema ku nayê pejirandin jî dibêje; “hûn gotinên min guhdar nakin” xwe tîne rewşeke nenas. Mixabin rewşa ku herî zêde tê jiyîn û tê dîtin ev e. Ev hevalên me gavên xwe dirêj dikin û dibêjin; “Hevalê Elî guhdar dikin, lê çima me guhdar nakin.” (Elî nasnavê ku berê Rêbertî bikar danî) Belê, di van deman de yek ji xalên ku di nivîsan de derbaz dibe ev e. Başe ji van hevalan dipirsin; “Ji bo guhdarkirina hevalê Elî şert û merc çine û ev çawa gihandiye hevalan? Xala yekem divê ku ev

baş bê fikirindin. Ya dûwem; asta hevalê Elî di nava vê Partiyê de çîye? Ev ast çawa hatiye afirandin û çawa tê îdarekirin?

Komîteyên navendî û her ku diçe heta endamekî derdorparêz ê herî ji rêzê ev otorite gav bi gav çawa pêş dikeve, kesayet bi xwe spartina Partiyê tevkariya xwe çawa pêş dixin divê baş bizanin. Di vê mijarê de nebesiyên ku bên kirin, ger li Bexda be jî dê paşde bizivirin. Di nava rastiya Partiyê de ti heval nikarin ji valetiyan sûd bigire û bilind bibe. Eşkereye ku darbeyeke burjuvaziya biçûk nebe ev ne gengaze. Bi kurtî otorite bi asanî pêş nakeve. Lê ev rewşa ku pir zêde em pê re rû bi rû dimînin ya ku em ji sifirê despê dikin, heta yên ku xwendin û nivîsa wan nîne em fêr dikin dema ku diçe ser serê gel, roja duwemîn dikeve rewşeke nenas. Li beramberî eleqe û coşa gelan wiha dizane ku hemû hunerî ya xwe dibîne û dîn û har dibe. Lê gel ji wî/ê kesî bawer nake, ji Partiyê bawer dike. Bûyera yetkiyê divê baş bê bikaranîn. Ew yetkiyeke pîroze û gelek binirxe. Lê yan ev yetkî qet nayê bikaranîn, yan jî weke ku pir zêde tê dîtin, vediguhere otorîteyeke girtin û berdan di deste wî de ye. Herdû rewş jî nayên pejirandin. Bi rastî jî ger her hevalek çavê xwe piçekî veke wê bibîne, bi hezaran mirov ji bo ku hêza xwe ya maddî û manewî tevlî têkoşînê bike, di bin fermana Partiyê de bixebite bi xwestekin. Vaye ya herî bi êş berpirs û erkdarê me ne di ferqa vê de ne, yan jî yetkiya ku di dest de bi usulen bav û kalan disepîne û dikeve nav xeteriyê. Encam; di rêxistinkirinê de dibe rewşeke nenas. Mînakên bi vî rengî mirov dikare pêşkêş bike.

Hemû hevalên me, bi rastfêmkirina pêşketin û otorîteya Partiyê, di nav Partiyê de karanîna vê yetkîya ku bi dest xistiye li gorî zanistî û ruhê Partiyê jîndarkirinê re rû bi rû ye. Ez hema bêjim, ev quralek rêxistinê û pirsgirêka regezê ye. Îro pîvana herî diyarker a bûyîn an jî nebûna şoreşgeriya proleterya ev e.

## EM Lİ DİJBERÎ HEMÛ NÊZÎKATİYÊN ECEMÎ Û LÎBARAL ÊN ÇAVKANİYÊN XWE Jİ ME DİGİRİN Û ME Jİ PARTBÛNÊ DÛR DİXİN ŞER BİKİN!

Di xebatên me yên Ewrûpa de ji demên borî heta roja me ya îro xalên ku tên rexnekirin, lê bi kûrahiya xwe nayên fêmkirin di derbazkirinê de hewldaneke têrker dernakeve holê, nexweşiyên heyî îro weke pirsgirêkên sereke yên Partiya me mijûl dikin derdikevin pêşbarî me. Ev nexweşiya ku em dikarin weke xwe negihandina pîvanên şoreşgeriya tê xwestin vebêjin, ger bi lezgînî neyê çareserkirin, bi taybetî jî ji bo kesên ku xwedî vê nexweşiyê ne, dê rê li ber rewşên nayên awatkirin veke. Ji ber vê jî, rexneyên ku arasteyî hevalan tê kirin bi êş be jî, di tedawîkirina nexweşiyan de weke dermanê herî bi bandor vexwarina wê, pejirandin û mîsoger pêdiviyên wê pêk anîn neçariyeke. Ji ber ku Partiya me weke ku di hemû qadan de, di xebatên Ewrûpa de jî dengên cuda, êş û azaran naxwaze bibihîze, di vê qonaxa dîrokê de dema ku ser bi erkên divê bên meşandin de diçe, bi pirsgirêkên vî rengî re mijûlbûnê, li beramberî têkoşîna gelê me ya pîroz mîna bê berpirsyariyê dinirxîne. Eşkereye ku êdî bi serêşîyên vî rengî re ji bo mijûlbûnê ne dema xwe heye, ne jî tehamula xwe maye.

Bi dûbare derbazbûna hevalê Sadûn ya vê qadê re rewşa ku derketiye holê, heta roja îro rexne û alîkariyên ku me kirin çiqas hatiye fêmkirin, bersiva wan çiqas hatiye dayîn ji bo destnîşankirinê bûye pîvaneke ku ji ti dijbertiyê re cîh neyê dayîn. Bê ku em girîngî bidin şêwe û teşeyan, destnîşankirina çavkaniya pirsgirêkan û bîrîna heyî hinekî be jî êşandin, ji bo ku hevalên me bi xwe ve werin pêwîst dibînin.

Ger em ji nameyên gazincên herî dawî giştine destê me destpê bikin, ya rast hevalên me ji xwe acizbûne lê ne di ferqa wê de ne. Hevalê Sadûn ê ku ji vir çû diyare ku nîqaşa têrker nemeşandiye yan jî nekiriye, hema çi fêm kiriye baş ango xirab çi fêm kiriye xwestiye li gorî wê hinek tiştan bike. Vê dide diyarkirin. “Her Egîdek dizane çawa karê xwe bike. “ Eşkereye ku hevalê Sedûn jî xwestiye baş an xirab li gorî xwe hinek tiştan bike. Ev tê fêmkirin. Lê ev hevalê me, her çendî weke tê xwestin hevbeşî pêk ne anîbe,

talîmatên Rêbertiya Partiyê derbazî meriyetê nekiri be jî, diviya helwestên ku hevalên din raber kiriban çibûya? Ya tê fêmkirin ew e, dema ku hevalê Sedûn di rêbaza xwe de hinekî israr kiriye paşde gav avêtiye, bêdeng bûye, ger em tiştên dema borî ji aliyê Hevalê Qasim û Cafer ve çawa kar bi zincîr kirine bibîr bixin, wî jî serî li heman rêbazî daye û hinekî jî xistiye nava van qeydûbendan. Tevî ku di demên borî de ev rastiya metîrsîn jiyabûn, xwe ji dûbare ketina nav vê kêmasiyê rizgar nekirine. Lê dema ku xwestin hinek qeyd û bendên din ava bikin helwesta ku pêwîst bû bihata raber kirin çibû? Ji pratîka rêxistina me ya dema borî de di vê mijarê de pêwîst bû kîjan encam hatiban derxistin?

Ya rast hevalên me, ji dîtina gelek pirsgirêk û nebesiyan ne dûrin. Mînak; Hevala me Evîn pirsgirêkan bi nerîneke xweş, pir baş tîne ziman. Ev tiştên rastin. Lê li ser navê çareseriyê tiştek di holê de nîne. Wê demê gazincek mijara gotinê ye. Hevalê me Edîp ku em dibêjin di mijarên rêxistinî de xwedî ezmûne hema serî li mijara xwe paşve kêşanê dide. Eşkereye ku rewşa valetiyê derdikeve holê. Rewşa hevalên din jî heman taybetmendiyan raber dike. Di vir de hema em pirs dikin; ka hevbeşî li kîderê ma? Dema ku hevalekî me kêmasiyekê dike ma helwesta bê girtin divê ev be? Eşkereye ku di destnîşankirina pirsgirêkan de yên ku ne xeletin ji aliyê hejmar ve pirin. Wê demê çima ev di civînê de nehatin destgirtin û rexne kirin, ji bo xwe giyandina çareseriyeke rast nîqaşên pêşwîst nehatin meşandin? Di vê mijarê de çima hevalên me yetkî û perpirsyariyên ku ji wan re hat dayîn bikar ne anîn.

Ev hevalên me dema ku li beramberî rewşên hîn xiraptir re rû bi rû man, gelo wê çiqas bikaribin nûnertiya rast a Partiyê bikin? Dema ku kesayetiyekî xwedî îrade û sûbjektîf derkeve, karan revlîhev bike, gelo ew kesên me yên ku xwe parazvanên rêxistinê dibînin wê dîsa agahî bibin “Elî”? Lê divê ev hevalên me baş bizanin “Elî” ji bo her demê nîne. Dibe ku îro teknolojiya hemdem derfet dide ku em rojane bi hev re biaxivin. Lê dibe sibê ev derfet jî nebe û em bi salan ji hev dûr bimînin. Ma wê demê jî wê li qutiyeke gazincan bigerin? Gelo em ê hêza fikrandina xwe ya afirîner û hêza rêxistinê bikaribin bidin axaftin?

Em pêdivî nabînin ku rêziknameya rêxistinê bibîr bînin. Talîmatên ku hûn hibra wan ziwa nebûne, di bandê axaftinan de xalên ku hatine destnîşankirin, em dibêjin divê ewqas zû nehatibin jibîrkirin. Yek ji xalên ku bi taybet di talîmatan de me destnîşankirî ye; êdî dawî li şoreşgeriya ferdî anîn, çi dibe bila bibe xwe gihandina îradeya hevbeş bû. Em careke din vê bibîr tînin vê bi taybet diyar dikin. Kar heta niha hinekî jixweber

hatin meşandin. Di demên ku xet û bîrdoziya Partiyê ne bi rêkûpêk de bû jî, dîsa kar rast meşiya ye. Lê ji ber ku êdî kar gelekî aloz bûne û em gelekî ketine nav hûrkariyan, bandora bîrdozî û polîtîk ji ber ku dê encamekî zêde nede, em neçarin derbazî sazûmaniya komîteyan bibin. Bi kurtî em neçarin ku di vê de serkeftî bin. Lê ji bo vê jî ji nexweşiyên xwe yên kevin re em neçarin bi rêxistinparêziya proleterya çareseriyê bibînin. Wê demê çareseriya vê çiye?

Ji bo vê; beriya her tiştî divê metoda gazincan li aliyekî bê hiştin, her hevalekî me ku aciz dibe, mîna ku destê xwe vedikin bi duayan gazincên xwe li ba xwedê dikin, pêwîste bi heman şêweyê destê xwe ji Rêbertiya Partiyê re venekin, ango gazincan dikin. Eşkereye ku ev weke emcamekî metafizik ê ku em red dikine. Em neçarin di vê mijarê de ji hevalan bipirsin gelo Rêbertiya Partiyê û xwedê tevlîhev dikin an na? Heta niha jî em bi hinek bûyerên bi vî rengî re rû bi rû dimînin ku em vê pirsê ji xwe dikin: Gelo em bi şoreşê re yan jî bi nexweşiyên zaroktiyê ve mijûl dibin?

Hevalê Qasim heta niha jî dibêje; “divê ku ev mijar ji bo me bê ravekirin” Em jî ji vî hevalî vê dipirsin; gelo heta niha mijareke herî biçûk a ku ne hatiye ravekirin maye? Ev 15 sale pêşketinên vekirî yên ku bi xêzkirin, bi dengekî bilind, ên ku ker dikarin bibihîzin, kor dikarin bibînin tên jiyîn. Wê demê hîn çi ji me tê xwestin. Eşkereye ku dema ku em hinekî tengav bikin wê hevalên me ji bê perwerdehiyê gazinc bikin. Na! Em vana napejirînin. Divê nexweşiya li vir bê dîtin. Nexweşiya ku qala wê tê kirin, nexweşiya ferdiyetê ye û hevalên me neçarin xwe ji vê rizgar bikin. Heval dixwazin kar ferdî çareser bikin, çavbernadin hêza rêxistinî ya hevbeş. Mînak dema ku yek ji xetê derdikeve, hesab napirse, dema ku yek ferdiyete kar tîne, ew bi xwe jî ferdiyeteke berevajî dibersivîne. Bi kurtî nexweşiya demdirêj a gelê me, di kurê wan de bi awayekî xeter diteyîse. Lê em ê vê qet nepejirînin û rêxistina proleterya heta dawî ferz bikin.

Bêgûman divê heval nirxandinên xwe yên di derbarê bûyer û pêşketinan de binivîsin, lê di heman demê de divê ku di platformên ku têdene de dahûrînan van jî temam bikin. Ev ne bûyereke ewqas jî zahmete. Yetkiya pêwîst, feraset, cesaret û fedakariya tê xwestin ji xwe bi wan re heye. Ez ne di wê baweriyê de me ku ti heval li beramberî otorîteyeke şaş, rûyekî tirş bitirsin. Jixwe ti heval dema ku rastî li ser wan tê ferzkirin di kêmasiyên xwe de israr nakin. Ji ber ku beriya her tiştî ji bo vê hêza wan nîne. Ya din jî li beramberî helwestên bi vî rengî pêwîste çi bê kirin vekiriye.

Yek naxwaze nîqaş bike, nîqaşê di nêvî de qut dike, yan jî qet nîqaşê venake; wê demê ez ê jî li ser navê xeta rêxistinê li ber xwe bidim, nîqaş

vekim, nîqaş bimeşînim, heta çareseriyek guncav bên dîtin dev jê bernedim, pêşniyar bidim û ji civînê re pêşkêş bikim. Mînak; di civîna me ya 7 kesî de, 6 kes dixwazin kî dikare vê asteng bike? Di rewşên bi vî rengî de rewşa hevalên me yên weke çiyayê ku berf lê bariyayî dê çawa bê ravekirin? Hevalno em dibêjin; "vaye werin em li vir kevneşopekiyek bingehîn xwe bicîh kirî hilweşînin." Em şikandinê û bi heman rêbazî bersiv dayînê pêşniyar nakin; berevajî em dibêjin werin vîna hevbeş serwer bikin. Em dibêjin werin em fikrên xwe yên mîna hev, şêwazên rast ên xebatê, pîlan û pêşbîniyên xwe bigihînin biryarên hevbeş. Lê mixabin ku di nêvengê de tiştek bi navê biryar nîne.

Her hevalek vîn û hizrê xwe yê azad, divê ku weke pêdiviya hevbeşiya proleterya, ger di nav komîteyekê de ye di wê komîteyê de bi hevalan re bike yek. Weke Partî em, ji aliyê bîrdozî, ramyarî û rêxistinî ve hêza yekîtiyê ne. Wê demê çima hevalên me vî hêzî bikar nayînin? Hinek heval qaşo li ser esasê ezmûnên ku ji provakasyonan û têkoşînên dijber derxistine dibêjin em bi tevdîr tevdigerin, ji bo ku neyên lîstokan baldarin. Ev ji hemû aliyan ve çewtbûne! Qala tevdîreke nehewce dikin. Belê li beramberî provakatorekî, hinek kesên nîyet xirab yan jî hinek kesên xwedî nexweşiya burjuvaziya biçûk pêdivî bi hestiyariyê heye, watedare û hinek caran jî pêwîste. Mînak; di rojên despêkê ku em bi ser provakator de diçûn, li Ewrûpa dema ku me xwest em destwerdana 83'ê bikin ji hinek hevalan re me gotibû ku divê li beramberî provakator çawa bi tevdir tevbigerin û pê re nekevin nava gengeşeyan. Tê dîtin ku xalên ku wê demê nehatin pêkanîn, demên piştre pir zêde xwest bên bikaranîn. Hema bêje hevalan wiha zanî ku wê dîsan provakator derkevin û me bînin lîstokan gem li devê xwe dan. Lê diviyabû berevajî bihata tevgerandin. Divîya girêdayî ezmûnên ku hatîn bi destxistin ve hevbeşiya rêxistinê bihata bikaranîn. Bêgûman rêbazên vê jî hene. Her tişt, li her derê nayê gotin, lê mirov hinekî xwe tengav bike û bihizire di kîjan civînê de, ji kê û ji bo çi hesab bixwaze dikare baş derxîne holê. Divê mijarê de pêwîste kevneşopên me yên partî baş bê bîranîn.

Divê ku partiya me mîna rêxistineke qederê ya civaka kevin neyê fikirandin. Em, rêxistinek herî pêşketî ya vîna azad pêş dixine. Divê ku herkes şayanî vê be û rêz nîşan bide. Me hêza ziman û hizrandinê bi gelê xwe re, bi kadroyên xwe re jî hêza fikrandinê, axaftin û derbazbûna çalakiyê da qezenckirin. Wê demê em şayanî vê bin û encamên wê destnîşan bikin. Ev jî, tê wateya ku ji komîteyekê heta ketina nav derdorekê, di hemû qadan de zindî, hînker û hûrûkûr xebatek têrker a birêxistinkirinê. Lê em dev ji gelek qadên din berdin, navenda me ya

Ewrûpa nizane pirsgirêkên navxweyî jî bine ziman, ger bîne ziman jî ji nîqaşa giştî wêdetir naçe. Mîsoger divê pirsgirêk bên komîteyê, di vir de bê nîqaşkirin û ber bi çareseriyê ve çûyîn çêbe, ji xwe ber li her cihî neyê axaftin, mijarên ku hatine çareserkirin mîna xwarina ku dîsa av lê tê zêdekirin me bi dehan car vegotine. Bi girîngî em li ser wê sekinîn, divê ku mijarên nû û pêşverû bikevin rojevê. Rêbaza vê jî hat destnîşankirin.

Ger em careke din bixin bîra hevalan; hevalek an du heval li ser mijarên ku bikevin rojevê wê xwe amade bikin û dê vê veguherînin biryara bi sedem. Ew biryar wê li kîderê, ji aliyê kê ve, çawa bikeve meriyetê tê destnîşankirin û erkdarî tê ferzkirin, piştî wê venerîn tê kirin û encamên wê careke din tên komîteyê. Mînak; bi dehan car me got ku tevahî lêçûnên darayî divê bi navendî bibe. Dîsa dehan car me got; vezasiya qadro, pêwendiyên derve û di nav pêkhateya rêxistinê de guherinên nûneran pêk anîn û hwd divê ku bi erêkirina komîteyan bên kirin. Bi kurtî mijarên ku pêkhateya navxweyî û derve ya rêxistinê eleqedar dike, tevahî pirsgirêk misoger divê bên komîteyê û di wir de bên çareserkirin. Bi vî rengî pêkanîna vê rastiyê ji aliyê hemû hevalan ve tê zanîn. Yên ku di navendê de û di desteya rêveber a teng de cihê xwe digrin di vê mijarê de xwedî yetkiya tamin û erkdarin. Wê demê çawa dibe ku, hinek hevalên me dikarin bi rehetî bêjin; “ji ber tawanên şêwe 20 rojên me vala derbaz bûn.” Ev tawane û tu kes nikare kesî din weke berpirsyar destnîşan bike. Ji ber ku wê jê bê pirsîn, çima ji bo teşegirtinê, bi rista xwe ranebû wê di komîteyê de jê bê pirsîn. Erken xwe pêk ne anîn, pişt re jî ji Rêbertiya Partiyê re gilî kirin û îzah xwestinê ve nikare xwe jê xilas bike. Hem wê tu yetkiyên xwe karneyînî, hem jî tê bêjî em bi zincîran hatin girêdan. Na hevalno, tiştekî wiha nabe! Wê demê em ê jî ji we re bêjin hûn koleyên hejar ên ku di bin bandora pêwendiyên hoşta, şagirt, û serf û senyor de ne. Ya rastî proleterek rêxistinkere hejariyê napejirîne. Wê demê em ê çareseriyê di nav xwe de bibînin.

Komîteyeke weke ya Ewrûpa heta dawî xwedî yetkiyên giştî, bi amûr û gelek derfetan hatiye pêçandin, di nav rêveberiyeke rêxistinî de pêşnexistina biryar û pêkanîna bi rastî jî aqlê mirov nagire. Partiyê bi qasî pêwîst xemilandiye û di asta herî jor de erkdar kiriye. Gelo hîn çi tê xwestin? Ger em ji xwe bawerin, ji guhertina qadro heta lêçûnên me yên darayî û hwd di derbarê gelek mijaran de nerînên ku em jê bawerin ku rastin, divê deynin holê, bikin pêşniyar û bixin dengdayînê. Di encama pejirandinê de yên ku li gorî vê tevnegerin hebin, divê ku pêwîstiya demokratiya navendî em ferz bikin, bi kurtî çeka rêxistinê bikar bînin. Bi

awayekî mafdar ji ber ku bûyerek bertekên me radike ser piyan em destnîşan bikin, weke ku hinek dibêjin divê neye gotin; “Ji Rêbertiyê destûr girtiye, ji ber ku bûyereke pîroze em ê çawa li dijî derkevin.” Kî dixwaze Rêbertiya Partiyê wiha fêm bike, ew tawanê herî mezin ê rêxistinî dike. Rêbertiya Partiyê ji ber ku ne tarîqatek “Neqşîbendî ye” ku ez jî bûme xelîfeyê wê, da ku bê gotin bila herkes were bibe muridê min.

Em rêxistinkerê herî hevbeş ê proleterya ne û pêwendiyên girêdayî me ne jî li ser vî esasî ne. Ne pêwendiya xelîfe-siltan, ne amir-memûr yan jî reîsê tarîqat û murîdekî ye. Di serî de jî em bi xwe, di her pirsgirêkê de bi hevalên herî ji rêzê re jî nîqaş dikin, nerînên wan digirin, hevbeş dikin, piştî wê dixin meriyetê. Ev kevneşopiya Rêbertiya me ye. Em tiştên ku ji aliyê Kemal pîr, Mazlûm û Xeyriyan ve hatine gotin bîr bînin, ew ji bo mirovekî îkna bikin digotin: “ Ger pêwîst be em ê 300 demjimêrî nîqaş bikin.” Bi kurtî nêzîkatiya Rêbertiyê ji pirgirêkan re vekiriye.

Divê ku Rêbertî rast bê fêmkirin. Bêgûman divê ku li beramberî Rêbertiyê rêzdar bin, gotinên wî mîna ferman bên fêmkirin û pêkanîn. Bi taybet jî talimat û nerînên rêxistinî mîna guhar bixin guhê xwe û divê her tim li ber çav bê girtin. Ev ji bo mîlîtanekî cidî tiştên pêwîstin, lê belê dê ew mîna papaxanekî ji ber neke, mîna dûrişmeke lewaziyên xwe dipoşe fêm neke, naveroka wê tê bigihê û afirîneriya xwe jî lê zêde bike û bi vî rengî pêk bîne. Em dibêjin divê ku mîlîtanek xwe afirîner bike û xwe bibîne. Mîlîtanek, bi qasî dikare her pirsgirêka ku derdikeve pêşberî re bi afirînerî baxive hingê dikare bi Rêbertiyê re bibe yek, wateya rast a pêwendiya bi Rêbartiyê re jî ev e. Lê hevalên me bê ku bizanibin jî canê Rêbertiyê derdixin. Divê pêşketina Rêbertiya PKK’ê rast bê fêmkirin û pêkanîn. Divê ku êdî gotinên me bikevin meriyetê. Yên lê pêş tên jî di nav de, em dibihîzin gelek hevalên me dibêjin; “ez ê mîna sempatîzanekî hem jî mîna leşkerekî bixebitim.” Ya em ji van hevalên me re bêjin ev e: “ger hûn dixwazin kesekî ewqas ji rêzê bimînin hem weke leşkerekî bixebitin biçin nav artêşa Tirk, leşkertî li wir tê kirin.

Di nav PKK’ê de mîlîtantiya Partiyê heye, mîlîtaniya Partiyê jî ne leşkerî û sempatîzanî ye. Bi yetkî, otorite û erkên xwe ve erkeke gelek berfirehe. Divê ku şayanî vê bin, bi feraseta koletiyê ya ku di nava civaka me de derbazdare cewhera kar neyê taxrîbkirin. Lê pir bi êşe ku, gelek hevalên me yên herî pêş jî heta niha xebatan wiha dest digrin, yan weke reîsekî, perderşah, otorîteyekê yan jî bûyîna mehmetcîkekî di nav artêşa Tirk de serê xwe mijûl dikin. Partiya me van ferasetan bi tundî mahkûm dike.

Pêwîste jiyana Partiyê û feraseta otorîteya rast, ji aliyê hemû hevalan ve bi kûrahî bê fêm kirin û derbazî meriyetê bê kirin. Weke ku erka dikeve ser milê hemû kadroyên pêş ev e, erkên ku dikevin ser mile navenda me ya partiyê ya Ewrûpa jî, xwe gihandina pîvanên rêxistina proleterya ye.

Di nav jiyana Partiyê de xwe helandin, kevneşop û kombûnên partiyê ên bêhempa li ser vî esasî veguhertina hêzeke maddî û ev di hemû pirsgirêkên rojane de bi awayekî serketî pêkanîne. Divê ku heval van erkên xwe himbêz bikin û bawerî bi hêza xwe bînin. Rêbertiya Partiyê, talîmatên wî bi şêwazekî rast fêm bikin, pêk bînin, nekevin nav nexweşiyên teşeyî yên ji rêzê. Lê bê teşebûnê jî mîna nexweşiyekê nekin, hemû xebatên me hevbeş bikin, nerînên ku di komîteyan de derbaz nebûne mîna nerîn nebînin, biryaran mîna biryar nepejirînin.

Wê deme, hemû xebat bi veguhertina biryareke hevbeş dengdanê re derbazkirin, di pêkanînê de çavdêrî kirin, venerîn, ger aliyên kêm û nebes hebin cardin ji dengdana komîteyê re pêşkêşkirin û wisa sererastkirin esase. Bi vî rengî li şûna feraseta rêvebirin-hatina rêvebirin a sedan salî ya seqet, di nava partiya me de û nemaze di komîteyên ku qadroyên pêşeng di nav de cîh digirin de feraseta rêvebirin û hatina rêvebirinê ya rast bi xwe re pêşxistin girînge. Bi vî rengî bûna milîtanên proleter, bi vê milîtaniya her ku bi ser karan de diçe û wisa kûr dibe re xwenasîn û di vê mijarê de rêxistinparêziya ku herî zêde pêdiviya gelê me pê heyî bi xwe re pêkanîn, jiyana xwe ya partî veguhertina çêkerek rêxistinkirî ya ji pola û ev çeker pêk bi pêl di çeperên girseyî de belavkirin girînge. Vaye erka dîrokî ev e, vaye rista sereke divê ku mîlîtanên me yên Partiyê misoger pêk bînin jî ev e. Em rast xwedî li van rista derkevin û rast pêk bînin.

Erka ku em ji mîlîtanên xwe çavrê dikin tevî ku ev e, yên ku di asta herî jor de ji xebatên me yên Ewrûpa berpisyarin, li wê qadê xwedî wesfên rêbertiyê ne helwest û tabloya ku raber dikin çawa ye?

Tevî ewqas ferzkirinên me yên bi israr, li Ewrûpa hevalên me yên ku ji xebatan berpirsyarin, li şûna ku şêwaza xebatên Partiyê esas bigirin nebesiyên xwe dane axaftin û careke din xwe kirine pirsgirêk û derketine pêşberî me. Tê çavdêrîkirin ku erk û yetkîya ku Partiyê daye hevalên li Ewrûpa ji bo pêşxistina karên partiyê bikar ne anîne. Karîyerîzma ku çavkaniya xwe ji rewşa ruhî a burjuvaziya biçûk digre û Rêbertî piranî tevlîhev dikin. Yên ku ti pêwendiya xwe bi jiyana partiyê re û şoreşgeriya proleterya re nîne, berevajî nexweşiyên ku her tim vana di nav me de dihelîne û derketina wan a pêşberî me, divê ku hinekî jî mirov wisa rave

bike. Rewşa ruhî ya burjuvaziya biçûk çiqas metirsîdare ji aliyê me hemûyan ve tê zanîn.

Hevalên ku faliyetên hevbeş dimeşînin cîdî negirtin, bêrêzî, li beramberî kar û xebatan ji rêzê mayîn, li beramberî vîna hevbeş serî netewandin û hwd bi gelek şêwazên cuda navê hevbeş ê vê nexweşiyê weke karîyerizmê hatiye dîyarkirin. Di bingeha vê de jî ferdiyet heye. Hevnegirtina vî kesî ya bi rêxistinê re, bi awayekî objektîf ji aliyê hizrî ve her tim ji xwe re cihekî cuda veqetandiye. Teyîsîna xwe jî yan di lîberalîzmê, yan jî di hişkbûnê de dibîne. Piranî jî ev her dû di heman şaneyê de li gel hev tên hewandin. Kesayeta bi vî rengî ya ku xwe di nav hêza rêxistinê de nahelîne, ya ku bi şêwazên cuda xwe dide der şaneya ku hemû nexweşiyên burjuvaziya biçûk hêlîna xwe tê de çêdikê ye. Yanî di nava refên Partiyê de hilgirê nexweşiyê ye.

Weke ku di giştî de heye, di faliyetên me yê Ewrûpa de jî gelek taybetmendiyên derveyî proleterya tên dîtin. Di demên borî de li şûna ku gelek pirsgirêk di komîteyên Ewrûpa de bên çareserkirin, mîna sohbetan hatiye destgirtin, pirsgirêkên herî sereke di civînê de nehatine vegotin. Hêza gel û qadroyan di civînan de nehatiye nîqaşkirin û tevgerîn. Yanî di dema borî de hevbeşî, şoreşgerî û rêxistînî nehatiye pêkanîn. Ev heta doh jî bi vî rengî ye. Her tim pirsgirêk bi rêbazên ferdî hatine destgirtin. Ev jî karîyerîzmê pêş de dibe û di encam de bi rêbazên etrîkawarî hata lingê hev şemitandinê jî diçe, yanî felsefeya têkoşîna çîna dervî proleterya ye. Hema bêje rêxistinkariya tarîkatekî, ahbapçawîşî, herêmgerî, tengaviya di mijara rêxistinî de û hw dine. Ev jî dibe îfadeya tevgerîna yekîtiya esnafan ku di mijarên rêxistinê de nebûye proleter.

Çiqas weke neyê pejirandin tê dîtin bila bê dîtin, di rewşa dawî ya ku hevalên Ewrûpa raber kirî de bermahiyên rewşa demên borî yên ku li Ewrûpa hatine jiyîn tê dîtin. Mînak; yên ku di mijarên rêxistinî de hestiyar û hesasin, duristin, lê di heman demê de jî yê ku bi awayekî saf tevgerî ye hevalê Sadûn, dema ku cara duwem vegerî Ewrûpa vê carê jî ji bo ku otorîter be ketîye nava helwestekî hişk. Nexweşiya ku heval ketiye nav çi dibe bila bibe, bê ku di nav wan de bihele, bê ku nîqaşeke têrker pêş bixe, tenê bi hêza rêveberiyê ketina nav keda xebat xistina rotayekê, ev jî ji aliyê hevalan ve nehatiye pejirandin. Ev jî weke ku ne pêwîste, rê li ber nîqaşên bêgane ketina nav pêwendiyên me yên partiyê re vekirî ye. Weke ku pirsgirêk bi dehan car me vegotiye û divê talîmatê de jî destnîşan kiriye, li şûna ku xwe bispêrin hêza xwe ya cewherî, di civînan de dest bigirin, xwe bigihînin şêwazên rast, rêbazên ferdî hilbijartine û kar heta bêrêziyeke

beramber jî birî ye. Hema vê jî bêjim, ne di wê baweriyê de me weke ku hevalê Sadûn dibêje helwestekî takekesî hatibe afirandine.

Lê rewşa hevalên din a ku hevalê Sadûn vala derxistine, li ber çav negirtine nayê pejirandin. Misoger nayê pejirandin. Em van herdu rewşan jî napejirînin. Ya ku em pêşniyar dikin; di xebatên navxweyî de serwerkirina rêbaza xebata rast a ku Rêbertiya Partiyê ferman dike ye. Divê ku heval di vê mijarê de rexnedayîna xwe bidin. Di vê mijarê de em ti îtîraz an jî pêşde ajotina hizrên din qebûl nakin. Ev biryareke partiyê ye. Careke din tiştên berevajî vê divê ku daneynin holê. Ti heval li ser esasê rewşa xwe ya ruhî nikarin tevbigerin û rêxistinê bi pirsgirêkên sûnî yên sexte ve nexuliqînin. Rêzdarî li beramberî kademeyên berpirsyar, di çarçoveya ku me diyarkiriye de divê bê esas girtin. Hevalê Sadûn ji aliyê Partiya Ewrûpa ve weke berpirsyar hatiye vesazkirin. Ev berpirsyarî heta roja dawî jî derbazdare. Statûya hevalên din jî diyare. Ji van aliyan ve pêwîste heval di nav wê hêmanê de rexnedayîna xwe bidin û pêşkêşî partiyê bikin. Rewşa heyî misoger divê ji hevalên din re neyê teysandin, weke nûnerekî mînak derkeve pêşberî wan.

Tê dîtin ku, ger Partî di welat de bi hêz nebe û ji vir destwerdan neyê kirin, wê zirar dayîna partiyê bibe mijara gotinê. Lenîn dibêje; “gelek pirsgirêkên mezin di encamê nîqaşên biçûk de derdikevin holê.” Weke ku Lenîn jî diyar kiriye, hûn jî li wir bê ku di ferqa wê de bin bi nîqaşên xwe yên bê wate zirarê didin yekîtiya Partiyê. Misoger rewş nayê pirolekirin. Ezmûnên pir mezin en partiya me jiyayî hene. Heta roja îro tasfiyegerên ku di nav Partiyê de derketine holê û di encam de ber bi dijmin ve çûne xala derketina wan, di despêkê de nîqaşên biçûk ên qet girîngî jê re nehatiye dayîn hene. Hinek ji wan her çiqas saf û niyet baş bin jî, rêbazên ku şopandine ew heta dijberiya Partiyê jî birine. Divê ku hevalên me ji tiştên tên gotin dilê xwe negirin. Dema ku bi nîyeta baş em tevbigerin bêgûman nîyeta we hemûyan başe û daxwaza ya herî baş kirinê di kesayeta we hemûyan de serwere. Em jî dibêjin, ger bi rastî jî bi vî rengî ye; di xebatên me yên Partiyê de yê ku wê qed sûd nede, ketina we ya nav nîqaşên bê wate nayê qebûlkirin.

Her heval baş dizane ku, cudabûnên ku di nav kesan de derdikevin di wan de israr bê kirin, ev dikare veguhere grûpbûnê. Lê tehamula Partiya me ji cudabûnên sûnî yên wiha re nîne. Em fêm nakin ku çawa cesaretî tiştekî wiha dikin. Niha hûnê jî bikevin ferqê, pirsgirêk weke ku hinek heval îda dikin, ne pirsgirêka derbazkirina bêteşebûnê ye. Di bingeha vê de ferdiyet heye. Pêvajoya rexnedayînê ya ku hêjî didome derbazkirina van armanc

dikir. Lê ya tê dîtin ew e ku, wateya rexnedayînê nehatiye fêmkirin. Ji wê jî zêdetir rexnedayînên ku tên kirin tenê di gotin de dimînin. Li beramberî çavdêrî nekirina û serwernekirina we ya kolektîvîzm, hişyarî û hevgirtina proleterya, di vê mijarê de rabernekirina hestiyariyê û ji nedîtîve hatina we, encamekî cuda gengaz be yan na êdî divê hûn dîyar bikin.

Tê fêmkirin ku ji têkoşîna li dijberî provakasyona Semîr ji kêmasi û xeletiyên hatin kirin we ders dernexistî ye. Di vê mijarê de hevalên ku herî zêde me rexne kirin îro dema ku rexnedayîneke bingehîn didin, divê ku hûn di van mijaran de berê xwe bidin rexnedayîneke bingehîn. Di rexnedayînên ku hûn pêş dixin de xala hevbeş; di demên borî de xwe negihandina navendeke bihêz bû. We qala derbaznekirina xebatên hevbeş a jiyanê, serweriya rêbazê, xebata takekesî û ji ber van jî xebata ku dihat awatkirin derbazî meriyetê nekirinê dikir. Weke hevalên ku di van hemû mijaran de xwedî nerînên hevbeş bûn, di roja îro de heman rewş raberkirina we, hûn ciqas bi rexnedayînê ve girêdayîne ma danayne holê? Ya ku we ji rastiyên ku hûn jî pê bawerin derbazî meriyetê kirinê dûr dixe çiye? Eşkereye ku di holê de ti astengî nînin, tenê hewldan û ferzkariya pêwîst raber bikin.

Bi dehan car me destnîşan kir ku her yek ji me dema li gorî xwe karê rêxistinê rêve bir dê encam ev be. Bi samîmîyeta xwe ya hevaltiyê em careke din alikariyên pêwîst pêşkêş dikin û divê ku her hevalek ji niha û şûn de, dê her hevalek rêbazê xebata Partiyê bi kûrî fêm bike, derbazî meriyetê bike û ferzkariya pêwîst destnîşan bike, em dixwazin ji vê bawer bikin. Yên ku tê gotin kesên ku di şoreşgerîya proleterya de bi biryarin rastiyên ku jidil divê ku pêk bînine. Lê di heman demê de ev fermana Pariyê ye. Wê demê, pîvanên ku tê vegotin em pêk bînin. Madem em di nav refên Partiyê de ne, wê demê em şoreşgertiya vê Partiyê bikin.

Partiya me, di nav refên xwe de ne ji lîbaralîzma rastger, ne jî ji hişkbûna çepger re mafê jiyanê nas nake. Ji rê derketinên bi vî rengî amûrên sereke ji aliyê provakasyonan ve tên bikaranîn. Partiya me li beramberî van herdû xeteriyan ji roja despêkê ve hişyariyên pêwîst kir û du salên dawî di nivîsên partiyê û talîmatan de li ser têkoşîna dijberî van rawestiya. Lê tê dîtin ku hêjî fêrbûn û helwestên berê nehatine derbazkirin. Tevî ku hevalên li Ewrûpa li beramberî van nêzîkatiyan helwesta xwe raber kirin û kîna xwe anîn ziman jî, hişyariya pêwîst raber nakin û di nav xwe de vê perwerdê kûr nakin. Ev, di rewşa dawî ya ku derketiye holê de tê dîtin. Bi taybetî jî hevalên ku di pileya yekem de berpirsyarin ji bo merîteykirina rêbaza xebatê, di vê mijarê de hestiyariya pêwîst rabernekirina wan, xebatên Partiyê weke ku pêwîste di giştî de bi rêvenebirin risteke girîng

divê mijarê de dibîne. Tevî ku bi hevalên din re hewla derbazkirina pratîkên borî heye jî, hişyarî û ferzkariya pêwîst raber nakin û rista xwe naleyzin.

Bi kurtî divê ku herkes erkên xwe pêk bîne. Tevî ku ev bi dehan car hatiye dûbarekirin jî, heta niha heman bûyer derketina pêşberî me divê ku hevalan bide fikirandin. Gelo kes tiştên ku tên gotin li ser xwe digire? Lê divê bê zanîn ku herî zêde jî tiştên ku tên gotin yên ku dibêjin; "ji min re nayê gotine." Ji rexne û rexnedayînê encamên pêwîst dernexistin weke ku îhlalkirina talîmatên Partiyê ye, di heman demê de sedema sereke ya pêşketinên Partiyê dide sekinandinin. Di rêxistina me ya Ewrûpa de ji ber ku pîvanên asta herî jor nehatine girtin, ji ber ku rêbaza jiyaneke şayanî ya partiya me û rêbaza xebatê derbazî jiyanê nake, ev rewş bi awayekî xwezayî teysîna xwe li ser çêkerê dike, heman nexweşî ber bi jêr ve belave dibin. Navenda ku xwe rêxistin nekiriye, jêrî xwe jî birêxistin nake. Ji ber ku çêker ber bi rêxistinê ve nayê kişandin, tevî ku ji bo rêxistinkirinê vekiriye û xwedî enerjiyeke mezine jî, nayê bikaranîn. Kar çima nayên meşandin em bawerin ji aliyê her hevalekî ve bêtir tê fêmkirin. Ji niha û şûn ve fêmnekirin nabe. Wê demê, ji niha û şûn ve li beramberî yên ku dixwazin karê rêxistinê li gorî xwe bimeşînin hişkbûna helwesta me dê bê fêmkirin. Xeta Partiya me û rêbaza xebata wê bi pêşketinan hatiye biştraskirin. Divê ku ev bi hev neyê rakêşandin, wateyên din jê neyê derxistin. Di hemû pirsgirêkan de divê xeta serkeftî ya partiya me û Rêbertî esas were girtin.

Bi giştî ya ku em li ser radiwestin di nav refên Partiyê de mijara dîyardeyên rastgir, divê ku hevalên Ewrûpa jî ji aliyê xwe ve dest bigirin ji nîqaşê re vekin û bi rexnedayîneke bi hêz çareser bikin. Pêwîste li ser ferdiyet, hêrs, rawestkarî, bêsebrî, pirsgirêk ji nedîtî ve hatin, her tim paşdexistina karan, pirsgirêk di nava xwe de çaresernekirinê, gazincî, pirpitê, li beramberî feraseta otorîteya şaş û bê otoriteyî, çavkaniyên bi vî rengî, teysîna wan û li ser encamên wan nîqaşên hevbeş bên meşandin. Encamên van bi rexnedayîneke bi hêz ji Partiyê re bê pêşkêşkirin û di rêya derbazkirinê de hewla ku ji dest tê bê raberkirin. Di vê pêvajoya zahmet û em tê de dijîn, bandora ferasetên dervî çînî ger neyê dîtin rû bi rû mayîna rewşên gelek xetere jênerev dibe, divê hemû heval vê bizanibin. Eşkereye ku, rastiyên ku em datînin holê bi kesayetiya filan û bêvan hevalî/ê re nîne. Ji xwe ev jî zêde girîng nîne.

Ya ku Partiya me pêwendîdar dike, di rewşa nederbazkirinê de dê bigihije asta nexweşiyekê û ji bo xwe pêgihandina armanca pîroz ku em neçarin xwe bigihîninê, wê me bi xeteriyên cîdî re rû bi rû bihêle. Yanî li

beramberî diyardeyên bi vî rengî di şerkirinê de serkeftina me ye. Divê ku heval jî xalên ku hatine destnîşankirin bi vî rengî dest bigirin, divê mijarê de alikariya pêwîst bi hev re bikin, kamilbûnek rêhevaltiyê raber bikin. Di vê xalê de pêwîste hinek heval nebesiyên xwe ji nêz ve bibînin, ji ber ku di pileya yekem de berpirsin ev hîn zêde zarûrî ye. Bi taybet divê ku hevalê Sadûn û Qasim careke din ji vî alîve nêzîkî rewşa xwe bibin û di serî de jî ew xwe di safoka rexnedayînê re derbaz bikin û nebesiyên xwe derbaz bikin.

Hevalê Sadûn weke hevalekî ji hemû aliyan ve divê ku bibe nûnerekî mînak, misoger divê êdî bigihije pîvanên proleterya, nebesiyên xwe yên ku wî ji rûnişkandina van pîvanan dûr dixe derbaz bike.

Rewşa hevalê Qasim jî, ji aliyekî cuda ve heman taybetmendiyan diteyisîne. Tevî ku li ber çavê wî gelek bûyer qewimîne jî, destwerdana pêwîst nake, bi kurtî însîyatîfa pêwîst bikar nayîne. Ev jî dîsa bi xwe negihandina rastiya pîvanên proleterya ve girêdayî ye. Her tim li bendê ye ku baş bê rêvebirin, dema ku nebe jî berê xwe dide helwestekî gilî û gazincan. Lê divê beriya her tiştî bi ser xwe de biçe, bikeve nav hewla derbazkirina nebesiyên xwe û bawerî bi hêza xwe bîne.

Hevalê Edîp jî, tevî ku hevalêkî di xeta Partiyê de serwere, kesayeta proleterya ya ji xwe bawer û pêgihîştî nateyîsîne. Li beramberî bûyerên ji derveyî xwesteka xwe aciz dibe û ev jî yek ji taybetmendiyên wî yên ku rê li ber gelek fersendan vedikê ye.

Helwesta pasîf a ku ji aliyê hevalê Mahmûd û Oktay ve jî derketiye holê, serê xwe li ser bûyeran ne êşandin, neketina ferqa gelek pêşketinan, rewşa ku herî zêde bê rexnekirine. Heta ev çêker kesayet ber bi rewşa “belê ezbeniyê” ve jî dibe. Eşkereye ku ev jî feraseta koletî ya ku proleterya herî zêde jê aciz dibê ye. Li şûna ku bi ser pirsgirêkan de biçin, ji ber ku rêya çareseriyê nabîne ji wan revê bi xwe re tîne û helwesta ku heval raber dikin jî piranî ev e.

Hevala Evîn jî dîsa di rewşeke pasîf de ye. Bûyeran dişopîne, lê di nav pêşketinan de hevaleke hewlesta proleterya ya çalek û ferzkariya wê raber nake ye. Heval ji B… heta niha taybetmendiyeke wiha raber dike. Xwe negihandina asta pêşketina ku tê xwestin û rastiyê de bingehekî wiha heye. Ev jî dîsa dide diyarkirin ku bandora çînên dervî proleterya ye.

Hevala Zehra jî, tevî ku ji despêkê ve di nav çêkereke wiha de cih digire jî, di despêkê de demek dirêj bê bandor hatiye hiştin, ji ber ku wê bi xwe jî jiyana navxweyî ya Partiyê baş fêm nekiriye ketiye nav helwestên lezgînî. Piştre ev veguheriye helwestekî berevajî, di bin navê bi hesab tevgerînê de

xwe paşve kêşaye, ji bo derketineke xelet neke helwestekî pasîf raber kiriye. Tevî ku ji bo derbazkirina vê xeletiyê hewldan heye, ji pirsgirêkê re bi cewherekî rast ve nêzîk bû ye jî, ji ber ku ji pratîkê dûre xwe negihandiye encama tê xwestin. Heval, di mijara cewhera rast bi afirênerî derbazî meriyetê kirinê de dikeve nava nebesiyan. Pirsgirêka wê ya derbazkirina bûyera şêwe, girtina afirêneriya pratîkî di nav aloziyan de rastî fêmkirin û li gorî wê xwe gihandina şêweya rast heye. Ev rewş bandora xwe di nêzîkatiyê de ji gelek pirsgirêk û pêwendiya re dike. Pêwîste dema pirsgirêka kesekî derdikeve holê hêviya xwe jê qût neke, bi tevdîr, sebir tevbigere û nêzîkatiyeke wiha reber bike. Heta dawî şêweyekî çar bi çar nîne. Ne hata dawî bawerî, ne jî heta dawî bêbawerî dibe. Para nerimbûnê divê her tim bê hiştin. Ji cewher tawîz nedayîn çiqas helwestekî raste, di veguhertina vê ya jiyana rasteqîn de jî nerimbûn neçariyeke. Lê dema ev tê kirin jî, pêwîstî bi radestnebûna şêwe, jiyana mîlîtaniya rexnegir û nûneratiya wê heye. Li şuna teşe û şêweya kesan nêrîn an pir zêde li gel wan bûyîn, an jî dijberî wan bûyînê, nêzîkbûnek bi taybetmendiya veguher a rêxistiniya şoreşgerî hewce dike û divê mirov bi kesan ve asê nemine. Di vê mijarê de divê berevajî vê mirov seranserî û paşverûtiya kesayetan bibine û xwe pêş bixe. Di nav jiyana Partiyê de divê mezinbûneke bi vî awayî bê destxistin.

Ev rexne rewşa hevalên din jî rave dike. Dema ku em ji cewherê bîrdozî ber bi xebatên rêxistinî û pratîkî ve diçin, divê ku ev weke pîvanên pêwîste em xwe bigihînînê bên pejirandin. Ev ji aliyekî ve jî rexneyên me ên komî ne li hemû hevalan. Divê ku heval, di van xalan de rexneyên xwe nivîskî, devkî û pratîkî bikin, vekirî bin. Taybetmendiyên bi wî rengî dikarin zêdetir jî bên rêzkirin, lê taybetmendiya hevbeş a hevalan; neketina nav hev û xwe negihandina îradeya hevbeşe. Em dixwazin bejin ku vê rewşa nerêxistinbûna civakê ya di nava partiyê de jî xwe dide der em napejirînin. Wê demê heval van rexneyên ku komî arasteyî wan hatine kirin divê ku bi awayekî herî hêz binirxînin, xwe bigihînin pîvanên pêwîst, çi tişta paşverû, kevin û dervî çîniye ji avêtina wan paşde nemînin.

Ger em kom bikin, bi taybet heta yekemîn konferansa Partiyê, ji aliyekî ve windahiyên giran ên ku çavkaniya xwe ji êrîşên cûntayê yên hişk digirt, şert û mercên zexta zêde, ji aliyên din ve jî nederbazkirina ecemîtiya qadro û xwe negihandina asta qadroyên pispor hem bandora taybetmendiyên burjuvaziya biçûk hem jî di xwe perwerdekirinê de îhmalkariya ku raber dikirin û nebesî Partî bi bûhranê re rû bi rû anî. Konferans ji bo rê girtina li vê hilweşînê hat lidarxistin û yek ji destwerdanên herî cidî bû. Konferansê

arasteya rast a ku diviya bû Partî bikeve ser destnîşan kir, bê gûman ev jî bi destnîşankirina çavkaniya xwe ji tehlîlên rast digirt, zelalkirina xeta çalekî û rêxistinî digirt pêk anî.

Di pêşketinên piştre de, ger Partiya me bi lez û kûrbûna pêwîst hema ji bûhranê derneketibe sedema vê jî, endamên ku alîgirên Partiyê bûn ji bo ku bibin endamên herî bi hêz ên Partiyê, di mijara dîrok û siyaseta Partiyê de neketin nav hizrandin û çalakiya wê. Disa divê mirov di rabernekirina ked û coşa pêwîst serfnekirina wan de li vê rastiyê bigere. Rewşa ku şoreşa Bolşevîk di sala 1908'an de jiyan kir, di konferansa me de û piştî konferansê jî hema bêje heman rewş hate dûbarekirin. Yek du jêgirtinên ku em ê ji Lenîn bigirin dê rewşê zelaltir bike. Lenîn wiha dibêje:

"Ger di destpêka kar de yek ji tovên partiya me, nekariye hêmanên cihekar û bûhranê derbas bike, ev ne tenê ji ber ku di çarçoveya serketina şoreşa dijber de erk mezin û zahmet bû. Bes li gel wê, tevî k udi fikrek şoreşgerî de bûn, ji ber ku hinek karkeran nekarîn di pîvanek têrkar a sosyalist de bihizirin, ji ber helwesta wan a li hember partiyê bêxem raber kirin ve girêdayî bû." (li ser tasfiyegeriyê rûpela 29)

Yanî Lenîn dema ku zehmetiyên partî pê re rû bi rû mayî vedibêje, qala hîn bêtir yên ku divê li partiyê û erkên wê yên şoreşgerî xwedî derkevin weke pêwîst hêza xwe nedayîna axaftin û însîyatîfa şoreşgerî ya pêwîst rabernekirin dike. Bi giringî xeteriya ku ji vir tê destnîşan dike. Lenîn dibêje; "partî di rewşeke zehmet de ye" û wiha dewam dike;

"Zehmetiya herî mezin, ji radeyek mezin lewaziya Partiyê, hema bêje hilweşîna rêxistinan, yan jî di şerê navxweyî yên hizîpgeriyê de û dijwar nebûna wî jî nîne. Zehmetiya herî mezin, beşa sereke ya karkerên demokratên sosyal bi qasî tê xwestin wateya rastiya vî şerî fêm nekirine. Ji bo meşandina vî şerî weke pêwîst xwe komîserhev nekirine. RSDİP ji alozî, hilweşîn ji ber bi rast û çêpê ve çûyînê divê bê rizgarkirin. Partiya ku ji ketina ser rêyeke saxlem a ku ji vê re pêşengtî dike afirandin û li ser esasê pêşxistin û alikarî pê re kirinê ji ber ku di asta têr dike de hêza destwerdan û serbixwe tevgerîna wê nîne wisa ye".

Bele, di nav me de jî ger xeta provakasyonê, şert û merc guncav bûna, hema bêje hindik mabû Parityê bînin rewşa ku darbeyeke mezin lê bidin. Ger partî gihiştiye rewşeke wiha divê ku mirov vê di kêmasiyên kadroyên ku birastî jî dibêjin em bi partiyê ve girêdayîne, bi nebesiyên xwe zemînekî çawa afirandin, di serkeftina xeta tasfîyeger de amadekirina zemîn de bêxemiya wan û taybetmendiya wan a ku kêm helw didin de bibîne. Ji xwe dema ku tu xwe dispêrî xeta rast a partiyê, bi ser hemû curên hilweşîner,

xirabkar, taybetmendiyên bujuvaziya biçûk de diçî, gelek endamên alîgirên Partiyê li beramberî vê rewşê bê xemin, di rewşa ref girtinê de dimînin û tirsnak dîtine. Hema bêje di bin zexta ku vê rastiyê bi xwe re anîye de eciqîne. Ji bo ji vê xilas bibin di pêvajoyên rexnedayîneke bingehîn re derbaz bûne û pêvajoyên wiha jiyane. Divê neyê jibîrkirin ku, armanca ji vê pêvajoya rexnedayînê xwe ji nebesiyên dema borî rizgarkirin, aliyên ku bi partiyê re nabin yek derbazkirin, di dema borî de rewşên ku ketina nav ên ked û hewla vê raber nekiriye, bê xem, rewşa ku bi qûralên Partiyê re hev nagire, ji ber xwe ve dimeşe, yanî nexweşiya sûbjektîf a zarokatiyê derbazkirin û xwe gihandina mîlîtanên ku dikarin erkên demê pêk bînin bû.

Lê em hêjî dibînin, hinek hevalan ev têkoşîna kûr a ku di nava partiyê de hatiye jiyîn, di pêvajoya perwerdê de weke tê xwestin ders dernexistine, yan jî weke ders derxistine bên xuyakirin jî di cewher de bi pratîka xwe re temam nekirine. Nemaze hîn jî gelek hevalên me di rexnedayînê de di duristbûn û bi cesaret tevgerînê de ya ku ji wan tê hêvîkirin dayînê de rewşa heyî derbaz nakin. Di têkoşîna li dijberî provakasyonê de dersên pêwîst û dernexistina van dersan di herdu helwestan de jî xwe dide der. Yek ji wan li beramberî pêşketinan bê xeme, weke ku qet tiştek nebûye xwe rehet hîs dike, ya din jî bi hêrs û lez tevdigere. Lê herdu jî ji parastina yekîtiya Partiyê û pêkanîna erkan, ji hewla pêwîst dûrin. Li Ewrûpa ev herdu helwest tên dîtin. Mînak; çi hevalê Sadûn çi jî Hevalê Qasim di derxistina holê ya provakasyonê de, pê re têkoşîn meşandinê de hişyariya pêwîst raber nekirine, piştî rewş derxistine zanebûnê jî vê carê ji kêmasiyên herî biçûk wateyeke din derxistin li ser navê hişyarî pêşxistina helwestekî din derketiye holê. Lê ev jî helwestekî rê li ber kêmasî û rewşên xeter vebikê ye. Ji ber ku mîna yekîtiyê, cudabûn jî di rêgez, polîtîka û bîrdoziyê de dibe. Taybetmendiyên kesayet û nebesî ne di cudabûna kesan ne jî hebûna cudabûneke polîtîk dide diyarkirin.

Ji vî alî ve heval di nêzîkatiyê xwe yên ji her bûyer û pirsgirêkan re, ne bi nebesiyên xwe yên kesayetî, divê ku li ser esasê bîrdozî û polîtîk tevbigerin, di çareserkirina pirsgirêkan de ev rêbaz bê esas girtin. Ger cudabûn hebin, ev bi rêbaz û amûrên ne guncav, ji derveyî civînan bi şiklê fesadiyê, li şûna ferdî teysînê, di civîna de rêya çûyîna çareseriyê bê hilbijartin. Di rewşên nerînên cuda derketina holê de di ronahiya xeta Partiyê de destnîşankirin û li ser esasê pêkanîna navendgeriya demokratîk xwe gihandina çareseriyê şêwazê yekem ê çareseriyê ye. Heval di rewşên bi vî awayî de ger di nav hêmanên xwe de nikarin çareser bikin, li gorî qûralan guncav divê ji saziya jorî xwe re ragihînin. Di paşeroja me ya nêzîk

de bi awayekî zindî pratîkên ku hatin jiyîn ji bo dersên pêwîst jê derxistin û xwe ji nebesî û xwe xapandinan dûr girtinê têr dike.

Çi di welat de, di şert û mercên roja îro de ku em têkoşînê tê de bilind dikin, di nava hinek hêmanan de, çi jî di nav hinek endamên di xebatên partî yên Ewrûpa de cih digirin, hevalên ku di asta rêveberiyê de erk girtine rewşa ku tê jiyîn, dide diyarkirin ku dersên pêwîst ji tiştên ku di demên borîde hatine jiyîn nehatiye derxistin. Di vê qonaxê de alîkariya yekane ku ji aliyê Partiya me ve bi van hevalan re bê kirin, careke din hişyariyên pêwîst kirine. Em nikarin destûrê bidin tu kesî ku bi nebesî, helwestên xwe yên takekesî zirarê bidin xebata me ya Partiyê û biryarên me yên partiyê. Yên ku di van helwestan de jî israr bikin, divê ku ji ezmûnê dîroka nêz ve jî bê zanîn, dê encamên herî xeter biafirînin û ji vê jî dûr namînin.

Polîtîkbûyîna rast; li gorî asta biryarên Partiyê guncav xwe gihandina asta şoreşgeriyê ye. Weke Rêbertiya Partiyê, ji bo ku ji hevalên Ewrûpa re bibim alîkar bi talîmatên kûr, keda ku ji dest hatiye, hatiye dayîn. Tevî vê jî, bi giranî navenda Ewrûpa, weke ku asta kesan kêm an zêde tê de heye, bê ku bi ti kesî ve girêdayî be teng dimîne. Xwe nagihîne hevbeşiya Partiyê û di vê de jî hema bêje bê xwestek be jî israr dikin û dikevin nav helwestên bi vî rengî. Lê ev hevalên ku ji nêz ve pratîka tasfîyegeran dinasin li ser esasê serkeftina xeta Partiyê, ked û hêza têrker raber kiriban, ew nirxên Partiyê yên ku bi derfetên gelek fireh ji emrê wan re hatiye pêşkêşkirin, li gorî xeta Partiyê guncaw, bi awayekî lez û kûrahiyê birêxistin kiriban, li beramberî hemû curên nebesiyan serkeftin di rêxistinkirina Partiyê de bidestxistina wan dê gelek zehmet nebûya. Divê bê fêm kirin ku ev pêvajo, bi awayekî neheq tevî ku layîqî hevalan jî nîne hatiye dirêjkirin. Em naxwazin hevalan tawanbar bikin û ji wan re bêjin; “li ser esasê cudabûnên biçûk, sûnî bi yekîtiya Partiyê nelîzin.” Lê divê ku ev jî neyê jibîrkirin; di rêbazên ferdî de israrkirin, tevî ku kes naxwaze jî wî/ê ber bi rewşên wiha ve bibe û wan bixe rewşên ku di hemû jiyana xwe de nikarin jê rizgar bibin rewşên herî xeter bibe û wan ber bi jiyaneke wiha ve dehf de.

Di serî de yên li navenda Ewrûpa hemû endamên pêşeng, ji nû ve li gorî rexnedayînek guncaw siyaset û bîrdoziya Partiyê pêk bînin. Bi rêxistin û çalakiya Partiyê re hevgirtin, ji hemû curên ayîdî burjuvaziya biçûkin ku bi qasî tê xwestin hatiye şîrovekirin, rewşên ruhî yên bi vî rengî, ecemîtiyê dûr bisekinin. Pirsgirêk û erkan di platformên Partiyê de, hêmanên wê de tehlîl bikin, derfetên ewqas sînordar jî vebiguherînin derfetên pêşxistina Partiyê û ji bo ku bikaribin baş rista xwe bileyzin divê ku bikaribin sûd ji şert û mercan bigirin, derfetên bê hempa biafirînin. Ti biyaniya şexsî û

astengî nikare endamên partiyê yên rast ji erkeke ewqas pîroz bigire, ango dûr bixe.

Silav û daxwaziyên serkeftinê

**Çile 1985**

## DI TÊKOŞÎNA RIZGARIYA KURDISTANÊ DE RASTIYA SEROKATÎ Û EZMÛNA PKK'Ê

### Ji Kadroyên Partiyê Re!

Çîn û gelên ku mafê wan hatiye binpêkirin, di salên biryardariya ku dîrokê ji wan re amadekiriye de, yanî salên ku em jê re dibêjin salên şoreşê dema ku dikevin qonaxeke bi vî rengî, rabûna wan a ser piyan çarenûsa xwe bi destê xwe xêz kirin, xwe gihandina ew kesayetiya ku ji dest dane û tevgerên ku vê bi serdestiya siyasî tacîdar dikin, dema ku dest bi serhildanê dikin, di despêkê de piranî bi awayekî ecemî, zarokî des bi vî karî dikin. Ji ber ku wiha destpê kirine tu kes nikare wan tewanbar bike.

Hostayê şoreşên serdema me Lenîn, di pêvajoya şoreşa Rûsî de qûralê kûr ê vê pêşketina dîrokî de wiha tîne ziman: "Gel dema ku despêkê serî li serhildanê didin, vî karî bê plansazî, ji plansaziyên berê amadekirî dûr, bi xemlîneke herî hov, bê ku encamên wê zêde hesab bikin bi tevgerîna azwerî, kîn û aciziyê radibin ser piyan." Ev encamek mecbûrî yê hemû pêngavên dîrokî ye û divê bi şeweyekî xwezayî bê pêşwazîkirin.

Bi heman şêwazî di demeke wiha de tiştekî din jî derdikeve holê. Gel û çînên bindest ên ku digihijin vê qonaxa jiyana xwe, pêdivî bi bangawaziya hêzên pêşeng ku bikaribe ji wan re rêbertiyê bike dibînin. Bi çar çavan li hebûna hêzên bi vî rengî digerin, û li benda derketina wan dimînin. Di dîrokê de mînakên bê hejmar ên bi vî rengî hene. Pêşeng, di serdemên dîrokî yên cuda de derdikevin holê. Hinek caran weke fermandarê mezin, hinek caran jî weke ku di civakên Rojhilata Navîn de pêxember, yan jî weke ku di Çîn û Hîndîstanê de tê dîtin, di bin navên cuda de yên ku zanistî, erdem û hostatî qezenc kiriye, armancên rabûna ser piyan formule kiriye. Pergal hîn pêştir û felsefeya vê pergalê ji aliyê exlaqî, çandî, aborî û siyasî ve kêm-zêde fêm kiriye, lêkolîn kiriye û ev jî bi xeteke taktîkî, stratejîk û plankirî formule kiriye. Ji bo vê hebûna kadroyên pêwîst, pêşeng

pêk aniye, bi vê armancê bi hêzekî hewl daye ve demeke kurt beriya van serhildanên dîrokî yan jî di qonaxa pêşketinê de derdikevin holê.

Dîsa hostayê şoreşa mezin Lenîn; bi nirxandina xwe ya "ji vê re hewldana rêxistinkîrî ya pêşeng û hevgirtina kîn, berteka girseyên bê zanist wê şoreşê ber bi serkeftinê ve bibe" dibersivîne. Dixwaze bêje ku hevgirtina herdukan şoreşe û vê diyar dike ku tergera xwe temamkirî ya şoreşgerî ye ku xwe ji hemû nebesîyan pak kiriye. Bi awayekî xwezayî ya di pêvajoya ecemî û zarokî de ye tenê ne çalakiya girseyane. Di despêkê de qarekterê pêşengî jî bi vî rengî ye. Pêşeng bê ezmûne. Formulên ku înşa kiriye û qalibên wî hîn nehatine jiyanîkirin û di pratîkê de nehatiye rûnişkandin. Wê di pratîkê de bê pîvan, di ezmûnan re bê derbazkirin, ger zêdebûn hebin wê bên derbazkirin û nebesiyên xwe hebin di asta temamkirinê de ye. Nemaze qala pêgiştiya pêşeng tê kirin.

### 1-Nêzîkatiyeke dîrokî ji mijarê re;

Dîrok bi mînakên bê hejmar ên pêşketinên bi vî rengî dagirtiye. Hîn di serdemên despêkê de bi qasî ku em çavdêrî dikin, tevahî mirovahiya li Yûnana kevin, qonaxeke weke qonaxa zarokatiya pêşketina nifş tê nirxandin dijî, hemû tişt zarokîne, çîrokin, lê di heman demê de balkêşe, xeyalî ye, helbest û huner şahnaze. Îlah tên afirandin. Qudretên awarte ji wan re tê bexşîn, egîd tên afirandin, yên ku pir zêde dişibin îlahan û hêdî hêdî ji asîmanan ber bi erdê ve dadikevin fermandarên dişibin îlahan, zilamên dewletê, zanyar û filozof derdikevin holê. Di berbanga şaristaniyê de vana bi gelek bangewaziyan dadikevin erdê. Bi kurtî di temasa xwe ya yekem bi xwezayê re, li beramberî xwezayê cara yekem dema ku zanist û ruh dikeve pêwendiyê, yên ku pena birine îlahên li asîmanan, bi hizrandina olî ve (mîtolojî) gavên xwe davêjin mirovatiya li rêya rizgariyê digere, tecrûbeyên xwe hinekî din zêde dikin bi qasî ku bi xwezayê re dikevin nav hev, hêdî hêdî xwedayên li asîmanan dadixin erdê. Xwedayên ku nikare di hafizaya xwe de cih bike, bipîve û fêm bike her ku diçe dikevin asta hêzê bi pîvan û hesab.

Bi kurtî mirov ber bi xwebûnê ve bi hêz dibe, pêş dikeve, li beramberî xwe baweriya xwe zêde dibe. Di têkoşîna xwe ya bi xweza re ezmûn tecrûbe digire, bi vî rengî ji ol ber bi felsefê ve daketinek, ji felsefe ve jî ber bi polîtîkayê ve dest bi pêngavekê dike. Zeûs ber bi Olîmpos ve bar dike, li wir hema mîna fermandarek zilamekî dewletê di asta xwe de mirovî dibe. Di huner û helbestan de ber bi şano û meydanan ve diherike.

Mirov êdî hinekî din xwe dîtiye, hinekî din rêbazê hebûnê girtiye, hêdî hêdî mezin dibe û ji qonaxa zarokatiyê ve ber bi qonaxa ciwaniyê ve baz dide.

Pêşketinên paşê ji pergela civaka komînal a hov (îlkel kominal) ber bi qonaxa koletiyê ve çûyîn di jiyana gelek civakan de bi şewazên ku dişibin hev tê dûbarekirin. Di civakên Rojhilata Navîn de jî bê hejmar mînakên wiha tê dîtin. Li vir jî bawermend û zilamên dewletê heman kesayetin. Weke ku di Hamûrabî û Fîrewnên Misrê de tê dîtin ji aliyê van ve li ser navê mirovatiyê pêkanîna meşa herî bihêz a yekem bi qasî ku dijberî xwezayê şerê civakan ên li dijberî hev jî destpê dike.

Di qonaxek ku beşek ji mirovan, beşên din ên mirovan dixe bin serdestiya xwe de, di nav dubendiya serdest û bindest, mêtînger û mêtîngerkirî, rêve dibe û tê rêvebirin de pevçûnên di valehiyê de derdikevin, pevçûnên bi xwezayê re têkilheve. Mirovatî êdî di gerdûna xwe de weke berhem û şêwaza herî pêşketî ya heyberî, bi qasî guman ji hebûna xwe neke, neçare lingê xwe saxlem bide ser erdê û bimeşe. Êdî xeyal, çîrok û efsane hêdî hêdî cihê xwe ji zanist û diyardeya siyasî û pratîkî re dihêle. Qûralên serdest û bindest, mêtînger û mêtîngehbûyî, rêvebir û tên rêvebirin ji bo jiyana ku avakirine dest bi pêşxistina bînasaziyeke jêr û jor hewce dîtine. Bi vî awayî wê serdemek zagon û rêveberiya têrkar û asoyê mirova hêjî hewl dide fêm bike, şîrove bike damezrandina qonaxa bi navê şaristanî ya esîl a mirov bi şêwazekî bi hêz derketiye holê.

Li vir jî azweriyên mezin, îhtîras, şerên mezin û serhilhan hene. Egîdên çîrok û destanan, mezinên olî, zilamên mezin ên dewletan û fermandarên mezin hene. Weke ku di mînaka Roma de tê dîtin, ji Romayê ber bi Îranê ve, Efrîqa û heta naverasta Ewrûpa jî fermandarên ku pêş dikevin, Augustus û Sezar derdikevin holê. Ev ne tenê fermandarên Romayê ne. Di heman demê de mînakên fermandariya gerdûnî yên dema koletiyê ne. Di gel van de zilamên dewletê, di komar û senatoyan de jî xatîp derdikevin holê. Tovên yekem ên demokrasiyê yanî demokrasiya xwediyên koleyan derdikeve holê. Pevçûn, xiyanet, qeleşî ev tev dabeşbûna civaka mirovan û weke planekî teyisîna vê şênber dibin. Babeta wêjeyî ya yekem, babeta hiqûq, bingehê yekem ên qanûnên leşkerî hemû di vê serdemê de derdikevin holê. Mirov heta niha jî lêkolîn û lêgerîn dikin, dema ku dest bi encam girtinê kirine, bi kurtî ji bo xwe nasînê bingehê ku kokê wan tê de hatiye avêtin yanî van salan esas digirin. Ev jî ya raste.

Pêşketinên piştî vê di asta domdariya vê qonaxa şaristaniya berdewankirina nifşê mirovane. Weke qonaxeke asta jor a pêşketina civakî hîn zêdetir pêdivî tên pêşwazîkirin. Weke rêjeyek jorîn a pêşketina civakî,

dema serdema feoldalîzma ku civakek mêtînger a pêşveçûyî ku hîn zêdetir pêdivî tên pêşwazîkirin û dihilberîne, li ser mirovan weke civaka dagirker a pêşketî destpê dike, pergala komînalîteya seretayî û encamên di pêvajoya pêşketina koledariyê de derketine hema bêje li vir di asteke jortir de tê dûbarekirin. Lê ev civak hinekê weke pêşveçûyî û ji xwe dûrbûn ve wisa ye. Olên bê ezmûn ên qabîle, eşîret û komikên biçûk ber bi olên gerdûnî ve bilind dibin. Dîsa bajarên biçûk, dewletên sîte de bi awayekî berbelav ber bi împaratorên pêşketî ve pêş dikevin û vediguherin. Di heman demê de girtûbûna di olan de hinekî din pêşketinê raber dikin.

Di despêka derketina mirovatiyê de, olên yekem ên bi pêwendiyên wan ên xwezayê û nemaze weke berhema yekemîn a lewaziya mirovane, di vê qonaxê de ji bo mirov ji xwe bawer be û gengazkirina hilberînê de her çiqas risteke baş lîstibin jî, di derketina dagirkerî û serdestan re û wexta ol bû amûrek zextê û mêtîngeriyê, li beramberî xweza xwe ragirtinê de rista ji aliyê manewî ve dileyîstin cihê xwe ji xapandina dagirkerî û serdestan re dihêle. Xitabî cihana wan a ûtopya û xeyalî ya manewî wêdetir dikin û bi vî rengî hewl didin wan îdare bikin û ji rêvebirinê re bihêlin.

Lê ol, dîsa jî li vir weke yekparetiya qûralên sîyasî, felsefî û exlaqî bi bandore. Di vê qonaxê de hema bêje her tişt di bin qalikê ol de dixwaze derketinan bike. Li vê derê mirov edî ne ji hemû aliyan ve ji aliyê ol, ne jî weke serdema despêkê bi çîrokên zarokatî tên îdarekirin, serdemeke rêbazên dagirkerî û qûralên zanist bandokerin, jêrsazî û jorsazi hinekî din pêşketiye û her ku diçe qûralên zanist zêdetir tên pêkanîn, yanî ber bi qonaxeke wiha ve hildikişe. Di qonaxek din de dema ku ber bi kapîtalîzmê ve diçe, ev pêşketin digihêje asteke pir pêşketî. Li beramberî lewaziya mezin a ol, girîngiya felsefê zêdetir dibe. Ol êdî cihê xwe ji felsefeyê re dihêle. Mirov êdî bi awayekî ji rêzê bi çîrokên ku nekare bixapîne û xeyalî ji şîrovekirina xwe, gerdûn û heyberê dûr dikeve. Rastiyên ku ji aliyê zanist ve derdikevin holê esas digirin, encamên van jî bi şêwazekî bê pejirandin şîrove dikin, bi kurtî ber bi şîrovekirinên felsefî ve çûyîn despê dike. Êdî neçare ki mantiq û pratîka mirov ber bi felsefeye biçe. Ji ber vê jî her ku diçe rista ol kêm dibe, mirov hîn zêde li gorî rastiyan tevdigere û encamên pratîka xwe baştir şîrove dike.

Vaye rista dîrokî a burjuvajî wiha derdikeve holê. Ya ku em jê re dibêjin ronakbûn (ronesans), hûner, wêje û zanist jî di vê bûyera afirîneriyê de yanî bingeha çînî û civakî bi vî rengî çêdibe. Mirovatî ji bo pêşketinê dixwaze qonaxeke nû bide despêkirin. Ji bo vê li Roma, serdema navîn dinere. Li wir ji bo xwe tiştê sûdmend çi hebe hemû digire. Di heman demê de her

tiştê ku astengî jê re ava dike hebe dijberî derdikeve. Xwe û bi xwe re jî civakê ji bo ku ber bi qonaxeke jortir ve bibe bingehê vê yê bîrdozî, wêjeyî û zanistî amade bike hewl dide. Di despêkê de jî filozof û wêjevan derdikevin holê. Qonaxa ku em jê re dibêjin qonaxa hunerî şêwe digire.

Lê xwediyê pergala kevin û girtî, bi taybetî jî yên ku xwedî ezmûnê dagirkerî û rêvebirina sedan salin û hêzên siyasî ku erka dewletê di destê xwe de digirin, yên ku dizanin wê çi, çawa di destê xwe de bihêlin û yên ku xwedî artêş û rêveberiya vê ne gel, ji bo vê çîna nû, li beramberî pêngava wan a nû astengiyên cur bi cur derdixînin. Li dijî felsefeya hemdem, li beramberî huner û ol, olên dervî serdemê bi hemû saziyên kevin ve jê re bersiv didin. Xwe sipartina hêza xwe ya siyasî û leşkerî ve, tundiyek pir dijwar û îşkenceyê ferz dikin. Lê mîna tovê ku li nav axê direşe, axê û zinar parçe dike û dirêj dibe, pêşketineke mirov a bi vî rengî jî misoger nayê astengkirin. Çîna ku qelîştokên vebûne hîn fireh dike, li ser bingehê pêşketinên nû rûniştiye, bi xwe re pîvanên xwe, di her astê de çalakiya xwe derdixe holê.

Serdema şoreşên burjuva, ji felsefê û ol heta wêje, ji aborî heta qada leşkerî di hemû astan de pîvanên xwe, rêvebirî, stratejî û rêveberî, rêbertî, hostatiya strateji û taktîkî ku van bi rêve bibe diafirîne. Bûrjûvazî bi xwe jî her tim di nav serîhildanekê de ye. Mîna ku di şoreşa Fransayê de, vê derdixe asta lûtkeyê. Beriya wê li hinek zemînên din serî li ceribandinên gelek şoreşên din dide. Di hinekan de kêm jî be ber bi encamê ve diçe, di hinekan de bin dikeve, di hinekan de hema bêje mîna ku di şoreşa Fransa de serfiraziya xwe derdixe asta herî jor. Li vir weke ku di şoreşek Îngîlîstanê de bûyî, êdî naxwazin bi rewatiyê ser têkoşînê bigirin.

Belê, burjuvajî hîn ji sedsala 15. ve çend sed saleke her tim di nava serîhildanekê de ye. Serhildan em di ol de ji çêkirina reforman bigirin heta wêje, ji wêje heta huner û ronesansê jî, ji damezrandina pergala saziyên leşkerî heta dijberî misogeriyê teşegirtina dewletên nû, ji teknîkên nû yên hilberînê heta rêbazên cur bi cur ên rêvebiriyê di her astekî de rabûneke ser piyan, berxwedaniyek û weke qonaxeke şoreşê derdikeve holê. Vana bi şêwazên cur bi cur xwe didin der.

Ev di cewherê xwe de rista ku ji aliyê rêberên burjuva û li ser navê burjuvaziyê nûnerên bi aqil û cesaret dileyzine. Danteler, Leonardo de Vîncî, Deskartes, Robesoîerre, Danton, Napolyan û hwd nûnerên pêşeng ên çîna nû ne. Di vir de tenê serhildaneke di asta pêşengên çînî de ne mijara gotinê ye. Çîn bi xwe jî her tim di nav serhildanê de ye. Li parlemento, kolan û bejahiyê jî bi şêwazê gêrîla, hinek caran jî weke xwepêşandanên

kolanan çalakiyan pêk tînin. Li ser hinekan metirsî û tundiyê disepîne, li ser hinekan jî raperînê dide destpêkirin. Vê ji dêrê li ser meydanên şer disepîne. Bi kurtî weke pîrika welidîna civaka nû, tevgereke şoreşgerî a berfireh ku bi sedan sal bidome pêk tîne.

Encama ku ji aliyê Marks ve jê bê derxistin ev e; “zext, pîrika hemû civakên kevin ên ji ya nû re avise.” Li vir jî rêbertî diyarker û devjênegere. Rêbertî tenê ji taybetmendiyeke leşkerî pêk nayê, divê ku aliyên siyasî û çandî bi hev re bijî, şoreşa ku pir zêde pêwendiya xwe bi çîn re heye, ya ku bi taybetmendiyên wê serdemê re zêde girêdanên xwe heye, weke ku nirxandina dîroka xwe û ya serdemê baş fêm dike, xwedî taybetmendiyên herî bi hêz ê şîrovekirina van e jî. Bi kurtî Rêbertî ji hemû aliyan ve yê ku mezinbûneke xwe ya kûr heye, rêz lê tê girtin nûnerê taybet ê çînî ye.

Rêber kesayetên wisa ne, hêj çînan xwe ne gihandinê, lê çîna ku wan di kesayeta xwe de ava kirî hêj şênber nebûye, lewma ew pêşengên civaka pêşeroja ku di kesayeta xwe de şênber kirine. Civaka ku di pêşerojê de şênber bibe di van kesayetan de, di pêşengtî û rêxistinbûnên wan de hatiye ceribandin, giştiye serkeftinê û hatiye jiyîn. Vana jiyana ku dê pişt re ji aliyê milyonan ve bê jiyankirin, di kesayetiya xwe de jiyane. Bi mîlyonan mirov, di demên pêş de felsefe, kesayetiya siyasî, exlaqî û hestî, rêber di despêkê de dijîn, bi bername dikin, rêxistin dikin û derbazî çalakiyê dikin. Vê piştre ji milyonan re radigihînin, weke serdestiya çîna burjuva, gulvedana civaka burjuva û cîhanê bi şêweya di kesayetiya xwe de bê dawî bike nûnertiyê jê re dike. Di vê mijarê de her tişt di kesayetiya rêberan de weke bêdawî ye. Mîna bêdawîbûna burjuvaziyê, ew jî bi qûralên ku çêkirine, rêveberiya dewletê, weke jêrsazî û jorsaziyê bê dawiye ferz dikin, xwedî lê derdikevin, diparêzin û pêş dixin.

Wê demê, pêşeng xwedî taybetmendiya şêweya despêkê ya civaka burjuva ku wê piştre serkeftinê dest bixe derdikeve holê û pêşeng di vê mijarê de xwedî ristekî devjênegerin. Madem wê piştre serdestiya çîna nû, bi kurtî di hemû astan da gulvedana wê misoger be, wê demê rêberên vê yên despêkê, misoger divê pêşerojê di kesayetiya xwe de biafirînin û şênber bikin da ku çîna ku nûnertiya wê dikin di kesayeta wan de bi awayekî ewle li pêşerojê binere. Da ku bikare bi cesareta ku ji vê digire çalakî û serhildana xwe bi rêbaz û bê binkeftî bike, ji ecemîtiyên xwe yên yekem rizgar bibe, şûna ecemitiya yekem cihê xwe ji rotayeke rûniştî re bihêle û bi rêberê xwe ve bê girêdan. Vaye, ji bo vê pêdivî bi rêberan heye.

Napolyon, dema ku li ser navê burjuvajiyê mîna fermandarekî leşkerî derket holê, heta radeya dawî bi cesaret û hosta bû. Ji Moskovayê heta

Misirê, ji Îspanya heta Elmanya yê, ti hêza ku serî pê netewandiye nemaye. Ew pisporê leşkeri ye. Pişt re yên mîna wî jî derdikevin holê. Vaye, li vir li ser navê çîn risteke girîng a tê lîstin heye. Çîna ku rastiyê qezenc dike pisporiya wî ya leşkerî û kesayetiya wî ya leşkerî ye. Hema bêje weke ku li Rojhilata Navîn di serdema feodalîzm û îslamiyetê de rista ku Cengîzxan û Elî lîstiye, kesayetiya fermandar û rêberekî wiha tê jiyîn. Çînayetî hewceyî vê ye. Di serdemên navîn de fermandarên mîna Elî û Cengîzxan nebûna, komên eşîretan gelo wê çawa gihiştiban pergalek leşkerî? Wê çawa şer kiriban? Wê êrîşên mezin ên sedsalên paşê çawa pêk baniyan?

Nexwe fermandar di merheleyên ku qabîle, eşîret, çînayetî û gelên bindest êdî ber bi kamilbûna mercên objektif a desthilatiya bilind dibin de derdikevin holê. Ev kesayetên ku avaniya girseyan, vîn, bêrîkirin û kesayetên wan di kesayeta xwe de bi teşe dikin. Li gorî vegotinên wan pêşî serkeftinên xwe yên bêhejmar pêk anîne û bi vî rengî girseya ku di nava wan de ye, lê hêzek potansiyela mezine dixe tevgerê û wisa qural, exlaq, felsefe û rêxistinbûnê pêk tîne. Bi vî rengî kesayetên serdar ên fermana "De pêşve bimeşe" dane. Ji bo vê ji Elî; "Emîr Ûl Mûmîn" tê gotin. Dîsa qanûnên Cengîzxan bêhempa ne. Ev di serdema koletiyê de jî bi vî rengî ye. Ger ferman û qanûn hîn jî şahnaziya xwe diparêzin ji ber vê ye. Qanûnên Napolyon û burjuvazî jî yên bi vî rengî hene. Heta niha jî yên ku di dibistanan de didin xwendin û qûralên li ser dimeşin ev qanûnin.

Nexwe ji ber sedemên cuda yên ji aliyê çîn û girseyên gel ve beriya her tiştî ji ber cihgirtina wan a di hilberinê de, ji ber neçariya her tim bi hilberinê re mijûl dibin, fermandarî û rêbertiya tena serê xwe nikarin pêş bixin, ji aliyê beşekî pêşeng ve di kesayetiya xwe de şênberkirin ji bo hemû demên pêşketinên dîrokî mercekî devjênegere. Ger gel û civak dixwazin ber bi pêş ve bimeşin, divê ku li pêşiya wan komek fermandarê xurt û bijare hebe. Rêbertî wan ji xeteriyên ku ji aliyê rast û çep ve bên diparêze. Ecemîtî û bê ezmûniya wan ji xeteriyan dûr digire. Xwe digihîne kesayetiyeke bi hêz li pêşerojê dinêre. Dibe mînaka fedekarî û cesaretê. Birêxistin, pergala ferman û fermandar bi awayekî hêz pêk tîne. Bi biryar, kesayetiyeke pêgihiştî ava dike. Hêvî dide kesên ku dixwazin rabin ser piyan. Pêşeroja xwe bi şêweyek biriqî xêz dike, vê jî di asta azweriyê û coşa cejnê de pêk tîne. Yanî koma kesên bijare ye.

Dema ku hêzek bi vî rengî ava bû, çîna mafê pêşdeçûna xwe heye rêzeke mezin lê digire, bi azwerî pê ve tê girêdan û bandora ku ti hêzên teknîkî nikarin bikin ev komên girseyan pêk tînin.

Yên serkêşên komên girseyane, di vê demê de şîdeta dewletê heta pergala xwe ya dawî jî pêş xistine. Hêza serdest a siyasî û leşkerî, hemû ziraviyên taktîk û stratejiyê pêk tînin. Êdî ezmûneke berfireh a çînayetî çêbûye. Yên li ser desthilatiyê dê çawa şer bikin, yên mafxwerî çawa bixapînin û dê çawa îşkencê li wan bikin pir baş dizanin. Dadgeh, zindan, cerdevan, garnîzon û beşên wan ên parezgehî hene. Bi danehevên kûr ên sedsalan ve, di serî de pêşengên bindestan, bêrehim êrîşî ser berxwedanên bindestan dikin. Nexwe hêzekî wisa amade li pêşberî wan heye. Di gel bê tecrübe û lewaziyên pêşeng û komên girseyî yên li dûv pêşeng, xwedî avantaja bi azwerî û coşeke mezin rabûna ser piyanin. Û ev jî beramber hev pev dikevin. Bi kurtî weke ku Lenîn gotî: "di despêkê de kêmasî û nebesiyên pêşeng û komên girseyan rewşeke jênereve û di heman demê de ji bo derketineke berfirehtir şertekî zerûrî ye."

Lê ev ê heta kengî bidome? Weke ku Marks dibêje; weke ku di hemû artêşên bindestan de heyî, artêşa proleterya jî dibe ku di çend ceridandinan de bin bikeve. Lê piştre, di encama dersên ku ji van binkeftina derxe, êdî wê pêşeroj heta dawî li ser piyan bimîne û wê nequlipe mîna boksorekî, mîna tîrkevan xwe sist dike, kulmên xwe hişk dike, mejiyên xwe dişuxulîne, bi baldariyeke mezin hêzên serdest diqulipîne. Marks dibêje; şer û têkoşîna proleterya di vê sedsalê de mîna ku qûrala kûr ya vê dûbare dike." Vê ji bo têkoşînên proleterya û xisletên tevgerên gel ên Sedsala 19'an dibêje. Yek ji van şoreşên yekem ên proleterya jî di şoreşa 1905'an de dûbare dibe. Baş xwe amade nekirin, hîn ref negirtina mîlyonan girseyên gel, weke ku dibe sedema bingeftinê, şoreşa 1905'an dibe provaya şoreşa Cotmehê ya pişt re pêşketî. Nemaze zemînekî ku şoreşa Cotmahê li ser pêş ketiye. Wê demê ji bo proleterya ku çînek hemdeme û burjuvazî jî, li gorî rastiya çînayetiya xwe guncaw ji bo ku xwe bigihîne pêşveçûnek astekî jor a civakê ji felsefê heta leşkeriyê, tê fêmkirin ku wê heman ristek bê raberkirin. Proleterya ku di rastiya xwe de civakê ji dagirkerî, nemaze ji hemû curên demogojî û derewan, zext û zoriyê rizgar bike, dikeve nav qonaxa çalakiyên dîrokî. Ji bo destxistina kesayeta xwe di wan şertên pir zehmet de, ev çîna ku pir lewaze bi navê xwe siyaset û leşkeriyê bike, hêdî hêdî dema ku teşe digire serî li gelek serhildanên ecemî dide. Ev rewşeke jênereve. Wan makîneyan parçe dike, rêxistinên di asta mezheb de dadimezrîne, serî li şerên kolan û barîkatan dide, gelek binkeftinan dijî, lê her ku diçe şerê xwe bi bandor dike. Piştî wê jî pêşengên çînî derdikevin holê. Vana beriya her tiştî ji bo proleterya nêrîneke cîhanî diafirîne. Proleterya wê bi kîjan felsefê li cîhanê binere, wê bi kijan bingehên zanistî

civaka nû rêxistin bike, wê rêxistina şoreşê li ser kîjan taktîk û stratejiyê pêş bixe? Ev pirgirêkên her ku diçe berfireh derdikevin holê ne.

Derketina holê ya van pirsgirêkan, kesayetên ku wan çareser bike jî ji neçarî diafirîne. Derketina pêxemberên proleterya mijara gotinê ye. Em ji exlaq bigirin heta felsefê, êdî li beramberî helwestê burjuva yê paşverû ji aliyê proleterya ve li ser navê mirovatiyê jê re bûyîna bersiv û êdî qonaxek pêşketî xistina rojevê mijara gotinê ye. Bi vî rengî Marks û Engls weke mamosteyên proleterya, ne weke pêxemberên wê derdikevin holê. Belê, ew jî hema mîna pêxemberan, pêşketinên piştre biqewimin radigihînin. Lê li ser esasekî zanistî, bi taybet jî bi ravekirinên civakî ve dikin. Bûyerên ku dê piştre biqewime wê çawa pêş bikevin di asta zagonan de destnîşan dikin. Tehlîlkirina Kapîtalîzmê "Kapîtal" derdixe holê. Li ser esasê tehlîlkirina zor (şîdet) û fêmbûna pêşketina şoreşê li ser şîdetê "Antî durhîng" derdikeve holê. Piştre jî weke şêwaza jîndarkirina vê ya rêxistina pratîkî proleterya partîsî û şêweya lêdana wê teşe digire.

Vê carê jî weke ku di sala 1870'yan Komînên Parîsê de, serhildana girseyî ya proleterya û şerê pêşengên wê tevgera herî bi hêz tê raber kirin. Dîsa ya ku tê jiyîn serdema zarokatiyê û ecemîtiyê ye. Hem pêşeng hem jî girseya wê ecemî ye. Ji bo wê hosta rexne dikin. Proleterya bi qasî ku bikaribe erd û ezman fetih bike yeman şer dike. Lê burjuvaziya ku hîn di asta xwe ya lûtke de ye, hêzên statîkoparêz û feodal bi tevkariya nokeran re bê rehmiya xwe li ser vê şoreşa proleterya vale dikin. Gelek xwîn tê rijîn, hejmarên zêde mirov bi girseyî tên tinekirin. Rêberên wan bê rehm tên îşkencekirin. Ev Tevgera çalakiyê ya herî mezin a proleterya ye. Lê bi binketina wê re, tevgereke divê ku gelek ezmûnên dîrokî jê bên derxistine. Hema bêje şoreşa 1905'an, dûbarekirina di nava şert û mercên Rûsya de ye.

Her ku diçe bi bandorbûna proleterya siyasetmedar diafirin. Qonaxa jîndarkirina bîrdozî û zanista proleterya despê dike. Di felsefê de ji îdealîzm û metafîzîkê ber bi materyalîzma dîyakeltîkî ve, berê xwe dide siyaseta serbixwe ya çînayetî û rêbaza şerê girseyî. Ev rista ku li wir ber bi hunera proleterya ve pêş dikeve,, bi pênaseyeke rast di sala 1917'î di şoreşa Cotmehê de bi destxistina îktîdara siyasî ve tacîdar dibe. Êdî kesayetên zilamên mezin ên dewleta proleterya, fermandarên wê yên leşkerî, çanda girseyan û di pêşketina mirovatiyê de yê ku gotina herî bi îda bêje, çalakiya herî mezin pêk bîne şoreşgerên wiha pêdigihê. Ew diyardeya ku em jê re dibêjin; "Bolşevîk" derdikeve holê. Ya ku mizgîniya pêşerojeke bi hêz, pêşketinek fedakar û bi cesaret dide, jîyana pêşeng a proleterya û civaka pêşerojê di kesayetiya xwe de teşe dike pêşengek derdikeve holê. Ev

pêşeng, ji nava civakeke weke Rûsya ku xwedî gelek taybetmendiyên derveyî serdemê ye, ber bi civakek qonaxa sosyalîzmê ya herî pêşveçûyî bilind dibe de, rolek pêşxistinê dilîze û wisa di wateya burjuva de sedsala dê pir bi êş derbas bibe kurt dike. Bi şoreşê civakê ji êşên mezin rizgar dike û şopa xwe di dîrokê de dihêle. Mîna hewariyên Îsa, xelîfeyên Mihemed û Montagneyên şoreşa Fransa ew jî weke mînakên herî pêşketî yên proleterya ji bo gelek şoreşên pîştî xwe pratîk û teorîya vê, rêgezên bingehîn di jiyana xwe de raber kirin û rista xwe lîstin.

Ev rist pişt re li Çîn, Vîetnam, Emerîka Latîn û Efrîqa di ezmûnên gelek şoreşan de dûbare dibe. Êdî ew pêvajoya ku em jê re dibêjin serdema fermandariya gelan, ji bo jiyana taybet a gelan, bi sedên sale yê ku di xewê de hatine hiştin, yên mafê wan hatiye xwarin û ji jiyana kesayeta xwe hatine dûrxistin, di pêşengiya wan de tê jiyîn. Beriya her tiştî pêşeng, ji pirsa wê pişt re çi bibe re bersiv dide. Baş şer dike, baş difikire, exlaqek kî baş, hezkirin û atmosfera rêzdariyê di hinavê xwe yê rêxistinî de diafirîne. Rêveberin, bûyîna fermandar bi kurtî li beramberî hemû curên zexta dijmin, stratejî û taktîkê bexwedana gelan derxistina holê, li beramberî hemû rêbazên şer ên zextkar taybetmendiya bersivdayîna bi rêbazên şer bi xwe re pêş dixe. Li beramberî hêzên emperyal yên herî hov, em ji gelê Vîetnamê bigirin, heta gelên herî Efrîqaya reş ên hêj pêş neketine ji berxwedaniyên gelên cur bi cur re bersiva herî yeman dide. Ew raperînên mezin ên gelan ku di sedsala me de pêk anîn û berxwedanên wan, ji bo serkeftina qonaxa dîroka mirovatiyê ber bi civakeke bê çîn ve diçe, ji bo xurtkirina serdema azadiya civakan û serxwebûna netewan, gelek ezmûnên şoreşgerî û rêberên van şoreşan teşe digirin.

Vala ji serdema me re nabêjin; "Serdema tevgerên rizgariya netewî û şoreşên proleterya", yanî li ser vî bingehî serdema qutbûna ji emperyalizmê ye. Ev îfadeya pêdiviyên bingehîn ên sedsala me ne. Ev rastiyên ku gelekî li ser tê axaftin û fikirandin pêwîst nake direj dirêj mirov ji kesên ku bi doza rêbertiyê re rabûne re bê vegotin. Ew kesayetên wisa ne neçarin ku bizanin di fikir û ruhê xwe de van jidil bipejirînin, dema destpêkê derdikevin holê hema weke goşt û neynok bi xwe re yekbûnê ava bikin û wisa bikevin rê. Ev helwesta ku ji aliyê hemû gelên hemdem ve di pêvajoyên rabûna xwe ya ser piyan de hatiye raberkirin, yek ji mînaka vê helwestê jî weke gelê herî kevnar û ji aliyê serdemê ve hatiye jibîrkirin gelê Kurdîstanê jî neçare raber bike.

## 2- Rewşa Dîroka Kûrdîstanê:

Hema destnîşan bikim, taybetmendiya çarenûsa xwe destnîşankirina ku rastiyeke ji aliyê gelên cîhanê ve hatiye jiyîn, xwedî kombûn, ezmûnên berfirehe û taybetmendiya bûna rêberê xwe bi xwe rewşeke ku gelê me jê mehrûm hatî hiştine. Di Kurdîstanê de weke pêdiviyekê ji vê bûyerê dûrmayîn û her dayîm pir dijwar ji vê dûrgirtin tê jiyîn. Gelê Kurîstanê bi qasî ji hejmarek zêde rêberan, ewqas jî ji bêrêberiyê êş kêşaye. Ti gelî bi qasî gelê Kurd ji rêberên noker êş nekêşa ye, zirara ku ji bê rêbertiyê jî jiyayî nedîtine. Gelê Kurdîstanê ji ber sedemên cur bi cur ên siyasî, dîrokî û erdnîgarî ji serdema koledariyê hate roja me ya îro hatiye jî, ji kesayatiya xwe dûrketin, nebûna begê xwe, bi kurtî ji dîroka bi êş a dûrketina ji serxwebûna xwe jiyaye.

Weke ku gelek tê ziman, weke yek ji encamên erdnîgariya tê de dijî hîn ji serdema koletiyê ve, ji ber ku bûye qada şer a despotan gelê ku li vir dijî, qet negihije navengeke pêşketina azad. Ber bi çiyan ve hilkişiya ye, li wir weke bîrîmên eşîret ên biçûk û hema bêje di rewşeke ku bi şêweya ji cihanê hatiye goşegirin neçarî jiyînê kirine. Ji serî heta binî serdema koletiyê mîna dagirkeriyekê, îstîla û hilweşînê pêş dikeve. Gel bi qasî ku dikare di çiya de xwe veşirê vedişêre, nemaze bi qasî ku ji şaristaniyê dûr bikeve dûr dikeve. Feoldalîzm, tenê derfetê di asteke jortir de jiyan kirina vê dide. Rêbazên zext û zorê yên feodalîzmê di yekeyên eşîretên Kurdan de beşekî berfireh ên noker derdixe holê. Bi dabeşbûna axa, şêx û mezhebên cuda ve, civak ji xwe xerîb dikeve, ji rêveberî û rêbertiya xwe ya cewherî dûrketinê re, pêvajoya radestbûna komek nokerên ku bi navê biyaniyan tevdigerin destpê dike.

Sepanek her ku xurt dibe û hema bêje devjêneger ku dibe şêweyek bingehîn a jiyanê, nemaze împaratoriya Osmanî ya di vê serdemê de nûnerê muhafezekarî û paşverûtiyek xurte, dema qonaxek li ser Kurdistanê da sepandin, rêveberiyek tevlîhev a noker bi têkildarî ol û axatiya ku di kesayeta Îdrîsî Bîtlîsî de şênber bûyî re, derdikeve holê. Ev reîsên civakê yên eşîretên noker, bi destê şêx û axayan de ji aliyekî ve bi axê ve tên girêdan, ji aliyê din ve jî di pêwendiya xwe ya bi şaristaniyê re li ser bingeha girêdanek wisa nokeriyê ve sazkirin, dibin şîrîkê ku pêvajo bil ez ber bi jêr ve biçe. Jiyana azad û serbixwe ya kevin ku li çiyan hebûna xwe didomand, bi pêşketina serftiyê û bi begên noker ên Kurd vê jî bi sûltanên biyanî re di nava şirîktiyê de pêk tîne, cihê xwe ji girêdana bi axê re dihêle.

Dema ku em digihêjin Sedsala 19’an pêvajoya azadbûna civakan, di şert û mercên wê rojê de êdî çawa gihiştiye rewşeke kes nikare pêşî lê bigire, di

Kurdistanê û civaka Kurdan de jî bi şêweyekî tam berevajî ev sedsal, bi şêwazek herî noker û girtîbûna feodalîzmê reh berdanê ve bi encam bûye. Sûltanên Osmanî û nokerên wan, êdî bi qasî ku berjewendiyên wan dest dide, li ser vê çêkerê hemû curê kiryaran dimeşîne. Di Sedsala 19'an de ji aliyê şoreşa burjuva ve hemû cîhan dorpêç kiribû, di demek ku pergala emperyal–kapîtalîst sermaye û îxraca meta ya ku li ser welatên dagirkirî û nîv-dagirkirî meşandî ve, civaka kevin serûbin bû. Civaka Kurd ji ber xweseriya serbixwebûna xwe piştî pêşketinên giştî her ku çû zêdetir tê tecrîtkirin.

Ji ber Siltanên Osmanî li bermaberî kapîtalîzma Ewrûpaya Rojava dij derdikevin û weke encama vê dijderketinê daxwazên hîn zêde ji Kurdistanê leşker girtin û bac dayînê derdikeve holê. Ev jî rê ji pevçûnên tên zanîn, di navbera reîsên eşîr, şêx û sûltanan vekiriye. Di vir de kapîtalîzm siltanên Osmaniyan dihilbijêre, Kurdan jî weke hêza nijdavanê gerandina meta û sermaye dibine. Ji ber piranî bazirgan û kompradorên eslê xwe Xirîstiyan ji xwe re esas digire, li van qadên nemaze hem nûnerên Osmaniyan hem jî kapîtalîzmê, bi taybet jî li van qadên ku dagirkeriya Îngîlîzan lê belav bûyî de, pêvajoyek zext û zorî ya bi êş destpê dike. Desbarbûna sedsala 20'an bi vî rengî çêdibe.

Çînên serdest ên Tirkan cilên feodal li xwe dikin. Bi avantaja ku bi sedên sale xwedî dewlet û rêvebiriyê ne, di serdema Îttîhat û teraqî de kapîlatîzm tevlî xwe kir û ev jî di serdema Kemalîzmê de bi xurtkirinê ve bi şêwaza Komara Tirkiyê tacîdar kirin û encama herî kurt a bi sûd ji xwe re jê werdigire. Di vir de li ser Kurdistanê pergaleke nû ya zextê ya aborî û siyasî mijara gotinê ye. Weke ku neyîniyên bêhempa yên sedsalan têr nedikir vê carê jî pêşketineke paşverû ya kapîtalîzmê ji jor heta jêr a ku belav dike bi bîrdoziyeke herî şoven xwe xemilandî Mûstafa Kemal bi rastî jî ji aliyê despotekî dîktator ve, yê ku hemû nîyetên îmhaker li pişt serê xwe hîs dike yanî rastiya gelekî bi vî rengî dibe mijara gotinê. Di Kurdistanê de heta dawî begên noker hene. Yên ku pêşiya xwe nabînin, nizanin wê sibêrojê çi biqewime, yên rojene dijîn, hêzên beg re serî tewandinê huner dihesibînin, otorîteya ku li pişt serê wan bilind dibe bi asanî serî jê re ditewînin yanî di van salên bi vî rengî de, civak bi awayekî herî xirab ji serdestiya Komara Tirkiyê re tê hiştin.

Hinek hêzên serdest ên xwecihî yên ku berjewendiyê wan hejiyane, dema kîn û hêrsa gel jî di nava serhildanê de bikaranîn encam neda, di pêşengtiya van serokên noker û kevneşop ên di nav civaka Kurdistanê de, di nav çêkera netewa Tirk de, navê wî jî di nav de bi hemû awayî helandin

mîna çarenûsekê tê pejirandin. Beşên noker ên xwecihî, bi şêweyek şebekeya sîxûran dibin dûvikek berdewamiya burjuvaziya Tirk. Dikeve rewşa belavkirina hemû amûrên wî yên aborî, siyasî, çandî û netewî. Ji rewşa nokerên berê hîn xetertir heta radeya dawî înkarker, ji firotina civakê re amade ye, yê ku rastiya me ya netewî înkar dike, kesayetiya xwe ya netewî înkar dike, kesayet û rêvebiriya dijmin a netewî rewa dibine û dipejirîne, vê jî bi gel û civakê dide pejirandin, di kesayeta xwe ya xas a netewî de û dev ji hemû curên mafên xwe, yên çandî, aborî û siyasî ber dide û propagandaya vê dike pêvajoyeke ji rêzê ya sîxûrkirinê derdikeve holê.

Rewşên ku ji sala 1940'î û heta roja me jiyaye, qonaxa heta dawî bi êş, bi qasî bi êşe, ewqas jî xeternake berbijêr ve çûyîn û herî tarî ev pêvajo ye. Salên ku herî zêde xiyanet û înkara netewî herî xeter hatiye kirin ev salin.

Hêzekî noker û hevkarê herî xeter ê emperyalîzma nav-netewî weke KT, di rastiya burjuvaziya Tirk de her cure kevneşopiya hovane, talanker û zextkar ên çîna xwe ya serdest, di kesayeta xwe de şênber dikin û didin der. Gelê Kurdistanê di destê çînek wisa de, di dîrokê de bûne şahide rastiya îxanetek ku ji rêberên xwe bi xwe dîtine û hûrûkûr jiyane. Her tim ji şaristaniyê hatine qûtkirin, ji dervî pêşketinên nûjen hatine girtin û herî dawî jî bi dagirkeriyek sîxûrtiya herî xeternak a serdestan ve rû bi rû mane. Lewma di serdema têkoşîna rizgariya gelên cîhanê û şoreşên proleterya de xwe wisa winda kiriye. Ji ber vê ji diyarkirina xwe, kesayeta xwe û çarenûsa xwe bi destê xwe saz bike dûr ketiye. Yê ku li ser navê wî/ê biaxive nîne. Yê ku li ser navê serbixwebûna wî ya netewî, berjewendiyên wî/ê ya civakî biaxive nîne. Berevajî berjewendiyên netewî û civakî jî bilêv nekirin, bi temamî li ser bingeha biyanîbûnek kûr pêşxistina hêzên sîxûr û noker çêdibe. Ji axa, şêx û reîsên eşîran, tebeqayeke noker a bi vî rengî xeternak tê afirandin. Qaşo hinek livas li ber rewşenbîran dikin, tebeqeyek nokar a nû ne tenê di asta kesî de, di asta çînayetî de jî derxistine holê. Bi taybet jî di bajaran de zêdebûna van, di civakê de hîn kûrtir di derbarê refên çîna kedkar de xwe belavkirin dibe mijara gotinê.

Bi taybetî weke ku di dahûrîna bi navê "Li Kurdistanê Sêdar, Çanda Qişla Û Erkên Me Yên Tolgirtina Şoreşgerî" de hatiye ziman hîn ji zorokatiyê ve rewşênbîrên ku ji nav gel hatine girtin û ciwan, di dibistanên ku hatine vekirin de bêkesayatkirina wan, wan ji cewher derxistin li serê gelê xwe piştre jî serê PKK'ê kirine bela. Tevgera bingehek çandek û kesayetek biyanî hatiye pêşxistin. Di zankoyan de ev bi bandortir tê kirin. Qaşo yên ku rewşenbîrin, lê bi qasî ku Îdrîsê bîdlîsî jî li şûn xwe dihêlin, civak bi şêwazekî herî xirab ber tarîtî, sextekarî û bêganebûnê ve dahf dane

teşe digire. Li ser navê sosyalîzmê diaxive, lê em nikarin jê re bêjin sextekarî û oportonîzm jî mantiqekî ewqas kirêt raber dikin. Ne çalakiyê bêçalakbûnê diparêze. Bi cilên moderne, lê kesek xwedî ruhek reşe. Kesên wiha derdorê dipêçin. Dibêjin li beramberî dagirkeriyê berxwedan nabe, li kesayetiya xwe ya netewî, azadiya civakê gerîn vala û ecêbe, tişta herî girîng ku bê kirin "Mîna qaptanê Keştiya xwe rizgar dike" xwe bi bûyîna xwedî mûçeyekî ve têr dîtinê sînordar dike, xwe rizgarkirin ABC'ya mirovatiyê pejirandine şîret dike. Heyfe ku ev tev di kesayet de li ser esasê nezantiyê pêş dikeve. Bê ku bizanibe ji çi re xizmet dike vana dibêje. Ger bizanibe jî ji derewên ku dike bi xwe bawer dike, propagandaya vê didomîne. Hema bêje hemû xaneyên civakê bi nexweşiyeke wiha dikeve. Ev xane bi qasî ku ji aliyê van kesan ve tê kolan, dikolin, dikarin biêşînin dêşînin, ev jî vediguhere kombûna birînên ku jan dide.

Eşkereye ku tedawî jê re pêwîste. Lê ji bo tedawiyê divê mirov ji kuve despê bike? Em ji mêjî bigirin heta dil, yê ku hemû aliyê wî di nav birînan de maye, ji bo civakek perçe perçe bûye gelo tedawiyek çawa pêwîste? Rewşa ewladên xwe ewqas bi êşe, yê ku ji hewcedariya berjewendiyên netewî û civakî ewqas bê bawere, nûnerên civakê fikrandin siyaset û marifet hesab dikin, gelo bi xwe ve hatina vê civakê wê çawa be? Bi kurtî yê ku ewqas ji xwebûnê derketiye, ji kesayetiya xwe dîtinê ewqas dûrketiye, ji gelekî ji destnîşankirina çarenûsa xwe û Serokê xwe ewqas feqîr hatiye hiştin; wê taktîkekî çawa bê raber kirin da ku ev gel di her astê de xwe nû bike, li gorî rastiyên serdemê bi stratejî hêza xwe ya potansiyel derbazî jiyanê bike? Ev ê çawa jê re bê dayîn? Wê çalakiya wî ya girseyî çawa derbikeve holê? Pêşengên wî/ê çawa derbazî meriyetê bike? Wê pêşeng bi xwe çawa derkeve holê? Di roja me de pirsên herî sotîner bîzat di nav jiyanê de hema her roj bi qîrdayîn derdikeve holê. Kesekî piçekî durist û ji mivorahiyê re rêzdar pirsên ku divê bipejirîne û bi asanî radest bike ev in.

Weke gel û civakên hemdem ên gelên din, ji civaka Kurdistanê re jî Rêberek pêwîste. Tenê ne di qada leşkerî de, em ji asta hunerî bigirin heta asta siyasî, ji ya bîrdozî bigirin, heta jiyana wî ya aborî yê ku bikaribe ji her tîştî bixe nava pergalekê, bernamesaz bike, bigihîne rêxistin û çalakiyê pêdivî bi qûrmaya giştî heye. Weke ku em pir zêde kar tînin, pênaseya dîrokî ya PKK'ê ketina wê ya dewrê û pêşketina wê li ser esasê bersiva van pirsane. PKK ji bo rastiyên serdemê bi civaka Kurdistanê ve dicebirîne, hewl daye û bûye hewldan bixwe. Dîrokeke ber bi jêr ve diçe, dûbere bilind kirin û ber bi pêş ve birin bi şêwazekî herî xirab ji serdemê qutbûn bi piren

saxlem ve pêkanîn û ji bo hemdem kirinê weke bersivek ji van pirsan re bûyer û diyardeya derketina PKK' ê pêwîste çawa bê destgirtin di nirxandênên cur bi cur de me anî ziman. Tenê ne ji bo dost û dijminên me, bi taybetî jî ji kadroyên ku divê di û mêjiyê partiyê bin, em ji yê di asta pêşend bigirin hata sempatizanekî ji rêzê divê diyardeya PKK'ê çawa dest bigirin, rastiya xwe ya taybet çawa dest bigirin me destnîşan kir. Heta niha jî em hewl didin bi awayekî zêde van dersan bidin.

Lê dîrok, neçar dike ku pêşengên li ser navê gelê me ketine rê hinekî din xwe biguherin. Ev di heman demê de, encamêkî xwezayî ja ji xwebûnê dûrketin û bêganbûnê ye. Gelek nirxandinên ku ji bo berxwedaniya bîranînên şehîdan û hatine kirin, radeya pîrozî û mezinbûna berxwedaniya wan çima li gorî yên welatên din nayê qeyaskirin me destnîşan kir. Dema ku mirov vê bi mînakên din ên serdemê re qeyas dike, em ji fikir bigirin heta çalakiyê, ji bo me serhildaneke herî biçûk di nav şertên Kurdistanê de dema tê destgirtin çima cudatir û xwedî wateyeke mezine me hewl da vebêjin. Dîsa dema ku em ji van hemûyan derdikevin rê, çima di nav me de Rêbertiya vê naçare xweser pêş bikeve, ji navenga bi êş û îşkencê azweriya berxwedanê, balkêşî, serekeyî, misogerî, fedekarî, wefa bi şewazê pêgihiştî divê pêş bikeve me rave kir. Dema ku em vana hemûyan destnîşan dikin, berxwedaniya gelê me ya xweser divê ku çibe, bi gelek mînakên cîhanê bê ku bên jiberkirin di nav xweseriya xwe de me got ku pêwîste rast bê fêmkirin. Mînak; di bin bêdengiya girseya me de kîneke bi qasî volqanên mezin heye, ev jî hema bêje weke nasnameya gelê me bi pergal û şênber bûye. Me ev jî diyar kir.

Belê, gelê Kurdîstanê birîndare, bêdeng diyare, nezan û bê rêxistine. Lê hîn di kûrahiyê de, bi qasî ku ti gelên din ne xwedî ne, gelek xwedî kîn û hêrsekê ye. Li xwe, xweza û civaka xwe di nerînê de hêrsê dipijiqîne. Tengezare, bi gumane, henekê xwe bi her tiştî dike, bi fikare, tolgire, rêzdar û bi merhemete. alîkariyê dixwaze, dixwaze xwedî lê bê derketin, şikestî ye, pir bi êşe û bi îşkenceyî ye, bê çare ye, ji bo merhemetê destvedigire û dûa dike. Vaye rastiya me ya gel ev e. Girêdayî dostaniyê ye, yek ku jê re bêje; "merheba" heta mirina xwe dikare pê re dost bimîne. Dikare bibe alîgir. Bi wefaye, bi azwerî ye. Vaye rastiya gelê me ev e. Dema ku em di nav pêvajoyeke nû re derbaz dibin, bi gelek mînakên bê hejmar ên bi vî rengî ku wê xwe bide der rastiya gelê me û kesayetiya berxwdêr a ku ayîdî vî geliye bi vî rengî ye. Rastiya gelê me yê berxwedêr ev e. Dibe ku gurme gurm ranabe ser piyan, li ji bin ve her tim serhildanekê dijî, di mejî de tevlîheviyeke serwer a ku ew bi xwe jî jê ne acize di nav kînekê de dijî,

gelê ku her tim jiyana xwe didomîne, nemaze serhildaneke li gorî xwe ser dixe yanî gelekî bi vî rengî ye. Xiyanet lê hatiye kirin, nefret dike, efû nake, lê nikare tola xwe hilîne û wane bide. Ev jî serhildaneke wiha ye. Dizane, dibîne, lê destê wî/ê têrê nake, di rewşeke wiha ya berxwedêr de ye. Tê xapîn, dizane her tim tê xapandin jî, vaye li beramberî xapandinek wiha di nav berxwedanekê de ye.

Hinek hevalên me bi qasî ku nikaribin vê rastiya kûr a gelê me fem bikin, di bin sekna wî ya pasîf de îsyaneke mezin razayî ye, di bin gelek dîmenên ji xwe bêganebûnê û sextekariyê de berxwedana razayî bi qasî nekarin bîbînin seranserin. Na, divê bi kûrahî nêzîkatî ji rastiya gelê me re bê raberkirin û nerîn. Wê demê wê bê dîtin ku di wir de kesayeteke netewî û bûyera îsyaneke civakî heye. Û gel li pêşengê xwe digere. Em îda dikin ku, gelê Kurd ê ku li Kurdistanê jiyan dike, yek ji gelê cihanê yê herî berxwedêr û pergala serhildanê dijî ye. Gelê ku xwedî potansiyela berxwedaniya bê çîne û vê jî di gelek xaneyên xwe de ji bo ku derbixe holê gîştiye ber derî, yanî gelekî bi vî rengî ye! Ev rasteqînî pir girînge. Şansê serkefina pêşengên ku nekare vê ji her alî ve fêm bike nîne. Yên ku nikarin tişta ku ji derve tê dîtin û ya di cewher de heye ji hev cuda bikin, pêwendiya di navbera helwestê pasîf û berxwedêr de ji hev cuda nake, eşkereye ku pêşengekî bi vî rengî ji ketina rewşa ecemî û reben nikare zirgar bibe.

Wê demê divê gelê Kurdistanê weke di nav rastiya xwe de, jiyana xwe weke jiyanake berxwedan û serhildanê, şêwaza herî ji rêzê ya serhildanê, bi sedên sale hatiye eciqandin, bêdengkirin, bi îşkeceyan re rû bi rû maye, hatiye parçekirin û bêrêxistin hatiye hiştin bê dîtin. Li beramberî sermê û birçîbûnê xweragiriya wî berxwedaneke. Sekna xwe ya li beramberî dûjîn, zilm û dagirkeriyê berxwedaneke. Helwesta wî li beramberî xiyanetên ku lê hatiye kirin berxwedaneke. Dibe ku ev bexwedanî ji rêzê û ne rêxistinkirî be, lê çiqas aloz û ji xeta xwe derketî dibe bila be, di nav vê serdemê de jiyaneke ayîdî xwe û hebûna wê tenê bi serê xwe berxwedaniyeke li gorî xweseriya wê ye. Lê berxwedaniyeke ecemî, bi tirs, bêçare û bêrêxistinî ye!... Ne girînge! Ya girîng bi qasî ku bi dîmenên ji dervî wî neyê şîrovekirin xwedî kûrahî, xweserî û alozî ye. Ya rast jî fêmkirina vê rastiyê ye.

### 3- Em Rastiya PKK'ê Baş Fêm Bikin Û Nûneratiyek Rast Bikin;

Çîroka pêşengê PKK'ê gelek cuda ye. Weke ku di nav gelê me de heyî, seretayiya pêşeng jî ji despêkê heta roja me ya îro jî, eşkereye ku em ji seranserî û êşan bigirin, wê hîn trajîk-komîk bûya. Xwe jibîr kiriye, hîn ji zaroktiyê de hatiye bişaftin û di aşê bêganebûnê re hatiye derbazkirin van zarokên biçûk, di karekî ku bi esilbûn ferz dikir de, karekî mîna yê pêşeng bihêz, xebatekî hunerî, wêjeyî û felsefî dixwest de gelo wê di despêkê de bikarin çi bikin? Bi taybet pêşengekî qet nas nekiriye, ji bo naskirinê xwedî derfetên gelek kêm bûye ji bo civakeke wiha dê rêbertiyeke çawa bihata kirin? Ji van aliyan ve xwe pênegihandin, di pêvajoya pêşketinên seretayî û ji ber ecemitiyan me kes tawanbar nekir. Weke ku me gelê xwe tawanbar nekir, me xwe ji tawanbarkirina hevalên ku destavêtin van karan jî xwe dûr girt, bi nêrîna ji bo çi wisa ne me difna xwe xwar nekir, rûyê xwe tirş nekir. Ev rastiya me ya esasî ye.

Ji bo pêşengek, bibe pêşeng karê divê seretayî bike, divê rastiya xwe bi awayekî arîfane û pêgiştî fêm bike. Şer bê amadekarî û îlkel hat kirin. Bi qasî têr dike xwe rêxistin nekirin, çalakî weke tê xwestin plansaz nekirin, li ser gelê me strateji, taktîk û siyaseteke rêxistinkirî ferznekirin, gelek darbe xwarin û li beramberî gelek êşên mezin rû bi rû mayîn mijara gotinê bû. Di vê wateyê de tişta ku di nav PKK'ê de hat jiyîn ji ber ku beşek ji dîroka sedan sal bû, me qala çend sedsal di nav çend salan de bi cih kirinê kir. Di salvegerên cur bi cur ên damezandina PKK'ê de nirxandinên ku hatin kirin, van pêvajoyan gelek baş datîne holê. Ev nirxandinên ku divê çawa qala pêşketina PKK'ê û şîroveya wê bê kirinin. Nirxandinên dawî bi wesîleya 7. Salvegarê de ji bo kovar û rojname gelek zelal hat axaftin. Ji bo vê pêwîstî bi dûbarekirinê nîne.

Ger em bi kurtî vebêjin, ji sala 1973'ê heta niha li ser navê rastiya taybet a Kurdistanê rastiya ku di teori û pratîkê de xwest bê pêşxistin, bi rasti jî rastiya netewî û civakî di ronahiya zanista şoreşgerî û hemdem de, bi rêbazê şoreşgerî anîna ziman wêdetir ketina nav hewldanêkê bû. Tevî hemû nebesî û bêderfetiyan ya hat kirin ev bû. Pratîk şênberbûna vê ye.

Taybetmendiyên ku gelê me di nav de ye, gav bi gav teysîna xwe li pêşeng kir. Taybetmendiyên cur bi cur ên gelê me, taybetmendiyên ku bi darê zorê hem ji aliyê hêzên noker hem jî ji aliyê hêzên bêgane ve li ser gelên me hatin ferzkirin, taybetmendiyên bêgane û berxwenedanê bûn. Di heman demê de ew taybetmendiyên kesayetiya berxwedêr, kindar teysîna xwe li pêşeng jî kir. Hineka ji wan berê xwe dan xiyanet û radestiyê, hinak ji wan jî di asta herî jor de ber bi berxwedanê ve çûn. Ev ji hev cuda bûn û bi hev re ketin nav pevçûnê. Weke ku hat diyarkirin, di nav refên PKK'ê de

têkoşîneke nû ku ev jî refên ronakbûnê bûn. Weke ku di dahûrîna " Pirsgirêkên Pêşketinê û Erkên Me" de hatiye destnîşankirin, ji ber nirxên nokerên feodal, tehekumkar û dagirker ve xwe formulekirina civakê bi PKK'ê re pêş ket.

Bîrdoziya PKK'ê ya ku navengeke azad afirand, polîtîkaya wê, atmosfer ji lêgerina çînên cur bi cur, gerîna cih û lêgerînên mewkiyan re rê vekir. Lê pêşengê PKK'ê ku li ser navê proleterya ket rê, xwediyên rast ên PKK'ê, em ji radestkarên herî dijwar bigirin heta burjuvaziya biçûk û nokerên zirav, ya ku qala xwe dikin, li dûv mewkîgeriyê geriya, jêre li cih geriya, li ser milên PKK'ê xwe bilindkirin. Berhemên ku ji aliyê wê ve hatibûn afirandin ji bo berjewendiyên xwe bikaranînê, her ku diçe li ser berjewendiyên çînî xwestin bikar bînin, heta hemû kesên curên çavbirçî hatin dîtin. Lê di seriyek din de jî yên herî fedekar, heta şervanê herî çavsor gelek tîpên din nasî. Me, ev bi şehîdan re dît, di xiyanetê de dît, di zîndanê de dît, li çiya dît, li derve dît, yên ku hemû derfet, ruhê û mejiyê xwe ji berxwedaniyê re veqetandîdî. Yên gelek kêm jî dayîn, ev her tim di kesayatiya xwe de veşart û hesabên zirav ên pêşerojê kirin jî dîtin. Yên ku bi lez xwe guhertin, yên bi lez xwe li gorî taybetmendiyên pêşengtiya proleterya veguhertin û xwe li gorî wê pêk anîn jî dît. Li beramberî vê yên rûpêş dan ser rûyên xwe, lê xwe weke PKK'yiyekî herî baş marîfeta herî mezin hesab kirin jî dît. Bi kurtî zemînên civakî, yên netewî çawa di PKK'ê de teyîsî û veguherî şerekî me ew jî dît. Di nav PKK'ê de ji aliyê gel ve xwedî li berjewendiyên xwe yên taybet derketin, di rizgariya netewî û civakî de bi îfadebûn, di asta xeta Marksîst û Lenînîst de, di asta pratîkî de çawa xwe gihand serfiraziyê jî dît. Di gel vê me şervanên xirab jî dîtin. Yên baş şer nakin, ji dijminên xwe yên çînî û netewî re ji aliyê bîrdozî, polîtîka û çalakiyan de di dema pêwîst û cihê pêwîst de yên ku bersiv nedan, planên baş çênekirin û yên pratîkeke baş raber nekirin jî me dît. Me şoreşgerên nebes ên ku rêhevalên xwe, Rêbertî, gelê xwe di rewşên gelek zahmet de hiştin jî dîtin. Me ecemiyên hejar ên ku nekarî polîtîka bikin û saf jî dîtin. Di gel xiyanetkaran, me berxwederên pir jêhatî jî dîtin. Di nava demeke kurt de, serûbinbûna dîrokek di nava PKK'ê de, serfiraziya rizgariya dîroka gelê me di pêşengtiya PKK'ê de çawa hat vegotin me ew jî dît. a

Cihê dirêj vegotina van ne ev dere. Ev hatine kirin, ti wateya dûbarekirina van nîne. Lê dîsa em dibêjin ti sedem nîne ku yê arife fêm neke ku ev gotin çi, çawa çêdike, pênaseya xwe ya guncaw çiye. Pêşengtiya PKK'ê bi bîrdoziya fonksiyona pêşengtiya Rêbertî re ji hêla polîtîk û leşkeri ve, di asta netewî û civakî de, di berxwedaniya eniyê de, ji

serhildana herî ji rêzê ya gundekî heta serhildana giştî ya gel, ber bi Rêbertiyekî çawa ve bilind bû? Li derve û hundir wê ev Rêbertî xwe bispêre çi? Wê kîjan rêberên sexte gav bi gav vê pêk bîne? Wê xwe çawa li ser serdemê ferz bike? Bi bermahiyên ji serdema navîn mayîn re, bi wan mezhebên sexte, eşîret, otorîteyên feodal re wê otorîteya xwe ya serbixwe, têrker û modern ve, pêşengtiya xwe çawa ferz bike? Belê bi kurtî ew rastiya ku "Em Rastiya PKK'ê Rast Fêm Bikin Û Pêk Bînin" de hatiye formulekirin, ferzkirina me ya serdem tê çi wateyê, bêrêxistinî veguhertina rêxistin, bêçalakbûn veguherîna çalakiyê, di çarçoveya kîjan stratejiya leşkerî û siyasî de bi çi çarçoveyê dê bê veguhertin? Ev ê bi kîjan taybetmendiyên mîlîtanan bê serxistin tev hatine destnîşankirin. Ev di pratîk û hizirandinê de gelek hat kirin, hat fikirandin. Ji bo yên ku arifin, ji bo yê hinekî jî bi doza xwe ve girêdayiye, aliyê kar neyên fêmkirin, gelek aliyên kêm ên neyên meşandin, ev rewş wiha ber bi zelaliyê ve birin mijara gotinê ye. Û weke encama van hemûyan me qonaxên PKK'ê vegotin, ev qonax xwedî taybetmendiyên çawa ne, careke din 7. Salvegera damezrandinê de weke rastiya PKK'ê şênber kir, bi zelalî nirxand.

Xala ku em gihiştinê, rastiya gelê me û ji aliyê rastiya me ya partiyê ji girtina biryareke dîrokî wêdetir mirov nikare bi nav bike. Û biryareke bi ti gotinên din nikare bê vegotine. Em gihiştin asta pênaseyeke milîtanek girêdana bi doza xwe ve, rastiya PKK'ê esas girtiye, mîlîtanekî partiyê ji rêzê jî bi awayekî zelal bikaribe xwe bigihîne kûrahiya dilê xwe û bikeve zanîna wê. Niha di vê qonaxê de li ser esasê ders ji demên borî derxistin û em ê çawa ber bi pêşerojê ve biçin me zelal kiriye. Dema ku em bi dehan car dibêjin; "pêwîste, Rêbertiya PKK'ê rast bê fêmkirin û pêkanîn" em vê tenê ji bo pêşxistina hevoka wêjeyî nakin. Rastiya gelê me ya awayê henase bi henase yên ku hemû bêrîkirinên wî/ê hatine çewsandin heye. Rastiyek bi êş, îşkence û dagirkeriyê serî lê hatiye tewandin, lê her tim xwestiye bijî, her tim bi azwerî xwe bi axê û çiya ve gire daye. Hêviya xwe qut nekiriye, ev ji zarokê xwe re teyîsandiye, zarokên xwe bi hêvî mezin kiriye. Her tim ji bo xwe ji wî hêviyek bendewar kiriye. Hema bêje ev weke bîrdoziya malbatê gihandiye lûtkeyê, hevî û bêrîkirinên xwe, ji bo pêşerojê paşde xistiye. Bi vî awayî ji mezinên xwe merhamet, efû, alîkarî hêvî kiriye. Lê her tim qehr bûye, lê qet navber nedaye rastiya me ya gel, her ku çûye veguheriye stranekê, lorîkekê hema bêje veguheriye mahrûmiyetê, ya ku ji kombûna êşan pêk tê. Lê dîsa jî her tim rastiyek gelê me ya mîna lêdana dil lê dide heye. Rêbertiya PKK'ê jî weke encama êşên bi vî rengî ku di aqilan de cih nabe derketiye holê.

Li dijberî feraset û pêkanînên xweza, civakên bêgane û nokeran rawestîn, nepejirandin, bi dilê gel jê re bersiv dayîn, ew bi berjewendiyên gel ên taybet re gihandina zanînê û bi vî rengî zanistiya mîlyonan veguhertina zanîna Rêbertiyê pêk hat. Dilê mîlyonan veguherîna dilê rêbertiyê, dilê mîlyonan ê ku di yek dilê de lê dide, berjewendiyê mîlyonan ên ku di yek mejî de, di yekîtiya hizir û vîna vê di pêşeng de şênber bû. Rastiya ku ji aliyê hinek kesên ku di nav refên PKK'ê de ne û hem jî di îdaya wan a pêşengtî û rêbertiyê heye fêm nekirine, her çendî di gotin de fêm kiribin lê rastiya ku nekarîne di pratîka xwe de raber bikin tam li vir derdikeve holê. Ew li Tirkiyê weke encamê bîrdoziya Kemalîst, dij demokrasiyê, despotik, bi qasî ku dikare mirovan biçûk bike, ewqas biçûk kirî bîrdoziyeke bi vî rengî û ya ku dibe encamê vê kesayetek heye. Ew zilamê biçûk ê ku bi bermahiyên serdema navîn xwe xwedî kiriye naxwaze fêm bike di nav refên partiyê de pêşketin çawa çêdibe. Ger fêm bike jî pêwîstiya vê wê çawa veguherîne rêxistin û çalakiyê fêm nake. Bi hinek gotinên demegojîk ve, dikevin nava rewşek çavkoriya ku tarîtiya dîrokê dirêj bikin. Ev zilamê biçûk, bê ku bizane weke dîlê zincîrên bermahiyên serdema navîne û dîsa ew zilamê biçûk ê ku ji aliyê kemalizmê ve hatiye afirandin pratîkekê raber dike. Kesayeta bê xeber di nav refên partiyê de, hem jî xwe di bin gotinan de veşartiye, hinek caran devê partiyê bi kar tîne, hinek caran jî bi fêlbazî û çalekgeriya sexte û hinek caran jî bi ketina nava xefleteke ku xwe digihîne asta arîfiyê dixwaze ser vê rastiyê veşêre. Na, pêwîste rastiya gel bi hemû aliyên xwe yên xweser ve bê fêm kirin. Ev rastiya ku di PKK'ê de tê ziman, bi hemû taybetmendiyên xwe ve anîna ziman û tenê ne bi anîna ziman ve neçare ku vê bi dil û mejî ve jî bicebirîne. Her mîlîtanek di pêşengtiya PKK'ê de li ber xwe bide, ger dilê xwe wiha neke, mejiyê xwe wiha neke, wê nikaribe xwe ji berahiyên serdema navîn û Kemalîzmê ji kesekî ji rêzê û her ku diçe xeter dibe rizgar bike.

Başe pêşengtî çiye? Peşengtî; dijminên gel, ên ku reha wan digihêje piştî sedê salan û li dijî rêbaz û sepanên dijminê xwe yê ku navendên serdemê yên herî paşverû ji xwe re esas digirin, belav dikin, parçe dikin, dagir dikin, ji kesayetiya wî/ê dûr dixin, biçûk dikin, têxin û li beramberî felsefe û exlaqê wan parêzvanekî berjewendiyên cewherî yê gel'e. Tenê ne parêzvanek îlkel û amatore, her wiha ziraviya di derbarê ku êdî ji bo demekê devjênegere û rewşeke nayê pejirandine. Divê di exlaq de pêgihiştî, şênberkirî, yekbûna vê di stratejî û taktîk de pêk anîbe, pêşbîniyeke stratejîk û encamekî taktîkî pêş xistibe. Pêşengî xwe giyandina misogeriya têrker û

pêgiştinê di nav xwe de dihewîne. Tu pêşengî, yan jî PKK'yîyî; wê demê tu naçarî wiha bî. Tu ji gel hez dikî, yan jî girêdayî yî; tê wiha bî. Tu bi namûsî, duristî; tê wiha bî. Tu bi exlaqî; tê wiha bî. Ma tu dixwazî bibî cureyek durû; tê wiha bî. Aliyê vê yê neyê fêmkirin nîne.

Başe, pêşketineke wiha gengaze? belê, gengaze. Dîrok bi pêşengên bi vî rengî dagirtîne. Dîrok, di qonaxa pêş a rizgariya gelekî de, di qonaxa rabûna ser piyan a çînekê de, bi şanaziyeke wiha, dilekî mezin, ji mêjiyên mezin re mînakên bê hejmar pêşkêş dike. Me bi kurtî nirxandineke van di despêkê de kir. Başe, heta niha kar bi vî rengî bi destnegirtin, destgirtin lê pêkneanînê re em çi navî lê bikin? Partiya me jî cureyek şoreşgeriyê ye, her tim em dixwazin ferz bikin. Ne devji azweriyên xwe yên azadî û serbixweyî berdidin, ne jî pêwîstiya vê weke tê xwestin di dem û cih de pêk tînin. Her tim di derengxistina salekê dixwazin rastiyan bidin dûbarekirin. Ev serê muhafazekarekî ye. Ev encamê pêwendiyên xwe ji pergala serdest û civaka kevin nequtkirinê ye. Li gorî daxwazên gel, li gorî lêdana dil dilê xwe lênedan, dibe navê bersiv nedayîna berjewendiyên taybet ên gel. Şoreşgeriya borî, şoreşgeriya nebes û xefleta ev di nava PKK'ê de berdewamkirinê ye. Li ser pişta PKK'ê bûyîna qov, hewaya azad a PKK'ê bi vî rengî karanîn, ev kesayet veguhestina nav me, vaye li vir ecûlîya zarokekî jiyîne. Hema diyar bikim û mînakekê bidim; ger zarokek zêde ecûl be, dema bi tena serê xwe li goşekeye malê tê hiştin diberde bin xwe, bang dike, qîj dide, tenê ji bo ku dê û bavê xwe mijûl bike, bi qasî ku dikare bigirî digirî, kiyametê radike. Ji zarokên wiha re zarokên ecûl tê gotin. Ev ne zarokên bi aqilin û ev zarok her tim lêdanê dixwin, tên eciqandin.

Di nava me de jî, zarokên kêrnehat ên şoreş û têkoşîna me ya şoreşgerî zêde dixwazin derkevin holê. Gelo dixwaze li quncikekê be, di nava partiyê de bi hinek nirxan jiyan bike û mîna zarokekî kêrnehatî dixwaze nêzîkî şehîdên me bibe? Xwe pîs dike û ma piştî wê qîreqîr dike? Xwe bigihîninê! Nêzîkbûnên mirovan ên zaroktî gelek caran tê dîtin. Belê, dema ku zarokek piçekê birçî dibe bang û gazincê dike, hêsrên çavan dibarîne, qîr dike; lê kesên pêgîştî ger ev kesên şoreşger bin qet qîmetê nadin van rêbazan. Zarokatî di nava rêfên partiyê de nayê domandin. Radestkarî dikare xwe veşêre, provakasyon jî dikare xwe rûpoş bike. Ji bê perwerdehiyê dibe ku gelek heval pêdivî bi alikariyê bibînin. Ev tiştên ku tên fêmkirinin û li dijberî van têkoşîneke çawa divê bê meşandin jî tê fêmkrin. Lê navê di zarokatî de israrkirin, ecemitiyê de israrkirin û di kêrnehatinan de israrkirinê tine ye.

Em ji tecrûbeyên xwe vê baş dibînin û fêm dikin; kombûnên hemû sedsalan, bi şêweya nexweşiyekê li kesayetiya xwe teysandin û ji bo ji van rizgarbûnê yên ku rêbazên bi Rêbertiyê dilîzin ne kêmin. Heta dawî bêrêxistin, bêberxwedanî, erkên dîrok û kêliyê hema pêk ne anîn, hezar û yek hêcet dîtin û sedemên pêk ne anînê rêzkirin, ev jî bi hinek rêbazên ku em jê re dibêjin demogîjî û bê ku xwe bizanibe ji vê bawerkirin, ev xêzkirin û nivîsîne. Kar çima baş nayên meşandin, hema bêje xwe pispor dîtin, Rêbertî acizkirin, nirxên şoreşgerî sorkirin, rêxistin sorkirin û tengezarkirine. Vaye ji we re kêrnehatinî, vaye zarokatî. Ya rastî ji ti kesî re yetkiyek wiha nayê dayîn. Lê ji ber sedemên cuda yên ku dikevin vê rewşê pir zêde ne. Xwe ne gihandina pêgiştin, terbiya berxwedanî û terbiya rêxistinê. Hişmendî, mantiq û ruhê zilamê biçûk ê ku ji aliyê Kemalîzmê û bermahiyên serdema navîn mayî dihewînin. Bilindiya demokrasiyê, şanaziya exlaqê sosyalîst najîn. Berçavkên serdema navîn bi gelek ji wan re ye. Tîpa serfkariya Kemalîzmê û tahrîpkar ya gelek ji wan heye. Bi kurtî exlaqê zilamê biçûk mijara gotinê ye. Lê pêşengtiya PKK'ê tê wateya redkirin û bi têkoşînê tesfiyekirina wan e.

Yê ku vê dijî ne tenê Rêbertî ye, rêbertiya ku bi berxwedanî şehîd ketî jî seknek wiha raber kirin. Yên zehmetiyên herî mezin jiyan, êşên herî mezin kêşan, îşkenceyên mezin jiyan çawa PKK parastin, çawa li ber xwe dan, çawa bi birçûbûn û agir re têkoşiyan, çawa li ber xwe dan, çawa hatin şewitandin, çawa hestî û çerm man û herî dawî vana ji partiyê re çi gotin? Gelo ev hemû nayên zanîn? Lê hinek reben vê ji nedîtî ve tên. Hem jî pir zêde li ser navê girêdana bi Rêbertiyê re wêje dikin, li ser navê ku heta dawî pê ve girêdayîne vê dikin. Tiştekî wiha nabe! Rêberên bi nirxên rast ên PKK'ê ve girêdayî, mîlîtan di pênaseya me ya bi bandor ku di roja îro de tê kirin û hem di pêkanîna wê de, hem jî yên di teoriyê de xwe gihandine, li beramberî rastiya me ya gel û partiyê nikarin wiha tevbigerin. Ma dixwazin bibin radestkar? Wê demê cihê ku biçinê diyare. Dixwazin rûpoşiya burjuvaziya biçûk bikin, bila vê bi hostatî bikin; pêdiviya wan bi perwerdê heye, divê merdane bêjin. Bi qasî ku nikaribin erk rakin lewazin, bila merdane bêjin.

Em weke Rêbertiya PKK'ê di derve û hundirê welat de, rêberekî berpirsyariya hemû çalakiyên leşkerî, polîtîk û bîrdozî digirin ser milê xwe ne. Em li ser ti kesî bi minet, rica li bergerandinê vê ferz nakin. Em şeref û serfiraziyek mezin didin kesên ku îda dikin bi erkên şanaz ên dîrokî ve, bi girêdayînên mezin bi hevaltiyê ve girêdayî ne. Yekane tişta ku fêm nakin ev e. şeref û anûreke mezin ji wan re hatiye bexşîn. Ango ne zehmetî ne. Bi

vî awayî rêzdariya herî mezin ji wan re hatiye raberkirin. Nexwe em tena serê xwe jî dikarin xwedî li erkên xwe derkevin û birêve bibin. Em ji sererastkirina çalakiya herî mezin, plansaziya wê ya herî deqîq bigirin heta pirsgirêkên herî aloz ên bîrdozî û çareserkirina wan û bi qasî ku bikaribin di ronahiya sosyalîzma mezin de çalakiya ku bi erka şoreşê re rabe pêk bînin ji xwe bawerin. Di vê mijarê de milîtanên ku me erkdar kirîn hene. Wê demê bi çi sedemê dibe bila bibe, dê dev ji rêbazên ecemî û zarokatiyê berdin, dê kes nebêjin nikarim, vê-wê pirsgirêkê ez asteng kirim.

Erê bila tu kes kesayeta kêrnehatî ya ne şoreşger li ser me ferz neke. Em pir baş dizanin ji wê cîhana tarî ya zehmetiyan çawa em ber bi cîhana ronî ve hatine. Henase bi henase, bi dilekî ranewestayî, bi zanineke bê xew, bi zanîneke her tim li ser piyan û bi dilekî ve me ev tev destgirtin û pêş xistin. Ji gelek hevalan re navengên azad ji bo hizrînê û tevgerê hat bexşîn. Tiştên ku li ber deriyê Komara Tirkiyê bidîtan çi bû? Nanek bû. Me tenê ne pêxwariniya madî, ji pêxwariniya manewî jî ya herî baş da wan. Ancex dikarin minetdariya xwe li beramberî vê destnîşan bikin, şikir bikin û xwe deyndar bihesibînin. Yek ji nirxên me yên herî mezin hevalê Xeyrî, ev bi awayekî vekirî aniye ziman; dibejê; “Herkes deyndare”, dema ku dimire jî deyndare. Di vê oxirê de mirin jî mirov ji deyndariyê rizgar nake, divê serkeftin bê afirandin. Ev taybetmendiya herî bi exlaq a partiya me ya herî diyarkere, exlaqê şoreşê, exlaqê şoreşgerî qûralê herî sereke yê ku civak li ser bilind bibe û xwe bibînê ye. Herkes ancax dikare bêje ku deyndare, neku mafdare. Ne di rewşa wergiriyê de ye, di rewşa dayînê de ye. Başe, ma nizane ev bi vî rengî ye? Ger tê zanîn, wê demê çima pêdiviya wê neyê bicihanîn?

Di nav we de kesên ku nirxên herî bilind radestî wan hatî kirin jî hene. Hevalên ku bi derfet û yetkiyên herî mezin hatine xemilandin hene. Em ji yên hêjî têr nebûne, heta niha jî yên ku daxwazên wan ên bi vî rengî hene re tenê Xeyriyan dixin bîra wan. Wan di kîjan mercan de, nûnertiya çi çawa kirin, ev çawa formule kirin? Me kadroyên herî pêşketî dane wan, lê em ji yên ku nikarin du demjimêran bi wan re eleqeder bibin re dibêjin: Kemal Pîr dibêje; “Ger pêwîst bike em ê 300 demjimêran eleqeder bibin û bikin mirovê doza xwe.” Ne 300 demjimêr, tiştên ku di 3 rojan de, di sê demjimêran de, di 3 xulekan de bên ravekirin hene, tiştên ku encam jê bên girtin hene. Exlaqê axaftina doza me, eleqederbûnê jî wiha ye. Ev jî ne tenê di dîmen de û ne jî îstîsna ne. Ev nirxên esasî yên PKK’ê ne. Belê, li beramberî van nirxên esasî ma em ê ji wan kesên burjuvaziya biçûk û xwedî azwerî re derfetê weke dixwazin di nav PKK’ê de jiyankirinê bidin

wan? Ji ber ku Çiya ye, nizanin filan û bêvan zehmetiyên wê hene, ma em ê ji şanaziya PKK'ê tawîz bidin, bi wan re lihev bikin? Na, na! Ew ên ku wiha ji bê çalakî û bê rêxistiniyên xwe re kilif bibînin dixapin. Çeka PKK'ê çeka devjêneger a gelê me yê qet dev ji berxwedanî bernedê û bedêng nebê ye. Belê dibe ku baş kar nake, ristekî zêde naleyze, lê çeke her ku biçe dê bi bandor be û bixebitê ye. Li beramberî vê hinek heval, hîn dibêjin ma pêwîste em xwe wiha rêxistin bikin, ma em wisa li ber xwe bidin, gelo dema wê hat an na? Yanî bi vî rengî divê erkên bîrdozî, siyasî, rêxistinî ji hev bên qutkirin, xwe bigihîne komîteyekê, nûnerên wê erkdar bikin. Gelo dihizirin nizanim ji bo erkdariyê divê wiha bê erêkirin, bi zimandirêjiyek wiha yên erêkirinê ve şoreşgeriyê dikin? Hîn dema ku PKK nû derketî holê ji aliyê bîrdozî, polîtîk û siyasî ve bi şêwazê Rêbertî afirîye. Dibe ku di şêwaza ji dayîkbûneke biçûk de be. Lê di wê demê de jî berxwedaniya herî mezin heye. Serhildana herî bi hêz heye. Ji 73'an ve heta niha Rêbertiyeke her tim berfireh dibe, heta hûrkariyên kûr mezin dibe heye û ev jî berxwedane. Niha dibêjin beşekî mezin ên hêzê me yên ne çalak hene. Em jî ji van re vê dibêjin; PKK berxwedaneke, PKK berxwedaneke di êrîşê de ye. Belê, gelê me bi giştî di rewşa parastinê de ye. Lê misoger PKK di nav parastinê de tevgereke êrîşê ye. Di hizir de ji kêliya despêkê ve êrîşek bû, di polîtîkayê de dema gava yekem avêt êrîşek bû, dema ku di çalakiyan de gava yekem avêt êrîşek bû. Hema em bixin bîra we. Dema ku Heqî li Amedê bûn bê ku ferman bigirin, bi tena serê xwe weke pêdiviya ruhê êrîşa PKK'ê li faşîstekî daye. Dibe ku rêze çalakiyên şîdetê yên ku em hejmara wan nizanin li dar xistibin. Wê demê komîteya leşkerî ya PKK'ê ne bû. Organizasyona wê ya polîtîk jî nebû. Di qonaxa grûbê de bû. Lê mirovê şoreşger lêdana faşîstan jî di nav de, gelek çalakiyên şîdetê encam dan û haya me jî ji van nebû. Ma Heqî şaşî kir, ji ber ku komîteya Heqî ne diyar bû gelo qûral binpê kir? Qetiyen ne wisa bû. Heqî di heman demê de ruhê siyasî û leşkerî yê partiya me bû û pêdiviya vî ruhî bicî anî. Qet ji me re negot. Name nenivîsand, ne got biryar heye yan na, komîteya wê çêbû çênebû. Bi tena serê xwe kir, pêk anî, di dîroka partiya me de xwest qonaxeke wiha derbixe holê. PKK'yîbûna rast, rastiya ruh û pratîka êrîşa PKK'ê ev bû. Kemal wiha ye. Bê hejmar kadroyên me ên bi vî rengî hene. Bê ku ferman ji me bigirin li ber xwe dan, paşverû û xayîn kuştin, rêxistin damezrandin. Lê ne gotin; "Ferman û Komîte nîne em bisekinin."

Wê demê em taybetmendiya kûrahiya rastiya PKK'ê baş fêm bikin: Ji roja derketina xwe heta roja îro PKK her tim çeka êrîşa taktîkî ya gelê me ye. Hem jî bi derfetên herî biçûk çeka ku êrîşî dijmin dikê ye. Heqî çalakiya

xwe ya yekem çawa lidarxist? Bombe û fîşekên yekem çawa teqand? Di bajaran de ev kir, hîn li lûtkeyên çiyayan jî xwe bi cih nekiribû. Me, vala vala Heqî dema ku ev çalakî li darxist, weke ruh û çeka êrîşê bi nav nekir. Wî bi encamekî xwezayî yê bîrdoziya PKK'ê ev pêk tanîn û dijmin jî vala ew nekuşt. Ji ber vê taybetmendiya wî ew li nav bir. Wê demê ruhê êrîşê yê PKK'ê, bi hemû taybetmendiyên xwe, divê baş bê fêmkirin û em dibêjin divê rast bê pêkanîn.

Me, di bîrdoziyê de gotinên yekem mîna fîşekê teqand, lê bi azweriyeke mezin, bi nihîniyeke mezin û bi pêngavekê ev kir. Em pir baş dizanin wê demê burjuvaziyê bihist û gotin: "Em ê di sê mehan de karê wan xilas bikin." Gotin bîrdoziyeke wiha, êrîşeke wiha dibe? Lê hemû vala derketin. Vaye PKK ev e. bêgûman li beramberî feraseta hinek hevalan a parastina pasîf gelek tişt dikarin bê gotin. Tenê ne rewşa hinek hevalan ya gelek ji wan wiha ye. Ma qet ji gelekî kole, dikare tevgereke taktîkê parastinê bişopîne derkeve holê? Ev, tê wateya ji rastiya şênber û zanista şoroşgerî tiştek nefêmkirine. Wêjeyekî amadekariyê derketiye, çiye ev amadekarî? Di kêliya despêkê de, dema destpê kir, amadekarî çiqas bû? Lê çiqas kar tê kirin, çiqas rêxistin dihat avakirin. Jixwe di nav me de amadekarî çalakiye, amadekarî rêxistine, amadekarî êrîşkirine. Eşkereye ku her tim bi êrîşê dikare amadekarî bê dawîkirin. Ango amadekarî ne xwe başde kêşane. Ne bendewariye, ne parastine. Dibêjin plansazî, nizanim dibêjin eniya paş; enîya paş erîşa herî mezine, plansazî êrîşa herî mezine. Û ev hemû jî di vê pergala çalakî û rêxistinî de pêk tên. Ev, taybetmendiya herî kûr a şoreşa Kurdîstanê, rastiya devjênegar a ruhê êrîşê ya PKK'ê ye. Û taybetmendiya ku ji aliyê kadroyên bexwedêr ên partiyê hatiye raber kirin û divê bê raberkirin jî ev e.

Serfirazî, Bexwedanî Wê Bibe Yên Bi Ruhê Êrîşê Şer Dikin!

**Adar 1985**

## DI PÊŞKETINA PRATÎKA ŞOREŞGERÎ DE EM HELWESTÊN NEBES Û KÊM DERBAZ BIKIN, BI RUHÊ ÊRÎŞ Û AFIRÊNERÎ ŞER BIKIN

**Ji Kadroyên Rêvebir Ên Partiyê Re**

Hem di dîroka berxwedaniya gelê me de, hem di pratîka zanistî, di dîroka berxwedaniya rêxistinî de, îro di têkoşîna me de, di beşên navîn ên welatê me de, di qadên çiyayî de, li ser sînoran di qadên pêl bi pêl pêş dikeve de divê ku xwe bigire, her ku diçe bi hêz dibe, ji aliyê madî û manewî ve xwe dixemilîne, ya ku dê li ser bingehê girseya gel û kadro xwe bilind bike, em ji qonaxeke dîrokî ya ku xwe giyandiyê re şahidî dikin. Rastiya Kurdistanê ya welatê ku rastiya wê radest girtî, li derve û hundur tecrit kirî, hatî înkar kirin û nehatiye pejirandin, li beramberî vê weke Rêberekî şoreşgeriyeke bi hêz ferz dike, di navenga zehmetiyên bêhempa de, ji roja yekem heta roja me bi leza maratoneke 15 salan, ji derfetên madî yên herî hêsan, heta yên manewî ku hemû tişt bi azweriyeke mezin dest xistiye û weke hêzekî ev jî karaniye, çawa giştiye vê rêwşê divê baş bê zanîn. Em vana li vir dûbare nakin, lê bi kîjan ruhê êrîşê bi kîjan derfetan afirandiye, me yek kir çil û dîsa em di kîjan pêvajoyên bi êş re derbaz bûn, li beramberî kîjan izdiraban, kîjan îşkenceyan me xwe gihand vê ger piçekî dil û zanistî bê êşandin dê derhal bê fêmkirin.

Û dîsa pênaseya PKK'ê jiyana mîlîtanî, qonaxa rastiya gel a îro, divê ku ev qonax çawa be û em ji yên dişibinê bigirin heta divê jiyana partiyê çawa be îro xala ku em gihiştinê diyare. Ev rewş girînge, hêvî dide, berxwedêre,

di nav teqînê de ye, li ber teqînê ye. Ev gav bi gav çawa hatiye amadekirin, ji aliyê kê ve ji aliyê kîjan hizir û pratîkê ve xwe gihandiye vê baş tê zanîn û neçare baş bê zanîn.

Em li ser vî esasî li rastiya pêşiya xwe dinerin. Em heta dawî bi kûranî li rastiya girêdana serdema şoşergerî û şîroveyeke bi hêz a dîrokê lê dinêrin. Dil û mejiyê mirov bi rêbazekî afirêner bi dest digirin û tên vê xalê. Li vir çalakiya herî zelal, fikra herî zelal, dilek di asta azweriyê de, bi kurtî şênberiya pratîzebûna ruhê PKK'ê mijara gotinê ye. Niha di gelek lûtkeyên welatê me de van qadên ku partiya me lê belav bûye kar çawa, bi çi lezê, kîja biryardariyê, bi kîjan misogeriyê dê bê rêvebirin weke tê xwestin nezanîn, yan jî zanîn û pêk ne anîn dibe ku bi sedemên din ve bê girêdan, ti kes nikare nebesiya xwe bi avakirin, kêmbûna talîmatan û kêmbûna ruhê êrîşê ya PKK'ê ve gire bide. Na, tenê dikare bi qusûra kesayeta xwe ve bê girêdan.

Me wateya vegera welat, lûtkeyên welat jî xêz kir. Em ê li vir vana dûbare nekin. Nirxandinên di derbarê ji nû ve vegerê de divê baş bên xwendin û ev nirxandin li beramberî çi tên kirin divê ku baş bê zanîn. Niha li wir ev çend sale pratîkek tê raberkirin. Ev pratîkeke heta dawî girêdana xwe bi raboriya PKK'ê ve heye. Pratîkeke Bi welat û derveyî welat re, zîndanan re bi şêwazekî qet neyê qutkirin heye. Pratîkeke pevçûna di navbera berxwedanî û dij berxwedaniyê de ye. Pratîkek heta dawî girêdayî pêkanîna xeta bîrdozî û polîtîke. Di vê mijarê de, di vê pratîkê de para me çî ye gav bi gav, bost bi bost, fîşek bi fîşek em baş dikarin daynin holê, em di vê rewşê de ne. Em xwediyê wê xwebûnê ne dizanin bi rewşa kîjan dilî, kîjan hêza fikirandinê ve, ev amadekarî hatine kirin ku em jibîr nekin. Dîsa bi kîjan plansaziyên taktîkî, kîjan nêzîkatiyên stratejîk ên leşkerî û siyasî ve xwe gihandina vê çêbûye li ber çavane.

Niha dizanim, heta niha jî hinek heval, bi hinek hevokan dileyzin, bi hinek dûrişman mijûlbûn, nîqaşkirina vê wiha dizanin ku em ê ji şoreşgeriyê bihesibînin û wê bikaribin kemasî-nebesiyên xwe bi van aliyan ve ji holê rakin. Bi hinek mijarên ne sereke ve mijûlbûn, bi binek kesên bi qusûr, nexweş û bi pirsgirêk ve, yan jî bi provakasyona re mijûlbûnê dibê qey erka xwe weke tê xwestin pêk anîne. Hinek li ser şoreşgeriya nebes riste rêz dikin yan jî li ser rêveberiya teng hinek rastiyan rêz dikin wiha dizanin ku erka xwe ya Rêbertiyê pêk anîne û wiha jî xwe hepis dikin. Dîsa hinek caran bi kêmbûna derfetan û heta niha jî qala hinek nebesiyan dikin û wiha dizanin ku di emcamê van nebesiyan de ew ê xwe bimazeret diyar bikin. Qala hinek astengî, kêmasiyên biçûk dikin, bê zanebûn be jî wiha

dizanin em ê jî cewherê kar li aliyekî bihêlin. Na! Heta ku ev henase lê bide, ev zanîn bixebite, em ê ewqas xafil nebin ku yê ne esas li cihê yê esas daynin.

Me beriya niha jî got, yên ku tevî hemû berpirsyariyên vê tevgerê bûne, bi kêmasî û xêrên xwe ve tevahî êşên xwe, evîndarî û azweriyên xwe jiyane, zanîna wê jiyane, weke saziyeke pêkhatî, em van karan weke sivikbûnê dinirxînin, weke lewazî dinirxînin. Belê, dibe ku em heta niha bi kulmên bi hêz naxivin, me hîn xerca gelê xwe çênekiriye. Lê taybetmendiyên şerê me baş raber kiriye, kulmên xwe baş tûj kiriye û pratîzekirina siyaseta me gav bi gav di pratîzekirinê de baş pêk aniye, herî kêm bi qasî ku neyê pelçiqandin, bi qasî ku her biçe mezin bibe em xwe gihandina xurtbûnekê de ne.

Êdî di zemînê dilên welat û partiya me tê de lê dide, em naxwazin qala rewşa perpisyariyên têkoşînê bikin. Bi taybetî fermandarê ku berpirsê çareserkirina pisrgirêkên reveberiya wê ne, ji rewşa hêzên ku xwedî asta rêbertiyê berpirsyarin, tenê ne navenda partiya me, weke pêşeng, yên ku ji gel re pêşengtiyê bikin yanî dixwazim hinekî jî qala rewşa kesên endamên partî jî bikim. Pêwîste bi qasî aliyên van hêzan ên li hember zehmetiyan li ber xwe didin û divê mirov rêz lê bigire û aliyên ku pêwîste her tim bên pêşxistin ve, divê mirov qala zarokatiyên wan jî bike. Dixwazim qala domdariya ecemitiyên wan, evîndariya wan a ku hinek caran vê heta asta ferasetê jî dibin, vê jî çawa bi hinek gitonan dixwazin bi me bidin pejirandin, bê ku bizanibin dikevin rewşek çawa ketî jî bikim.

Ev ji me re gotin, pir bi êşe. Heta niha qala bê derfetiyên maddî, kêmbûna qadro, ji aliyê bîrdozî û polîtîk ve xwe nexemilandinê, xwe negihandina asta tê xwestin, sedemên cuda rêzkirin û sekna xwe bi vê şîrovekirin, çima di asta têrker de rêxistin û çalakî nehatiye pêşxistin rave dikin. Yan jî bi qala hinekî din amadekarî dê plansazî di demên pêş de bên kirin, wiha dizanin ku em ê bi van xwe têr bibînin, bi van agahiyan ve jî wiha dizanin ku raporên baş dane. Ji jêr heta jor hemû jî vê li ser me ferz dikin û wiha dizanin ku wê me îdare bikin. Na, em dizanin zarokê kîjan gelî ne. Em baş dizanin me kîjan derfet anîn gel hev û pê mezin bûn. Em vê ji ber di hemû jiyana xwe de bi serdeçûnê, bi jiyankirinê, hişyarî, bi baldarî tevgerîne dizanin.

Rêbertiya PKK'ê ji roja derketî heta roja îro, bi taybet jî weke provakatoran, komara tirkiyê şayanî dît, ne rêberiyeke wiha ye û tenê ne dosteke jî. Na, ew tiştên cuda ne. Rêbertiyeke hinekî dizanin bi hostayî li doza gel binerin, yên ku hêza pêşdebirina vê hinekî bi xwe re afirandî ye.

Divê ev rast bê fêmkirin. Rêbertiyekî ji derfetên biçûk, ji misqalekê asteke çawa afirandiye îspat kiriye. Rêbertiyek hinekî jî li gorî serdemê xwe pêk aniye, hinekî jî xwe ber bi gelê welat ve herikandiye. Ma wê kadroyên me vê fêm nekin? Li ser vê nîqaşan vekin?

Em niha ev derfet çawa hatin afirandin, çawa ji milîtanan re hat gihandin dûbare nakin. Bi dehan car me cesaret daye wan, derfetên pêşxistina fikrên xwe pêşkêşî wan kiriye xistiye bin emrê wan. Me li vir hewcedariya nefesekê pejirand. Li derveyî welatê xwe mayîn tenê ji bo xatirê têkoşînê û hevalan me qebûl kir. Ji bo mezinbûna hevalan, ji bo derbazkirina xwe amadenekirinên pêşengan, ji bo xwe bigihînin asta şervanên bi bandor hema bêje ti êş û azar nema ku me nekişand. Me tenê ev ji bo ku mîlîtanên me yên partiyê hinekî din mezin bibin, ji bo rastiya gelê me yê berxwedêr hinekî din reh berde kir. Ev ne tiştên ku neyên fêmkirinin. Her milîtanekî xwedî hişyarî, dikare vê derxe holê, fêm bike.

Em di navengeke pir metirsîdar a înkarê de, bê pênc quriş pere, ji fîşekekê mehrûm, ji gotinekê hejar derneketin gelo? Kê çi da me, ma ji roja despêkê herkesi bi awayekî wehşiyane li dijberî me şer nekir? Ma ti diyardeyên hêvî û baweriyê di holê de hebû? Derfetekî me yê madî ku em pê zikê xwe têr bikin, fîşekeke em pê şer bikin hebû? Ma heta niha jî em bi heman şêwazî şer nakin, bi berhem naynin û vê radestî hevalan nakin? Derfetên ewlekariyê, fikrandinê, xwendinê, tenduristiyê ku em ji bo xwe nabînin nadin wan? Ma me derfetên herî mezin nexist bin emrê wan, heta derfetên ku me pêşkêş kir bi qasî ku tu bikaribe pê Tevgera rizgariya netewî pê bimeşînî bi taybet jî ji qadroyên welatekî weke Kurdistanê ji nedîtîve tên re pêşkêş nekir? Qadroyên herî bi hêz, di serî de ji qadroyên partiya me ku pêşî tên milîtanan re nehat dayîn? Ti kesî tiştek neda me, lê em gelek tiştan didin qadroyên xwe. Em bidinê, vê zêde nabînin û înkar jî nakin, lê divê beramberî vê jî hebe.

Ji bo derbazkirina nebesiyên hevalan divê ku mirov taybet bixebita. Gelek heval dikarîbûn biçûna çalakiyê, lê wê zûve winda kiriban. Di gelek pêvajoyên cuda de çawa li nav çûn, ber bi binkeftinê ve çûn em pir baş dizanin. Ez ê çîroka van li vir venebêjim. Hevalên ku çil caran binkeftin amadekirin û bi pratîkên xwe ev jiyan kirîn hebûn. Hîn jî hevalên ku ji mantiqê binkeftinê, yê parastineke ji rêzê xwe rizgar nekirine hene. Ger nav bidim, yê ku xwe di asta herî baş de dizane jî, çawa di nav feraseta parastina pasîf de maye bêjim, gelo wê xemgîn bibin ev heval? Yan jî gelo wê li hêcetan bigerin? Na, ew ê pir eyb be. Me ji aliyê madî û manewî ve hemû derfet da van hevalan. Gel’ek hat dayîn, çiyayên xwerû-xweşik ên

cîhanê, lûtkeyên qet nayên destxistin hat pêşkêşkirin, qadroyên herî fedakar hatin dayîn û bi qasî ku biçûk neyê dîtin çek hat dayîn. Û pir bi êşe ku vana hemûyan kesên ku her tim “ji hezar hirçan re gotin xalo” derxist holê. Eşkereye ku diviyabû bersiva van li gorî mafê wê hatiba dayîn.

Belê niha PKK di pêvajoya ku di welat de li gelek qadên têkoşînê, li qadên ku baş dikare tê de şer bike lêhûrbûn dike û ji bo gelê me jî dixwaze hêvî û azweriyê pêş bixe dijî. Ji bo partiya me yek ji pêvajoyên pêgiştinê ye û ji bo gelê me jî pêvajoya berxwedaniya biryardariya dîrokî ye. Pêvajoya ku divê kes pê nelîze, bi peyvên xweşik divê bandor nekê ye. Pêvajoya ku divê herkes eşkere tê de şoreşgerî û berxwedaniyê raber bike, misoger rabe ser piyan, bi hemû curên rêbazên têkoşînê, bi ruhê PKK’ê yê êrîşê biafirîne, pêş bixe yanî pêvajoyeke damezrandina şere. Em cara yekê qala pêvajoya ku PKK’bûna rasteqîn, pêgîştinên raber bike, gelê me jî bi hêviyên serkeftinê li ser esasê berjewendiyên xwe yên taybet bikaribe pêk bîne dikin. Û dîsa ji aliyê hemû cîhanê, dost û dijminan ve hatiye pejirandin ku, ev bi vî rengiye, em qala pêvajoyeke wiha dikin.

Başe, pêşeng ji vê re çi dibêje? Em eşkere û hema diyar bikin; dixwaze civînên ku li ser navê navendê tên lidarxistin, dixwaze di derbarê pratîkên ku ji aliyê yekîneyên çekdarî ve bi armanca propagandayê tên kirin, em ji wan ne razîne. Bi berhem nabînin, weke tê xwestin bersiva keda me nayê dayîn. Ev ne bersiveke ku heval bi asanî jê razî bine. Em li vir li tawanbarên şexsî nagerin, ev ne rêbazê min e. Min filan û bêvan teşîr nekiriye û nakim jî. Em ê ne bêjin pir hevalên paqij, ne jî bêjin ên pir qirêj û cudabûnê nekin. Ji hemû hevalan re rêza me heye. Ji yê herî baş, heta yê lewaz min nirx da hemûyan û ji niha û şûn ve jî ez ê nirx bidim. Ez ê bi rêzdarî û hezkirineke mezin li hemûyan binerim, ev çêkera me ya exlaqî ye. Lê dema ku vê dikim jî, yê ku herî zêde ji xwe re dibêje; “ez têr dikim” û li ser navê me yên ku vî sifatî şayanî xwe dibînin bigirin, heta yê herî lewaz tiştên bên gotin, heta ji yê herî baş re jî gelek tiştên bên gotin hene. Weke pêwîst bi rista xwe ve ranebûn, yên talî li şûna yên sereke danîn, li şûna ruhê êrîşê parastina pasîf danîn û hwd. ger em di vê mijarê de bi hinek mînakên şênber hinek rastiyan destnîşan bikin dê heval baştir fêm bikin.

Dema ku li çêkerê bê nerîn dê bi asanî bê dîtin ku, ji xwe di belgeyên PKK’ê, plansaziyan de, kesekî kêmekî li ser xeta partiyê serwer, ji aliyê hemû qadroyan de bi şêwazekî asanî dikare bê fêmkirin, heta hûrkariyan dikare pêş bixe giştiye asteke wiha. Nêzîkatiyên PKK’ê yên stratejîk, di asta siyasî, bîrdozî û çalakiyê de zelale, plansaziya wê ya taktîkî zelale. Xemilîna madî û amadekarî têrkerin. Di serî de jî kombûna qadro, rewşa

girseyan, rewşa erdnîgarî navenga derve û hundirîn bêhempa ye. Dibe ku rewşeke bi sedan sal nehatiye destxistin heye, hatiye afirandin. Li vir diviya bû li ser hemû nirxan rêveberî û rêber bihata rûnişkandin. Vaye li vir nexweşiyên zarokatî hatin raberkirin, ecemîtî hatin kirin. Bi karên dawî re mijûl bûn, bi ruhê êrîşkar ê PKK'ê yê bilind bi fermandariyeke zirav rêveberiya kar û li ser meşandinê, di rêxistin û çalakiyê de bi şêwazekî nameşe, hema bêje qet destê xwe ji qirika me dernexistin.

Baş tê bîra hemû hevalan, bi helwest û gotinên xwe ve provakatorek li wir derket holê, bi mehan pê re mijûl bûn, şeş mehan li ser navê partiyê pê re hat nîqaşkirin. Bûyereke KDP'ê derket holê. Weke ku wan bi çavê xwe dît, gihiştibû asta radestiyê. Lê ji bo xwe ji vê radestgeriyê rizgar bike jî ti helw nedida. Vaye ji pratîka wî bandor bû, tevî ku tiştek nedanê weke ku hêzeke mutefîkê herî başe, hêzeke welatparêzê herî başe tevgerîn. Ji wan re gotin em ê bi hev re li dijberî komara tirk û artêşa wan a faşîst şer bikin. Li Başûr wan ji hev de bixin. Başe, li Başûr kî heye, li ser navê kîjan siyasetê şer dikin? Başûr, ji bo fetisandina artêşa faşîst a tirkan ji bo şoreşa me ciheke? Yan jî ciheke dehên salên dawî de şoreşa me tê de bê fetisandine? Hiş çiqas zû tiştan jibîr dikin. Dahûrînên PKK'ê hene, tehlîla vê xetê heye gelo ev tên jibîrkirin? Wê ber bi şerekî radîkal ê çawa ve bimeşe? Wê bi kîjan rastiya siyasî, civakî vê bike û em ê bi van re wan pêş bixin? Ji aliyê hevalê me yê herî pêşketî bi awayekî henekî be jî got, ger pêwîst kir em ê Sovyet bixin dewrê; wê bi tehrîkirinê wan banîya rûyê hev. Çawa dike, bi henekî be jî çawa dibêje, asta van çiye, çiye polîtîkaya wan, kê pêk tînin, çawa tê pêkanîn, ma nayê zanîn? Weke li Başûre, wê li Rojhilat jî wiha bikin, ma gengaze? Pêşketinên pişt re çi selmand? Ma ev negotinên reben û sefîlin çine? Dibe bê ku bikeve ferqê, lê ne bi niyazeke baş hatibin gotin, çine?

Li Başûr man, gotin hîn zêde em ber bi Başûr ve biçin, ev çi bû? Ji qada sereke ya ku meseleya gel, pirsgirêka Kurdîstanê tê de çareser bibe ber bi qada talî ve herikîn, hêzê sereke mîna hêzê îhtîyat bikaranîn, helandin û xistina nav komployan nebû ev? Ma paşeroj bi mînakên vê dagirtî yên ji wan nebû? Li vir çawa zanebûn wiha zû vediguherê jibîrkirinê? Ma dahûrînên PKK'ê hatin jibîrkirin? Ew nêzîkatiya çavkaniya xwe jibîrkirina van digire ji dervî jiyana partiyê di saziyên din de, têkoşîn, ev ji ku derketin? Ma ev ne pişta xwe bi hêzên xeyalî ve girêdan û ne pişta xwe bi rastgiran ve girêdane? Belê, zêde pêwîst nake ku em dirêj bikin. Ev rastiyên ku berê jî hatine vegotin û rastiyên ku her hevalek piçekî zorî bide xwe dê bikaribe fêm bikine. Ev encama xwezayî yên feraseta parastina pasîfin. Ev

encamên xwezayî yên xwe di vê mijarê de li gorî ruhê êrîşa taktîkî a partiyê amade nekirinê ne. Sedemên wan kî dibe bile bibe, çi dibe bila bibe encama objektîf ev e.

Ya rastî, weke hêzê hemdem ê rizgariya netewî PKK, ji aliyê stratejîk û taktîkî ve ji roja despêkê heta roja îro, rewşa wê diyare. Min berê qala ruhê Heqî yê êrîşkar kir. Bi du gotinên me çawa dibezî me qala wê kir. Li derve tevî hemû curên êrîşên bêaman jî me qala rewşa xwe ya berxwedêr kir. Li wir çiya çiyayên me ne, mirov mirovê me ne, mîna ku ev malê KDP'ê ne tevdigerin. Jiyaneke bi destûr, îcaze ye ku ev tiştekî ew bi xwe jî naxwazine. Ev ji kuderê derketin? Ji bo torbeyekî ard li dûv wan bazdan. Ma rêbazê jiyana PKK'ê ev bû? Ma wê ji birçiyan bimiriyan? Ma di nava bê derfetiyan de difetisîn? Na, na! Hinek bi rêbaz li pirsgirêka nerîn dikarî gelek tiştî çareser bike. Bi kurtî bêşansiyeke biçûk wiha hat jiyîn.

Em baş bizanibin, li Sovyetê Partiya Karkerên Komînîst (IKP) çawa pêş ket diyare. Dîsa li Başûr KDP dixwaze çiraveke çawa biafirîne diyare. Lê ev ne çiraveke artêşa Tirk tê de tê fetisandine. Eşkereye ku wê bibe çiraveke tiştekî din tê de difetise. Niha vana baştir tên fêmkirin. Wê demê divê di mijara taktîkên partiyê de mirov zimandirêjiyan neke. Weke tê xwestin henekî be jî hinek gotin neyên kirin. Di nava PKK'ê de şêwaza bûna mirovê taktîk ê çalakiyê heye. Şêwazekî di nav PKK'ê de bûyîna fermandar, qadro û rêvebir heye. Tahlîlên siyasî yên henekwarî nayên kirin. Jiyaneke ji xeta partiyê qut nayê avakirin. Şêwaza şerekî, berxwedaneke cuda dernakeve holê. Hêzên ku mirov nikare pişt pê girê bide, pê re bixebite nakeve nava helwestên xwe xapandinê.

Bila ev jî neyê gotin; me zêde nexwest em vê bêjin, ji xwe me ne dixwest vê bêjin. Erê, ez jî dizanim ev nedihat xwestin, bêgûman wiha jî nehat nirxandin. Lê ji helwestên biçûk ên lîbarel em bigirin, heta zimandirêjî, safîtiyê, hinekî jî bi gundîtî polîtîkaya saf û qala polîtîkgeriya teng bikim, ev hatin raber kirin. Û ev jî hinekî têkiliya xwe bi qûrnaziyê, xwesteka hinekî zêdetir li Başûr weke penabar mayînê re heye. Em bi qasî ku polîtîkayên bi vî rengî wê di nava qadroyên me de rê li ber çi vedike nebînin ne safin. Çend sal çawa hat xerckirin, çawa veguherîn komên penaberan, ji bin ve jî provakatoran çêker ji hev xistin, rev hatin rêxistinkirin, li jor jî bi pirsgirêkên talî û vala re mijûlbûn çêbû. 15 sale tiştên ku me amade kiribûn, hem jî di qada ku diviyabû qet neyên windakirin, herî zêde tê de berxwedan bihata kirin de, em bi xeretiyan re rû bi rû hatin hiştin. Ev çavkaniya xwe ji kîjan feraseta rêveberî û rêbertiyê digire?

Em Rêbertiyekî cihekî weke çolên Ereban de, her tişt tê de parçe parçe hatiye kirin, ji aliyê Erefatgeriyê ve het tişt tê de hatiye firotin de ewqas nirxan diparizin. Rêbertiyekî di nava emperyalîzma Ewrûpa de xwe ji hev de naxe, qadek çanda xirap a ku her tişt ji hevde xistiye, kariye tevgerê ser bixine. Tê li lûtkeyên çiyayên Kurdistanê be, wê çek di destê te de be, wê li pişt serê de ev rû bidin û tê van jî bi hinek şîroveyên nebes rave bikî, yan jî ji nedîtî ve bê. Eşkereye ku li vir ji xeta taktîkê PKK'ê yê esasî ber bi parastina pasîf ve çûyîn heye. Di pêkanîna xeta me ya taktîkî de, ji wê qutbûnek heye. Di ji nû ve vegera welat de ev hatine vegotin û berpirsyarê vê yê sereke jî rêveberiya wir e. Ev jî hatiye gotin.

Bertekên qadroyên me yên vê demê diyarin. Divê ku zêde li Başûr mayîn çênebe. Baş tê bîra min, xwestin van rexneyan vala derxin. Cihên nû, di van cihên nû de avakirina malan û weke hevalên ku vê pêdiviyê fêm nakin bêdeng bikin. Hêz di radeyek mezin de bi karê bax û bostanan ve hat mijûlkirin. Ger rê le nehatiba girtin, wê biketan nav xefleta bi hêzên Başûr, pêşmergeyên KDP'ê yan jî hêzên Iraqê re ketiban nav şerekî nediyar. Sedema çiravbûna Başûr ev e. Li vir di taktikê me yên partiyê de kêm be jî ber bi rastgirêyê ve çûyîn mijara gotinê ye. Erê, heval bi xetê ve girêdayî ne, gûmana me ji vê nîne, lê di pratîk û taktîk de ji rê derketine ev, weke tê xwestin bikarneanîn û bandor nekirina hêzê me ye. Windahiyên ku rê ji vê rê vekiriye diyarin.

Me kadro çawa şandin wir, 15 sale me çawa amadekirin? Dibe ku gelek nebesî û kêmasiyên wan hebe, lê her kesê ku çek di dest de û gihişt wir, kesê ku mirin girtiye berçave. Ti kes nikare vê ji nedîtîve bê. Kes nikare bêje ev ne bi vî rengiye. Bi kombûna agahiyan tê, bi komek ezmûnan ve tê, wer rêbertiyek li ser wan nehatiba rûnişkandin tenê ne çalakiya 15'ê Tebaxê, çil qat zêdetir bi serhildanên bê hejmar ên gel em dikarin bên vê rojê. Ger dîsa xwe ferzkirinên me nebûya, dê encam çawa ba nikarin texmîn bikin. Vaye piştre pêşketinên nû hene. Yanî derketina Çile ya dawî û di Adarê de ragihandina bûyera "Eniyê" heye. Ragihandina Eniyê bi raveyên ku qet mirov pê têr nabe çawa hate paşxistin heye. Çima ewqas dereng hat xistin, li Başûr dimînin, bi bertekek li beramberî heyî, vê carê jî di zivistana herî zehmet de tevahî çêker bi carekê ber bi hundur ve birin heye. Ma ev ji rastgiriyê ber bi çepgiriyê çûyîn nîne çiye? Tê du salan bi karê bax û bostanan ve mijûl bibe, piştre jî di zivistana zor û zehmet meha Sibatê de hevalên jin jî di nav de, bê ku hebûn yan jî nebûna rê kontrol bike tê "Yellah" bike. Ev çiye? Enwer Paşatî ye, ma sefera Sarikamiş tê kirin? Me fêm nekir, du salan li Başûr ewqas rehet man, ma di meha Sibatê de

nekarîn bimînin? Nizanim, windahiyên dawî ne berhemên vê polîtîkayê bin? Belê, windahî çêdibin, li Başûr jî dikare bê mayîn, ji Bakûr jî bê derketin, lê divê tu vana bi rêbaz û pîlan çêbikê.

Dixwazin dîsa amaje bi rewşa qadroyên me bikim: Me bi sedan saxlem gihandin wir, çendek ji wan niyaz xirab, dibe ku 510 ji wan jî rizî derketibin. Em ê vê asayî pêşwazî bikin û ti kes jî ji ber vê ti kesî tawanbar nake. Lê piraniya wan hatin ji bo mirin, berxwedanê erk xwestin. Ger hinekî teşe ji wan re hatiba dayîn, hinekî bi rêz, bi eleqe gohdar kiribana, rastî hinekî hatiba fêmkirin, ti karê ku bi van mirovan ve nehatiba kirin nebû. Lê çi hat kirin? Hinek ji wan li Lolanê, hinek ji wan li Zaxoyê, hinek ji wan jî li Îranê bi mehan bê ku ti agahiyan bigirin dan sekinandin. Eşkereye ku rêvberiyeke wiha nabe. Wê bêjin; çima ma ew bi xwe nizanin? Ger ew bi xwe xwedî zanistiyeke sûper bin jî dê li benda rêveberiyê bisekinin, Rêbertiyê bisekinin, ew li ser yek fermana rêbertiyê dê biçin mirinê. Rêveberî ji wan bêxeber, bê ku ferman bide bêxeber bijîn, wê piştere jî bêjin çima xwe bi xwe nakin. Di Rêbertiyê de li ser dûviktiyeke wiha destûra rûnişkandina tu kesî nade. Hevalê herî milîtan jî, li ser fermana rêveberiyê ber bi erkan ve baz dide. Wê daxwiyaniyek bê dayîn, divê di dem û cihê xwe de bê kirin, bila kes nebêje rê dirêjin, agahî di dema xwe de nagihêjin. Ger mijûl bibin zilam telefon jî di nav de, li dûr hev rêzkirinan dikare di kêliyê de xwe bigihîne. Di dema xwe de talîmat nedayîna qadro, perwerde nekirin û nerêxistinkirin heye. Erê me got; li Başûr jî wê pêvajoya ceribandinê bê jiyîn, em dikarin bêjin ev feraseteke rast bû. Meş, taktîkên êrîşê, çalakiyên ceribandina kombûnan gengaz bû û ti kesî jî ev danerizand. Hinek ji wan gelekî sist bûn, lê dikarîn baş pêşengtiyê bikin jî hebûn di nav wan de, di gel pênc nebesan, kesekî têrker dikare bê dîtin, dikare wan biherikîne, mirovên me yên wisa jî hene. Rêveberiya me, navenda me ji bo vê xwedî hejmara endamên têrker bû, derfetên teknîkî têr dikirin. Agahî girtin jî di nav de, her tişt dikarî bê kirin. Bi mehane di bûyerên dawî de çi qewimiye em nizanin. Ger em hinekî xwe bixin zehmetiyê di du rojan de em ê bikarin fêm bikin bê ka li wir çi qewimiye. Em di sedsala 20’an de dijîn, ma wê çibibe yekîneyeke biçûk a peyamnêran bigere, vana bi telefonan rabigihîne, ma nabe, ev jî ne gengaze? Yê ku vê dibêje dibe ku zilamekî sofîst (alîgirê hizra sofîzmê) ê xirab be, lê nikare bibe şoreşger. Erê, qadro wiha hatin hiştin û ji aliyê çend provakatoran ve hundurê wan hat kolan, hema bêje piraniya wan teşwîqî revê kirin. Başe, ma wê her tim tawan li provakator bê barkirin, li çend kesên nebes bê barkirin, ma rêveberiya teng, wê di vir de li para xwe negere?

Wê demê ev çend sal fedekarî hat jiyankirin, kedek mezin hat raberkirin, zehmetiyên mezin hatin derbazkirin, ji hevalê herî pêşhatî de heta hevalên herî ji rêzê, hemûyan ev jiyan kir. Me got ku em li beramberî vê rêzdarin, em tiştekî ji vê re nabêjin. Lê dema ku em tên ser berhemiya jiyanê, hevalan xwe bi xwe kirin, ji keda xwe re rêzdar nebûn, nikarin ji xeta xwe re rêzdar bin. Jiyan dervî xetê, xala ku herî zêde heval jê razî nabine, lê bi pratîkên xwe ev raber kirine. Mirov çiqas li beramberî xwe û rastiya xwe bêrehm nêzîk bibe ewqas kamil bibe. Bila tu kes sersebê li yên din nebîne, herkes hinekî li xwe binêre, yên di herî jor de bila hinekî jî serê rim li xwe bizivirîne.

Wisa tê fêmkirin ku, demeke dirêje paşvekêşan û ber bi derve vebûna PKK'ê weke taktîkekî parastinê hatiye diyarkirin, heta niha jî ew dudilî û helwestê du alî îfadeya vê ye. Ji roja derketina PKK'ê heta roja me ya îro rewşa heyî, gelê me bi giştî di nav şêwazê parastinê de bûyîn weke êrîşeke taktîkî û parastin jî ji bo êrîşeke bi hêz a parastinê, bi qasî ku dest dide dikarê bê karanîn, weke encamê xwe negihandina rêbertiyeke taktîkî û pratîkî ya kûr, ev derdikevin holê. Ez vê dibêjim. Bi taybetî jî li beramberî êrîşên ku piştî salê 1979'an zêde bûn, eşkereye ku bi gelek heval re feraseta parastina taktîkî pêş ketiye. Feraseta di bîrdozî, polîtîka û çalakiyê de xwe parastin, Partî bi provakatoran re nîqaş kirin, Partî bi ferasetên rastigir xistina nav lihevkirinê, hem jî bi şêwazekî ku em gelek zirarê jê dibînin rûnişkandin, Partî sist girtin, derfetên partiyê ji bo pîrozbahiyên bi bandor karneanîn, di serî de jî weke teşe nedana qadroyên xwe ev feraset xwe daye diyarkirin. Lê milîtanê PKK'ê hêjî bi gelek taybetmendiyên xwe ve, pir baş xwe dide diyarkirin ku milîtanekî êrîşê ye. Ma di zîndanan de ev wiha nebû? Di mînakên beriya niha de, di jiyana sedan hevalên ku li ber xwe dan ev ne diyare? Nîqaşa di derbarê PKK'ê de provakasyon dixwazin me bikişînin nav, ma ne paşde kêşane? Gelo ev ne reformîzm yan jî şoreşgeriya nebese?

Ti gûmanan min nîne ku hevalên ji bo rêveberiya partiyê bi me re dibin alîkar, heta dawî bi feraseta me ya rast û berxwedêr ya partiyê ve girêdayîne. Lê ez dixwazim qala polîtîkayeke pir xirab a ku tê meşandin bikim; di polîtîkaya pratîkî de, di çareserkirina pirsgirêkên pratîkî yên şoreşê de, ketina rewşa wan a ku mirov heyf dibîne bikim. Her dem û her xulek nebe jî, ji ber ku pir zêde dikevin, ez dixwazim qala vê asta wan a ketinê bikim. Dixwazim qala hinekî jî bi dilê pak û şêwazê lîberalîzma gundîtiyê ku tê kirin bikim. Ger na bi derfetên ku ji hevalan re hatibû pêşkêşkirin, kombûna qadro û gel kar dikarî gelek pêş de bihata birin.

Min gelek caran ji hevalan re got, di kongre û konferansan de mijarên ku me bi dawî kirine, weke di hemû civînên navendê de nîqaş dikin, salekê paş de dixin, nîqaşên hîn teng birêve dibin, di gelek nîqaş û hevdîtinan de vê didomînin û dixwazin vê asta paşketî bidin jiyîn. Bê zanebûn vana dikin û her ku diçe di milê rastgiriyê de didin rûnişkandin, vê jî bi rewşeke xetertir dikin. Wê demê belavbûna çêker û ber bi revê ve çûyîn wê derkeve. Ger taktîkê partiyê bi qasî ku têr dike bi pîlan û venêrînê neyê pêk anîn, ger ew Partî partiya herî dogma be jî, ji destdayîna hêz nikare xwe rizgar bike. Ya ku partiya Bolşevîk li beramberî tasfîyegeriya salên 1908-1914'an bi hêz kir çi bû? Ger têkoşîna bi tasfîyegeriyê re baş bê fêmkirin, serxistina devjênegeriya însîyatîfa êrîşê, plansazî û rêxistina îlegal û ev di nav çêkerê de serwerkirinê şoreşa Cotmehê pêk hat.

Lê di nav me de kar tevî ku nayê xwestin jî, di cihê ku herî zêde dibêjin em tê de têkoşînê dimeşînin, ji tasfîyegeriyê re xizmeta hatiye kirin, gelek heval ketine vê astê. Ji aliyê navenda me ve ev çend salin nîqaşên ku di civînên li wir hatine kirin li ser dema borî derbaz bûye, yanî ravekirineke polîtîk nîne. Revayên herî bi hêz encax bi şêweyekî pir ji rêzê hatine dûbarekirin. Bi hûrkarî pêşxistina pîlanekî taktîkî nîne, nîqaşên bê encam ên li şûn yên demên borî di derbarê taktîk de hene. Di derbarê teşegirtina qadroyan de, seferberî tevgerê kirinê de nîqaşek, planek, bernameyek û pergala rapor nivîsandinê nîne. Di van de pir ji rêzê mane. Diviya ya bihata kirin çi bû? Erê, ji xwe ya nayê kirin jî ev e. Rista rêbertiya partiyê bi şêweyek ecemî hilgirtin, lê bi rastî jî ev ne li ser esasê hevkariyê, bi awayekî karîkatorene temsîlkirin rewşeke wisa derketiye holê.

Dê çi bahata kirin? Ne dûbarekirina tiştên ku Rêbertiya Partiyê pêş xistî û pêşkêş kirî, vana derbazî pratîkê kirin, veguhertina meşandinê bû. Pêwîstiya wê çi bû? Hemû tiştên ku ji fermana wan re hatibû dayîn pêwîst bû bo ronî û pîvanê teşe hatiba dayîn, rêxistinkirin, venerîn û teşwîqî çalakiyê kirin bû. Ew der qada çalakiyê ye. Divê li wir çalakiyên herî baş, berxwedaniyên herî baş di wê qadê de bên raberkirin. Hejmar têr dike, yan jî bi qasî ku dixwazî hejmarê zêde bike, çek, qadro, şervan zêde bike, ji bo vê astengî pir kêmin. Li şûna vê çend kesên ku jiyana partiyê xirab dikin, bi pirsgirêk, mîna kesên artêşê xirab dikin digirin dest û bi mehan, hata salan van dikin mesele. Ji bo van du awirên tûj besin. Dê hedê xwe bizanin. Ger pêwîst bike fîşekek bese. Yên ku di şoreşê de bi qudretin vana di dem û cih de tespît dike nakeve rewşa pêkneanînê. Di gel vê de piraniya çêkera me, girêdana xwe bi berxwedaniyê re heye. Girêdayî partiyê ye. Bi van re çi hat kirin, çiqas eleqederbûn çêbû, di derbarê van mijaran de qet rapor hene?

Belê, pêwîste em hinekî qala “Yekîneyên propaganda yên çekdarî” jî bikin. Çi bûn ev yekîne? Hêjî bi pênaseyên wan ve mijûl dibin. Na Gîap wiha gotiye, ber bi agahiyên kîtabî ve heta dawî çûyîn heye. Ji xwe gelê Kurdistanê, salên dirêje vê bûyerê dijî, çiyayên me çi pêşkêş nakin, mirovên me çi nadin, wê demê diviya ya ku bihata kirin çibû? Em ê ewqas qadro kom bikin, bê ku tu wan derbazî çalakî û rêxistinê bikî pasîf bihêlî, ev nabe. Bi salane qadro li çiya di nava jiyana herî bi êş, di berfê de, zivistanê, havînê de çi kirin? Her tim li bendê man. Ma diviya bû berhemdarî wisabûya, jiyan wisa bihata fêrkirin? Gelo ev ne parastina pasîfe çiye? Divê ku yekîne ji vê berpirsyar neyên girtin, ferman ji yekîneyan re bihata dayîn, bernameya karkirinê li pêşiya yekîneyan bihata dayîn, yekîneyan dê ev bimeşanda, li dijberî fermanê dernediketin. Dibe ku yek-du ji wan dijatî kiriban, li navbirin û eciqandina van jî gelek zehmet nebû.

Bila qala kêmbûna hejmarê neyê kirin, mirovên mîna çiyayan ji wan axan hatin derxistin. Di yekîneyan de rêveberî nîne, di avakirina yekîneyan de, rêvebirin û vesazkirina wan de, di plan û xebat xistina pêşiya wan de çiqas afirênerî heye? Çiqas sînordarkirina qadan li pêşiya van yekîneyan hat dayîn, her yekîneyek wê li çeng gund, çend navçeyan binêre, di çiqas demî de dê çiqas çalakî encam bide, di çend gundan de dê çend rêxistina ava bikin? Yekîne dikarin rêxistinê ava bikin, çalakiyan li dar bixin. Ne di şeş mehan de du heba, bi sedan dikare li pêşiya wan bê dayîn. Dikarin mîna bahozê li ba bikevin, hinekî rêveberiyeke bi tenduristî, hinekî rêveberiya têrker ji bo vî karî bese. Zilam jiyana xwe daniye holê, bi çek digere, lê mîna li seyranê be digere. Başe, kî ji vê berpirsyare. Belê ji berpirsyarê grûbê bigire, rêveberiya partiyê berpirsyarê van teva ye. Divê ku zêde di qadro de li qusûrê neyê gerîn, jiyana xwe datînin holê. Dibe ku afirêneriyeke pir mezin nebe, lê rêveberî hinekî wan tengav bike dikare wan ber bi serkeftineke hîn pêş de bibe. Bila qala başverûtî û seretayîtiyê neke. Ez ji kêliyên despêkê, bi mirovên herî kêrnehatî me çi serxistin dizanim. Min çawa serxistina Heqî vegot. Wê ewqas qadro, ewqas derfet ji fermana wî/ê re bê dayîn, ew ê jî qala qusûra wan bike çalakiya xwe pê rave bike. Tiştekî wisa nabe!

Em ji berpirsyarên yekîneyê bigirin heta berpirsyarên partiyê eşkereye ku hemû di nav feraseta parastina pasîf de mane. Bi kurtî taktîkê êrîşa çalak nehatiye pêkanîn. Sê sal wiha bûye. Çalakiya 15’ê Tebaxê, çalakiyeke êrîşê ya dîrokî ye. Çalakiya 15’ê Tebaxê hem ji aliyê hejmar ve, hem ji aliyê nîtelîk ve dikarî bi çalakiyeke mezintir bihata pêkanîn. Hem jî ew çalakî bi

ecemitiyêke mezin hat pêkanîn. Çima? Ji ber ku ji hemû aliyan ve bi feraseta taktîka parastinê ve girêdayî man. Diviya bû ev di civîna herî dawî ya navendê de bihata nîqaşkirin. Yên di vê mijarê de berpirsyar diviyabû bi dilekî mezin, li ser esasê rexnedayîneke bi cesaret ev di nava xeta partiyê de rave kiriban û bi vî rengî rê li pêşiya çalakiyên heta dawî vekirana.

Hûn hemû baş dibînin û dibêjin: "Gel gihiştiye asta rabûna ser piyan, gel dixwaze rabe ser piyan." Tevahî polîtîkayên hikumetê yên derve û hundur, dîsa rewşa Artêşa Tirk, şerê Îran û Iraqê li holê ye. Erdnîgariya me, çêkara ma ya mirovan a berxwedêr ji hemû aliyan ve hem rabûneke ser piyan a bi vî rengî gengaz dike û hem jî gelek nîşaneyên vê hene. Hebûna me ya qadroyî di asteke biçûk neyê dîtin de ye, başe divê ya bê kirin çiye? Divê aşûre bê çêkirin? Başe tu çêdikî? Na! Wê demê tu bi çi mijûl dibî? Tu bisekine, tu bisekine, tu bisekine, ne dema wê ye; li gorî serê xwe wêjeyek pêş xistiye. Kademeyeke rêveberiyê a têrker çêke, vê ferz bike, yên ku pêk neyîne bê ku li hêsrê çavê wî/ê binêrî bieciqîne. Kî yê te ji vî helwestê te asteng bike, ger tu xwe bi xwe ji vê asteng neke. Komara Tirkiyê? Na! KDP? Ne gengaze. Şoreşgerên nebes? Na, wê hemû para devê xwe bigirin. Mîlîtanê bê perwerde? Na. Wê demê te xwe bi xwe xwest êrîş bike kê rê li te girt? Ma xwe xwest bêjin rabin ser piyan girseyan got? "na" Na, na. Pêşengên partiyê di nav dudiliyê de jiyan kirin. Em bimînin an biçin. Bi keşfê girtine û bernadin. Ev çi feraseta keşfê ye, bi mehan qadroyan çiya bi çiya, kevir bi kevir bigerîne, wê keşfa çi bikin? Di dêma wan keşfan de bi tonan çalakî dikarîn bên lidarxistin.

Gelekî qala Gîap tê kirin, lê Gîap bi kîjan yekîneyan çi dikir ma em nizanin? Şemageriyeke ji rêzê serê xwe girtiye û diçe. Heta Qersê, Dêrsimê baskê meşê girtiye û tê sewqkirin. Kîjan bername li pêşiya wan hatiye dayîn, ma dema di rê de dimeşin nikarin tonek çalakî û rêxistin bikin û bimeşin? Bi kurtî, dema serî tije be, di van mijaran tevan de dema ku pêkhateyeke bi tendurist hat kirin, sê paş, du pêş hejmara vê kêm an jî zêdeye we çiqas serê xwe pê êşand? Li gorî taybetmendiyên herêman, li gorî kadroyên herêmî û yên cihên din, li gorî rewşa têrker û netêrker, di çend mehan de, çiqas çalakî û rêxistin dê bikaribin bikin an nekin, ma ev xal tev hatin plankirin, li ser hat fikirandin? Na! Hûnê bêjin, derfet nebû, rewşa hewayê gelek xirab bû, birçî man? Na! Eşkereye ku divê mirov qala rêveberiyeke kar nake bike. Bi azwerî, bi ruhekî mezin ê êrîşê, hevbeşiyeke mezin ev ne karên ku neyên kirinin.

Hûn bi xwe dibêjin; "Gel dixwaze rabe ser piyan em rê lê digirin", "kadroyên me dixwazin bikevin nav." Dibêjin bisekinin, hîn talîmat

nehatiye û didin sekinandin. Başe, wê dawiya vê ber bi kîderê ve biçe? Em bêjin em hatin îmhakirin, sînor qut bûn, başe hûnê li wir çi bikin? Hûnê binkevin. Heçko we derfet li wir ava kiriba, çarenûsa gel ji bin ve biguheriya, rewşa rêbertiyê saxlem bikira, gelek tiştên ku dijmin tengav dike bikira nedibû? Ji bo vê mirov hebûn, ji bo vê derfet jî hebûn, hem jî di asta herî bi hêz de. Lê bi feraseta memûrê xirab, bi feraseta ferzkirineke xirap, şerkeriyek xirap di van mijaran de jî hat raberkirin. Ya ku di bin vê de jî razayiye ji taktîkê sereke yê partiyê feraseta parastinê de eşkereye ku ketin heye. Di bin rûpoşê amadekariyê de, yan jî hinek kesên bi pirsgirêk jî tewambarkirin, nizanim tehrîka filan û bêvan provakasyonî sedem hat diyarkirin û hat xwestin ku rewşê bidin derbazkirin.

Mînak; çalakiya 15'ê Tebaxê çi da îspatkirin? Ma îspat nekir ku bi ruhê êrîşê dê pêşketinên gelek mezin bên destxistin? Di vê de çend kes hatin girtin? Ma di nava feraseta parastina pasîf de grûp îmha nebûn? Başe, kî berpirsyarê vê ye? Eşkereye ku rêveberî ye. Ji bo nihînî tevgerîn, her tim di tevgerê de bûn, ji bo pêkhateyeke guncaw bi dehan car me hişyarî dan. Çiqas hatin pêkanîn ev. Belê, di civînên navendê de ev dikarîn baş bên axaftin. Xwe sipardeyên vê ferasetê, wateya bîrdozî û polîtîk, pêwendiyên xwe bi paşeroja partiyê re û bi encamên xwe yên dema pêş re dikarîn baş bên nirxandin û di rapora ku diviya ji bo sekreteriya Partiyê re bihata pêşkêşkirin di vê astê de bûya. Nexwe na pir zêde ew gotinên xweşik û dûbarekirina wan eşkereyeke ku wê cihê raporekê negire.

Belê, divê bê qebûlkirin ku di nava feraseta parastineke pasîf de tê girtin û divê ev jî bi nebesiyên berpirsyarê grûban ve neyê girêdan û ravekirin. Yanî bi sistahiya yekîneyên grûbê ve, taybetmendiyên radestkar ve neyên girêdan û takmînkarî neyê çêkirin. Em pir baş dizanin grûba Orhan wan jî di nav de, ger hemûyan bi ruhê êrîşeke aktîf û bi rêveberiyek çalek ve bihatana meşandin dê wiha nebûya. Tenê ne çalakiya 15'ê Tebaxê, ji serî heta dawî dê ev sal wiha bibana. Dijmin jî li benda vê bû, gel jî li benda vê bû û kadroyên me jî li benda vê bûn. Eşkereye ku ya xwe dixe rewşa nenas rêveberî ye. Hûn çi dixwazin? Zilam bi salane di bin hemû cure dorpêçiya dijmin de dijî? Belê dijî. Gel li beramberî hemû curên îşkenceyê gelo li ber xwe dide? Li ber xwe dide. Ma zîndan li beramberî îşkenceyên metirsîdar xwe radigirin? Xwe radigirin. Ma tu bi qasî ku dikarî xwe tengav dikî? Belê dikî. Wê demê divê berdêla vê çi be? Êrîşe, hem jî ne bi derfetên herî ji rêzê, bi çekên ewqas pêşketî, bi vî kadroyî ve.

Tê bikevî nava polîtîkageriya herî saf, hewaya lîberalîzma gundîtî û tê wiha berê xwe bidî ravegeriyê; ev nabin. Tê di nava feraseta memûrekî de

bimînî, rave bikî; nabe! Erê, dibe ku divê mijarê de me hişyariyên pêwîst di dema xwe de nekiribin, lê kesekî di mewqîya fermandar de ye, yê di qada tevgerînê de ye yanî yê ku fermandarê şere bi rehetî dikare vana formule bike û heta rewşeke dikare encam jê bigirê ye. Di vê mijarê de em gelek nebesiyên di qadro de dipejirînin. Lê ev mînak; ma ne ev nebesîne ku li Ewrûpa, di çirava Lubnanê de dibin bela serê me? Heçko qadro hat sivikirin, ji aliyê fikrî û pratîkî ve gihişt asta gav avêtinê. Ger hinekî li wir li ser esasê ceribandin û ezmûnan bihata xebitandin, bi asanî kî, di kîjan yekîneyê de, dê bikaribe çiqas bixebite wê derxista holê. Ger hinekê eleqederî, venêrînek şidiyayî, çavdêriyek berfireh hebûya dê derxistiba holê ku her kes çi dike.

Heta niha jî di derbarê qadroyên me yên ku tên wir de yek hevok nivîs nîne, çine, kêr çi tên, çûn kîderê? Gelo li ser vê çil carî fikirîn heye, li ser vê bername heye? Ya rast kesên ku hatin gelek barkirîbûn. Piştre çi hat gortin; di asta wan de ketin heye, dema ku tên lez tên, lê dema ku li vir dimînin asta wan a siyasî û ruhê wan ê êrîşê dikeve. Başe, ev çavkaniya xwe ji kî digire. Berevajî, ma ewder ne cihê ku divê ruhê êrîşê tê de bê pêşxistine? Ma pirsgirêka sereke ya rêberê wir ne ev bû? Gelo ev pir zehmet bû? Na, çiya tam jî cihên ku divê ruhê êrîşê tê de rabe ser piya ye. Qadên ku divê tolgirtina pêtên ji dijmin tê de bilind bibine. Bê nîqaş ev bi vî rengiye. Başe ketina ast tê çi watê? Me mirovên herî bi pirsgirêk di destê wan de çek ji hemû cure şeran re amade kir li vir, lê me xwe westand, em 300 demjimêrî axivîn, 3000 demjimêrî axivîn, bi yê herî nebes re jî me ev kir. Wê demê rêveberî û rêbertiya bi qudret çiye? Eşkereye ku li vir divê tu hinekî li xwe bidî, tê hinekî xwe fireh bikî, hinekî xwe biwestînî.

Ez hema bêjim, evana tenê ayîdî yek kesî nînin, ev giştiye û heta 79'an jî diçe. Ji wê demê û vir ve yên ku radestkar jê re bûn zemîn, nebesiyên ku provakator xwest li ser bileyze, navenga destdayî ya polîtîk jê re ava kir, ya ku ji aliyê rêveberiya nebes ve jî nehat ferqkirin, tevdîr negirt, lê xwe ji nav feraseta parastina pasîf şênber kir û bê ku bikeve ferqa wê, hema bêja ya ku mohra xwe li hemû xebatan da, pêşketineke xeter bû. Hîn dema ku weke grûba yekem em derketin ya ku di kesayetiya Heqî de îfada xwe dît, di berxwedaniya Hîlwanê de, heta kêmek be jî di Sîwerekê de û hîn di gelek qadên din de îfadeya xwe didît ji wî ruhê me yê êrîşê qutbûn, paşvekêşan, pêvajoya amadekariyê bi şêwazê parastina pasîf destgirtin, bi şêwazê di bin bandora vê de mayînê derket holê. Û gelek heval wisa dizanin ku bi ravekirinê dê bê derbazkirin. Na, wê demê rewşa ku li wir tê jiyîn, rewşa parastina pasîfe.

Bi taktîka partiya me re, xalên ku hîn ji despêkê ve bi xeta êrîşê ya bîrdozî, polîtîk û leşkerî ya partiya me ve hevnegirt û rewşeke pir curî heye. Rêveberiyeke rûnişkandî, rêveberiya têrker bê ku başde bixe di feraset û pratîkê de bi derbaskirina vê re rû bi rû ye. Bi vî rengî ji bo hevaltiya kêm, bigihêje asta têrker, ez ê tişta ku para min dikeve hemû alîkariyê bidim. Bi yê herî lewaz re bi mehan mijûl bibim, bişînin çiqas kesên kêm û têrneker hene hemûyan ji min re bişînin ez dûbare perwerde bikim, dûbare bigihînim asta dikare bixebite. Dil dixwest ku hûn jî vê bikin. Eşkereye ku ev bên kirin dê şoreşgerî jî bê kirin.

Divê taktîkê PKK'ê di bingeha hemû xebatan de bê rûnişkandin. Bila windahî çêbin, bila grûp îmha bibin, tenê hûn bi vî awayî tevbigerin. Di nav feraseta parastina pasîf de wê bi mehan grûbek ji Başûr dernekeve, derkeve jî wê tenê li ser esasê parastina xwe tevbigere; ev binketine. Şoreşgeriya nebes ji xwe çil caran binkeftinê şayanî xwe dibîne. Ev di asta grûban de wiha ye, her ku diçe di asta rêveberiyê de jî wiha lê tê. Ev jî tê wateya ku yê herî zêde li dijberî nebesiyan derdikevin bi xwe her ku diçe dikeve asta nebesiyê. Rêveberiya li gorî demê û di cîh de, plansazîkirin û ji bo rêveberiyê xaleke devjênegere. Tê karan her tim başde dahfdî, di dema xwe de sewq nekî, rêve nebî, her tim bêjî piştre; ev xirabiya herî mezin a bi şoreşê bê kirine. Di vê mijarê de gotina min ev e; ne ku em nefêmkerin. Kî ewqas mafê başdexistinê ji xwe re dinase. Di demên pêş de dibe ku her tişt biqede. Ne di salekê de, ger di mehekê de tu hemû derfetan seferber nekî, tê xiyanetê li şoreşê bikî. Lenîn qala demjimêrekê dike, dibêje em berê bikin dê wiha, paşê bikin dê wiha bibe. Ev ji bo me jî derbazdare. Demeke bi qasî salekê weke ku dikare rê li ber destxistina nirxên mezin veke, ger neyê nirxandin dê rê li ber windakirina her tiştî jî veke. Wê demê li ser navê pêşengtiya partiyê bi sebreke çawa tê raberkirin, rehetiyeke çawa, çawa helwestekî ewqas lîberal dikarê bê raberkirin?

Divê neyê jibîrkirin, ji bo yek demjimêrî îdarekirina kadroyekî em li vir çiqas ked didin? Ji bo ku em yekî bigihînin sînor, ji bo yekî bigihînin çiya çi dikin. Hûn çawa dikarin salekê li wir bisekinînin, nebes birêve bibin, bê pîlan û bername bixebitînin? Hûn wê cesaret û curetê ji kîderê digirin? Dê bê gotin ku; "zehmetiyên şoreşa me hene, yê ku bê vir wê fêm bike." Na, ez îda dikim, jiyana herî bi qehr ger devji berxwedaniyê nehatibe berdan, jiyana penaberî û bêgane ye. Jiyana herî bi esil; jiyana di lûtkeyên çiyayan de ye, jiyana herî çalakger û tolgirtinê wire.

Ez bi qasî ku ji rastiya me bêgane bim nezan nînim, Ger yên ku ez dibêjim nerastin, ka raporên yekeyan, ka raporên Lolanê, ka raporên

Zaxoyê? Eşkereye ku nînin, tenê xêzkirin hene. Vaye ev rewş rastiya rêveberiyê diselmîne. Ger dê bê gotin nekir, nebûn; ev gelek xirabe! Bike, tê bidî kirin, kes li dijberî vê dernakeve, hêza we heye, otorîta we heye. Eşkere ye divê hûn bêjin, me nekir, neda kirin, rista xwe ya rêveberiyê û rêbertiyê neleyîst.

Hêjî di dema xwe de rapor nenivîsandin bûye qûralek. Karê sê rojan bi sê mehan pêk tînin. Mînakên vê yên şênber hene; ji hevalekî re ji bo rapor nivîsînê we çar meh demê jê re nasî. We çar meh dem ji kîderê derxist, hûn çawa ewqas dem jê re dinasin, hûn li ser navê kê vana dikin? Yên ku ji du salan heta niha rapor nenivîsandine hene. Çawa nanivîse? Dê binivîse, hûn çawa ji vê re tehamûl dikin? Divê neyê tehamûlkirin, ji bo vê her tişt bê kirin. Grûp di rewşa parastinê de ne; ferman bide, yên ku fermana te pêk ne anîn ceza bike. Di sê mehan de ewqas gund rabin ser pîyan, dê ewqas herêm bibin herêmên sor, û fermana xwe bide, bi sedan mîlîtanên ku ev ê çawa bê kirin raber bikin hene.

Diyare ku, bi rêbazên bê Rêbertî, bê rêxistinî ya kûr a ku di nava gelê Kurdistanê de heye, dê encam neyê girtin, şoreş neyê pêşxistin. Lê gelek xirabe ku ev neyê zanîn. Lê, divê ev bûyera ku em jê re dibêjin Rêbertî, rêveberî pêwîstiya wê bê cîbicîkirin. PKK vê pir baş dizane, di nava hemû xebatên PKK'ê de çawaniya vê pir zelale. Lê bi henekî karan derbaz nekin, bi rûyê xwe tirşkirinê hûnê nekarin me bitirsînin. Em ji girêdana xwe ya bi xeta partiyê, bi xeta wê ya stratejîk û taktîkî ve çiqas girêdayîne ti gûmanê nakin, lê em dibêjin hûn pratîsyenên ecemîne, polîtîkagerên tengin. Hûn dibin dar, lê fêkî nadin. Hûn bi awayekî metirsîdar ked didin, lê berhemên we nîne. Çawa ku proleter dixebite û ji patron re diçe, li gel me naçe ji patron re jî, vala diçe. Dilê we bi we naşewite, hûn li beramberî jiyana xwe înkarê dijîn, hûn nirxên jiyanî nafirînin, hûn li ber jiyana xwe nakevin, dijmin rehet dikin, em vana dibêjin.

Em jibîr nekin dijmin jî li benda şoreşeke qet nikare bixe bin venerînê ji me hêvî dikir, hêjî hêvî dike. Gel jî li benda vê ye, dost jî li bendê ye. Başe ma hûn şerm nakin bi rêveberiyeke xirab, ecemî ber bi encameke xirab ve biçin? Girêdana bi gel, şehîdên me yên berxwedaniyê dikare ev be? Milîtanên me vê rewşê çawa şayanî xwe dibînin? Milîtanek çawa pêdigihê? Dayikek zarokê xwe çawa pêdigihîne? Di Kurdistanê de ev bi kîjan zorî û zehmetiyan ve bi kîjan hêviyan pêk tê? Gelo pêşengên me yên partiyê van dizanin? Milîtanên me bi vê difikirin? Keda ku di ber wan de hatiye dayîn, çil caran ji bo ku em wan bidin jiyankirin baldariya me raber kiriye, gelo ew ji bo xwe raber dikin? Û jiyana wan ji vê re nebersive, ma ev ne êş e?

Hûn bi asanî nehatin meydanê, em bi asanî we nadin jiyîn, bi asanî çek nadin destê we, di vir de namûs heye, anûr heye, her tişt heye. Hûnê çawa nebes nêz bibin, hûnê çawa dil û zimanê xwe sist bihêlin, çawa dibe ku her tişt mîna fîşekekê rasterast ber bi hedefa xwe ve naçe, çawa bi ruhê êrîşê bi ser her tiştî de naçe? Çima, ji bo çi?

Wê demê em weke pêşenga bin, wê demê em xwe bigihînin pêşengtiya PKK'ê, wê demê em bizanin ev ne bêderfete. Berevajî hûn di nav mercên herî destdayî de ne, her tişt me wiha amade dike. Mirovên li derveyî welat di nav wan mercên mirov jê şerm dike de wiha dixebitin, me li vir ji bo van; "roja reş mirov ji yarê diya xwe re dibêje bavo." Ji bo vê me hemû curên heqareta qebûl kirin; ji bo şeref û anûra we. Çima hûnê vê karneyînin? Li vir yên herî şanaz divê ku were cih, evder dilê gelê Kurdistanê ye. Evder Kabeya Kurdistanê, mîrac, rewşa bilindbûnê, sala hilkişînê ye.

Bi van hemû tiştên ku me gotin em nedixwazin hevalan ji rêzê tawanbar bikin, ne bixin rewşeke zehmet, ne jî me xwest divê mijarê de em pesnê wan bidin. Tenê me xwest dîroka gelê Kurdistanê, rastiya wê ya civakî, li gorî rewşa dost û dijminên wî rista ku divê Rêbertî xwe bigihînê xalên devjêneger dûbare be jî em bînin ziman. Pêgiştina vê gelek zahmet nîne, nemaze ji bo ji niha û şûn ve, nemaze di wan qadên ku em tê de ne qet ne zehmete. Ked, cesaret û fedekariya ku tê serfkirin dema em bînin berçav rewşekî ku ji aliyê we ve jî neyê qebûlkirine. Hûnê bi xwe bêjin em di rewşekî neyên qebûlkirin de ne û hûnê xwe weke fîşekekê lê bikin, encax hûn bi vî rengî bimeşînin. Ev rewşa layiqî we û me hemûya ye. Ma me soz neda ji bo ku em bibin yekîneyeke ecêb êrîş dike, yekîneyeke di nava mercên herî zehmet de melevanî dike, yekîneyeke misoger dizane serkeve? Ma me ev di bîrdozî û siyaseta xwe de madî nekir? Ma ev ne sonda me ye? Wê demê di serî de çêkera navendî, tevahî berpirsyarên yekîneyan, nûnerên herî ji rêzê hûn çi dikin? Hûnê çawa gelê Kurdistanê ji cîhana zehmetiyan, Kurdistanê ji cîhana tarîtiyan rizgar bikin? Sonda ku we daye hûnê çawa pêk bînin?

Belê, encama ku derdikeve; di serî de ji welidîna PKK'ê re, li gorî îfadeya wê ya madî guncaw siyaset, di roja me de bi derfetên têqûz, êrîşên taktîkî yên bi milîtanan bê meşandin, em dibêjin em derbazî rêze çalakiyên kesayetiya milîtan, rêxistinên milîtanî û çalakiyên milîtanî bibin. Em dibêjin bi taktîkê rast ê partiyê şer bikin, bi taktîkê şer jî êrîş bikin. Divê qonaxê de em dizanin şer bi giştî di pêvajoya parastina stratejîk de ye, ma ne dîyare ku divê parastina stratejîk jî bi taktîkê ecêb êrîşek pêk were? Ger

wiha ye, wê demê divê bi qasî ji aliyê ruhî ve, di şêwe de jî hemû alîgir, sempatîzan û milîtanên me hem ji aliyê hejmar ve bên birêxistinkirin, hem jî ji çalakiyê re bên seferberkirin. Mane divê bi berçavgirtinek xurt ve derbasî êrîşê bên kirin? Gel ne di nav bendewariyeke ew qas kûr de ye? Ewqas keda me vê neçar nake?

Bi rastî îro em di rewşa ku herî baş dikarin çeka partiyê bikar bînin de ne û em dikarin kar jî bînin. Di vê mijarê de gûmaneke me ya biçûk jî nîne. Rewş gelek guncavin, mercên derve û hundirîn, pêşketinên objektîf û sûbjektîf ji hed zêdetir alîgirê me ne. Hûn ji hedê xwe zêdetir ezmûn û tecrûbeyan dijîn û hîn jî dijîn. Ez hema vê jî bêjim; di van demên dawî de weke ku em hinekî jî jê ditirsin, madem em ewqas di dema parastinê de man, vê carê jî ez naxwazim qala êrîşên pele, bê pîlan bikim, ez nabêjim bila vana hema derkevin. Bi kurtî ji rêderketinên rastgir pêwîst nake ber bi yê çepgir ve biçe. Berevajî, di cewher û şêwe de çeka xwe ya taktîkî, taktîkê xwe yê partiyê, di êrîşa çalakiyên bîrdozî û polîtîk de bi bandor bikar bînin. Ev çî ye? Rêxistinkirina çêkerê ye, bi şêwazê herî guncaw çêker reşandine, bi awayekî herî berhemdar xebitîne.

Tiştên ku ji aliyê hemû berpirsyarên partiyê ve bên kirin, pêdiviya xwe bi agahiyên ewqas dahiyane nabîne. Berevajî rast fêmkirina rêbazê me yê şer, rêbazê têkoşînê, rêbazê xebatê rast fêm kirin û rast pêk anîn têr dike. Yên şer dikin pirin, bi qasî hûn dixwazin dikarin gundiyan derxin, gelek rewşenbîrên me hene, niha em dikarin hîn leztir van bikişînin nav refan. Rêberên we jî çêdibin, her roj yên nû derdikevin, hinek perwerde û bi hinek ceribandinan dê derfet bide ku em yê herî bi hêz ji nav wan derxînin. Ev ne karên ne gengaz, neyê kirinin. Her yekîneyeke me ya biçûk a propagandayê di demeke kurt de dikare xwe dabeşî pêncan bike. Navenda me ya partiyê, bi ceribandin û ezmûnan ve dikare li derdora xwe asteke rêveberiyê ya bi hêz ava bike. Bê hejmar endam hene di vê mijarê de, hêjî yên ku her kêlî ji mirinê re amadene, mîna fîşekê ye em qadroyên wiha dişînin. Nexweşan bişînin gel me, çiyê we kême bêjin, lê li beramberî vê jî şerekî bi bandor derxin. Weke din ez tiştekî din jî bêjim; ger hûn baş şer nakin, di erk de nebesin hûn dikarin ji erkê efûya xwe bixwazin. Tonek milîtanên me hene, erkên xwe dewr bikin. Ger bar girane hevalên vî barî parve bikin hene. Hinekî bidin wan. Yetkiyê bidin destê wan wê bigirin, jin-zilam wê vê qebûl bikin. Bê ku hûn bitirsin bidin, çima hûn xwe tengav dikin?

Di vê mijarê de ez dixwazim qala tecrûbeyeke Ewrûpa bikim; dixwazim qala têkoşîna hevalên rêveber ê wir bikim. Di asta herî jor de yetkî hat dayîn, lê nekarîn bi provakarorekî. Bi hezaran girseya me radibe ser piyan,

ne gotin; “bimeşin.” Hema bêje yetkî di kulmên xwe de hepis kirine û nemeşiyan. Hema bêje ya derket ne hêmana meşandinê, ya nemeşandinê derket holê. Rewşa ku li welat jî tê jiyîn hinekî dişibe vê. Yetkî di asta herî jor de hatiye dayîn, derfet hatiye dayîn bi rêbazê herî pêşketî, lê bikar nayînin. Ecêb, şoreşgereke demdirêj dikare wiha bidomîne. Carekê dê yetkî, berpirsyarî û erkên xwe belav bikî, pêl bi pêl tê bimeşîne, çi dikare bê kirin heta dawî tê tengav bike, bi awayekî hevbeş tê hemû kesî tevlî berpirsyariyê bikî.

Em li vir hezaran hemwelatiyan dixin nav berpirsyariyê. Her roj em perpirsyariyê li ser tonek mirov ferz dikin, tonek pêwendî pêşkêş dikin; ma Bolşevîzm ne ev e? Lenîn; qala tevlîbûna dizan, berîkbiran, tevînebûna alîgirên Japon a serhildanê dike. Lê hûn nikarin agahiyekê bigirin û bişînin. Bê hejmar bazirgan tên, tonek gel heye, ma yek kes jî nikare bi dûv şopa bûyeran bikeve, hûn nikarin telefonekê bidin? Dîtina van gelek zehmete? Ev ecemitiyek dilê mirov pê bişewitê ye. Di bin navê rêxistinkirinê de gelek pîlan û pêşnûme tên nîqaşkirin, lê pratîk nîne. Tonek mirov berpirsyariyê dixwazin, dewr kirina erkê nîne, ji bo derdora wî tonek yetkî hatiye dayîn, belavkirina yek yetkiyê nîne. Başe wê qadro çawa bê pêgihandin, çawa şer bike? Bi her roj dûbarekirina propagandayekê? Eşkereye ku bê xeberî ji pratîka şoreşgerî, di pratîzekirina pratîka şoreşgerî de bêrayî, diltirsî heye, lê şoreş wisa çênabe. Lenîn vê wisa dike? Vekin, li kesên herî ji rêzê yê taze pêdigihê binêrin, komîteya navendî jî di nav de komek erk dide. Serhildanan çawa pêk tîne, çawa rê li ber serhildanên gelek gundiyan vedike? Hûn heta niha jî ji serhildanê ditirsin. Yetkiyên we yên ku dikarin çil serhildana derxin nîne. Bolşevîkî çi dikin, her tim qala serhildanên bi pîlan dikin, lê ji ber ku gelek serhildanên bê nîzam derketin ev nayê astengkirin. Pesnê wê didin, zanînê pêş dixin, plansaz dikin û vediguherînin serhildaneke giştî. Eşkereye ku di gel me de her tişt di rewşa serhildanê de ye, gerîla di nav serhildanê de ye, serhildan di nava gêrîla de ye. Ma em ê ewqas kîtabî bimana, ewqas ji cewherê jiyanê dûr bimana; gelo sofîstî ne ev e?

Di rêbazê xwe yê xebatê de heta niha ma em ji bona hejmareke zêde mirov bixin nav kar ne xebitîn, hêjî her roj naxin nav xebatê? Başe, hûn çi dikin? Hûn bi du kesan re jî mijûl nabin. Çima? Ev hepiskrina yetkiyê ye û feraseteke xetere. Em yek-du kêmasî kirinê netirsin, bila taktîk rast be, hinekî şer rast be, hema bila kêmasiyan bikin. Êrîş şere, ji vê jî zirar nayê. Ferman bide, erkên şênber bixe pêşiya wan, ji bo hemû gundên Kurdistanê pîlanekî xêz bike, wê di çiqas dem de, di çiqas çalakî de bikevin tevgerê

texmîn bike. Ma Rêbertî ne ev e? Heye di vê mijarê de tiştek, nîqaşek, pîlanek, raporek?

Wê demê divê kar çawa bê fêmkirin di nav PKK' de tişta tê zanîne. Xwe nekin sedemê giran ên ji rêderketinên rastgir, pirtûkwarî nemînin, karan bi propaganda îdare nekin. Pirtûk û propaganda pêwîste, lê şûna karên ferzker nagire. Me çil carî qala kêmasiyekê kir, hinek heval di teoriyê de karan çareser dikin bi vê jî wiha dizanin ku di pratîkê de jî çareser kirine. Teorî tenê rê nîşandere, em ji bîr nekin rênîşandare. Ti taybetmendiyeke wê ya din nîne. Lê prtatîk bi serê xwe bûyere. Lingê mirove, meşa mirove, qiyamet rakirina mirovane. Ger ji dehan yek teorî ye, ji dehan neh jî pratîke. Kî yê îbadet ji agahiyên pirtûkan re bike, sofî ne û sofî jî cîhanê naguherînin. Lê pratîk berhemênere, dema ku bi teoriyê re yek bû û ji rêderketin çêbû hat sererastkirin, her tiştê dê bigre û bimeşe. Wê demê xwe şûnde dayîn, bê berhemî heye û ev jî çavkaniya xwe ji pirtûkbûnê digire. Li ser propaganda çekdarî, propagandayeke zêde, Gîap zêde xwendin heye, dûbarekirin heye; lê çend çalakî hene, çend ferman hene?

Eşkereye ku yekeyên di nava parastina tevgerînê de bûn winda nekirin, yekeyên di nav parastina pasîf de winda kirin, yekeyên bi qasî tê xwestin pêkhateyên wan nebû, weke tê xwestin bernama wan nebû winda kirin. Gelo cî bi cî kirina van bêderfet bû. Dibe ku ne bêderfet bû. Wê demê em karan rast bigirin dest, mînak kî hejmara yekeyan dadixe du kesan, bi mehan di şikeftekê de kî kê dihêle? Ger em rêveberên baş bin, ti kes nikare cesaretî vê bike. Pênc kesan bidin, yekî bikim endamê îstîxbaratê, yekî bikim fermandar, yekî bikim siyasetmedar, venerîn bikim, bang bikim, qîr bikim, bimeşînim. Vaye ev rêveberiya bi qudrete, têrkere. Ji ber ku nehatiye pêkanîn çi ma tê fîlan û bêvan tawanbar bikî? Hûn ê bêjin me "neda kirin" sûc avêtina ser yên din nîne. Ez li beramberî karê PKK'ê çawa xwe berpirsyar dibînim. Ger ev PKK bin jî kevne û pêdar (şaha kalkma) ez berpirsyarim, her tiştî qebûl dikim, berpirsyartiya we hemûyan qebûl dikim û ez ê heta dawî jî di vê ferasetê de bimînim. Ez ê li tawanbarên erzan negerim. Lê ez îro li ser navê PKK'ê bihêz daxivim. Li ser navê gelê Kurdistanê bi hêz daxivim û îda dikim min kar pêş xistine. Ya para min dikeve dikim, libera dibim li beramberî hinekan ber xwe didim, pere dest dixim, fîşekan dest dixim û hemûyan jî di nava mercên herî zahmet de pêk tînim. Belê, dibe ku Rêbertiya Partiyekê bi giştî wiha neke, lê ez dikim.

Mirovekî xilasbûyî weke endamekî şerker radestî we dikim, dîsa gelekî hêviya xwe bi rêbertiyê ve girê daye dixim bin fermana we. Ev tiştek ku

biçûk neyên ditinin. Ji ber ku ez van dikim êş nakişînim, nabêjim “zehmetî dikêşim.” Gazinc nakim, bi zewq, serbilindî, bi dilxweşî dikim. Rojane kêmî 15 demjimêran propaganda nakim. Ev 15 sale van dikim û ez ê bikim jî. Siyaseta êrîşa serbixwe ya Partiyê her roj, her kêlî dimeşînim. Dudiliya min tenê li beramberî pêşketinê bê şansî ye, li beramberî ketîbûna hevalan a ketîbûnê ye, li beramberî girêka xirab a ku ji aliyê yekeyan ve tê avakirine.

Gumana min ji vê nîne ku hûn jî dixwazin wiha bijîn. Gumana min ji wê nîne ku hûn jî vê awat dikin, ji bo vê jî tijîne û di serde diçin. Lê xwe ji rêbazên ecemî û zarokatî biparêzin, ev şayanî we nîne. Hûn ne çalakin, kar nameşînin, hema bêje hûn kesayetiya gundîtî ya ne çalakî sedên sal didomînin. Hûn di van refên partiyê de Rêbertî ji rêzê digirin dest, ne bi qudretin, ne otorîterin, hûn mîna cendirmeyên Mistefa Kemal, gundiyên serî ditewînin dest digirin. Na, Na! Têkoşîna PKK’ê di vê mijarê de navbange, şanaze, bi anûre û ev jî ne tiştekî neyê kirine; erkeke bi şeref, anûr û zewqeke mezin bê pêkanîne. Hejmareke zêde kadroyên ku vê pêk bînin hene, mîlîtan hene, bê ku tiştek hebe li ser navê Kurdistanê me ev hemû pêşkêşî we kir, wê demê nirxê vê dilop bi dilop mîna xwîna xwe, mîna henaseya ku hûn digirin qîmeta wê bizanin û bi berhem bikin. Rêyeke vê ya din nîne. Û hûn hemû jî, ji navendê bigirin heta milîtanekî ji rêzê hûn ê wiha li bûyeran, welat û gel binêrin. Yanê dê bê zevtkirin, fetihkirin, êrîşkirin; her tiştê ku bi darê zorê ji dest me hatiye girtin, dûbare dê bi darê zorê bê qezenckirin. Hûn ê êrîş bikin, bigirin, kom bikin, ji bo ku hîn bi hêztir lê bidin, hûn jî bi hêz bibin. Ma PKK’yî bûn ne ev e, di zanîn û çalakiyê de ne ev e? Bi xwe xistina nav zehmetiyê nekin, nafirînin, bi darê zorê şerkirin û serhildanê ferz nekin? Erê, rewşa li gel we çî ye? Ne bi zorê ferzkirin, gelek tişt heta ku distewê negihandina encam, bûyîna dar, lê fêkî nedan, bûyîna şikofe, mîna gulekê vebûn. Ev ne şayanî me ye, nabe!

Belê, bi taybet ji hevalên ku li ser navê rêveberiyê tevdigerin dibêjim; demjimêrekê derengmayîna we, ji hezaran re dibe mal û ev jî rê li ber windahiyan vedike. Paşeroja xwe bigirin dest, hûn ê wê demê ji ber rêveberiya xwe ya nebes mirov xistine çi rewşê fêm bikin. Ma dilê mîlyonan ev e. Wê demê hûn ê bibin dilê wan, hûnê zanîna mîlyonan di serê xwe de bigirin û hûnê xwe bispêrin vê û jiyan bikin. Ev jî kesayeta milîtanî, jiyana milîtaniyê derdixe holê. Divê hemû wisa bin, pêl bi pêl heta gel dê wisa belav bibe. Dema ku bi vî rengî bû kî dikare azweriya gelê me, berxwedanî û çalakiya wî rawestîne? Kîjan astengî dikare vê bêderfet bike? Ma bi darê zorê her tişt nayê girtin? Ger çek pêwîst be, ma em nikarin vê bistînin, ma bi çalakiyeke ji rêzê ev çawa ye derneketiye holê? Ma ne di

holê de ye ku gundî çawa radibin ser piyan? Wê demê em çima nameşin, wê demê em çima nakevin êrîşê. Başe, em li benda çawa bikevin qebrê ne? Ji gel û partiyê re bûyîna mal, me weke bingehê exlaqê xwe qebûl nekir? Sonda me ne ev e? Yekane wateya jiyana me ne ev e? Ev nehatin nivîsandin, mînakên wê nehatin dayîn?

Belê, dûbare dibêjim; serhildan li ber derî ye. Divê ku ev pirtûkwarî neyê fêmkirin. Erê, ji gêrîla serhildan, ji serhildanê jî gêrîla derdikeve û bilez vediguherin hev, her tişt li gel me di nav hev de ye. Di Kurdistanê de bi mehan, bi salan çekdar bimîne piştre jî bêje; "hinekê gêrîla û paşê serhildan" tiştekî wiha nîne. Weke Partî û gel di demên despêkê de, bi şêweya komên biçûk, hem propaganda çekdarî, hem gêrîla, hem jî em serhildanê dijîn. Çavekî baldar, wê hema vê rastiya me bibîne. Wê demê bi sedan, hezaran gund dixwazin rabin ser piyan, lê hûn ranakin û dibêjin; "bisekine" ev hişmendî dê biecicqe, linav biçe. Kî dixwaze rabe hûn ê ber bi çalakiya herî mezin ve bibin. Hûn ê nebêjin; "bisekinin" Cihê ku lê tê gotin bisekine pasîvîzm heye, oportonîzm heye. Di Lenîn de tiştên wiha nîne. Dibêje; "çiqas dikare rabe ser piyan, bila rabe" û dîsa çiqas dikarin "çek rakin, bila rakin" Tenê bila taktîkê partiyê rast be, yan din Plehanovcîti, Menşevîcîtî ye.

Ger yê dixwaze rabe ser piyan gundiye teşwîq bikin, ajîte bikin, bila rabe ser piyan. Ger rabûna ser piyan a mezin xetere, serhildanên biçûk bidin kirin, serhildanê biçûk guncaw nîne, bi gêrîla bidin kirin, vaye di serhildanê de gêrîla wiha derdikeve holê. Qey bê lêkolînkirin dê şêwaza rast neyê dîtin, şêwaza şer pêş nekeve? Bila gundî rabin ser piyan, gun bi gund serî hildin, ev dikare bibe şêwazekî şer? Dikare bibe. Di Kurdistanê de ev gelek derdikevin pêşberî me. Herêm bi herêm dikarin rabin ser piyan, wisa nebû? Sîwerek, Hîlwan nizanim Êlih wiha pêş neket û ji niha şûn de jî wê wiha pêş nekeve?

Despêkê çend gund, çend herêm, ma wisa pêş nakeve şoreşa Kurdistanê? Pêş dikeve. Wê demê ev hişmendiya sofîstîk çiye, pirtûkwarî çiye, kê vana bi berhem anî. Milîtan yek bi yek ranabin ser piyan, yek bi yek berxwedaniya herî xweşik dernaxin holê? Derdixin. Wê demê ewqas dayîna sekinandin çima? Şêwazê ji vê rastir, bi hêztir heye? Na! Dibe ku şêwaza herî bi berhem, di nav ceribandina pratîkî û xebatê de derkeve holê. Mesela deh gundî ji du kesên zana re bê dewrkirin ne guncawe? Dibe ku guncaw be. Li gorî cih û demê hûn ê biceribînin. Mînak, ji herêmekê re pênc kadroyên baş tê dayîn, na du heban bide, grûbê bi gundiyan zêde bike. Lê hûnê vana li gor cih tayîn bikin. Berpirsyarekî, alîgirekî hûn ê tayîn

bikin. Dikarin çend çalakiyan bikin, hûn ê li potansiyel binêrin. Deh heb, pênc heb, li gorî wê hûn ê bername bidin, ew ê jî li gorî wê bixebitin.

Bi awayekî herî baş dabeşkirina hêza me çiye? Yê çekdar û bê çek çawa be? hema bêjim; grûbeke çar kesî me rêkir Çewlikê, li erebê sûwar bûne yan jî ji wan re hatiye gotin biçin bajêr zanyarî kom bikin, zilam hatin girtin û dê bên îmhakirin. Bê eleqeyî, talîmata rast nedayîn ji vê re tê gotin. Hûn nikarin bêjin em pê nefikirîn, me nekarî jî; hûn ê bifikirin, şoreşgerî ev e. Li beramberî milîtanan, kesayetiyan berpirsyarî ev e. Mîna goşt û nenûkê bi hev ve girêdan ji vê re tê gotin. Çima fikirîn, pêdiviya fikrandina rast ev e. Zimanê ku bêje biçin bikin, çima hûn nizanin wê bê qutkirin. Me çar sal beriya niha got; herêmên weke, Bedlîs, Colemêrg, Wan û Sêrtê herêmên serhildanê ne. Her kêlî agahî tên. “gel dixwaze rabe ser piyan, bi hezaran mahkûm hene” û hwd. Hêjî bi milîtanên me re tevgerîn nîne. Hişmendiya wî/ê, dema wê nehatiye. Ev hişmendiya mirinê ye. Tiştê wiha nabe, wê demê bi çarenûsa gel dê bê leyîstin. Berevajî bi qasî ku te derfet dît tê tevlî bike, yek ji wan me yeke biçûk raber bike, tê wî rake ser piyan. Hûnê nebêjin, pîlan, bername, gêrîla û serhildanê ranewestînin. Ger tu di çalakî û leşkeriyê de ji xwe bawerî, ev ê çawa veguherin hevdû di cih û demê de tesbît bikî.

Vaye fermandarê şer, pisporê leşkerî wiha derdikeve holê. Ti pêwendiya vê bi nêzîkbûna pirtûkwarî ve heye, bi hişmendiya “ bisekine, bila bistewê” ve heye? Na, şoreş wisa pêş nakeve, hinek hevalên me bi nexweşiya xirap a pirtûkwarinê ketine. Bihêlin bila bi şêwazên cuda bejin bavêje. Gotinên Lenîn ên di vê mijarê de diyarin. Ew bi xwe jî nabêje filan bêvan şêwaz. Çalakgeriya bê dawî pêşniyar dike. Me her tim mînak ji Heqî da, me got divê çalakgerîya bêdawî herkes pêş bixe. Di vê mijarê de tevahiya navenda Partiyê di pêşxistina çalakiya bê dawî û pêkanîna wê de dikare xwe erkdar û yetkîlî hîs bike. Taktîkê Partiyê dîyare, xet jî diyare, li ser esasê girêdaneke zêde bi vê ve, divê hemû curên çalakî û rêxistinê bike. Tevahiya milîtanên Partiyê, pêdiviyên vê xetê divê li gorî hêza xwe rêxistin bikin, derbazî çalakiyê bikin û her tim di nava êrîşê de bin. Tevgerîn, veşirtîbûn, erê qûralên vê yên tên zanîn hene. Bi şertê pêkanîna van qûralan, ji serî heta dawî di herêmekê de dikarin van bikin. Tenê ne têkoşîna çekdarî, rêxistinên medenî jî dikarin vê bikin. Em ji şivanekî ji rêzê bigirin heta propagandevanek rewşenbîr, bila her kes vî karî bike, derdor bê avakirin, gund xwe bigihînin komîteyan, bajar bên rêxistinkirin, hejar û dewlemendê wê di nava vê de be, bila axayê wî jî hebe, em di qonaxa eniyê de ne, kî çiqas dikare bike bila bike, teşwîq bikin, bangewazî bikin. Şoreşgeriya

plansaz ji bo jor pêwîste, di taban de jî herî kêm ji dehan neh bila wiha ji ber xwe ve bişkivin, biteqin, erka Rêbertî ne astengkrina vê ye, araste diyarkirine. Bila nebes bin, dibe ku kesên bi gûman bin jî, bila komek mirov tevlî bibin, tu piştre dikare arasteyên wan diyar bikî. Ax ya rebbî bûyîna sofîstê vê şoreşê çiqas xirabe.! Bila xwepêşandanan bikin, jin û zarok tevlî bibin, ne şerte ku şoreşgeriyeke proleter ya tam bikin. Jixwe ev li Kurdistanê ne gengaze. Tonek amûrên agahî girtinê hene, pir zêde me got ku gundê ku em nikarin bi telefonê pêwendî pê re daynin nîne, yan jî bila grûbek bi van re mijûl bibe, wê çi bibe, ma qiyametê rabe, wê cihê we bidin dest? Hûn ji bo torbeyekî ard rica ji KDP'ê dikin, ji bo lojîstîkê, yekîneya xwe pêdiviyan ava bike, wê bi tonan xwedî bike yaw. Bixwazin em tonek xwarin ji vir ji we re bişînin ger hûn birçîne, êdî eybe.

Em birêxistin bikin, gelê me pir rêxistiniyê dixwaze, berxwedaniyê pir dixwaze, em li ber xwe bidin. Pirsgirêka teşe ne bûyerek ewqasî zehmete. Plansazî bûyereke zehmet nîne. Bi kîjan yekeyê tê di şeş mehan de çi bide kirin, bipîve, biwezîne, bila yê din jî ew bi xwe temam bike. Rê li pêşiyê negire, bila hemû tiştî bike, ferman bidê, bêje, "bikin" xetên giştî xêz bike, venerîn bike, piştre wê bêkêmasî bike. Derfet ji dest naçin, berevajî tiştên nû ji bo pîlanên baş derbazkirina jiyanê şerte û tenê bi pîlanên ser giran ve kar nayê meşandin. Wê demê ez dizanim wê pîlanên 85'an taktîkê Partiya me bi awayekî serkeftî bên pêkanîn, ferman bide, divê mijarê de eniyê ragihîne, kombûnên ezmûnan heye, amadekarî heye, xwesteka gel heye, hevî heye. Di bingeh de yên diyarker ev in. Bi qasî tê xwestin tesîsat heye, siyasetek rast jî heye. Vana esasin, bi qasî ku wê çalakiya me bilind bikin, bi qasî ku me ber bi encamên em dixwazin ve bibin jî dewlemendin. Hinek ceribandinên biçûk hatin jiyîn, ev bi qasî gengaz hatin îspatkirin û mafdariya me di hêviyan de derxist holê.

Wê demê ya ku divê bê kirin tevahî yekeyên Partiyê ji navendê heta taban, ji eniya baş heta hundurê eniyê, ji bejahî heta bajar, ji deştê heta çiya divê ku hemû di nava ruhekî êrîşê de bin. Em ji serhildanan bigirin, heta linavbirinên takekesî, ji serdegirtina bajaran bigirin heta serhildana gundan, divê çalakiyên hemwext ên cur bi cur bên karanîn. Erê em ji şêwazên parastina çalak bigirin, ew jî ne yên ku neyên karanînin, di cih de ew ê jî bên karanîn heta êrîşên berfireh ên çalak, hemû di nav hev de, lê di bingeh de li ser esasê karanîna taktîkê Partiyê û di nav êrîşan de li gorî serdema ku em tê de derbaz dibin bi awayekî guncaw bê karanîn. Hemû tiştî rakin ser piyan, bila qadroyê me behremendiya xwe ya bêdawî li vir raxe. Behremendiya xwe ya rêxistinî, behremendiya xwe ya venerînê û

behremendiya xwe ya bi zorê rakirina ser piyan bila nîşan bide. Bila ferman bide, yên ku fermana wî/ê pêk neanî jî pêlê bikê û derbaz be. Hîn çi bike? Ger pere pêwîste bila xesp bike, çek pêwîste, bila ji ser dijmin rake, vaye ferman, qadro û enî.

Em dixwazin şoreşê bikin an na? Ger ji xwesteka me gûman nîne, wê demê ehrîman lingên we girê daye, yan jî munecîma me girê daye. Tiştên wisa nînin. Wê demê ferdê ku di roja me de gelek diyardeyên kamilbûnê nîşan dane, di rewşa xwe bêtir kamilkirinê de, wê vê bi şêwazê herî bi hêz bijî û wê weke milîtanê herî kamilbûyî yê PKK'ê şer bike.

Em weke Rêbertiya Partiyê, ya ku para me dikeve weke ku heta niha hatiye kirin, ji niha û şûnve jî texsîr nekin, em ê baş rêve bibin. Bi xeteke bîrdozî ya bê tawîz, bi hostayane nermiyeke polîtîk wê bê meşandin. Em ê kombûnên qadroyekî bêhempa bafirînin, hêviya gelê xwe her tim zindî bigirin, dilop bi dilop xwîna xwe, henase bi henase bêhna xwe ji hemû aliyan ve em ê ji kar re vekin. Di serî de jî em ê vê bikin. Û ji yê herî di rewşa zehmet de ye, dema ku xwest em ê jê re bibin alîkar, ji aliyê madî û manewî de, em ê di vê de jî qet zehmetiyan nejîn. Misoger em ê bi vî exlaqê têkoşînê dijminê xwe bin bixin, baweriya xwe ya di vî warî de bi vî rengî diyar bikin, tenê diyar jî nakin, pratîka xwe bi vê raxin, bi vê lêhûrbûn bikin û bersiv bidin. Ya ku dikeve ser milê hemû partiliyên din jî ji vê ne cuda ye. Hûn di rewşeke baştir de ne, hîn hûn ciwanin, divê ku hûn têrkertir bin, zekayeke we ya baş heye, ruhê we taze ye, vê veguherînin azweriyeke mezin a şoreşê, bi gelê me re girêdaneke bêhempa damezrînin, bêhempa wan bidin şerkirin.

Bêhevsengiya metirsîdar a di navbera me û serdemê, dijmin de em ê çawa derbaz kin, bermahiyên serdema navîn ên rûreş û divê mirov jê şerm bike çawa derbaz kin? Encax bi zanîneke giştiye asta azwerî, hizrandineke mîna azweriyê hevgirtiye û yekîtiya hestan û bi yekîtiya Partiyê ev bê kirin. Vana tiştên xirabin, bêderfetin? Tu carî na! Erê, ji bo dîtina şêwazên pêwîst hûn xwedî azadiyeke bê dawî ne, em ji paqijkirina xayînên ferdî bigirin heta bêçekkirina dijmin, ji rêxistineke ji rêzê ya medenî heta rêxistinên herî pêşketî yên leşkerî, di cih û demê wê de li gorî mercên objektîf û xeta partiyê guncaw, bi qonaxên wê yên taktîkî ve girêdayî bimînin û bikin.

Fêmkirina taktîkê Partiya me ne erka milîtanê Partiyê ye? Qonax bi qonax li gorî vê guncaw rêxistina wê kirin, bi şiklekî guncaw pêkhateya wê pêkanîn, ne erka sereke ya milîtane? Erê, wê demê ger em girêdayî van erka ne, pêwîste bi anûr van erkan pêk bînin. Hûn tengav dibin, xwe bêtir tengav bikin, hûn ser naxin xwe paşde bidin, cihê xwe bidin hineke din.

Yek di yekeyê de nikare bike, vê ji yekeyek din re bihêlin, navenda me zehmetî dikişîne, bila vê hewaleyî me bike. Ji hemû aliyan ve bi anûreke mezin, bi grûreke mezin, em dikarin van al'an li bilindahiyan liber ba bixin. Çekên me xirab bikar neyînin, xirab nêzîkî qadro û gelê me nebin, ev jî ji bo min têr dike. Hûn westiyane daxwaz bikin, me ev erk û peywîr hemû weke nîşaneya şeref û anûrê da wan.

Me jiyana azad a ku herî zêde em hewceyî wê ne, di asta herî jor de ji we re pêşkêş kir. Ger na me ji we rica nekir ku hûn ewqas zehmetiyan bikşînin û me bi minet jî tiştek ji we nexwest. Ger yên wisa fêmkirine hene bila hema xwe paş de bidin, xwe paş de nedin ew xirabin, xwe veşêrin jî namerdin. Lê, na ger şervanên ewqas cewherî ne, erk û peywir wisa fêm kirine, wê demê meşandina vê fermana me ye û erka wan bi xwe ye. Bê ku bikevin nav du dilîyekê, bê ku xwe bi biyaniyekê rave bikin, bi kesayetiya rast a PKK'ê, dê karê PKK'ê wisa bimeşîne. Ma di vê de tu qusûra me çêbû? Em amadene hesabê hemû tiştî bidin we. Bixwazin, me çi ser xist, çi ser nexist, bi lez û beza metîrsîdar a salan û bi lewaziyên xwe ve heta niha jî em çawa baz didin hesabê wê bidin we. Mafê me jî yê ji we xwestinê heye. Ger hûn jî hesab nedin, bi namûs, ji dil destnîşan nekin, hûn xirabin. Bersiva ku bi şermê ji vê re bê dayîn jî nîne. Ma we hemû tiştê xwe ji bo şoreşê danenî holê? Hûn, ji bo bi paşeroja lenetkirî hesab bixwazin derneketin ortê? We jiyana xwe ji bo vê feda nekir? Wê demê hûn çawa dikarin xiyanet li xwe bikin? Hûn çawa dikarin di rewşeke nebes de bimînin, hûn çawa dikarin van nebesiyên xwe bidomînin? Wê demê hûn çawa dikarin xwe efû bikin?

Dûrişmeyeke me ya din hebû; dema ku dijmin ji me yek winda kir, heta ku em deh hebên din qezenc nekin xew ji me re herame. Yek gaveke paşde bi Partiya me dide avêtin, ger em deha gavan ber bi pêş de navêjin xew ji me re heram be, jiyankirin heram be, em vê dibêjin û di wateyeke misoger de ber bi pêş ve diçin. Mîrasa PKK' ê ne ev e? Dujmin darbeyek lêdabe, yên ku dizanin deh darbeyan lê bide ma ne em in? Ji bo bîranîna Heqî di şert û mercên herî zehmet, bêderfetiyê de çi hatin kirin? Li Hîlwan ji bo bîranina Halîl Çavgûn çi hat kirin? Piştî wê çi hat kirin. Wê demê li ber serê me şitil tên qulipandin, erka ku dikeve ser milê hevalên li kêleka serê wî/ê çiye? Ne deh qat tolgirtine?

Bi hemû hêza xwe ve bersiva ku dijmin heq kiriye di cih û dema wê de dayîn nîne? Li beramberî bê rêxistiniyê, rêxistin di her astî de bilindkirin ne sonda me ye? Bi hemû rêbazan re şerkirin, şerê gel ne taybetmendiya rêya me ye? Li gorî siyaseta Partiya me polîtîka kirin, bûna poltîkagerekî herî

nerm ne erka me ye? Li beramberî hemû curên hilweşînê, xirabkariyê, tolaziyê, diyardeyên rastgir û çepgir şerkirin, ne durişma milîtanên partiyê ye? Û ev îro ji her demê vekirîtir û xwe ferzker nînin û ji her demê zêdetir em ne neçarin bi van derfetan şer bikin?

Di çiyayên herî xweşik de egîdên herî baş ên mirovan ne li gel hevin? Pêşengên herî pêşketî yên partiyê ji we re nehatine pêşkêşkirin û ev ne jiyana herî bi şeref û anûre? Wê demê ji bo xatirê vê çi kar nayê kirin, çawa dikarin her tim li beramberî dijmin bi windakirinê bifikirin? Çawa her xulek bi serkeftina dagirtî nayê kirin? Û çawa bi gelekî her tiştê wî jê hatiye girtin, ecêb hatiye parçekirin, ji rewşeke ketî re hatiye terk kirin weke milîtanên gel'ekî bi vê rastiyê re rû bi rû mayî her roj gav bi gav bi van ve mirov nikare rê bigire? Çima vê bi çek, siyaset, bi huner, çalakî û vê bi rêxistinê bi berhem nekin. Wateya jiyaneke din heye?

Wê demê em çima ewqas vana dûbare dikin? Eşkereye ku karê şoreşê, ji aliyê hinekan ve bi qurnazî, yan jî safitî, hinek bi nezanî, bi hinekan re jî bi rastî ji ber kêmbûna perwerdê, yê hinekan jî kêmbûna ezmûnan, ji bo beşeke mezin jî, ji ber sedema zehmetiyên qada taybet weke tê xwestin nayê meşandin ji bo wê? Madem wisa ye ji van erkan re, van erkên xwe yên pîroz ji niha û şûn de bi hewldaneke mezin û bi xebata herî mezin a afirêner ve, di şikil û cewher de kes cihê ku lê ye, di asta herî jêr de be jî çalakî û rêxistinê ferz bike, qadê misoger vegerîne qada şer û bersiv bide. Bi tevahiya hêza xwe vê bike. Ji niha û şûnde tiştek me rizgar nake û efû jî nake.

Berxwedanî divê egîdane û merdane be. Şoreşgerî hunerekî divê merdane bê pêk anîne. Helwestên berevajî misoger ji milîtanê şoreşger, bi taybet li bejna şoreşgerê proleter nayê. Yên PKK'yî ye îdîa nakin ku wisane, di heman demê de bi pratîka xwe jî vê îspat dikin. Wê demê em bi hev re îspat bikin, helwestê dudil bavêjin. Çend kêmasiyên ku ji rêzê em dê bikin bila me netirsînin. Em ê di vê mijarê de hevalan tawanbar nekin; berevajî ji van kêmasiyan wane bigirin ya baştir û rastir bidest bixin. Di derbarê dema pêşiya me de, ji tecrûbeyên xwe yên borî wane derxin, hêviyên gelê me yê ku berhemê jiyana bi îşkence, êşa ku ji kûrahiya sedên sal pijiqiye û hatiye xwedî derkevin. Bi şehîdê xwe û yê jiyan dikin, ev fermandên Rêbertiya Partiyê divê qet neyên paşçavkirin û yek xulekê neyên jibîrkirin, bangewaziyên wî bi dilekî hevgirtî û hêza mejî bicebirînin û erkên xwe yên milîtanî himbêz bikin. Û bi rastî jî, bi pêşketinan dagirtî û bi erkên em dikarin pêk binîn ve ser bixin.

Taktîkê xwe yê Partiyê di derbarê roja îro de taybetmendiyên wê piştî ku me dûbare li ber çav derbaz kir, em ê van li kîjan qadên guncaw derbazî meriyetê bikin, dê çalakiya rêxistinî ya herî guncav û pergala wê çawa pêk were? Li ser esasê xwe sipartina taybetmendiyên herêman em hewl bidin hîn şênbertir bikin. Egeriyên pêşketina berxwedanê, beriya ku li gorî taybetmendiyên herêmê bê destgirtin, bi xetên giştî berxwedan û weke berhemên pêşketinên siyasî yên derve û hundir, di derbarê egeriya çiqas dikare bê bilindkirin de, tahlîlên beriya niha derbazdariya xwe diparêzin. Ji roja despêkê yên ku ji aliyên PKK'ê ve dihat parastin û di xeta polîtîk de dihatin ziman, li ser esasê xwe sipartina hêza xwe ya xas dê şoreş gengaz bibe. Di vê de jî ya diyarker hêza gel a taybete, ger gelek bikeve pêvajoya şoreşê kêliya biryarê ya ku ji aliyê dîrokê ve tê dayîn rastiyek be û xwe gihandina rewşa vê ya objektif pêk hatibe, erênî û neyênîya şert û mercan encax dikare risteke talî ango dawî bileyze. Ev careke din piştrast dibe. Nirxandinên ku ji aliyê PKK'ê ve di derbarê Welat, rewşa gel a civakî, aborî û şertên siyasî her wiha di derbarê rewşa dijmin de kirî, li ser vî esasî bernameya ku hat derxistin, gengaziya pêşketina berxwedaneke stratejîk û taktîkî derxist holê. Pratîka heta îro hatî meşandin, bi vî rengîbûyîna vê piştrast dike.

Rapora dawî ya ku ji civîna navendî re hatiye pêşkêşkirin, weke ku bi berfirehî nirxandiye, pêşketinên siyasî hêrsa gelê welat her ku diçe zêde dike û tenê rêya çareseriyê bi giştî şerê berxwedaniyê, serhildanê hema bêje aniye ber derî. Ji aliyekî ve kîna gel a jixweber pêş dikeve; ji aliyê din ve bi vê ve girêdayî xebatên bi zanebûn û rêxistinî ku ji aliyê partiyê ve tên meşandin hema bêje li hev digerin û bi hev ve cebirîne; giştiye asteke wisa. Beşekî mezin ê hêza xwe divê ku em ber bi qadên guncaw ên welat ve bibin, di ezmûnan re derbaz bikin, dîsa bi hinek çalakiyên sînordar biceribînin, ji xwe baweriya me û bilindikirina çalakiya şoreşê dide îspatkirin. Dagkeriya Faşîst a Tirkan, bûhrana ku ji aliyê siyasî, aborî û civakî di nav de ye her çiqas seranser qala hinek derbazkirina wê bike jî, ev her kêlî û her demê dikare veguhere bûhranek kûrtir. Xwedî karekterekî bi vî rengiye. Li beramberî sermayegeriya di destê çend kesan de kombûyî beşên berfireh hejar dibin, ber bi proleteriyê ve diçin, hema bêje çîna navîn li nav diçe, ji derve ve bi emperyalizm bi taybetî jî girêdana bi emperyalîzma Emerîkayê zêdetir dibe. Ji aliyê civakî ve her ku diçe jiyana yoz pêş dikeve, rizandin jî lê zêde dibe, "demokrasiya rastgir-çepgir" ya ji aliyê cuntayê ve hatî pêşxistin ji niha ve siwaxa wê jê dikeve, xwe nagire. Ji aliyê cuntayê ve ew demokrasiya çavkaniya xwe ji Emerîka girtibû, jê re

hatibû diyarkirin, di nava pênc salan de çiya derket holê, dê çiqasî bikaribe bimeşe di asteke girîng de eşkere bû. Hema bêje “Komara duwem” a ku dixwestin ji nû ve înşa bikin hîn di salên xwe yên despêkê de, li gorî yê berê çiqas kêm bi qusûre dê nikaribe xwe ji jiyaneke bi bûhran rizgar bike eşkere bûye.

Buhrana di çêkera aborî de, bêkarî, enflasyon, valatiya di deynên ku divê ji derve re bên dayîn, veberhên (yatirim) û di qadên dayîna deynan de zêdebûn di pêşeroja herî nêz de dê kûrtir bibin. Ev ê jî bi xwe re ji aliyê siyasî û civakî ve rê li ber teqînan veke ango dê teqînên wiha kêm nebin. Ji bo rêgirtina li vê şûna rêveberiyeke leşkerî-faşîst, ya pê re lihevkirî, di nav îtîfaqê de, mîna ku li sertaserê cîhanê heyî, di Tirkiyê de jî ya ku giraniya demokrasiyên Ewrûpa dide hîskirine. Bi nêzîkatiyeke wiha alternatîfeke nû, yan jî klîka nû ya Emerîkaparêz ya Ewren û Ozal dema ku ket tengaviyê, dê bikaribe cihê vê bigire. Yan DYP (Partiya Rêya Rast) weke partiyeke rastgir a nû yan jî partiyeke mîna ya Ecewît SODEP (sosyal demokrat partî) ê nûnertiya lîberalîzma burjuva dike taybet bi xwe derkeve holê. Dibe ku partiyek wiha ber bi salên 88’an ve bixin rojevê. Bi daketineke wiha nerm vê hesabê dirêjkirina çend salên din a vê bûhranê dikin. Bi taybetî di van gerên dawî yê Ecewît ên Ewrûpa de, dixwaze hinekî xwîna taze bigire çepgirên tasfîyeger jî bigire bin kontrola xwe, bi lez partiya çepgir a demokrat fermî bike û dûbare girseyan bondor bike. Tê fêmkirin ku dê cunta îcaze bide û wî amade dike. Lê ev jî ji kûrkirina nakokiyên di hêmêza pergalê, ew li hevkirina bi zorê hatiye pêkanîn û li ser hev ferzkirinê, bi zorê xwe nêzî kirinê cudatir dê ti encamên din nede. Nemaze weke dewlet her ku biçe dê buhrana KT (komara Tirkiyê) zêde bibe, dê nikaribin rê li ber qelîştokên di binê cuntaya faşist de derdikevin bigirin. Mirov dikare bêje ev rejim dê ji niha û şûn ve zêdetir zehmetiyê bijî, bilikume û birize.

Zextên li ser Kurdistanê, hem abêje giştiye asta şerê çekdarî, lê ya ku li ser gel tê ferzkirin şerê taybet ê kontrgerîla dimeşînin. Li Kurdistanê ne bi rêveberiyeke medenî, ji hemû aliyan ve li gorî armancên Şerê Taybet xwe gihandiye pêkanîneke, şerekî leşkerî, Îdareya Şerê Taybet mijara gotinê ye. Ev jî vekirî dide diyarkirin ku Kurdistan bi şoreşeke dijber, di nava şerê şoreşgerî de jiyan dike. Nirxandinên ku dawî hatin kirin, bi taybet pêkanînên rewşa awarte, jiyana li Kurdistanê bi şerê taybet ku tê meşandin, li bermberî vê şerekî gel û hebûna wî bi awayekî vekirî datîne holê. Wê demê em devjê berdin bermahiyeke demokrasiya dagirker-burjuva, mirov nikare qala rêveberiyeke leşkerî jî bike, encax dikare qala pêşxistina şêwazekî taybet a şer bike.

Komên berfireh ên gelê Kurdistanê, di ti demên dîrokê de ewqas mahkûmî dagirkerî, hejarî, hilweşînan nebûye. Û dîsa ewqasî xwe nêzîkî berxwedaniyê hîs nekirine. Pêwendiyên eşîrî her ku diçin parçe dibin. Kesên ji nokeran nefret dikin rûyê wan eşkere dibe. Gel hema bêje bi çar çavan li benda pêşeng û Partiyê ye. Piraniya wan weke baskekî vê her ku diçe ber bi helwesta berxwedêr ve diçe û bi vê ve jî sînordar namînin vediguherin berxwedaniyê divê ku mirov vî heqî jî radest bike. Di qadên din ên Kurdistanê de, bi taybet dijwarbûna şerê di navbera Îran û Iraqê de venerîn lewaz bûye, ev rewş bûye xewna tirsnak a cuntayê û ev rewş didome. Valatiya ku hatiye afirandin, veneriya ku li ser Kurdistanê lewaz bûye, valatiyeke siyasî ya pir mezin diafirîne, ev jî berdevkên Emerîkayê jî weke xeleka herî lewaz a ku valatiya wê nikare bê dagirtin a cîhanê Kurdistan hesapkirinê ve dibe. Bi rasti jî yek ji xelekên herî lewaz a emperyalîzmê, di serî de Bakur û Rojavayê Kurdistanê û hemû Kurdistan'e. Ji ber vê, ji aliyê şertên derve ve, rewşa herî destdayî tê jiyîn.

Ji aliyê din ve alikariyên derve, hêdî hêdî objektîf be jî bi şêweyek girîng bandora xwe diyar dikin. Di şoreşa Kurdistanê de cara yekem bê ku ji xeta serbixwe tawîz bide, dikare ji derve alîkarî bigire, ji derve hinek boriyên henase girtinê û vebûna wê nîşan dide. Bi rastî jî cara yekem asta cidî ya ku di Kurdistanê de tê destxistin ev e. Lê ev ji bo pêşketina şerê gel, şerê berxwedaniyê ne diyarkere, lê weke mercekî devjêneger, weke di paşerojê de diyarkir, dê ji niha û şûn de jî diyar bike. Dema ku em destdayîna erdnîgariya Kurdistanê, welatê fireh, çêkera berxwedêr a mirovên wê jî lê zêde bikin, mercên objektîf di serîde Kurdistana Rojava û destdayîna wê rewşeke bê gûmane. Pêşketinên objektîf ku çavkaniya xwe ji vê rastiyê digire, têkoşîna Partiya me ya ku ji despêkê ve bi ezametek mezin, cesaret rêxistina xwe ya serbixweya netewî didomîne, di roja me ya îro de gihiştiye lûtkeyê. Teqîna qadro a ku ji aliyê hêzên xwe dispartin dewletan jî nekarî bikin, bi tesîsata çekan, teqîna zanîna PKK'ê di hinavê xwe de pêk anî. Di heman demê de ev bi darbe lêdana hemû curên tasfiyeger, hilweşîner, xirapkar û ferasetên rastgir-çepgir mahkûmkirinê ev raber kir. Ev hemû amadekarî, di erdnîgarî û qadên mirovî ên dest dayî de hatine cihkirin. Her roja ku derbaz dibe xwe pêş dixe, taqwiye dike û pêşketina xwe ya sûbjektîf didomîne.

Vana tev didin diyarkirin ku em di nava şerê gel ê şoreşgerî de dijîn, ne li ber derî, em di navê de ne. Êdî pirgirêk a pejirandin an ne pejirandina vî şerî nîne, ber bi pêş de birina şer û hostayî ve meşandina wî dide diyarkirin. Hinek heval tevî ku rewşa şer jiyan dikin jî, mîna ku amadekarî tên kirin

tevdigerin. Weke ku me hîn biryara şer nedaye tevdigerin. Ev jî asta wan a pêşxistina çalakî û rêxistinê asteng dike. Vana helwestekî pratîkî ya şaş ku çavkaniya xwe ji ferasetên şaş digire raber kirine. Em ketine pêvajoya şer. Em jî li beramberî şerê ji aliyê şoreşa dijber ve tê ferzkirin, şerê şoreşgerî çapa wê û hêza wê çiqas sînordar dibe bila bibe, bi dîtina şêwazên afirêner me jî ferz kiriye. Êdî Partî ketiye ser rêya xwe, bi gavên ku dimeşe ewlehiya rê, rastiya rê bi dehan car îspat kiriye.

Êdî divê ya bê kirin, di rêya ku tê zanîn de gavên xwe saxlem avêtine. Pêşeng bihêz kirin, zexim kirin, di nava xeta Partiyê de vîn û hizir kûr kirin esase. Bi taybet di taktîk, yanî di rêbaza têkoşîna rêxistinî ya rojane de bi bandorkirin, ber bi hemû pêwendiyan ve xistina êrîşê bajar, gund, çiya û deştan di qadên hundirîn û derve de hucûm kirin girînge. Gund bi gund, bajar bi bajar, navçe bi navçe, malbat bi malbat, qabîle bi qabîle, kargeh bi kargeh, dibistan bi dibistan hemû yeke bi hucûmê destxistin esase. Di nava pergala serhildana gundekî, herêmekê, di nava pergala xwepêşandanan de bûyîn, medenî-leşkerî, çekdar-bêçek, jin-zilam, ciwan-pîr, herkes bi ajîtasyonê ber bi şerê rizgariya netewî ve veguheztin tê xwestin. Çi bi çek, çi bê çek bi propagande ve kişandin, rêxistinkirin, derbazî çalakiyê kirin, ev rê derbazkirin, ji misqalên biçûk her ku diçe mîna robara ku kes nikare li pêşiyê bisekine valabûn, di nava pêkanîna van de bûyîn; eşkereye bi vî rengî xwe rêvebirina pêşeng hewce dike. Gengaziya van hemûyan, ji aliyê teorî û pratîka Şoreşa Kurdistanê ve bûyerên ku hatine piştrastkirin. Ger bi israr bê bandorkirin, rêxistinkirin, venerînkirin, meşandin, dê bi derketinên pir bi hêz ên şoreşgerî ve encam bibe. serhildana herêmî ya gel jî di nav de dê bi gelek şêwazên têkoşînê emcam bigire. Qonaxa dîrokî ya ku şoreşa me giştiyê ev e.

Êdî li vir stratejiya PKK'ê, li ser esasê xwe spartina hêza xwe, ya karker, gundî, û bloka ciwanan eniya xwe ragihandiye. Dîsa li ser vî esasî bi xwe spartina îtîfakan, ji hêzên herêmî ên çalek jî sûd wergirtiye. Di serî de jî Tevgera Rizgariya Ereb a Filîstînê û şerê Îran û Iraqê ji bona xwe weke hêzekî îhtîyat bikaraniye. Dîsa têkoşînên di parçeyên din ên Kurdistanê de hêzên îhtiyat ên heyî ji xwe re bikaranînê de serkeftîbûye. Heta pergala sosyalîst jî, hinek be jî kariye ji bona xwe bike hêza îhtiyat. Tevahî kombûnên çepê Tirkan, mîrasa şoreşê di kesayetiya xwe de şênber kiriye. Ji hemû qelîştokên burjuvaziya Tirkan marîfeta di kêliyê de jê sûd wergirtinê, weke dema borî de bûyî, di roja me de jî destnîşan dike û hema bêje pêşketinên ku rojane xewa rejîmê direvîne bafirînerî raber kiriye. Wê demê li beramberî rastiya ku êdî ji aliyê dost û dijminan ve hatiye

qebûlkirin, pêşeng xebata xwe ya rojane divê afirêner bike. Karektera xwe ya rêzdar, taybetmendiya ku hemû pêwendiyan bidest dixe, vana tevan bi pêngavên mezin kirin hewce dike. Ji bo vê yekeyên pêwîst peydakirin, qad li ser vî esasî amadekirin, pêkhateyên herî bi berhem ên rêxistinî, pîlanên herî bi berhem li ser vî esasî amadekirin û derbazî meriyetê kirin heta radeya dawî guncaw bûye. Bi pêşengatiya PKK'ê ji bilî pêkanîna vê ti erkên din nemaye. Divê ku em diyar bikin hêzên ku êdî bikarin rê li pêşiya vê bigirin nemane.

Pîlanê şerê berxwedaniyeke bi vî rengî, taybet bi welatê me, dema ku em daxin asta qadan, ji bo ku em hîn bi hêvî û serkeftî bin derfetan derdixe holê. Beşên navîn ên Kurdistanê, di serî de navendên weke Colemêrgê, Wan, Sêrt û ya ku Mêrdînê dike yek qada berfireh a sînor îro tam qada berxwedanê ne. Serhildan jî di nav de, qada ku xebatên siyasî, leşkerî û hemû curên xebatên rêxistinî dikarin tê de kûr bibin. Xebatên tên meşandin, didin nîşan ku dikare bi windahiyên herî kêm ve gelek têkoşînên serkeftî bên meşandin. Erdnîgariya destdayî, girseya wê ku di nava îsyanê de ye û hêza Partiyê bi awayekî herî bi berhem bi hev bê cebirandin dê bikaribe pêşketinên gelek mezin raber bike ji hêla her kesî ve hatiye erêkirin. Li gorî vê, xebatên di qadê de, tenê ne yekeyên ajîtasyon, û propagandaya çekdarî ne, yekeyên rêxistinî, yên çalaki, komîte, nûnertî, komîteyên eniyê ji bo ku amadekirina serhildanê, biyekkirina gerîla, komîteyên herêmê, komîteyên gundan avakirin û erkên cur bi cur divê bên pêşxistin. Hêza xwe ya di herêmê de li ser vî esasî erkdarkirin, pêşiya her yekî/ê ji wan di hejmarên diyar de gund an navçe dayîn, di nava demekî diyar de li van deran rêxistin û çalakiyên guncav xwestin û dîsa serhildanên gel lezkirin daxwaza herî raste.

Weke qadeke din Bêdlîs, Sêrt û qada ku Mûşê bi hev gire didê ye. Di vê qadê de xebatên çekdarî û siyasî zêdekirin, pêşxistina xebatên rêxistinî, erdnîgariya guncav a ku xwedî mirovên çalakin ji bo vê qadê jî derbazdare. Bi hêzekî têrker ê guncav, xebatên qadê lezkirin, weke di qadên din de jî tê payîn erkdarî bi bandorkirin, xebatên gund û bajaran, rêxistinên wan pêşxistin, yekeyên çalakî, grûbên rêxistinî û propaganda vesazkirin, di qadê de têkoşîna siyasî û çekdarî bi lezkirin, hem gengaz hem jî pêwîste. Ger ev têkoşîn bi qadên sînor ve bê yekkirin dê pêşketinên girîng dest bixe. Teqwiya qadro ya pêwîst ji herêm û xwecihî bi asanî dikare bê pêşwazîkirin.

Yek ji qadên din jî Amed, Çewlig û Xarpête. Xwedî erndîgarî, cih û hêze, di heman demê de xwedî mirovên çalake û qadeke îsyanê ya kevne.

Lewaziya amadekariyên li vir dema ku em digirin berçav, dikare hinekî din amadekari bên kûrkirin. twqwiya qadro dikare bê kirin, hinek endamên herêmî dikare ber bi vir ve bên veguhestin. Qad dikare bi qadên din re bê girêdan. Evder jî ji bo berxwedanê guncave. Ev der jî dikare bibe navenda berxwedanê. Bi vî rengî destgirtin erkdariyên guncav dikare bê bi bandorkirin, her çiqas ne asan be jî heta dawî derfet heta dawî veşartî, her tim di nav tevgerê de bûn, bi awayekî herî hostane hevgirtin û encam jê girtin mijara gotinê ye.

Dîsa yek ji qadên din jî Dêrsim, Erzîncan, Çewlig, Erzirom û Mûşê dike yek, qadeke berfireh û dirêj heye. Bi taybet asta xwendevanan û zêdebûna wan, asta zanînê û pirbûna wê, erdnîgariya destdayî, kêmbûna bejahiyê dema ku em tînin berçav, evder jî heta dawî wê bikaribe bibe navendeke berxwedanê, pêşketinên lez dest bixe, bi potansiyale xwe ya qadroyên berfireh ve, ji gelek herêmên din dê girîngtir pêş keve, erdnîgariya wê heta dawî destdayî ye, dîsa girseya wê jî guncave. Bi taybetî jî ji aliyê dijmin ve nakokiya ku di navbera Bakur û Başûr de, bi fetisandina berxwedaniya li Bakur dê bixwaze pêş bixe. Dema ku em vana hemûyan tînin berçav heta dawî divê em giranî bidin vê qadê, bixin tevgerê, pêwîstiya vê derdikeve holê. Di gel yekeyên çekdar ên berfireh bûne, komîteyên gundan bi lez pêşxistin, hêzekî berfireh ê şer ber bi çiyan ve komkirin û xebitandin guncav û encamgire. Em ji hemû navçeyên Dêrsimê bigirin heta Warto, ev herêma ku divê her tim di nav tevgerê de xebatan pêş bixe, ji bo encam girtinê endamên sereke ne.

Dîsa ya ku ji Rojavayê Kurdistanê pêk tê bi mercê ku Semsûr navend be, ya ku Riha, Mereş û Meletî bi hev ve gire dide, qadeke me ya berfireh û girîng heye. Di vê qadê de despêkê her çiqas xebat hêdî pêş bikevin jî, di demên pêş de mîna welate kî, dikare potansiyelekî mezin bi duv xwe bixe. Ji ber ku proleterên wê zêde ne dê bibe navendeke berxwedaniyê. Weke di demên borî de bûyî, di dema pêşiya me de jî, wê di vir de rêxistina me gelek pêş bikeve. Piraniya karkerên ku ji Partiyê re bibe bingeh wê di vir de derkevin holê. Hinek xwe ji Başûr xwedî bikin, wir jî hinekî bigire nava xwe wê bikeve nava berxwedaniyeke watedar, em dikarin vê ji niha ve diyar bikin. ji bo vir jî, erkdariyên ku niha hatine kirin dikare bên bandorkirin, bi vê bandoriyê dê pêşketina dest bixe, ger gavên despêkê bi tendurist, hostane bên avêtin wê pêşketin lez bibin, divê ku mirov vê jî bêje.

Li milê Başûr ji serî heta dawî Mêrdîn û beşekî Başûrê Amedê jî digire nav xwe, Wêranşarê jî digire berfirehiya xwe û bi S.. re jî di temasê de

qadek me ya din heye. Di vê qadê de bi taybet rêxistinên gundan, rêxistinên siyasî lez pêşkevin. Di beşên çiyayî de yekeyên çekdar bi asanî pêş bikevin, potansiyela wan a demê borî, di demên pêşiya me de çalakbûna wê qadê dereng nekeve, her çiqas di despêkê de pêşketin giran pêk bên jî, dê di demên pêş de lez bibe. Û eşkereye ku wê potansiyela şervanên gundî bikeve tevgerê. Bi teqwiyekirina qadroyên guncav re, bê ku ecele bê kirin ji niha ve amadekirin hem gengaze, hem jî rista alîkar, her ku biçe jî rista sereke bileyze. Eşkereye ku li gorî vê nêzîkatî ji qadê re raberkirin ya raste.

Dîsa li Bakurê Rojhilat a ku Qersê û Agirî jî digire nav xwe, Erzirom, Mûş û Wanê bi hev ve gire dide, xwedî potansiyelekî girseyî û erdnîgariyê ye. Dîsa potansiyela gundiyên hejar û ciwanan hildigire nav xwe qadeke me ya din heye. Li vir li ser esasê xebatên siyasî, di gel grûbên çekdar ên sînordar, dê bikaribe potansiyela xwe ya şer bixe tevgerê. Ev potansiyel bi asanî dikare ber bi herêmên din ve bê veguheztin. Beşên çiyayî, yekeyên çekdar dikarin bikevin tevgerê. Bi van aliyên xwe ve herêm dê gelekî dijmin tengav bike. Weke di dema borî de, di roja me ya îro de jî ji bo karakterê proleterya yê têkoşînê, karakterê gundiyên hejar dikare gelek bibe alîkar, bi taybet di dema pêşiya me de, wê vê bi leztir derxîne holê. Bi rengekî bi hêz destavêtina vir û bi taybet ji bo ku kêmasiyên dema borî kêmasiyên hatine jiyîn cardin nekeve nav wan kêmasiyan ji bo vê bi tevdirî tevgerîn tê xwestin. Rêxistinên zêde ne lezgîn, lê birêxistinin her ku diçe xwe belave dike evder hêdî hêdî pêşxistin bi qasî ku di herêmên din de pêşketin biqewimin evder xistina nav tevgerê wê taktîk û nêzîkatiya herî guncav be.

Beşê Başûrê Kurdistanê, bi taybet herêma Zaxo û heta digihêje Lolanê ji ber rewşa xwe ya qada perwerdê û fêrkariyê ye. Li vir ne şerê germ, bêtir di asta eniya paşde girtin, hem ji aliyê hêzên ku em bi wan re di pêwendiyê de ne jî rewşeke guncave. Û hem ji bo me jî li gorî espîriya eniya paş qada guncave. Nemaze li gorî hinek ferasetên berê şer di vê qadê de kûrkirin dê zêde sûdmend nebe. Weke qadeke eniya paş, qada perwerdê, navenda rêveberî û karîgeriyê, di heman demê de gelek xebatên weşanan, ên ku pêdiviyên enîya paş pêşwazî dike, erkên mîna van ên di dema borî de hatibûn kirin, ji niha şûn ve jî berdewamkirin dê helwesta herî rast be.

Em ji herêma hinek be jî hersê sînoran dike yek bigirin heta beşên navîn ên sînor û di navbera Zaxo de xwe bi cihkirineke bi tendurist ku bê kirin, bi taybet ji bo demên pêş dê alîkariyeke mezin ji têkoşînê re bike. Di vê mijarê de armancên KDP'ê yên tên zanîn mijara gotinê be jî bi hostayî bê xebitandin, rêgirtina li astengiyên bi vî rengî dê zehmet nebe. Li vir jî

yekeyên rêxistinî, yên weşanê, rêveberiyê û xwe bicihkirina wan ne zehmete û ji bo pêşxistinê endame. Disa di vê mijarê de erkdariyên ku hatine diyarkirin guncavin, dikare zêdetir bên pêşxistin, hinek guhertin tê de bên çêkirin.

Heta niha jî S… hem ji bo vebûnên derve hem ji bo yê hundur risteke pir girîng list. Di dema pêşiya me de jî wiha diyare ku wê vê ristê bi bandor bileyze. Ji bo şandina welat deriyê vekirinên derve ye, deriyê gelek weşanê ye. Ji ber vê ji niha û şûn ve jî bi awayekî berhemdar karanîn di nava îhtîmalan de ye. Weke navenda pêwendiyên derve Ewrûpa, çi jî welatên sosyalîst û vekirin ber bi Tevgerên Rizgarî yên Ereban ve herêmeke berhemdare. Divê ku bi vî awayî rista wê bê domandin.

Herêmên sereke ku hatin rêzkirin, di nava xwe de dikarin dabeşî yekeyên ku em ji wan re dibêjin qadên herêmî bibin. Heta dema ku dabeşî qadan bûn, dikare weke hinek beşên xwar jî bên dabeşkirin. Herêmeke xwar a çend qadan digire nav xwe jî dikare bê pêşxistin. Pişt re ji qadên dikare derbazî grûbên gundan bibe. Di qadan de bi komîteyeke amadekar dikare dest bi kar bê kirin. Herêmên jêr, ber bi sazûmaniya komîteyên amadekar, her ku diçe sazûmaniya qadan, ji vir jî ber bi komîyetên bajaran ve û di gundan de jî derbazî pergala komîteyên gundan bibe. Tenê ne yekeyên çekdarî, bi taybet ên ku ber bi xebatên rêxistinî yên berfireh ve baz didin, hîn bêtir kesên ku xwedî taybetmendiyên legalin, bi komîtekirina gund û bajaran gengaze. Di binê sêwana propagandaya çekdarî ya parêzer û pêşverû de lez dayîna vê, ev pêkanîn, êdî giştiye xala ku mirov nikare xwe ji ber bide alî. Yekeyên çekdarî her ku diçe gêrîla ji serhildanê re amade dike û hemû grûbên bajêr ên gundan, derdora wan, komîteyên wan dayîna avakirin, ji bo avakirinê alîkarî dayîn û bi pêşxistinê ev dikare pêk we re. Vana teva bi hêzê xwe yê çekdarî dikare venerîn bike, ewlehiya wan pêk bîne û hêzên berfireh beşdarî xebatan bike. Hedefên dijmin ên ku ji wan re hatiye diyarkirin, ji linavbirina wan û nokeran em bigirin heta bê bandorkirinê dikarin biçin.

Erkên leşkerî û rêxistinî yan jî çekdar-bêçek û rêxistinî divê ku di nav hevde hevgirtî bin, lê heta radeya dawî bi qûralê veşartîbûnê ve girêdayî bê meşandin û bi şêwazên ku şênber bûye derbazî jiyanê bên kirin. Di vê mijarê de, bi taybet beşekî pir girîng ên qadroya ji herêma çêkirin, gelek herêm gihandina qadroyên herêmî, ger êdî bi qasî bikarin li ser piran bimînin bandorker bûne. Di vê mijarê de nemaze rêjeyek girîng a qadroyên xwecihî avakirin, hêza qadro ya gelek herêmên din avakirin, ger êdî bi qasî bikarin xwe bi xwe bimeşînin karbidest bûne, qadroyên xwecihî ji çaran sê

bilindkirin, yên li herêmên din heyî, bi taybet di venerîn û berpirsyariyê de di asta ku rist bileyzin de ew atamakirin, kombûna qadro bi vî rengî belavkirin dibe ku hîn rastir be. Polîtîkaya ji herêmekê re her tim qadroyên bêgane atama kirin çiqas xelet be, polîtîkaya hemû qadroyên herêmî jî bicihkirinê xelete. Li gorî taybetmendiyên her herêmekê bi awayekî guncav qadroyên herêmî û ji herêmên din qadro tê de bicihkirin, li gorî taybetmendiyên leşkerî, rêxistinî, siyasî yên kêm pêşketî û bi bandor, bi hedefên taktîkê giştî ve girêdayî mayîn, asta wan zêdekirin êdî ne zehmete. Di vê mijarê de tiştên ku di demên borî de nehatîn kirin, pêşketina qadro ji nêz ve şopandin pêwîste. Di pêvajoya ceribandinê de aliyê wan ê lewaz û bi hêz derxistina holê, di cih de şopandin, çawa erkên xwe ser dixin dîtin, ji vê û şûn de bi cihkirineke guncav pêk anîn ne zehmete.

Dîsa hejmara pêkhateyê û çawaniya wê ji rewşa çêkera borî rizgarkirin, yên ku pir baş dikarin bi hev re bixebitin bi hev re dayîna xebitandin girînge. Mînak; pênc qadroyên berhemdar ên bijare li gel hev girtin û bê berhemiya wê dema ku mirov li ber çav digire, ji berpirsyariya hêzê rêveber ê têrker, hejmara têr dike ji herêmê û endamên ciwan dayîn, hem perwerdeya wan û bi vî rengî hejmareke zêdetir qadro derxistina holê gengaze. Berevajî qadroyên di heman astê de li gel hev girtin, ji bo belavbûneke bandorker û berhemhêneriyeke serkeftî jî ne guncave. Rêxistin bi tevlîbûnên nû wiha tê pêşxistin. Hem ji bo pêşwazîkirina çekan, hem jî xwe amadekirinê ev çêker guncave. Li şûna çek dayîna her kesî çend çek dayîna yekeyê û rê li xwe bi xwe bi çek kirina yekeyên vekirin pêwîste. Divê yeke hem ji aliyê madî, hem manewî ve xwe bi xwe xwedî bikin. Hemû grûbên aliyê wan ên siyasî li pêşin, divê hemû grûbê siyasî bikin. Yê ku kabîliyeta xwe rêveberiyê heye divê hemû grûbê bike leşker, çekdar bike, ev hem di nav egeriyan de ye, hem jî neçariye. Dema roja wê hat, li pênavê şoreşê divê hema xwe bide û hêzên berfireh bigire nava refên xwe û berfireh bibe. Ma wê pêşketina şerê gel hinekê jî ne wiha be?

Divê ku vana di hejmareke guncav de ji herêm an jî gundan re rêbertiyê bikin. Erken rêxistinê yên şênber li pêşiya wan bê dayîn, çalakiyên şênber, gund bi gund, bajar bi bajar wê çi bikin, di çiqas demê de vê bicih bikin, pêşnûmeyek çors bê diyarkirin û weke raporên xebatê bên pêşxistin û karê şênber bê xwestin. Ji bo vê divê venerîna pêwîst bê pêkanîn, bi taybet ji berpirsyarên komîteyan, yên esasî di vê mijarê de hesab bê xwestin. Ger pêwîst be bê venerînkirin, guhertin û bi vî rengî êdî bername bê pêk anîn.

Di vir de ji qadroyan re divê bê gotin ku ji nêzîkatiyeke dema grûba yekem zêdetir em di rewşa fermanê de ne. Divê ku herkes mîna leşkerê

berfermanekî van fermanan pêk bîne. Ji bo vê xwe perwerdekirina wan û berpirsyariya wan a meşandina karê sereke yê şoreşê divê bi caran bixe bîra wan. Û çi dibe bila bibe divê bi zincîra ferman û fermandar, her ku diçe nêzîkbûnek rêxistineke leşkeri bê kirin, em di rewşa rêxistina partiyeke wiha de ne bê zanîn û xebat bê kirin û herkes jî bi yekîtiya vîneke mezin, bi rehetiya dil vê erê bike. Ji aliyê din ve pirsgirêkên pêkhateyên, di cih û dema xwe de dema ku guhertin pêwîst bû, di navbera herêm û eyaletan de bitevgerîn, ji Bakur ber bi Başûr ve, ji Rojhilat ber bi Rojava ve bitevgerîn bê pêkanîn. Em jibîr nekin, bi taybet ji ber mercên demsalê, zivistanan giranbûna xebatên dema ku em tînin berçav, ji Bakur ber bi Başûr herêmên sînor ve hatin, ger hemû nebe jî hejmara guncav tê dîtin. Qadroyên ku dikarin sûdmend bin, di nava dayîn-sitendina ceribandinekê de ji bo civînan dikarin dakevin. Dîsa ji bo perwerdê em dikarin gelek mirov ber bi Başûr ve bikişînin.

Bi biharê re vana dîsa dikarin ber bi Bakur ve bikevin tevgerê. Ev hemû jî di nava espîriya propagandayên çekdarî de bi xebateke rêxistinî û çalakî dikare bê meşandin. Bi heman şêwazê di navbera Rojhilat û Rojava de jî tevgerînek dikare bê pêkanîn. Li gorî ku demeke dirêj wê çêkera me têkoşîneke bi tevgerîn bibe mijara gotinê hem windahî kêmkirin, xebatên tên kirin, tevgerîneke wiha dê windahiyên herî kêm bide derxistiye holê. Ev jî rêbazê rast ê seferberkirina girseyên berfirehe. Disa di vê mijarê de bêrehmiya dijmin mijara gotinê ye. Destavêtina malbat, jinan mijara gotinê ye. Divê neyê jibîrkirin yên ku rewşa wan xeterin, hineke ji wan ber bi Başûr ve yan jî nava Tirkiyê re şandin, heta kişandina derveyî welat jî dikare bê kirin. Hinek heval, mîna Filîstînî û Ermeniyan dibêjin; em qet dernakevin, nabe ku yek kes jî derbikeve. Ev berhemê hişmendiya baş nefêmkirina pratîkê, cewherê afirêner ê zindî yê materyalîzmê ye. Em pir zêde rastî vê tên. Ger tu dixwazî deh kesan li çiya bigirî, divê tu yek kesî derxî. Tu dixwazî deh gundiyên saxlem derxînî, çendeka ji wan bigire qadên din, Başûr, derveyî welat, ma ev ne rêya deh kes li gel xwe girtinê ye? Yek ji endamê wan ê ciwan li gel me be, di welat de yên din dê baş şer bikin. Dîsa ger em malbata qadroyekî bigirin gel xwe, bihewînin dibe ku em qabîleyê jî di çiya de bigirin. Bi van rewşan li ber çavgirtinê, qet wê cih neyê guhertin, her kes cihê ku lê ye wê bimîne yanî ketina nav fikra sabît çiqas dikarin derkevin serê çiyê, em dikarin çendika ji wan bigirin gel xwe û cih biguherin divê hûn wisa bifikirin. Hesabê vana hemûyan, li gorî rewşa wan guncav bê kirin û ber bi çareseriyê ve çûyîn çêbibe.

Wekî din divê baş bê zanîn xwepêşandanên bajaran hem gengazin, hem jî devjênegerin. Di bajaran de êrîşkirina ser gelek hedefan li ser esasê şîdetê, bajar ne weke qeleyên bi hêz ên dagirkeriya Kurdistanê, qeleyên lewazin. Bajar ji aliyê dijmin ve di asteke legal de ne, ji ber vê jî qadên ku em baş dikarin tê de lê bidin ewderin. Ji çiyayan êrîş bi pergal dikarin bên pêşxistin. Dagirkerî ewqas jî bi hêz nîne. Mijarên baregehî, bi taybet weke herêmên spî, sor û têkel ji niha ve û demî be jî divê ku bê biryarkirin. Yan jî em bêjin ji bo sê mehan herêmên sor divê bên avakirin. Di bin erdê de rêxistinên siyasî ên veşartî divê bên avakirin. Herêmên spî dikarin bên destnîşankirin. Herêmên tevlîhev rewşeke em pir jiyan dikine. Vana dikarin di nav xwe de rewşa xwe zelal bikin û pêş bikevin. Bi kurtî ji pirsgirêka xwe bi cihkirinê re, li gorî rewşa heyî raberkirina nêzîkatiyeke guncaw pêwîste.

Ev pêşketin hemû êdî vê eşkere didin diyarkirin ku, di serî de xebatên me yê navendî di hundurê welat de, hemû xebat divê ku hinekî din şênber, hinekî din li gorî cewherê pêşketinan guncav û di asta pêşwazîkirina pêşketinan de bin. Rêxistinkirina qadroyên me, bi teşe kirin, hilbijartina qadan, pêşxistina qadên xwe bicih kirine, li gorî armancên guncav, li gorî pîlanên taktîk guncav be, bi vî rengî ber bi zelaliyê ve biçe. Li vir nivîsandina talîmatên ku ji herkesî re bibin reçete nivîsandin ne gengaze. Lê her bîrîm li gorî tahlîlên şênber, bi tahlîleke şênber, qada ku tê de ye bi kûranî û berfirehî binirxîne, wê di çiqas demê de xwe bigihîne çiqas rêxistin û çalakiyê texmîn bike, grûb divê ku hîs bike payedare bi erka xwe û berpirsyartiyên xwe ye. Ger talîmat nebin jî, xeta Partiyê weke talîmatekê, taktîkê Partiyê weke talîmatekê bipejirîne û ya pêwîst bike. Di vê mijarê de gotina “bisekinin bila talîmat were” yek ji xalên ku em li gorî feraseta parastina pasîf rexne dikin ve girêdayî ye. Ev jî gelek xetere.

Em ji du kesan bigirin heta bîrîma herî bi hêz, herkes qada ku tê de ye talîmat nebe jî, li ser esasê xwe sipartina xeta Partiyê dikare pîlansaziyên berfieh pêş bixe û bi şewqeke mezin xebatan rêve bibe. Dikare komîteyên eniyê pêş bixe, nûnerên xwe diyar bike, dema ku derfetên lidarxistina çalakiyan derket çalakî pêş bixe. Divê ku qebûl bike ev erkeke û ev erk jî di nava berpirsyariyê wî/ê de ye. Wekî din heta bi salan jî pêwendî qut bibe bi vî şêweyî tevgerîn dê xelet nebe û bizanibe bi vê re peywirdare. Bi vê zanebûnê şert û mercên di nav de li gorî hêza xwe guncav, ê ku şert û mercên erdnîgariyê jî hesab dike, rewşa girse hesab dike, hemû curên pîlan û rêxistinan rêve bibe û venerîn bike. Ger kêmasiyek hebe divê vê zêde pilore neke, ger pêwîst bike alîkarî bixwaze, lê qet dev ji çalakî û xebatê

bernede. Ji ber ku pêwendî ji navendê, bîrîma jor qut bû divê ku raneweste. Divê bizanibe rawestîn mirine û wisa tevbigere. Bi kurtî, taktîkê Partiyê ji bîrîma herî biçûk heta ya herî pêşketî, ji aliyê herksî ve bi heman ruhî bê jiyankirin. Divê ku bizanin serkeftin divê de veşartiye. Encamê ku ji vana hemûyan bê derxistin ev e; di welatekî mîna Kurdistanê de şoreşa ku tê de pêşkeve wê bê hevsengî be, weke ku ji bo her herêmekê wiha ye, di hemû welat de divê bi heman reçeteyî pêk we re û talîmatên wiha pêşxistin jî ne gengaze. Divê mijarê de nêzîkatiyên giştî, bi xetên sereke ji zûve bûne biryar û têgîn çêbûne. Ya girîng, bi xwe sipartina van afirêneriya xwe û xebateke afirêner berpirsyarî û yetkî derxistina holê ye. Divê mijarê de çend kêmasiyên ku dê bên kirin divê çavê me netirsîne. Divê baş bê zanîn ya herî xirab bê çalakîbûn, bê pîlanî ye û xwe radestî çarenûsa xwe kirine. Divê ku her kes bizanibe ev jî rizîn û linavçûne. Divê tu kes bê tevger mayînê nepejirîne, şerê hereketlî, êrîşkar, yê desteser dike, fetih dike ji aliyê her herêm û yekeyê ve misoger bê raberkirin. Ruh û hişmendiya pêşketinê ev e. Tehlîla şênber a mercên şênber, çalakiya şênber, rêxistina şênber û di vê de heta dawî ji xwe bawer bi ruhê êrîşê, yê fetihkirinê pêwîst dike. Ger pêwîst bike bi îknayê, rêxistinkirinê, ger pêwîst bike bi çekê, bi darê zorê, di bajar û gundan de herêmên spî yên ku hatine ragihandin çalakiyên sabotajê pêşxistin, di herêmên sor de yekeyên çekdar pêşxistin, perwerdekirin hewcedariye. Û vana heta radeya dawî demkî, aloz, hereketlî û her ku diçe berdewamkirina van, bi şêwazê çalakiyên dewlemend divê ku ji pêşketinan re bersiv bê dayîn.

Li qaliban asê nebûn, dê li gorî pirtûkê guncav be yan na, di vê mijarê de neketina dudiliyê, wê li gorî demê be yan na, wisa gotin û di nava bê teşebûn de nemayîn, ji bo ku tu bibî şervanekî gel ê afirêner divê ku esas bê girtin. Divê ji pêkhêneriya vê re cesaret bê kirin û êdî kar ji nîqaşên berfireh bê derxistin, êdî weke meseleya pêkanînên şênber û weke meseleya pilansazî û rêveberiyê bê dîtin, wisa nêzîkatî jê re bê kirin, qimeta demê li ser vî esasî bê zanîn û jiyankirin. Divê neyê jibîrkirin, derengmayîneke ji rêzê bi îmhabûna hinek grûban encam dibe. Derengmayîna çend mehan, dibe ku çarenûsa Partiya me neyênî bandor bike. Vaye em dibêjin tu qadroyî, divê ji vê re musade nekî.

Encama ku ji vana hemûyan bê derxistin ev e, pirsgirêkên me ne pirsgirêkên bîrdozî, siyasî, rêxistinî, heta di asta taktîk de neyên xetê ne. Vana hemû bi asanî ji aliyê me hemûyan ve yên ku hatine qebûlkirin, di dengdanê re derbaz bûne, di kongre û konferansan, civînên navendê de, di nav yekîtîya ferasetê de me dengdanê yekîneyên me yên biryarê ne.

Pirsgirêk ya pêkanîn, dayîna pêkanîn û venerînê ye. Di vir de bi ruhê êrîşê berê xwe dana welat, berê xwe dana karkeran, bêrê xwe dana gel, gel rakirina ser piyan û ev pirsgirêk bi rêbazên dewlemend çareserkirin, heta radeya dawî di nava tevgerê de bûnê, ferzkirina çalakiyên şayanî ya demê esas girtine. Divê hêza raberkirina çalakiyê û hêza zorê hebe, girse bi awayekî berbelav û bi hemû rêbazan em ji serhildanê bigirin heta sûyîqastên şexsî, em ji xwepêşandanên ji rêzê yên girseyan bigirin heta serhildanên girseyan, ji bajêr heta xebatên gundan, ji xebatên ciwan û karkeran, ji hemûyan re li gorî hêza xwe û bi şêwazê herî bi berhem hêza xwe bikar bînin, bersiv bidin. Nîqaşên bê ka dema vê hatiye yan na, qet ne nîqaşên me ne, ev sextekariya burjuvaziyên biçûk, reformîstên ku dibêjin: "Dema wê nahatiye" ye. Divê ku em qebûl bikin ev weke dirêjahiya van di nav me de ye, ji bo vê qet nîqaşê demê neyê kirin, dem her tim bi pêşketinên şoreşgerî re dagirtî derbaz bikin, hema bêje divê dem bê rawestîn û bi çalakiyan dagirtî bê nirxandin, em vê dibêjin. Nêzîkatî ji demê û cih re ev e.

Dibe ku xwîn bê rijandin, zorî û zahmetî bên jiyîn, lê ya ku qezenc bike şoreşe. Wê demê ya ku di pratîkê de kamil bûye û bûye hêrseke bi hêz a me hemûyan û di taktîkê partiya me de şênber bûye, rêbazê xebata xwe ya rojane em hîn afirîner û şoreşgerî bikin. Em di vê mijarê de helwestên du alî, dudil li aliyekî bihêlin. Em berxwedana gelê xwe ya bi esil a ku dê bi paşeroja xwe ya dîrokî ku lenetkirî hesab bixwaze û bi vî rengî xwe li ser serdemê ferz bike bê ku dudiliyan bijîn bilind bikin. Gewretirîn vîna xwe, zanîna xwe ya bi hêz, di pergala çalakiyên bi berhem, rêxistinkirin, tişta ku dikare bê girtin, girtin, yên ku bên qezenckirin, qezenckirin, bidestxistin û weke pêwîstiya duruşmeya şoreşê, weke ku di tevahî gelan de heyî rizgariya gelê Kurdistanê jî ji vê wahşet û dagirkeriya mezin encax bi vî ruhî pêk bê. Ji serî heta dawî, di tevahî qonaxên têkoşînê de, bi ruhekî êrîşê yê wisa dê şoreş bê qezenckirin. Li ser vî esasî em nebesî û neyêniyên dema borî derbaz bikin. Radestî û provakasyonên ku li ser me tên ferzkirin, ji bo careke din zindî nebe em bixin qebrê. Û tevizandina li ser gelê xwe, bêtevgeriyê derbaz bikin, wisa ya ku hemû tiştî fetih dike derxînin holê. Wan bixin pergaleke berfireh a şer û berxwedanê. Ji bo fetihkirina erkên bi vî rengî, divê qadroyên me bi hemû hêza xwe ve bi ruhê hucûmê bi ser erkan de biçin û pêvajoya pêşiya me bafirînin. Ev fermana Partiyê ye, erka Partiyê ye. Ji jor heta jêr, ji Rêbertiya partiyê heta sempatizaneke ji rêzê, ev erkên ku me hemûyan girê didin û misoger divê pêk werin, weke pêwîstiya girêdana bi gelê me, şehîdên me û bîrdoziya me em serkeftî pêk bînin!

## Wê Serkeftin Bibe Ya Partiya Ku Bi Vî Rengî Şer Dike!

**Adar 1985**

## EM WÊREK BIN KU BIKARIN PARTÎ Û GEL JI BONA ŞOREŞÊ BIRÊXISTIN BIKIN Û RÊVE BIBIN

### Ji Kadroyên Partiyê Re

Mercên ku gel di nav de dijî, pêşketinên lez û ji bo ku em vana bi şoreşê ber bi encam ve bibin, pêwîstî bi ked û wêreyekî mezin heye. Ya ku eserê van teva ye Partî, dîsa pirsgirêkên Partiyê yên bîrdozî, polîtîk, rêxistinî, damezrandina rêxistinê û pirsgirêka rêveberiyê di roja me de di rewşa herî metirsîdar de ye. Lê di heman demê de, dikare pêşketinên nîtel ên di asta jor de jî bafirîne. Ger di demê de ji mercên objektîf û sûbjektîf re bersiv bê dayîn, ji bo pêngava azad û herî bi hêz a dîrokî bê kirin, derfetekî dîrokî ku divê ji dest neyê derxistine. Ev ji bo Kurdistanê mijara hebûn û nebûnê ye. Divê yek kêliyê jî ev rastî neyê jibîrkirin. Ji ber vê em bi erkên gelek mezin re rû bi rû ne. Rista diyarker di vê de dikeve ser milê milîtanên Partiyê ên

pêş. Behremendiyên xwe li gorî vê raberkirin, şoreşgeriya ku di vê demê de tê xwestin bi hêz û têrker pêkanîne. Ji bo vê ya ji dest tê kirin û tevahî astengiyên çi ji derve çi jî ji hundur derdikevin vala derxistin, di nava xeta Partiyê ya rast de ber bi gavên ku tê awatkirin ve meş û ev dê misoger bi serkeftinê pêk were. Ev jî rastiya ku divê ji aliyê ti şoreşgeran ve neyê redkirin, di heman demê de weke mercê pêşketinên bêderfet neyê dîtin, divê dûbare dûbare em vê destnîşan bikin. Heta niha li berçavgirtina hestyariya dem û rewşê tevî ku bersiva pêwîst me girt, hemû xebatên Partiyê, bi taybet ên ku di nav xebatên pratîkî de cîh digirin, milîtanên rêveber û damezrêner ger dûbare be, heta acizker bê dîtin jî, ya ku em neçarin bikin û misoger serkeftina wê pêwîst dibinin. Bi ti biyaniyan serdeneçûna wê em ê nikaribin qebûl bikin, çi dibe bila bibe misoger encama ku dîrok ji me re bêje serkeftine ji bo dest bixin ya di dest tê divê bê kirin. Ji bo vê di serî de em bi hemû berpirsyariyên şoreşê bi ser erkên xwe de biçin. Ji bo ku erka xwe serkeftî pêk bînin heta dawî hişyarkirin, ger pêwîst kir hişk bi serdeçûyîn jî di nav de ew vexwendina erka xwe pêkanîne, pêdiviya sereke ya berpirsyarî, girêdayîna me bi gel û Partiyê ye. Ev di heman demê de divê ji aliyê hemû milîtanên Partiyê ve bi vî rengê bê dest girtin.

Heta niha di gel pêşketinên erênî, bi taybet jî milîtanên me, em ji bîrdoziyê bigirin heta qada çalakiyan, nêzîkatiyên wan ên teng û seranser, ji evîndariya xwe bigirin heta cebantiya zêde, em ji nîşaneyên burjuvaziya biçûk bigirin, heta ecemîtî û karîyerîzmê, ji hemû curên tasfîyegeran re li pêşiya kar bi zanebûn, gelek caran jî bi nezanî çawa dibin asteng. Çawa mîna koleyan serê xwe li ber vê ditewînin îbadet jê re dikin, heta cîh bi cîh derdixin asta ferasetê bi êş dibînin û ne pejirandina vê bi hemû hêrsa xwe, neçar dimînin dûbare dûbare qîr bidin. Ger ya tê bendewarkirin, bi serdeneçûna erkên pêwîste cî bi cî bên kirin ên gengaz û di heman demê de mecbûrîne, bi kurtî Partî û gel ji bo şoreşê ber bi rizgarî û rêxistinê, bi rêbazekî têr nake rêvenebirin û weke ku bi nivîsên cuda de dirêj dirêj me aniye ziman, vêna bi tevger û ferasetên nebes ên cur bi cur ber bi rewabûnê ve dibin, ji gelek kesayetiyên milîtan ên Partiyê, yên ku bi çi dilîzin ji nezanî ve tên, lê ji bo me heta radeya dawî eşkere ye yanî teslîmkarî û serî tewandin, di nava Partiyê de dixwazin vê zindî bikin, ya ku ji me dixwazin ne tenê pejirandina vê, erêkirina wê jî ji me hêvî dikin. Li dijberî şoreşgeriyê baş bê zanîn ku her diçe hêrsa me li beramberî van zêde dibe. Divê ku di van helwestan de neyê israrkirin, ger bê israrkirin bi hemû curên

fedekarî û ger pêwîst bike em ê hemû nêzîkatiyên hişk jî bigirin berçav û di derbarê derbazkirina van de em dixwazin biryardariya xwe dupat bikin.

Ji bo vê van tengbûnan û ji wan sedemên ku çavkaniya xwe ji bandorên serdema navîn û burjuvaziya biçûk mane digirin, dîsa ji bo derbazkirina nîşaneyên bandorgeriya dagirkeriyê divê ku her kes ya ji dest tê bike. Vê jî ji bo ku hêza gel a ku dikare ji bo şoreşê rake ser piya û bigihîne asta wîze, behremend û hostatiyê, derfetên me heta dawî ji vê re dest didin. Bê ku em bibin evîndarê xwe em ê bi asanî bikaribin vê ser bixin. Em ê bibînin ku ev ne tiştekî bêderfete, heta çalakiyeke dêrîne. Ger em pêkanîna vê bi awat û xwestekek mezin pêk bînin û bêjin pêkanîna vê jî bilindbûneke pir mezine, em dê rastiyan bînin ziman.

Wê demê heta niha di welat û derveyî welat de, ji xebatên bîrdozî heta yên çalakiyên di her qadê de, dixwaze bila ji ber sedemên di nav de yan jî derve tên be, bila ti kes serîtewandina teoriya nepêşketinê ya ku nav lê nehatî kirin û gelek curên wê li ser me ferz neke. Heta dawî tirsnakî û xeteriya vê kes paşçav neke. Bi hinek rêbazên taybet bi xwe û cur bi cur bi giştî li ser Partiyê, bi taybet jî li ser Rêbertiya Partiyê ji roja yekem û vir ve pêşketinên bîrdozî, siyasî, damezrîna rêxistinî û rêvebiriyê çawa derxistiye holê? Ev di pêvajoyên çawa re derbaz bûn? Çawa derket holê? Nezanîn, bi qasî tê xwestin fêm nekirin, ger bizanibe û fêm kiribe jî ji bo derbazî pratîkê bike, li gorî pêdiviya xeta Rêbertî guncav tevnagerin jî hene. Kesên ked û çoş bi qasî tê xwestin rabernekirin, ger raber bike jî ev bi hostatî pêkanîn û veneguherandina encamekî madî, ev jî weke şoreşgeriyeke divê bê qebûlkirine li ser Rêbertiya Partiyê ferz dikin hene. Kesên sere Rêbertiyê li beramberî kêmasiyên xwe tewandin û yên ku dikevin nava xefleta vê bi tevger û nêzîkatiyên xwe yên cur bi cur pir kêm nînin. Em ji milîtanên pêşdehatî yên Partiyê bigirin heta gelek kesên îflah nabin, bermahîne, lumpen û endamên burjuvaziya biçûkin, helwestê ku herî zêde dixwaze bê raberkirin ev e.

Lê na, di nav me de şoreşgeriya bi PKK’ê pêk tê, şoreşgeriya ku ji aliyê Rêbertiya Partiyê ve nûnertiya wê tê kirin, li gorî daxwaza ti kesên xwe nenas, şîroveyên wan nayê dest girtin û di nava PKK’ê de weke şoreşgerî nayê pêkanîn. Parastina vê sergirtî yan servekirî nayê kirin. Weke sedemên nepêşketin û xwe nerêxistinkirinê nayê diyarkirin, weke sedem diyarkirin û binkeftîbûn nayê erê kirin. Wê demê em bizanin Rêveberiya faşîst a 12’ê Îlonê ku li pêşberî me ye her roja ku derbaz dibe teşîr û tecrîd dibe. Di nav xwe de dirize, venerîna wê ya faşîst her ku diçe li ser Kurdistanê kêm dibe, tenê ne li rojayê Bakurê Kurdistanê, li Başûr û Rojhilatê Kurdîstanê jî

valatiyeke mezin derketiye holê û dibe ku ev derfeta herî mezin a ku di dîrokê de destê me ketibe. Ger ev ji nedîtîve nayê, divê bê qebûlkirin ku şoreşgeriya ku divê em pêk bînin, ji şoreşgeriya ku em îro pêk tînin gelekî zêde ye û pêşdetire. Vaye, em dibêjin; girîngiya raberkirina vê û ji bo ku ev girîngî bi serkeftinê temam nebe divê ti biyanî neyên nîşandan. Li vir em hem mafdarin, hem jî gengaziya vê dibînin. Em dibêjin; xwediyê merc û pêşketinên ku dikarin vê bi serkeftinê bigirine, ji bo rêvebirin û pêşxistinê em têr dikin, şayanî vê ne û serwerin.

Di demên dawî de bi israr di gelek qadan de, tengaviyên xwe yên herî ji rêzê jî ji sazîyeke mîna Rêbertiya Partiyê re, bi asanî mîna nameyên mirov aciz dikin nivîsandinê bigirin, heta “divê ku em hîn bêtir bên ronîkirin, îzahatên zêdetir ji me re pêwîstin”, helwestên bi vî rengî ku şayanî me nînin zêde ne. Ev 15 sale Rêbertiya Partiyê ji aliyê teorîk, pratîkî ve hem nivîskî hem devkî hewldaneke bêhempa raber kirin. Weke ku ev nehatine ziman tiştekî wiha di holê de nîne. Ji zikêşiyeke herî mezin em bigirin, heta bûhrana ruhî yên ku çavkaniya xwe ji burjuvaziya biçûk digirin, hemûyan weke meseleyên siyasî ku dixwazin di nav Partiyê de raber bikin kêm nînin. Heta gelek ji wan pir zêde dibêjin serê me tevlîheve, ji bo vê jî dixwazin nêzîkatiyeke xweşbîn ji wan re bê raberkirin û dikevin nav hemû curên nêzîkatiyên hestyar û dixwazin ev jî xwezayî bên pêşwazîkirin. Heta ji vê jî wêdetir dixwazin pîrîmên siyasî ji wan re bê dayîn û xelatkirin. Em ji “karîyerîzmê” bigirin heta nêzîkatiyên daxwazên xebat, jiyanek rehet û bê esil, xwe radestkirina şoreşgeriyeke nebez û serî jê re tewandina wê û gelek xerizeyên ku dişibin van erêkirin heye. Di nava Partiyê de ji van re derfet dayîn, mafê jiyanê dayîna nasîn, vekirî nebe jî, bi rêbazê xas ên jinepîran be jî dixwazin, mirin-qêrîn û fesadiyê dikin. Heta têkiliyên Rêbertiya Partiyê ên hevaltiya mezin sifatên rêzdayîna mezin a hevaltiyê, sebir bi rastî jî bi gavên mîna moriyan bi erdê re dixişikin, dixwazin bi wan xerîzeyên xwe yên erdê ve dixişikin re bikin amûr û cesaretî vê dikin. Eşkereye ku ev layiqî Partiya me nabin.

Tevî ku me çekên herî bi hêz ên bîrdozî, polîtîk û leşkerî jî daye destê wan, yên ku nikarin ji rêzê van kar bînin jî, bi asanî şansêkî rêbertiyê ji wan re nasînê dixwazin, bi evîndariya vê ketine û ketine xefleta qebûlkirina vê. Yên ku axaftina herî kêm, propaganda herî kêm, rêxistina herî kêm, çalakiya herî kêm weke sedema rêbertiyê ferz dikin ne kêmin. Nafikirin, ger bifikirin jî bê ku fêm bikin û pêdiviya vê pêk bînin, ji bo vê ked raber bikin bi înad kesayeteke ecêb raber dikin. Dibêjin; “Em ev in, encax dikarin ewqasî bikin.” Bi kurtî ne şoreşgeriyeke ji bo serfirazî û serkeftinê,

dixwazin şoreşgeriyeke nebes, di her kêliyê de mirov bi hêrs ji cihê xwe hilperîne, bin bikeve bê erêkirin. Xwedêgiravî yên ku dibêjin em pir girêdayî Rêbertiya Partiyê ne, meftûnî xeta Partiyê ne, dîsa ên ku qet axaftinan nayînin ser gel û Marksîzmê xwediyên vê ferasetê divê bizanin ku, ev helwest mirov tengav dikin. Îsyanê didin kirin û di her kêliyê de rêxistina me bi binkeftinê re rû bi rû dihêline. Ger hinekî din binê wê bê kolan dê bê fêmkirin ku ev ferasetên bêhna koletî û teslîmkariyê jê tê ne ku dixwazin, di nava Partiyê de xwe bigihînin şêwazekî nû ye. Yên ku xwe di vê rewşê de dibînin, heta dawî mafê xwe dibinin, lê bizanin ku heta dawî ne mafdarin, her tim li ser Rêbertî axaftin û bi Rêbertiyê re ketina nav pevçûnê baş bizanibin ku bê pîvanî ye. Di qonaxeke herî awarte de, bi pêwendiyên bilind ên Partiyê lîstin dibe ku ji hinekan re rehetiyeke şexsî pêşkêş bike, hinek tiştan li bêrîkirinên wan ên kariyerê zêde bike, lê ev tenê li beramberî berxwedaniya bilind a gel û Partiyê astengin û neyê jibîrkirin hêvî didin dijmin.

Di vê mijarê de em ne alîgirê tengkirina rexneya û hedefgirtina kesayeta filan an bêvanin. Dîsa em naxwazin bikevin nêzîkbûnek teng ku van mijaran tenê xweseriya qadekê ye yan jî tenê bi qadekê ve sînordar bikin. Weke hat diyarkirin, ev di gelek herêm û kesayetan de, di vê astê yan jî di wê astê de her çiqas meyl û nîşaneyên xwe ferzkirinê hebin jî, gelek teşegirtinên ruhî ya ku em dikarin bêjin aloze bi taybetmendiyeke wiha Partî girê dide. Hişmendiyê li zincîran dide û rewşeke ruhî ya bi vî rengiye. Çavkaniya van, bingeha dîrokî û civakî hatiye destnîşankirin. Ji bo derbazkirina van, otorîteyeke Partiyê ya çawa pêwîste hatiye gotin. Beriya niha dixwaze ji Navenda Partiyê ya Kurdistanê, dixwaze navenda Partiyê ya Ewrûpa û qadên din re talîmatên bi devkî û nivîskî hatine şandin de sedemên sereke hatine destnîşankirin. Dîsa berg bi berg nivîs hene, axaftin hatine kirin.

Şoreşgeriya serkeftî ya kêliyê bi rêxistin û çalakiyê, bi xebateke çawa dikare bê afirandin? Disa di vê demê de otoriteya Partiyê ku bê ferzkirin otoriteyeke çawa be û jiyana Partiyê divê jiyaneke çawa be, taybetmendiyên milîtan çawa bin, bi mehan heta salan beriya niha me şênber kir. Ev jî di pratîkê de milîtanên Partiyê yên jiyan dikin û şehîdên xwe ve çawa şênber bûye û me hewlda em şênber bikin. Karê navxweyî yên Partiyê di hemû qadan de û ji yê herî ji rêzê, heta yê herî aloz divê çawa bê destgirtin me diyarkir. Di serî de jî divê Rêbertiya Partiyê çawa bê fêmkirin û pêkanîn me vegot. Lê wisa tê fêmkirin ku, hinek ji wan di asta herî kêm de be di encam negirtinê de înat dikin. Weke hat gotin, heta niha jî

cesareta tiştên herî ji rêzê jî li ser Rêbertî ferz kirinê dikin. Vaye, bi nirxandinên herî dawî ve girêdayî, bi rastî jî gava herî mezin a dîroka me tê avêtin, di vê pêvajoya ku ji aliyê ruhî ve em xwe nû dikin, hewl didin amadekariyan bikin de em ê ji van re bêjin êdî bese.

Em dixwazin vê dîroka xwe bi rêbazekî şoreşgerî binivîsin. Gelê me daxwaz û awata bi hêz daniye holê. Dijminê me rewşek herî parçe û belavbûyî dijî. Başe li beramberî van mercan kîjan şoreşgerê evîndarê xwe yê ku rast nabe, di demeke wiha de û di qonaxeke ewqas pêşketin tê de tên jiyîn de, dikare nebesî û tengbûnên xwe ferz bike? Na, girêdanek ji rêzê ya bi gel ve, girêdana bi Partiyê û Marksîzma ku rê nîşanî wê dide bê derfetiyan bi derfet dike, nebesiyan derbaz dike. Bêcesaretî û hejariyê; digihîne şêwaza herî pêşketî ya cesaret û fedekariyê. Rêxistinî û çalakgeriyê dikare gelê me rake ser piyan û wê li beramberî dijmin dikare bigihîne asta ji serkeftinekê ber bi serketinek din ve baz dide. Bila ti kes me di derbarê negengazî û pêşxistina helwestên wiha re mijûl neke. Em kesên ku dizanin karên me çawa pêş dikevin û bi hêz dibine.

Niha dîsa ger dûbare be jî divê ez diyar bikim ku PKK rawestgehên xwe yên pêşketinên rêxistinî, siyasî û bîrdozî dema ku jiyan dike, kar ji sifirê çawa gav bi gav hatin pêşxistin herkes neçare bi kûranî fêm bike, da ku ji pêşketinan bawer bike. Em weke Rêbertiya Partiyê, dema ku me peyvên yekem ên bîrdozî destnîşan kirin, di navenga çiktarî de û di binê şûrê demokles de her tim li ser serê me dihejiya, me çawa cesaretî fikirandinê kir destnîşan kir. Ev cesaretek mezin ê çawa dixwaze, ev cesaret tenê ne li beramberî dijmin li beramberî zordestiya wî ya tazî sekinînê jî cesaretek hate meşandin bû, me ev jî derxist holê. Ji bo gel, ji bo welat, ji bo mirovatiya pêşverû, ji bo qetandina tarîtiya pir zêde ya li welat, çawa bi gavên biçûk û bi kiteyek du kiteyan derket rê ji bo vê bê amadeyiya me ya despêkê zêdebûna bêderfetiyan bawerim pêwîst nake bên vegotin. Ji bo qezenckirina gundiyekî ji rêzê, ji ciwanekî re daxwaz û awatek pêşkêşkirin û ji bona di wî/ê de ev bên afirandin, ji bo hinek zanebûna dîrokî û siyasî bê bidestxistin, ji aliyekî ve serweriya dijwar a dagirkeriyê, ji aliyê din ve di nava refên gel de jî hebûna şêweya çavkorî, di navbera her cure bîrdoziya serdestiya ji rêderxistinê de, em hewce nabînin cardin dubare bikin ku bi rewşa xwe ya lewaz ve çawa ji navê derketin û pêşve çûn.

Hewce nake ku em bejin dagirkeriyê ji sedên salan ve, gel di nava mercên zext û zoriya herî hişk a siyasî û leşkeri de aniye rewşek nenas. Bi rêbazên tinekirinê yên herî çors û zirav ve, bi hîlekarî her cure têkîliyên siyasî û rêxistinî yên ji serdema navîn mayîn ve, gel xistiye rewşek wisa

nikare gav bavêje, xwe bifikire, xwe nizane û nas nake. Lewra ji bona em vî gelî bigihînin xeta siyasî ya şoreşgerî hewce nake ku em bejin gava destpêkê çiqasî bê hêvî bû û çiqasî kêmasî hebûn. Dîsa pêwîst nake em bînin ziman, em çawa wêriyan vê bikin. Ji bona avakirina hişmendiyek siyasî ya ji rêzê û avakirina çalekiyekê bi rastî jî di nava qonax û mercên ku kêm mirov wêrekiyê raber bikin ku hêza meşînê raber bikin de, me çawa hişmendî û wêrektiya vê raber kir? Lewra hewce nake em bêjin kesî negot em bi ser kar de naçin. Ji bona pêşxistina hişmendî û wêrekbûna vê em çawa bi xwe re mijûl bûn. Dema em ketin pêvajoya damezrîna rêxistinî, Komara Tirkiyê çawa bi giştî rabûn ser piyan, çawa di nava rêfên gel de şovenîzma civakî, teretûrên hov û burjuvaziya biçûk meşandin. Dîsa me çawa wêriya li hember ferasetên serî didan tewandin û li beramberî astengiyên wan berxwedanek bêhempa raber bikin. Her kêlî hema bêje bi çembera mirinê hevgirtin û çawa hêza ji vê çemberê derketin hat nişandan? Disa pêwîst nake bê gotin bi perwerda herî kêm û amadekariyên herî kêm ve vana çawa hatin jiyîn.

Bi kurtî em qala pêvajoyan dikin û ew demên ku gelek zêde hatine vegotinin. Bi rastî jî ji van deman re rêbertiyeke bîrdozî, siyasî û rêxistinî hatiye raberkirin. Hewla rêveberî û damezrandinê hatiye dayîn. Em îro dixwazin bixin bîra gelek milîtanên evîndarê xwe ne, bi rastî jî înşaya bîrdozî, damezrandina siyasî û rêxistinî û rêveberî jixweber çênebûn. Her tim bi lêdana dilekî qet ranewestiyayî û mejiyekî netevizî ve, di mercên Kurdistanê yên ku her tim dil reş dikir, neyînî dafirand û bê bawerî pêş dixist de, bi înad mercên ev dil û mejî hat ferzkirin, pir sînordar be jî pêşketinên derketin holê, me kir bingehê pêşketinên hîn bi hêz em ketin nava rêveber û damezrîneke wiha. Yek ji van jixweber nehatiye bidestxistin. Em ji bermahiyên herî biçûk ên zanînê bigirin heta avabûna madî, li pişt hemûyan bi dilekî bêdeng nebûyî û ranewestiyayî, xebata mejiyekî her tim dibiriqand mijara gotinê bû. Ev misoger divê wisa bê fêmkirin. Di PKK'ê de dixwaze bila di dema grûbê de be, dixwaze di qonaxa niha de be ti pêşketin jixweber pêş neketiye. Ji her tiştî re hewla dil û zanînê ya bê navber hevaltî kiriye. Encax kesên di nav me de û dervî me yên rast nabin, nehişyar, bê teşe û bi rastî jî burjuvaziyên biçûk ên ku mirov li beramberî wan aciz dibe, aware, serserî bi zanîna vê ya lewaz dikarin wisa bibersivînin. Rewşa rast ne ev e.

Wê demê em dibêjin, ji qonaxa yekem heta em gihiştine roja îro, em ji şêwegirtina herî biçûk a bîrdoziya pratîka xwe bigirin heta pêşketinên siyasî yên herî girîng ku me îro xwe gihandiyê û tenê em Rêbertiya Partiyê

bihesibînin li beramberî zehmetiyên gelek mezin ên 15 salan derbaz dike. Li pişt her pêşketinekê hewldaneke ji baweriyê der heye. Bê pênc kurûşî, bê fîşekekê, bê çend gotin, qonaxeke çiktarî û desthilatiya bêhempa ya paşverûtiyê tê jibîrkirin? Vaye, derketineke wiha, ji vê re cesaret kirin, ev rêvebirin ne weke tê zanîn bi cesaretekî ji rêzê û rêveberiyê ve çêbûye. Na, bi rastî jî bi qasî ku kes bawer neke, ji bo doza şoreşa vî gelî bi cesaret û zanîneke têrker, bi rastî jî Marksîzm bi şêweyek herî serkeftî li gorî mercên welat pêk anîn, cesaret û fedakarî hat raberkirin û hat pêkanîn. Di bingehê van hemûyan de zanîn hatiye raberkirin û raxistin.

Me qonax hema bêje bi hemû taybetmendiyên xwe ve gotin, ger pêwîst be em ê dirêj dirêj vebêjin. Em li hinekan dinêrin, heta niha jî wisa dizanin ku ev kar ji ber xwe ve gihiştine vê xalê. De îcar bi wan çekên ku me dane destê wan û dema çalakiyek an du çalakî lidar xistibin, em dibînin hema xwe mîna egîdekî dibînin û dibin evîndarê xwe. Girêdan û merdiyeke ji ya şovelyayên serdema navîn kêmtir raberkirin weke rêhevaltiyeke baş dihesibînin. Çalakiyên ji aliyê leşkerên bi pere bihêztir û baştir pêş dixin, dixwazin ji aliyê me ve mîna çalakgeriya Partiyê bê erêkirin. Na, tiştên wiha nabin. Em naçarin ji van bê dil û bê mejiyan re bêjin şoreşgeriya ku me ava kiriye şoreşgeriyeke çawa ye? Fîşekeka me bi dest xistiye çawa hatiye destxistin? Ji bo her yek ji wan me çawa di nava dorpêça mirinê de jiyan kiriye? Dilê me çawa her tim wisa lê daye? Teqandina fîşekê bûyera herî basîte. Bi ser hêzên faşîst de çûyîn li gel me coşa cejnê ye, aliyê herî asan a vî kariye. Wê demê divê herkes bizanibe ku di nava partiyê pêwîste milîtaniyek çawa bê destxistin. Ger naxwaze bikeve rewşek pênc qurişî, naxwaze bi guhê wî/ê bê girtin û bê avêtin, neçare ku vê cidiyetê pêk bîne.

Îro, weke Rêbertiya Partiyê em ê qala bê amaniyên şert û mercên ku em tê de ne jê gazincan nekin. Ji ber ku em pir baş dizanin, yên ku rêbertiyeke wisa li ser me ferz dikin di serî de şehîdên me yê berxwedaniya mezinin. Ji Heqîyan despê dike, heta Mazlûm, Xeyrî, Kemal û Mehmedan, şehîdên me yên şoreşê di nava şertên berxwedanî lê zehmet de jî li ber xwe dan û zanîn ji bo vê şehîd bikevin. Wan mîna Rêbertiya Partiyê li ber xwe dan. Di nava şertên herî zehmet de PKK'ya têknaçe afirandin. Başe, Rêbertiya Partiyê ji vê cuda dikare bê fikirandin? Mane neçare bîranîna wê şoreşgeriya bin nakeve bidomîne? Ger Rêbertiya Partiyê bi vî rengî ye, em vê ji xwediyên her cure kêmasiyên ku weke kesên qaşo girêdayî Rêbertiyê ne, heta wan kesên ku em herî zêde qebûl nakin, yan jî tipên bêbinî yên em weke rêheval nabînin, di heman demê de kesên durû ên Rêbertiyê red dikin, di gotin de xwedêgiravî Rêbertiyê qebûl dikin û di cewher de qebûl nakin dipirsin.

Hûn qala girêdaneke bi Rêbertiya Partiyê ve ya çawa dikin? Girêdan çiye, pêdiviyên wê çine, çawa tê tehamulkirin? Mirov neçare hinekî durist be.

Bi rastî em rêvebiriyek, hem jî hewldanên rêveberiya damezrîner raber dikin. Em vala najîn, em mîna fermanberekî dixebitin. Madem yên ku her tim me rêve dibin hene, Marksîzm- Lenînîzm me rêve dibe, bêrîkirinên pêşverû yên mirovatiyê me rêve dibin, şehîdên me, me rêve dibin, di serî de jî daxwazên gelê me yê bi esil me rêve dibin, madem em di bin vê rêvebiriyê de her tim radibin û rûdinên, dixwin û vedixwin, xwe bi pergal dikin, em hewl didin milîtaniya ku ev dixwazin pêk bînin, başe ma ev ne jiyaneke ji bo hemû Partiyê derbasdare? Ev şeş sale em ji civakê qutbûne. Bi kurtî masî çawa ji avê qutbûye, bi şêweyek ku ji hemû rastiyan qutbûyî, hema bêje di nav şertên gelek zehmet de em henase werdigirin de, ewqas mirov perwerdekirin, ji aliyê madî û manewî ve ew amedekirin, heta pêdiviyên wan ên herî ji rêzê em ji pêlavê bigirin heta pêkanîna çek û derbazkirina nexweşiyên wan û nûkirina cesareta wan, ma em naçarin hemû tiştên wan tena bi serê xwe bidin? Ma her milîtanek ne neçare li gorî hêza xwe tiştekî tevlî bike? Rêhevaltiya ku me bi hev ve girê dide ne ev e? Ji dervî vê ti pêwendiyeke me bi hev gire bide heye? Weke Rêbertî me ev hemû di dema xwe de û bi qasî tê xwestin pêk ne anîn? Rewşa yê ku hêzên dewletan li pişta wan e di holê de ye, di nav me de rêveberiya bîrdozî û polîtîk a têrker hat desnîşankirin, yan na? Rêveberiya têrker a rêxistinî, bi hemû cure parastina qadroyan, ev ber bi qadên têkoşînê veguhestin û di asteke biçûk neyê dîtin de ji aliyê madî ve amadekirin û sewqa wan hat kirin, nehat kirin?

Bi rastî jî gel'ekî weke yê Kurdîstanê hejar, nayê naskirin, tu kes pêre nabe alîkar û li ser esasê bi xwe ve girêdanê nêzîkatî jê re hatiye kirin, qadroyên di nava rastiya gel'ekî wiha de jiyane ji hewayî, bejahî û bi xeteriyên herî kêm em wan nagihînin navenga têkoşînê? Navenga têkoşîneke wiha ye ku ji bo me gihiştina wir cejne. Ma ev şansa ku me nedayî xwe, ne da van hevalan? Me ev bi rastî jî bi şêweyekî rayedarên dewletê nikarîn ser bixin de, me ser nexist? Heta niha jî bi şiklekî herî xeter ji bo ku ji aliyê qadro ve, çek, dîsa talîmatên têrker û ji bo ku xwe bi pêwendiyan bixemilînin, ji aliyekî ve bi afirandina gelekî her tim wan qebûl dike, ji aliyê din ve her tim ji bo ku refên xwe bi bandor bikin, bi xebatên rêxistinî û propaganda ma em her tim alîkariyê bi we re nakin? Ji cixara wan bigirin heta têrkirina zikê wan, bi pêşwazîkirina hemû pêvidiyên wan ku rewşa gelê me ya pir xizan a hejar derbas dike jiyanekê pêşkêşî wan nakin?

Başe, şoreşgeriya ku ew li beramberî vê raber dikin çawa ye? Rastiyên ku divê bersivên baş an jî têrker jê re bên dayîn hene. Rêbertiya Partiyê çima dixwaze vana hemûyan bike? Yeqîn dikim ne ji bo dil û kêfa van paşayane. Mane vê weke pêwîstiya girêdaneke kûr a bi gel ve, bîranina şehîdên berxwedanê ji bo jêbirina şerma dîrokê nake? Ma şev û roj ji bo vê em xwe sererast nakin? Ji bo têr bikin, ji bo ku em lez bikin binkeftinê bigihînin serfiraziyê em jiyan nakin? Ma em gazincan ji vê dikin? Her roj xeteriyên mîna şûrê demokles li ser serê me diheje hene. Di her kêliyan de xeteriyên ku me bifetisînin hene. Ma ji bo vê me gazinc ji kî kir? Me ji kî re got: “ Werin alîkariya me bikin?” Bi derfetên xwe yên şexsî ji bo berdewankirina Rêbertiya herî mezin, zehmet û bi hêz ma em devjê berdidin? Cesaret û zanîn ne ji bo qadro gihandina asta têrker tê hilberîn? Ev rewş bi Rêbertî re wisa ye, bi yetkî bi berpirsyariyên kêm, lê bi derfet û fersendên mezin milîtanên ku hatine xemilandin êdî dikarin çi bêjin? Êdî ji bona bûna rêxistin, artêş avakirin û gel rakirina serhildanê dikarin kîjan kêmasiyan ferz bikin? Dikarin çi sedemên ji rêzê hemêz bikin û xwe veşêrin? Ma dikarin bifikirin ku Rêbertî vê nabîne?

Belê, kar misoger pêş dikevin û hema bidim diyarkirin ev ne xebata filan û bêvan milîtanî ye. Ji bêrîkirinên kûr ê gelê me bi afirêneriya Marksîzm û Lenînîzmê ya bi rastî bersiv dide xeta me ya Partiyê, bandora me ya bîrdozî û polîtîk karan her tim pêş dixe. Di vir de milîtan şûnde dimînin. Gel dixwaze tevlî sedan çalakî bibe; kî ev tevlî perwerdê û rêxistinê kirin? Bi sedan ciwan dixwazin çek rakin, dixwazin bibin milîtan; rêvebiriya Partiyê ya pratîkî çiqas dikare ji vê re bibe bersiv? Gelê me bi giştî dixwaze rabe ser piyan; çiqas bi xebata rêxistinî ji vê re bersiv hat dayîn? Sal derbaz dibin, bila kes qala tengbûna demê neke. Belê divê qadroyên me evîndarê xwe nebin, bê ku sebir û kamilbûnê ji dest xwe bernedin divê bersiv ji vê re bidin? Dema ku me Partiya xwe dimeşand, em nebûn ehpabê filan an jî bêvanî, ji bo ku em ji zikêşiyên filan û bêvan re bibin derman jî rêve nabin. Yan jî ji bo tengaviyên filan û bêvan, koletî, teslîmîyetkariyê, hemû curên nexweşiyên zarokatî, ecemitiyan em rêz raber bikin, yan jî her tim wan rewa bibînin jî rêve nabin. Berevajî em vana hemûyan bi kîneke mezin pêşwazî dikin, bi rastî ji bo avakirina rêxistina milîtanên doza şoreşa gelê me, ji bo herkes bibe milîtanên bi hêz em vana dikin. Hewl didin nûnertiya wan bikin. Feraseta ku divê li ser çalakî û Partiya me serwer be ev e.

Nikare bê gotin ku ev tenê taybetmendiyeke sembolîk a Rêbertiya Partiyê ye. Em pir baş dizanin, nûnerên ketî yên provakasyonan ev bi vî

rengî dîtin. Rêbertiya Partiyê mîna pîrê fanî zêde derketiye pêş, îfadeyên hema di her kêliyê de wê bimire nirxandin. Dîsa bi hemû curên ehbabçawîşiyê yên ku Rêbertiya Partiyê jî ji xwe re mîna ehbabçawîşekî hilbijartin, yên ji raberkirina vê durûtiyê şûn ve neman, xwestin wiha fêm bikin. Lê rastî ne wisa ye. Rêbertiya Partiya me bi jiyana xwe û bi şehîdên xwe ve ne rewşeke pîrê faniyê ye. Bi qasî ku di sedan sal de bi cih bibe otoriteyeke zindî ya pêş dikevê ye. Ya ku dikeve nava hemû şaneyên gelê me, em ji malbatê bigirin, heta bajaran hemû mirovên xwe ji kûrahiya dil heta hêza mejî ya ku girtiye bin serweriya xwe û otorîteya ku dê bigire bin serweriya xwe ye jî.

Belê Rêbertiya Partiyê, otoriteya ku serwere li ser hemû pêşketinên di nava Partiyê de, yê ku pêş dixe û reve dibê ye. Dema ku bi vî rengî hate destgirtin, êdî şoreşgertiya divê bê raberkirin jî tê fêmkirin. Lê bi taybet em dixwazin qala nexweşiyên zarokatî bikin. Gelek heval pêwîstiyên xeta Partiya ku di kesayeta Rêbertiye de şênber bûye û tê rêvebirin li aliyekî datînin, wisa fêm dikin ku weke wan fêm kiriye dê şoreşgeriyek bê pêkanîn û pejirandin. Ji bo vê jî sedemên cur bi cur diyar dikin û wisa dizanê wê xwe bidin efûkirin û bên erêkirin. Lê rewş ne wisa ye. Bi şêwazekî berbelav nexweşiyên zarokatî tên ferzkirin. Ferasetên ecemî, sertewîner û tasfiyeger hene. Çiye nexweşiya zaroktî? Karên xwe di demê de, li gorî pêdiviyên xetê nepêkanîn, hemû curên teng destgirtin, seranser, brokratîzm, û nerîna teng ya gundîtî em ji yên herî jor bigirin, heta nexweşiyên ku qirika gelek milîtanan girtiye. Ev tê fêmkirin. Pêkanîna Rêbertiya Partiyê, bi wî re pêwendî rast û weke tê xwestin sereratkirinê em bigirin heta, hevalên li pişt serê wî/ê yê ku di heman komîteyê de pê re hevbeş dixebite, heta bi sedan mirovên di bin emrê wî/ê de bi eleqeyeke têrker, hezkirin û rêzdarî rêvebirinê, di her qadê de, di serî de jî navenda Partiyê, di gelek yekeyên partiyê yên pêşhatî û milîtanan de nexweşiya ku xwe dide dere.

Hinek caran qala nebesiya perwerdê tê kirin, hinek jî heta niha qala destnedayîna derfetan dikin. Eşkere derewan dikin. Mercên herî destdayî û girseyeke bi hezaran a ku ji bo şoreşê amade ye rabe ser piyan, bi sedan qadro ji bo fermana wan amade ne. Hemû curên amadekariya, pere, çek û hwd ji bo fermana wan amade ye. Belê, dibe ku hinek kêmasiyên qadroyên me hebin. Başe, li kurdistanê tiştekî bê qusûr heye? Dê heta serkeftinê jî kar bi qusûran pêş nekeve? Ji ber ku ev bi vî rengiye, şoreşgeriya kêlî dixwaze rabernekirin wê bi çi bê ravekirin? Di vê mijarê de pêwîste kes nekeve nav ferasetên gote got, virde-wêde nekişîne, bi cesaret van ferasetan raber neke.

Em qala ya gengaz, hem jî bi daxwaz û awateke mezin ya gengaz dikin. Dibe ku me hêza dewletekê neda bin emrê wan, ma ev pêwîste? Ma me qadroyên herî baş nexist bin fermana wan, ma ev pêwîst bû? Na, niha ez pêşxistina mirovê nexweş mîna zewqekê digirim dest. Gelê me bi vî rengiye, hûr hûr û parçe parçe kirine. Ji hizrandinê heta rêxistinê, rewş bi vî rengiye. Kî nikare bi yê kamil dest bi kar bike, kî vê naxwaze? Kî dikare ewqas xafil û teng be, seranserî û ehmeqtiya burjuvaziya biçûk raber bike? Na, di nava Partiya me de kar wiha nehatiye destgirtin. Em çêkera ku ji nava gelê me hatiye hemûyan nas dikin, dizanin, û bi teşe dikin. Ji bo tedawîkirina ewqas nebesî, wan gihandina asta têrker û nexweşiyên wan çareserkirinê weke Rêbertiya Partiyê me çi nekir? Ma me bi van hevalan mesafeyek neda qezenckirin û ew nedan bin emrê van hevalan? Me yên herî bi pirsgirêk li gel xwe girtin, bi wan re her roj bi demjimêran ked da û ew hinekî pêşxistin û pişrte jî em nadin bin emrê van begên me. Wê demê kî dikare ji çi gazincan bike?

Niha ev nexweşiya zarokatiyê dema pirsgirêkek biçûk derket bi Rêbertî re ketina nav nîqaş ji xwe re merîfet dihesibînin. Hema dest bi nivîsandina nameyên gazincan dikin, rexneyan dibarînin. Na, mirov ji xwedê re jî wisa gazincan nake. Zarok jî gazincên wisa nakin. Lê yên ku bi vê nexweşiya zaroktî ketine, cesareta kirina pir tiştan bi xwe re dibînin. Na, em weke Rêbertiya Partiyê, tenê û tenê ji xwe bawerin. Lê baş zanîna xwe sipartina van spartokên xwe, em dizanin bê binketina me mayînde dibe, ji pêşketina wê jî bawer dikin, em bi xwestek û coşeke mezin vê diyar dikin. Ger hemû tişt biçin jî, hêviya me tame ku em ê ji sifirê PKK'ê mezin bikin, berxwedaniya mezin bafirînin. Em di pratîkê de her roj vê diselmînin, temsîl dikin, li ser dijmin jî vê ferz dikin. Me ev li ser serdemê, pergala kapîtalîst, dost û dijmin ferz kir û rêzdarî ava kir. Aciz jî bibin, nexwazin jî, me rastiya welatê xwe û gelê xwe li ser wan ferz kir û rêzdarî destxist. Êdî ti kes bi erzanî ser me de nayê. Me ji hemû kesî re em çiqas girêdayî serxwebûna xwe ne, weke gel, Partî, milîtanan çi çawa bi pejirînin, wê çawa ser me de bên û sinorê vê wê çibe da diyarkirin. Dîsa li beramberî gelê xwe em Rêbertiyeke çawa ne, bi kîjan cesaret û fedakariyan û divê em çawa bên qebûlkirin kirpand, ferz kir û da erêkirin.

Wê demê divê mirov nebêje Rêbertiya PKK'ê ye û derbaz nebe, nebêje milîtaniya PKK'ê ye û derbaz nebe. Divê ku her kes di vê mijarê de hedê xwe û berpirsyariyên xwe yên dîrokî bizanibe û bijî. Û em dibêjin bila ti kes rêbazên xwe yên nebes, ferasetên xwe yên teng û seranser tevlî evîndariya xwe nekin û li ser me ferz nekin. Em ruh û hişmendiya kar pêş

nakeve, pêşde naçe, aman hawar belavbe, em ê tine bin nêzîkatiyên wisa ên dudil, di her kêliyê de bi binketinê pêçayî nas nakin. Di Partiya me de ew ruh nîne, bêganeye, çavkaniya xwe ji serdema navîn û dagirkeriyê digire, em qebûl nakin. Dema ku bêşansiyeke biçûk qewimî helwestên panîkwarî, pêşketineke biçûk jî hat jiyîn hema bêje bi qasî ku qadê terk bike ruhên biçûk dibin, yên ne berxwedêr, dil û mêjiyên wisa em qebûl nakin. Rêbertiya Partiyê ji serdemên herî tarî heta îro, rêxistineke pêşeng a pêşketin pêk aniye. Rêxistinekê pêş dixe, rêxistin dike, serkeftinên jê nebawer di nava demekê de bi cih dike û ya ku behremendiya vê raber dikê ye.

Wê demê em dibêjin; "divê her kes bizanibe di nava Partiyê de yetkî, rist û erka xwe çiye û li gorî wê bijî." Her kes neçare di dema xwe de karê xwe bike. Bi Rêbertiya Partiyê re çawa di nav pêwendiyê de ne? Emrên Rêbertiya Partiyê çawa tên şîrovekirin, çawa jîndar dibin? Herkes neçare vana di dem û cihê xwe de pêk bîne. Em di heman demê de hêza rêvebir ya Partiyê ne. Talîmat û emrê me hene. Em ne evdoyên gêjin, em hêzeke rêveber a otoriterin. Em vala van sifatan li xwe nakin. Ev ji aliyê gel û dîrokê ve li ser me ferz dike, ger em bi qasî serê derziyê xwedî merdiya Partiyê ne, erkeke misoger divê ku em pêk bînin. Erkeke ji hemû kesî tê xwestine. Wê demê bi otorîte û rêveberiyeke wiha çawa tê xebitîn? Bi wî/ê re weke ehpabçawîşekî, hevalekî dibistanê, weke hemşeriyekî yan jî weke xizmekî na, neçare bizanibe weke rêberekî bixebite. Talîmat, nirxandin û emir, weke talîmat û emrên nayên pêkanîn nayên pêşkêşkirin. Vana yên ku dikarin bên serxistinin, bi awayekî jênerev nirxandinên ku serkeftinê bînin û fermanên ku xwe dispêrin wê ne. Ti kes nikare li ser vana deh salan nîqaşa, dikarin pêk werin yan na bimeşîne. Yê ku li gorî karê te ye pêk bîne, yên ku ne li gorî te ye pêk neyîne. Bi hefteyan vala vala zimandirêjiyê bike, derbazî jiyanê neke, rêxistin neke, bigire nav kefa destê xwe û gire bide, di serê xwe de bigire û hepis bike; divê her heval bizanibe wê hesabê vê çawa bê pirsîn.

Em her roj li ber xwe didin, bi rastî jî em her roj ji dijmin mewziyekê qut dikin û jiyan dikin. Fermanên me tenê ji bo pêkanîna vê ye. Talîmatên me tenê gengaziya vê diselmîne û ji ber ku di asteke saxlem de ne. Wê demê bi mehan heta bi salan, mîna ku cîhanên nû yên bên keşifkirin hene, mîna ku wê înşayên nû yên bîrdozî û siyasî bên jiyankirin, ketina nava nîqaşê bê berhem, raveya nepêkanîna emran di demê de çiye? Dema ku diçin ser çalakiyê, bi ser rêxistinê de dimeşin eşkereye ku wê bi van talîmatan çûyîn çêbibe. Yên ku îdîa dikin bi me, bi Rêbertiya me ve

girêdayîne, ger yên di vê de jidilin hene zilamên ku ev afirandine. Di bilî vê em Rêbertiyê nakin. Yên ku mîna milîtanan bi me ve girêdayîne, ji milîtaniyeke wiha kirinê zêdetir em ti milîtantiyeke din nas nakin. Bila ti kes serê kêliyê ji me re nebêje tiştên ku kirina wan bê derfete û vê ji me re pêşkêş nekin. Bila ti kes gazinca destnedayîna derfetan ji me re neke. Em kesên ku jiyana herî bi êş ji xwe re rewa ditîne. Jiyana herî bi êş di zîndana de teşe girtiye, Mazlûm, Xeyrî û Kemal xala lûtkeya vê ne. Bila ti kes nebêje em bi bîranîna wan ve girêdayîne, di qadên cejnê de, di qadên ku herî zêde ruhê mirov tê de bilind dibe, di lûtkeyên çiyayên me de karan negihînin xala nemeşandinê. Karê wan misoger bi şêwazê ku me ji serkeftinê bigire nikare bigire dest. Di wan deran de her tişt hene, em dibêjin her tişt dikare bê tazekirin. Li wir jiyan bilinde, li wir dîrok heye, li wir gelekî resen heye, li wir welatparêziya serî natewîne, nakeve bin zapt û reptê heye. Li wir dijmin di asta herî lewaz de ye. Li wir ruhekî azad heye, bi kurtî li wir ocaxa şoreşa cîhanê ya herî geş pêketî, volkanekî li benda bibe pêta agir heye.

Wê demê tê hem li qadeke wisa be, hem jî bendewariyên ji te, tiştên ku ji aliyê dîrokê ve ji te re tê emirkirin di dem û cihê xwe de, bi şêwazên guncaw weke tê xwestên pêk neyîne. Em dibêjin; milîtaneke wisa nayê qebûlkirin. Di qadên herî hestyar ên gelên cîhanê de çi çawa hatiye pêşxistin em dizanin. Me bi caran diyarkir; me got, bermahiyên serdema navîn û otoriteyên dagirkeriyê bi pifekê, bi pihînekê piranî tiştên ku dikarin bên derbazkirinin. Ma em ê weke tê xwestin li ser gelê xwe serwer nebin? Ji bo vê bi sebirbûnê, pêdiviya xebatên rêxistinê û amadekariyan em înkar nakin, lê dema cîh û dema wê hat, em neçarî bizanin weke bahozekî jî pêşve biçin.

Pêvajo çiye? Eşkereye ku ev her tim ne di nav amadekariyê de nîne. Eşkereye ku amadekarî domdarin, propaganda jî wê domdar be, rêxistin jî her tim hebe. Lê erkên kêliyê yên wiha hene ku, erkên divê ku mirov mîna bahozê biherikê ye. Berfireh û têrker, li ser gel serwerbûn, gel rakirina ser piyan, bi çalakiyên guncav û rêxistinê ew bi ser dijmin de şandin şoreşgeriyek pêwîste. Rêbertiyek, bi kurtî şoreşgeriya pêşenge ev. Em vê dixwazin. Ger na bi nexweşiyên zarokan re, ecemîtiyan, hinekî jî bi sertewandinan û Rêbertiyekî bi tasfiyegeran barkirî naxwazin. Em ji Rêveberiya yekeyek herî biçûk a porpagandayê bigirin, heta rêveberiyên komîteyên navendê yên Partiyê yên herî berfireh û pêşketî, şoreşgeriya divê serwer be ev e.

Dibe ku hinek heval bêjin ev ji kîderê derketin. Hinekî li rast û çepê xwe binêrin, bila hinekî jî herkes li xwe binêre, em dixwazin çi bêjin dê bê fêmkirin. Heta niha jî hinek heval erkên ji rêzê dixwazin. Qaşo deh sale milîtaniyê dikin, lê nikarin hucreyeke ji rêzê bimeşînin. Du kesan rêve nabin, du kesan perwerde nakin. Ev helwesteke rûreşiyê ye. Hinek ji wan jî dibêjin qusûra filan û bêvan heye, erkên xwe yên bêhempa ji nedîtîve tên. Na, tiştên wisa eybin. Em naxwazin li rûyê van bêjin û ne li bendê ne ku vana erk, perpirsyariyên mezin pêk bînin. Tê ewqas xwedî ezmûn û zanînê be, tê nikaribe gundekî rêxistin bikî, karê perwerdekirina ciwanan nekî! Her tim bi hezaran gundiyên ku dixwazin tevlî têkoşîna herî zehmet bibin tê perwerde û rêxistin neke û nede şer kirin; tiştekî wisa gelo dibe tawanbarî? Wê dev ji cixara xwe bernede, dev ji têrkirina zikê xwe bernede, lê wê ji rêxistinkirin û perwerdekirina du kesan aciz be. Yekî wisa zilamekî hay ji xwe tine ye, zilam bê esle. Başe yên wisa çi ji rêxistinê dixwazin? Gelo li benda wê ne ku em ji tasfiyeger û radesrkaran re serî bitewînin? Vêna Komara Tirkiyê û serfermanê wê Kenan Ewren nikare bi me bide kirin, di nava refên Partiyê de hêmanên bi vî rengî bi me bidin kirin? Yên wisa dixwazin rêxistina herî kêm û keda kêm bi me bidin erêkirin. Rewatiya nebesiyên xwe, radestiya serî tewandî a qilif guhertî û şêwazên wê yên nû dixwazin. Erêkirina şêwazên nayên dîtin ên cur bi cur tasfiyegeriyê dixwazin. Di vê dema ku divê em dîrokê serûbin bikin de, vana daxwazên ku pêşde bên ajotin û cesaret jê re bên kirinin? Na, em dîroka xwe serûbin dikin. Çalakî û rêxistina herî kêm kî dikare bixwaze? Kî dikare ji vê re cesaret bike. Na, Na! Kar berevajî vê ne. Xirabiya herî mezin a ku bi dîrok û gelê me bê kirine ev. nerêxistinkirin, bi qasî tê xwestin nexebitîn, bi ser karan de neçûyîn, bêzarî, bi hezaran ruhên cuda dixwazin vê ferz bikin, ev gunehê herî mezine.

Şoreşgeriya ji aliyê gelekan vê tê kirin, nagihêje wê şoreşgeriya di salên 1920'an de ya ku li Tirkiyê dihat kirin. Em bi Kemalîstên şerê Rizgariya Mîlî bifikirin. Kemalîstan bi azwerî û xebateke çawa li dijberî dagirkeriya klasîk û dagirkirinê hewl dan. Başe, em ji şoreşgerên proleter ên di nav me de re çi bêjin? Bila li serbazên Tirkên faşîst binêrin, bila li pêşmergeyên rêxistinek paşverû ya weke KDP'ya li ber çavên wan binerin, ew çawa dixebitin. Rêveberiya faşîst heta koşeyên herî dûr ên welatê me çawa dixwazin belav bibin? Başe, milîtanên me çi dikin? Çima hewl didin bi nebesiyê rave bikin? Çima helw dide çima nerêxistinbûna xwe biselmîne? Eşkereye ku ev bêşermiye. Hinek ji wan çima hewl didin bi ser karan de neçin, di vê mijarê de tevlîheviya serê wan û rewşa wan a ruhî çiqas kûre

îspat bikin, ji aliyê din ve qaşo dîsa ji bo bibin PKK'yî dibêjin gelek pê şadin. Tiştekî wisa nabe. Di holê de zulm û wehşeta hezaran salî heye, mirovên nalenal dinalînin hene. Em devjê berdin şoreşgeriya proleter, şoreşgeriyeke burjuvaziyek ji rêzê, heta şoreşgeriya milîgeriya seretayî jî, pir zêde di ser vê re em dibin şahidê cesaret û ferzkirinan, nizanim pêdivî bi gotina vê heye?

Xeta PKK'ê çi bû? Şoreşgeriya ku ji aliyê vê xetê ve pêwîst dikir çi bû? Ev tên fêmkirin? Dîsa bila ti kes qala bêderfetiyan neke. Tenê kesên ku me şandî wir şerê çekdarî jî di nav de, dikarin gelek şerên din bimeşînin. Bi hezaran gundî hene, hejar, hem jî li beramberî mercên herî zehmet gundiyên li ber xwe didin hene. Ev dixwazin bên zanakirin. Li bendêne bên rêxistinkirin û derbazî çalakiyan bên kirin. Partîvanên me yên pir zana li beramberî van mirovan çi dikin? Çiqas ji wan perwerde dikin, çawa li nav wan belav dibin?

Bi kurtî nexweşiyên zaroktî hene, evîndarî ji ecemitiyên xwe re hene, şêwazên cuda yên sertewînê hene. Me sedemên van danîn holê, em dûbare dûbare naxwazin vana vebêjin. Lê tenê em dixwazin dîrokê serûbin bikin. Dema berxwedana nû bi şêwazê bahozekê afirandin û em dixwazin mîna bablîsokê li ba bikevin û bafirînin. Dê û bav di nava êşa dilekî mezin de ne. Gelê me nalenal dike. Rêhevalên me yên di bin îşkencêde hene, her kêlî di nava mirinê dê dijîn. Rêbertiya Partiyê bi şêweya serhildanekê bi dil û mejiyê xwe bi şêweya ku nehatiye jiyîn dixwaze jiyanekê di kesayeta xwe de ava bike, rêve bibe. Dixwaze bi ser karan de biçe. Dixwaze demê di serfiraziyê, serfiraziya herî mezin bi serkeftina mezin ve temam bike. Vaye mercên milîtan ji xwe re esas bigirin ev in. Vaye, mercên diyarker ên her tiştî li ser van esasan dafirîne, dikare bafirîne û gengaziya vê digire bin saxlemiyê ev in.

Em naxwazin zêde li ser pirsgirêkên pratîkî bisekinin. Di gelek pratîkan de nebesî û kêmasî hene. Bawerin Partiya me, di serî de navend û qadroyên me vana dibînin. Wê careke din ji van gazinc nekin, bi hevketinan ve Partiyê mijûl nekin, di dema xwe de bernameyên xwe pêşkêş bikin, misoger emrên Partiyê di dema xwe de û di cîh de bi şêwazê herî berhem pêk bînin.

Em çavdêriyeke pir kurt divirde diyar bikin; bûyera lewaziya zanîna siyasî ya di ekîbên çekdar de tê dîtin. Di eniya paş de em ji fesadiyê bigirin vala vala kuştina demê û heta nîqaşên ne di cîh de em dibînin ji gelek tiştan re şahidî tê kirin. Di axaftinên beriya niha de mijara Başûrê Kurdistanê divê çawa bê destgirtin me diyar kir. Hinek taybetmendiyên jiyana metîrsîdar

beriya niha vegot, nivîsand, em ê dûbare nekin. Lê îro bi mehan heta bi salane hemû mirovên ku me gelek pêş xist, gihand asteke teorîk girtina wan a nav yekeyên çekdarî sedema vê çiye? Di nava yekeya propagandayên çekdarî de komîsertiyeke siyasî ji bo 15 gundî dana şerkirinê têr dike. Gundî, gundiyên hejar ma wê nebûna tovê artêşa me ya gel? Tevahî qadro di nav yekeyên çekdarî de girtin, wê nebe yekemîn sedema rizandinan? Ya duwem: hemû bi mehan di Başûr sekinandin, vana nexistina nava rêxistineke guncav û têrker ma ne nîşaneya duwemîn a rizînê ye?

Bi kurtî li berçavgirtineke herî biçûk jî, ne di wê baweriyê de me ku hebûna me ya qadro ku di dest de ye, yên herî bi pirsgirêk di vê navberê de jin jî di nav de wê bi awayekî herî bi berhem çawa derbazî meriyetê bibin bibe pirsgirêk zehmet. Lê ev mijar weke xaçepirsê lê kirin. Yê bi pirsgirêk, milîtanê ku duristiyeke wî/ê ya ji rêzê jî heye ma nikare ji deh gundiyan re fermandariyê bike? Ma dê gundî di nav rêxistina artêşê de cih negirin? Ji aliyekî ve hemû qadroyan di eniya paş de ji rizîn û mirinê re terk bike, ji aliyê din ve jî hemûyan di nava yekeyekê de hesp bike. Rêbaza li gorî xeta me ya Partiyê guncav ne ev e! Pêdiviya xeta me ya rêxistinî û çalakî bi vî rengî nayê tengkirin. Du qadro, berpirsyarek û cîgirekî wî/ê gelek endamên gundî yên ciwan ku dixwazin li ber xwe bidin hem dikare di nav bîrîmên çekdar de perwerde bike, hem çalakî pê bide kirin, rêxistin bike û wan mîna qadroyekî bihêle û li hemû herêmê belav bike. Ev jî ne karên ku bi salan, bi mehan dikare bên çareserkirinin. Bi rastî jî ji aliyê teorîk û pratîkî ve mirovên bi hêz ên dikarin vana bikin hene. Ger bi eleqeyeke têrker ji wan re nêzîkatî bê kirin, giraniya kar, xeterî ji wan re bê nîşandan û bi qasî tê xwestin bên rêvebirin, bernameyên guncav ên xebatê li pêşiya wan bê dayîn û venerîn bê kirin. Yên ku bi israr naxwazin erka xwe pêk bînin di kêliyê de bên cezakirin, xiyanet, revokî, radestkarî neyê xelatkirin û şûnve kêşan çênebê, bi şoreşeke herî biçûk lîstin jî bê cezakirin eşkereye ku dê kar bimeşin.

Bi sedan û hezaran kes îro dixwazin tevlî çalakiyê bibin. Ger ji dehan yek ji van bikeve nav çalakiyê, belavbûna hemû şebekeyên sîxûr dê zehmet nebe. Artêşa Tirkan dilerize, leşkerên wan jî nikarin çek bikar bînin. Serkeftin li ser serkeftinê dikare bê afirandin. Hemû pêwîstî dikare ji wan bê pêşwazîkirin. Hemû saziyên Komara Tirkiyê di bin emrê me de ne. Bi pîlansaziyeke ji rêzê û bi operasyonê pere, çek û hemû amûr, bi kurtî her tişt dikare bê desteserkirin. Gelê me bi giştî dixwaze rabe ser piyan, dema ku em bixwazin dikarin ber bi hemû çalakiyan ve bikişînin. Dibe ku bi milyonan bimirin, bila ti kes ji ber ku wê xwîn birijê me tehdît neke, şoreşe

wê bibe, em ê qadroyan winda bikin dibe; lê bi rêveberiyeke têrê dike rêbazê xebateke rast bila li pêşiya hemû kesî bê vekirin, bila wisa bin ev. Bi kurtî ji bo pêşneketina karan em ti sedeman nabînin.

Em dibêjin; pêwîste rêbazê xebatê bê bi bandorkirin, bigihêje asta rast û têrker. Ew nexweşiyên zarokatî em behsa wan dikin û ecemîtî li ser me neyê ferzkirin. Ferasetên tasfiyeger û sertewîner bi rûpoşên cur bi cur bila di nav Partiyê de şansê jiyanê nebînin. Ger hinek bixwazin sergirtî vana bikin dema ku hat tesbîtkirin divê bên cezakirin. Ev yetkî ji partîvanan re hatiye nasîn. Bila ti kes jî bi mehan û bi salan nebêje pêşketim, yan jî em pêş dikevin û me mijûl nekin. Êdî di vê qonaxa dîroka me de bi dilmeziniyekê, bi fêrbûnên xwe ve bi hêza vîneke kes nikare bigire bin kotrolê di asta ku êrîşî ser dijmin biçin de ne. Neçarin vê namûs û anûrê raber bikin. Berevajî şoreşgeriya proleter li aliyekî, ev bi kompradoriya feodal re jî hev nagire. Rê girtîne, na. Em dibêjin bila bi mehan Rêbertiya Partiyê bê agahî nayê hiştin. Em ê têlên bi dirî parçe bikin û dîsa rêya xwe vekin. Me welatê xwe ji seriyekî heta seriyê din derbaz kiriye. Bila ti kes nebêje zehmetî û mercên xwezayê û me netirsînin. Merc û zehmetiyên xwezaya me ji bo şoreşê çavkaniyên şoreşê ne. Jiyana li wir ya herî eslî ye. Siya dîrokê ya herî mezin li wir mijara gotinê ye. Li wir henase tê dayîn û sitendin, ne li cihekî din. Dilşadiya herî mezine li wir bûyîn, li wir dawî lê anîn mirina herî xweşike.

Belê, em hema bibîrbînin, Dr. Hîkmet kivilcimli, di pêvajoya 70'î salî de, 20 salan di zindanan de riziye û di nava mercên penaberiyê de bi mirina herî xirab mir. Di henaseya xwe ya dawî de dibêje: “Daxwaziya min a herî mezin weke partîzanekî mirine.” Ger ev partîzanî weke Kurdistanê di lûtkeyên çiyayan de be, di cîhanê de ji vê bilindtir mirin ango jiyan nîne, bê mirinî nîne. Wê demê bila ti kes qala zehmetiyan neke, aliyê herî xweş hewl nedin cuda bidin nîşandan. Em û heta hevalên ku li Ewrûpa hemû jî, bi dil û can em dixwazin biçin wir. Jin û gelên me dixwazin li wan çiyan bimirin. Vînek hat avakirin, raberkirin û nîşandan. Başe, ew qadroyên evîndarê xwe ne çi dikin? Çavên wan li derve ye, çavê wan li eniya paşe. Yên bi vî rengî bi lenetin, divê ku çavên wan bên derxistin. Dema ku bi çalakiyê ve radibin dilê wan lê dide, mîna çûkekî tirsonekin. Bila ew dil bi erdê re bibin yek! Dê tola hezaran sal bê rakirin, her tişt ji nû ve bê qezenckirin, yên ku hatine windakirin dê gav bi gav bên qezenckirin. Vaye, ji bo vê dilên ku divê lêdin nediyarin? Divê ku jiyaneke çawa bê destxistin ne diyare? Meşandina van karan ne rewşeke bi anûr û ya herî bilinde? Ji bo

vê sebra herî mezin, pêgihiştin, ferzkarî nayê raberkirin? Belê tê raberkirin, ji bo gelê me êdî ev pêwîste, Partiya me partiyeke şayanî vê ye.

Me kar ji bo vê rêve bir. Ger na ji bo bi hinek rewşên ruhî yên burjuvaziya biçûk û tevlîheviyên serî em vî karî rêve nabin. Ji bo ku em nexweşiyên wan ên hov, ecemî, brokratîk, teşeyî, seranser û teng re mijûl bibin jî naxebitin. Ji bo ku em bi xweşiyên wan xwe birîndar bikin jiyan nakin. Êdî beşe, alîkariya pêwîst ji van re hatiye raberkirin. Ger mirovin wê bi lez xwe pêş bixin û biguherin. Ger na em ê bi guhê wan bigirin û bavêjin. Ger israr bikin em ê bêjin xwedê bela xwe bide we.

Wê demê yên ku dixwazin karekî pêş bixin li gorî hêza xwe em ê jî bi şêwazê herî bi berhem rêxistin bikin. Di komîteyên herêmê de, hucreyan de, di yekeyên propagandayên çekdarî de, em ê li her cihî vê bikin. Ne em ê hêza zêde li gel wan birîzînin, ne jî em ê erkeke rêxistinî û rêveberiyê ya ku nikare ji bin derkeve bidinê. Tiştên ku bikarin bikin texmîn kirin zêde ne zehmete. Mirov di dema çalakiyê de vê bi ruh û fikra xwe dikare hema bigire. Kî, wê çiqas, li kîderê bimîne? Zanîna kî li kîderê çiqas dikare kar bi rêve bibe? Ji kî re çawa dikare alîkarî bê kirin? Kî çawa tê rêvebirin, kî çawa tê perwerdekirin, kî çawa tê erkdarkirin û peywira mezintirîn jê re tê dayîn? Ev di mercên îro yên PKK'ê de pirsên ku bi asanî dikarin bersiva xwe bibînine. Kîjan çalakî kîjan bernameyên çalakiyê û hedef, li kîderê û çawa bên pêkanîn? Bi kîjan pîlan û agahiyê? Rêbazê tevgereke çawa pêwîste? Di Kurdistanê de veşartîbûn, tevgerîn çawa tê raberkirin? Ev dema ku li rewşa me û ya dijmin bê nerîn bi asanî dikarin bên bersivandinin. Bi rêzîkname, talîmat û rêvebirnameyan şoreşgeriya ku diviyabû ji zû ve bi pîvanên saxlem ve bihata girêdan.

Dixwaze bi xwestek ango bê xwestek gelo hinek dixwazin kar asteng bikin? Tu carekê hişyar dike, du caran hişyar dike gelo xirabkariyê dike, bi dilê tê xwestin bi ser karan de naçe? Tê carekê hişyar bike, du caran, di cara sêyemîn de tu dikarî bi guhê wî/ê re bigire û bişîne dojehê. Ev yetkî hemû erk û berpirsyarî hatine nasîn. Em ê carekê winda bikin, lê deh caran qezenc dikin. Ev jî vekirine. Êdî ev misogere, ti kes di vê qpnaxê de ji pêşxistina karên me nikare me paş de bide. Yetkî, û berpirsyariya ti kesî ji tiştekî wisa re nîne. Ti kes nikare me bitirsîne. Êdî gel ferman daye. Ger hemû hêzên cîhanê yên xêrnexwaz û hêzên din hev bigirin jî nikarin vê asteng bikin. Gel xwestiye, ti hêz nikare li pêşiya vê bisekine. Nexweşiyên ruhî yên di nav Partiya me ne, nexweşiyên burjuvaziya biçûk wê vê asteng bikin? Na, nikarin. Wê demê em herkesî vedixwînin pêdiviyên xeta me, tevgerinê û rêxistina proleterya û çalakgeriyê. Me pîvanên vê û çawaniya

pîvanan danî holê, em ê dûbare nekin. Diyarin ev. Rêxistingerî û çalakgeriyeke çawa? Ev, li gorî pêdiviyên xeta PKK'ê çawa tê raberkirin? Di vê mijarê de her tişt eşkere hatiye diyarkirin. Divê ku heval me nexin rewşa zimandirêjin baş.

Di vê qonaxa dîroka me de rêxistingerî û çalakgeriyeke wisa tê raberkirin hem jî bi zewq û anûr tê raberkirin. Berevajî vê ev wê me ber bi milîgertiya seretayî yan jî xeta reformîst a burjuvaziya biçûk de bigire, ev jî wê PKK'ê bi şêweyekî di nava rêbaza xebatekê de hepis bike. Yek ji xirabiyên herî mezin bê kirin jî ev e. Ti kes ji me nikare bêje ji xwe kar hinekî pêş dikeve û nikare vê asayî pêşwazî bike. Ev hinekê jî xeta serkeftinê ye. Pêwîstiyên xeta serfiraziyê, bi serkeftinên roja ne yên ber bi serfiraziyê ve diçe amade dikin. Ti kes nikare evîndarê xwe bibe û bêje, me karên ku, me rizgar bike kirine. Serkeftin, di serî de di helwestê şehîdên me yên berxwedaniya bê binkevtinê de ye. Di fedekariyên bê hempa yên gelê me ye, di hewldanên bêhempa yên Rêbertiya Partiyê ne. Bi xêra yên ku di sefa û zewqa kar, yan jî gotinên beredayî dikin ev kar nabin. Em dixwazin dîroka xwe bi serkeftinan dorpêç bikin. Hem jî dixwazin di vê demê de bikin. Ev ne tiştên neyên fêmkirinin. Ne emrên ku pêwistiya wan neyên bi cîhkirinin. Emrên dîrokî yên ku divê bi zewq, anûr û egîdiyên mezin bên pêkanînin, daxwaziyên gelê me ne. Gelê me dixwaze û her tiştê xwe dide. Wê demê milîtan ji bo çi rojê ne? Kar çiqas hatin pîlankirin?

Erê heta niha me xwest. Me xwest ku em bizanin pîlanekî xebatê yên milîtanên me yê çawa heye. Em dixwazin fêm bikin li herêman gund bi gund, bajar bi bajar çawa dixwazin belav bibin, bi pîlan û hedefên çalakiyên xwe ve, bi keda rêxistinkirinê û bi hêza xwe dixwazin çi bikin, çi nakin, di vê mijarê de hêza wan têra çi dike, têra çi nake. Ger nikarin bikin bila vekirî bêjin em nikarin. Dixwazin kêm bikin, zêde bikin bila vê diyar bikin. Em dibêjin kar şêlo û çepraz nekin. Hêza wan têra çi dike bila eşkere, zelal û durist destnîşan bikin. Di serî de jî navenda Partiya me ya pratîkî, hevalên li welat û derveyî welat ne mîna qutiya gazincan, ne her tim bi nebesiyên xwe yên ruhî, tevlîheviyên serî bikin mijara gazincan, bila mîna milîtanên egîd xwe nêzîkî me bikin, pêgiştî nêzîk bibin û bila ne kişkişînin. Hêza şoreşgeriya mezin a kêliyê ku dîrok li ser me ferz dike raber bikin.

Pirgirêkên me yên ku di nav xwe de dikarin bên çareserkirinin, hem qadroyê me dikare xwe mîna dêwa lê bike û derdora xwe bi rêxistin bike. Bila êdî qadro her tim li benda jorê nemîne. Yetkî û berpirsyarî ji wan re hatiye nasîn. Bila di cih de çareseriyan pêş bixin, ferz bikin. Bi zorê, îknayê, yan jî bi perwerdê tê çareserkirin, bi xebatê rêxistinê tê çareserkirin.

Rê û rêbaz hene û di destê wan de ye. Yetkî û berpirsyarî jî heye. Bila netirsin, xwe paşde nedin, ji ber ku wê kêmasiyek du kêmasî rû bidin xwe şûnde nehêlin. Bila nebêjin wê piştre çi bibe û xwe ranewestînin, di cihê xwe de nejimêrin.

Pêşxistina şoreşê û rêxistinkirin emreke. Li gorî pîvanên PKK'ê ev kirin emreke. Li gorî taybetmendiyên milîtanên PKK'ê ev kirin emreke. Ne ku ji bo çekên hatine dayîn bêdeng bên kirin, birizine; ji bo ku her demjimêrê vereşin hatine dayîn. Zanîna ku hatiye dayîn, ji bo ku her kêliyê bi rêxistin bikin hatiye dayîn. Qadroyên ku hatine dayîn, ji bo ku bi şêwazekî herî baş bên rêxistinkirin û bikaranîn hatine dayîn. Ji bo ku daxwaza gelê me rakin ser piya hatiye afirandin. Rêbertiya Partiyê, ji bo ku pêşketinên bi vî rengî pêk bên jiyan dike, ne ji bo tiştên din. Ew qet û qet şoreşgeriyeke din qebûl nake. Hinek ji wan dibêjin; "Bisekinin em hinekî xwe pêş bixin, hinekî bisekine ez cîhanê li gorî xwe pêk bînim." Na, yek ji xirabiyên herî mezin jî ev e. Divê ku her kes li gorî emrê Rêbertiya Partiyê bixebite, ne li gorî xwesteka xwe.

Belê, di vê mijarê de rexneyên me ji hinek hevalan re çêbû. Li Ewrûpa xwestin şoreşgeriyeke ew dixwazin bikin. Partiya me anîn ber deriyê binketinê. Li welat jî ev kirin, di dema borî û roja îro de jî kirin. Em ber bi binketinê ve anîn, hêjî tînin. Em vana qebûl nakin. Madem baweriya xwe bi Rêbertî tînin, wê demê bila bicoşin, mîna bahozê biherikin. Na, ger bawer nakin bila cudabûna xwe diyar bikin, tiştên ku jê ditirsin hene bila daynin holê. Ji şoreşê bawer nakin, ji xetê bawer nakin? Bila vê diyar bikin. Ger bawer dikin bila pêwîstiyên pratîkî pêk bînin. Pêwîstiyên vê yên pratîkî hene, eşkereye ku tenê bi gotina em bawer dikin, pêdiviyên pratîkî pêk tînin em ê rehet nebin. Çawa ku em tenê di gotin de rêbertiyê nakin, yên girêdayî me ne jî tenê nikarin di gotin de girêdayî bimînin. Em çawa girêdayî Partiyê ne? Em çawa girêdayî milîtanê xwe ne? Di şert û mercên herî zehmet de jî me çawa rêveberiya wan a bîrdozî, polîtîk û rêxistinî kir? Destê her yekî ji wan, ji yê herî baş me her yekê çekek da wan, ji bo amadekariyên wan, ji bo ku xwe bidin jiyankirin ji aliyê ruhî û madî ve ma me çi nekir? Başe, li wir divê çi çawa bikin? Divê ku hinekî vê ji xwe pirs bikin. Ji cesaretê ku gel raber dike kêmtir cesaret raber kirin, ji fedakarî, berxwedaniyê kêmtir fedakarî û berxwedanî raber kirin. Kîjan milîtan şayanî xwe dibîne? Kesek bi salan tê perwerdekirin, ger tiştekî neke ma wê ji gundiyekî milîtanî û rêbertî bê hêvîkirin. Ev ne şerme?

Bi vê ve girêdayî, ji aliyê teorîk û siyasî ve ti kes ewqas jî ne paşketî ye. Ger dilê xwe bidinê dikarin artêşê damezrînin û divê damezrînin jî. Ne tenê

herêmekê, dikarin hemû welat ber bi rêxistinê ve bibin û divê bibin jî. Zanîna wan jî têr dike, di vê mijarê de êdî nefesa wan jî firehe. Di qadên herî baş de hatine bicîhkirin. Wê demê çima heta niha dîsa bi teoriyên nebesiyê, bi ferasetên tasfîyegeran ên cur bi cur van hevalên me dikevin rewşên neyînî? Hinek ji wan dibêjin; “Ez tenê dikarim bibim leşker, mîna sempatîzanekî şer bikim.” Ev bêşermiyeke pir mezine. Wê tu deh salan di nav Partiyê de hemû pêşketinan jiyan bikî, piştre jî rabî bêjî; “Ez leşkerekî biçûkim.” Bila ev leşker biçin di nav artêşa Tirkan de leşkeriyê bikin. Di PKK’ê de leşkertî nîne, milîtanî heye. Di nav PKK’ê de ji aliyê rêxistinî, çalakgerî, bîrdozî û polîtîk ve milîtantî tê kirin. Berevajî vê xeta herî teng û tasfiyegeriyek nehatiye dîtine. Leşkeriya çi? Deh salan di nava Partiyê de bimînî, lê tê yekeyekê rêxistin nekî, rêve nebî, piştre jî tê efûya vê bixwazî. Na divê ev bi fîşekan bên paqijkirn! Ev rewşeke gelek neyînî ye.

Wê demê divê herkes durist tevbigere. Madem vana dibêjin em bi Partiyê û rêbertiyê ve girêdayîne, ger bi rastî jî ev wisa ye, di pratîkê de pêwîstiya vê divê çawa bê îspatkirin em di mînakên xwe de nîşan nadin? Yên di zindanê de nîşan nadin? Ma gelê me jiyana xwe ya di nava êşê de nade diyarkirin? Başe, divê helwestê milîtanan di vê mijarê de çawa be? Di van mijaran de rexnedayînên ku tên dayîn de divê cesûr, vekirî û durist tevbigerin û em dibêjin pêwîste di pratîkê de bê îspatkirin. Di van mijaran de gelek heval hatine rexnekirin. Careke din dirêj dirêj rewşa wan anîna ziman em pêwîst nabînin. Pêwîst bike û em xwestekek têrker nebînin em ê rexneyeke bingehîn vê carê di derbarê koletî û serîtewandinê baş derxin holê, teşîr û tecrîda wê bi xwe bikin û bixin binê erdê. Vê carê em ê rûpoşên nexweşiyên zarokatî û ecemîtiyan derbaz nekin daxin, dixwazin şoreşgeriyeke rast nabe pêş bixin, raber dikin em ê nîşan bidin. Ji bo vê hêza me heye, ji me tê û em têrê dikin.

Em naxwazin bi ti kesî re û vala, bi taybet pêwendiyên xwe yên hevaltiyê texrîb bikin û bigerin. Em amadene zehmetiyên herî mezin bigirin ser milê xwe. Di her derê û qadê de, berjewendiyên Partiyê çi pêwîst dike heta dawî em hene. Lê em heman tiştî ji hevalên yetkî û berpirsyariyên wan kêmtire jî hêvî dikin. Ev mafê me û erka wan e. Bila ti kes nexweşiyên xwe yên zarokatiyê mîna sitiriyan di me re nekin, nekevin nav neyîniya berdewankirina rêbazên xwe yên ecemî û rast nabin. De îcar bila kes serî li şêwazên tasfiyegeriya sergirtî ya ku navê wê lê nehatiye kirin nede. Ji bo Partiya me û gelê me îro xeteriya herî mezin, bi şoreşgeriya herî teng, çalakgerîya herî teng û rêxistingeriya teng ve têr dîtine.

Şoreşgeriya tê xwestin, şoreşgeriya hatiye fêmkirine. Şoreşgeriyeke tê xwestin, şoreşgeriya xeteke teqezbûyî ye. Nemaze şoreşgeriya dikare ser bikevê ye. Ti kes afirandina efsaneyan naxwaze. Ji aliyê gelên cîhanê ve, bi rastî jî ji aliyê serokê filan an bêvan çînî ve ya ku ji zûve hatiye serxistin, lê ji hêla me ve şoreşgeriyek ku mirov jê şerim bike ya ku me ser nexistiye. Ger em di mijara şerma ji dîroka xwe û serdemê dikin de kêmekî jidilin, misoger em ê bimeşin. Aliyekî mêtîngeriya Komara Tirk ya dijî serdemê ku bê jiyîn nîne. Çiqas zorê ferz dikin bila bikin, ev dê tenê serkeftina me lez bike. Merîfetên herî dawî yên artêşa Tirkiyê di holê de ne, ma van lez neda pêşketinan? Ew negihand xaleke nikare ji nav derkeve? Ger em hinekî din ferz bikin û kar hinekî din weke tê xwestin bimeşînin, ma dernakeve holê ku dê ev artêş ji bilî lezdana pêşketinên artêşê nikaribe tiştekî din bike? Wê demê ger rewş wisa ye pêşketin dikarin bên lezkirin. Her hevalek dikare di vê mijarê de erk bigire.

Dibêjin hinek karan asteng dikin. Di vê mijarê de gelek nameyên gazincê hatin. Kî asteng dike despêkê tê hişyarkirin, dostane tê îknakirin û pîvanên Partiyê tên ferzkirin. Ger bi israr pêk neyînîn zimanê wan tê qutkirin, serê wan tê jêkirin. Ma ev yetkî nînin? Na, hene. Ma mirov kêmin? Bi koman mirov derdikevin. Ma çek kêmin? Bi qasî têr dike çek hene. Bandorgeriya bîrdozî, polîtîk dixwazin? Her tişt heye. Wê demê divê aşûre bê çêkirin, hem jî ya herî xweş. Wê demê divê rêveberî hebe, hem jî ya herî bi qudret. Divê rêveberiyek ku bihêle dijmin rêz bigire hebe. Êdî di vê xala dîrokê de, ji bilî vê şoreşgeriyê ti kes ji şoreşgeriyeke din re nikare bêje şoreşgerî. Êdî jiyana bi êş, zehmet û ya bi îşkence ya ku îro PKK dijî, şoreşgeriyeke ji bilî vê nayê qebûlkirin. Bila ti kes li ya kevin nenêre û ji xwe re cila qut neke. Em şêweyek li gorî rewşa şênber a demê dixwazin. Em dibêjin, bila şoreşgeriyeke li gorî pêşketinan bi rengekî herî lez bilind dibe û her roj pêş dikeve bê ferzkirin. Êdî şoreşgeriya bê ferzkirin diyare. Ti taybetmendiyên me yên kesî û çêkera me vê asteng nake. Madem ferzkariya dîrokê ewqas misogere, wê demê bila her kes li gorî vê ferzkariyê, di veguhertina çêkerê, guhertina ruh, pêşxistina mêjî de, bi kurtî ji bo serwerkirina hemû şaneyan kar bîne. Ferzkarî, dikare mirov bigihîne xala herî serkeftî. Nemaze ger ev ferzkirinek ku mirov bê wê nikare bikeve navê be, qadirê her tiştî ye. Rêveberiya şayan, şoreşgeriya şayan, şoreşgeriya diçe serfiraziyê, yên ku pêşketinên demdirêj û rojane saxlem dikin gengaze û ya tê xwestin jî ev e. Divê ya her kes raber bike jî ev be. Vaye, girêdan bi Partiyê, bi Rêbertiya Partiyê, şehîdên berxwedanê re ev e, şoreşgeriya yekane divê li ser demê bê ferzkirin û bi ser demê de bê çûyîne.

Ji ber van rexneyên me yên hişk, bila ti hevalên me yên milîtan dilê xwe negirin. Dema ku em van diyar dikin; bi qasî ku ji aliyê ti tevgerên rizgariyê û tevgerên gel ve nehatiye jiyîn, ya ku berhema pêşketinên bêrehmin, îro di serî de milîtanên me yên Partiyê, yên ku çarenûsa gelê me ji kûr ve bandor dikin, heta duh jê nedihat bawerkirin û mîna xewnekê dihat dîtin, niha di encama hewldanên bi israr de îro êdî bûne xewneke pêkhatî. Ji aliyê her hevalekî ve gavên wê bi zanîn û dilxweşiyê ve tê avêtin. Ji bo vê di asta herî jor de baldariyê nîşan dide. Ev tev jî li ser esasê baweriya bi serkeftina heyî, di kêliya hostatiyeke mezin û heta dawî ji xwe bawer hatiye raberkirin. Em ê tenê xwe nêzîkî doza xwe ya ku pêkanîna wê asan dibe nekin. Di heman demê de ya ku dê me ber bi serkeftina dawî ve jî bibe, yanî em ê bibin xwediyê pêşketineke bi vî rengî.

Em dibêjin ku; sedema berhema mezin a vê qonaxa ku evqas bilind û bi anûre, mîsoger pêwîste em weke berhema xwe temam bikin çi dibe bila bibe. Çavkaniya xwe ji kîjan bêşansiya civakî, dîrokî û serdemê bigire bila bigire. Em ê îfadeya herî şênber a hemû astengiyan bi biryardariya di xeta partiya xwe ve derbas bikin. Bisepînin, heta bi têrkarî û bi qasî bikare hemû astengiyên dijmin derbas bike bi veguhertinek sepana pratîkek şoreşgerî ve divê tiştek nekare asteng bike. Asta me ya perwerdê, paşeroja me, şert û mercên objektîf û sûbjektîf çiqas astengiyan derdixin holê bila derxînin, ger armancên ku têkoşîna me pêve girêdayî ewqas bilind û dikarin pêk werine, xwedî nîtelîkek bi vî rengîne, li beramberî hukmê ferzkariya dîrokê gelo kîjan qelsiya bê behreyî ya me nikaribe vê diyar bike û bide raberkirin heye? Dîsa li ser esasê xwe sipartina van rastiyan ma em ê nikaribin kîjan gavên xwe bi şoreşgerî nekin? Çawa em ê nikaribin encamên serkeftî bigirtin.

Bila ti kes xwe di pişt zemîna civakî ya nedestdayî de, hewldanên îmhakirinê ya cuntaya mêtînger û faşîst, nezantî û bêrêxistiniya gelê me ya zêde, hêcetên ku pêşketinên derve li gorî berjewendiyên me pêş neketine veneşêre û nespêre van. Hewl nede ku bide diyarkirin em ê nekarin li hember vê mêtîngeriya dijî serdemê li ber xwe bidin. Na ev dagirkeriya dijî serdemê, bi rastî di ger hemû paşverûtiya cîhanê bên gel hev jî, wê nekare bi vî rengî bidomîne. Tenê mercekî ji vê dagirkeriyê re rê veke heye; ew jî rewakirina bêrêxistinî û nezantiya me ye. Belê ji bilî vê tiştekî din, nikare vê rewşa dervî serdemê bidomîne û mercê yekem a ku bikare mêtîngeriya li dijî serdemê hilweşîne jî, li beramberî wê hêza berxwedaniyê raberkirin û wêrekiya berxwedaniyê raberkirine. Ez ê nebêjim nêviyê kare, ji sedî heftê

û pênc bi vê ve girêdayî ye û ev hatiye destnîşankirin. PKK'ê dîroka vê bi serkeftî diyar kiriye.

Dema ku em ewqasî bang li milîtanan dikin, armanca me ne biçûkxistina wan e, ne jî wan xistina bin barekî nikarin ji bin rabine. Berevajî rêzdariya bêdawî ku em li beramberî jiyana wan a eslî dijîn, di asta azweriyê de hezkirin û rêzdariya me ya li beramberî wan heyî, ji bo ku jiyana wan a şoreşgerî kamil be em xwedî lê derdikevin, em wê ji hemû curê ji rêderketinên rast û çep, ji hemû nexweşiyên zarokatiyê, ecemîtî û ferasetên tasfiyeger û serî ditewîne diparêzin, wan ji vî helwestî paqijkirin xwe li ser me ferz dike. Em di vê baweriyê de ne ku, serkeftina ku di van mijaran de hatiye destxistin wê dergeha me ya serkeftinê her tim bilind bike. Di vê mijarê de hezkirina ji hemû neyêniyan dê me ji armanca me û doza me ya Partiyê dûr bixe. Armanca me ne qusûrên gelek hevalan raxistina berçav û ew biçûkxistine. Berevajî ew ji wê jiyana civakî ya jê hatine û mirov jê şerm dike qutkirin, bandora wê ji ser wan rakirin, ji bo ku careke din nekevin nava rewşên wisa yên rûreş bi derfetên Partiya me milîtanên xwe biçekkirin û ew bê binkeftin kirine. Ji ber rêzdariya kûr a ku li beramberî jiyana wan tê bihîstin, li beramberî hemû curên xeteriyên bîrdozî, yên linavbirinê, ji bo ku bikaribin xwe biparêzin û bibin pola, ji ber armanca herî mezin em bi israr li ser vê mijarê radiwestin.

Milîtan hinek caran ji ber bê tecrûbeyên xwe dikarin sergerm tevbigerin ji bo vê jî wê rojên pêşiya me çi bi xwe re bîne, wê pir bifikirin, pir zêde şaşwar bimînin û saf tevbigerin. Bêrehmiya têkoşîna siyasî bi hemû dijwariya xwe ve jiyan nekirine. Ji ber vê sedemê dema ku rastî mîna çeqo li ser sûtiyê wan tê danîn, bi êş û kîneke mezin digevizin û dibêjin ax em çawa ketin vê rewşê, xweziya me nejiyaba. De îcar dema ku li ser dezgehên îşkence û zîndanan de tên razandin vê carê jî dibêjin; “bila ji bo yek demjimêrê azadiyê ez bijiyam, ez ê çil carî ji mirinê re razî bam” û bi vî rengî diqîrin. Dîsa di vê mijarê de her roj li zîndanan fîxanên hevalên me di guhê me de deng venedida û dê negotiban; “Çi dibe xwe nedin girtin, çil caran ji mirinê re razî bin, lê nekevin vêderê, şer bikin” û me jî ev ewqas dûbare nekiriba.

Hûn derdikevin qadeke şer a herî esîl, bi qasî ku esîle ewqas jî bi hêze û qadekî şer a zehmete jî. Dê li wir hemû curên şer bên ceribandin. Em dikevin nava pêvajoya têkoşîneke şerê gel bi hemû taybetmendiyên xwe ve, dibe ku di şênberiya Kurdistanê de em ê rû bi rû gelek taybetmendiyên xas bên û em bi xwe van taybetmendiyên xweser biafirînin. Piraniya we ciwan û safin, li aliyê din dijminê me hemû hêzên paşverû digire pişt xwe,

rêbazên li navbirin û yên îşkenceya herî ketî bikar tîne. Hemû ezmûnên xwe yên dîrokî her roj pêşde dibe. Mîna marê çivîka di devê xwe de dadiqurtîne, hêjî hewl dide û dixwaze rastiya me bihelîne. Bi vî rengî ser me de tê. Vaye, di vê xalê de ji bona em di gewriya dijmin de bibin girêk, bifetisînin, pêwîste em zanista berxwedanê ya bêhempa ku divê em heta sînorê dawî pêş bixin û misoger li ser esasê pêşxistina vê şêweyên xweser ên şerê gel ferz bikin û bi vî rengî encam bigirin. Ev rist dikeve ser milê milîtanan. Ev jî ji nêzve bi raberkirina însiyatîfa afirêneriyê xwe gihandina rêxistin û çalakgeriyê ve girêdayî ye.

Heta niha, bi taybet rastiyên ku di mercê jiyana derve de derdikevin em dibînin ku, dîsa her roj di gelek qadan de ji windahî û darbeyên tên xwarin em fêm dikin ku, ji sedî not windahiyên me çavkaniya xwe ji pêkneanîna qûralan digire. Di rastiyê de ji sedî yekê van darbeyan di encama destwerdana bi zanebûn a dijmin pêş neketine. Windakirina milîtanên me yên herî baş, baş çek bikarneanîn, rêxistingerî baş bikarneanîn, li gorî qûralên veşartî tevnegerîn, bi kurtî li gorî taybemendiyên şoreşa me xwe negihandina şêwaza xebatê çavkaniya xwe digire. Lewma em zêde winda dikin. Vaye dijmin gundiyekî welatparêz ê ji rêzê ku digire û ji siyê zêdetir hemwelatiyên me yên girtine dixwazin yekser li sêdarê bidin. Ma wê çi ji milîtanekî nekin? Li gorî ku rewş wiha ye, paşeroj disa di ber çavan re derbazkirin girînge. Bi hevbeşiyek mezin înşakirina tovên Partiyê, dema çûyîna ba gelê me nêzîkbûnek nirxdar jê re kirin, rêzdarî û evîndariya herî mezin raberkirin, bi rêbazê herî guncav ew tevlî refên xebatê kirin, li dijberî vî dijminî derketin wêdetir ti çareyeke me ya din nîne. Ji bo li ser vî esasî ji xebatên Partiyê, ji bo gel di asta têrker de, em bikaribin rêveberî û înşaya nû bi cesaret serwer bikin, em hemû neçarin mîna endamên têrker xwe amade bikin. Kesên din wê xwedî li vê şoreşê dernekevin. PKK hêza vê ya pêşenge, milîtanên wê jî misoger endamê vê ne û em dibêjin pêwîste vî ristî bileyzin.

Divê neyên jibîrkirin ku dîroka bi hezarên salan ji êşên mezin daweriviye, gewretirîn ezmûnên şoreşên gelên cîhanê ji bo wê can û xwîna xwe dane, ya ku dibe cewhera van tevan teoriya şoreşê, Marksîzîm-Lenînîzm, weke berhema ji bawerkirinê gelek zehmet mûcîze afirandiye û hemû nirxên madî û manewî li ser van bingehan hatine afirandin. Ji pêwendiyeke ji rêzê û ji fîşekekê heta nirxên me yên manewî, her tişt li ser vî esasî hatiye afirandin. Wê demê ji bo xwedîderketina li van, li ser herkesî erka pêşxistina behremendiyên xwe di asta herî kêm de jî, ji bo ku serkeftî bin ji wan hemû tiştên xwe xistina holê daxwazkirin pir xwezayî ye.

Piştî van tevan, bila ti hevalê milîtan ranebe û nebêje: "Ev hemû ne ji bo min in, ji hinekî din re tê gotin." Na, xalê ku em datînin holê herî zêde jî ji yê ku vê dibêjê re ye. Di hemû nivîs û axaftinên me de ev rastiya ku tê ziman, dixwaze di welat de, dixwaze li derveyî welat be, dixwaze kadroyekî me yê bîrdozî, dixwaze jî bila sermpatîzanakî me ya ji rêzê be, kêm yan zêde ji bo hemûyane. Heta radeyekê ji hemûyan re ye. Di serî de jî navenda me, hemû kesên di xebatên me yên Partiyê de cih digirin ji lewazî û nebesiyên wan re û di derbarê çêkera wan a ji hêza rêveberî û domdariya wan a înşayê ku nikarin têkoşînê bi pêşketinên domdar pêk bînin re ye û wan hedef digire. Ev nebesiyên me yên berfirehin. Ev nebesî rehên xwe ji sedên sal berê, yên ku heta atomên xwe parçebûne, ji zemînêkî civakî yê neyînî digirin. Ev nebesî, rehên xwe ji linavbirina dijmin a ku her roj ji aliyê bîrdozî, polîtîk û leşkerî ve dide meşandin digire. Ji bo vê vala derxistina van, bi xebatekî bandorker a şoreşgerî bersiv ji van re dayîn û bi rêveberiyeke Partiyê ya xurt ve tacîdarkirin ne erkeke asane. Tevî vê jî, erkên hemû hevalên me eleqedar dikin û xwedî derketina li wan ferz dikine.

Ma em dikarin karên Partiya xwe ji çend kesan re bihêlin? Di serî de weke Rêbertiya Partiyê yê ku her roj li beramberî xeteriya linavbirinê ye, cihê hemû qadroyên pêşeng dagirtin û ji bo ku bigihêjin asta pêşwazîkirina pêdiviyan, hem hêza xwe ya çendanî û çawanî heta dawî ji pêşxistinê kîjan qadro dikare xwe paşde bide? Di rastiyê de rewşeke jiyana gelê me ya dilê mirov pê bêşe heye. Ger hinekî jidil û durist be kî vî erkên xwe yên mirovî û welatparêzî dikare pêk neyne? Îcar ji bo milîtanek PKK'ê gelo kîjan taybetmendiya ayîdî xwe û behremendiya xwe heye ku ji wan veşêre û bicih neyîne heye?

Yekane encama ku ji van derbikeve ev e; dervî serdemeke metirsîdar bi wehşeteke nehatiye dîtin, weke şêwaza jiyanê li ser me tê ferzkirin bi vê rejîma lanetkirî weke qûralên fermanber ên serdema me em ê hesab ji hev bixwazin. Hemû tiştên ji me girtine dîsa qezenckirin, ji zarokan heya temen mezina, ji keçan heta dayikên me, hemû tiştên ku di nav dîroka me de qewimîne û heta roja me ya îro, heta gelê me yên di nava jiyanek bi êş de, ya ku herkesî ber bi rewşeke wisa ve dahf dide, hemû tiştê wan ji wan girtiye û rejîmeke wan derveyî mirovatiyê hiştiye; bi ruhê şoreşgerî û tolhildanên bi darê zorê ji wan girtin ma ne erka herî bi anûr ya cîhanê ye? Bûna daxwazkarek erkek wisa baştir gelo dikare qala jiyaneke din a çawa bê kirin? Jiyaneke ewqas berz, bi qasî ku berze jî ewqas zehmet û ferzkare, dilop bi dilop ku dawerive mafê xwe bigire kîjan nebesî dikare asteng bike? Bi zanebûn an jî bê zanebûn kîjan qelsiya me ku çavkaniya xwe ji me

digire dikare rê li pêşiya kar bigire? Ma gengaze ku ev rewa bê pejirandin? Kes bi nexweşî, nebesiyên xwe çawa dikare derkeve pêşberî Partî, Rêbertiya Partiyê, şehîdên me yên berxwedanê û yê ku nirxê me yê herî mezine pêşberî gelê me?

Vaye em dibêjin dawî li vê jiyana biqehir bînin. Piştî van tevan, em di qonaxa mirovbûnê ya ku dikarin dawî li hemû êşên gelê xwe bînin de dijîn. Qet nebê em ewledên dilsozê wê ne. Qet nebê em jêhatîne ku çalekiya wê ya herî pîroz a şoreşê, yanî çalekiya şoreşgerî pêk bînin. Em ê bikarin di vê mijarê de her cure dildarî, wêrekî, zanebûn, azamet û hewldanê raber bikin û em ji kûranî hîs dikin ku ger ev nebin wê hemû dozên mirovatî bên windakirin. Em yeqîn dikin em ê bikarin vê ji bo pêşeroja xwe ya ronî pêşkêş bikin û ev jî jiyana yekane ye, em ê her şêweyên jiyana ku ji bilî vê bi destê xwe bidin aliyekê. Ji ber xebatên dijmin ên vekirî, heta komek nokerên wan, hêzên cur be cur wê ji bilî vê mafê ti jiyanek din ji gelê me re nede, lewra ew di nava vê jiyana ku herame bê jiyîn de fetisandinê zêdetir wê ti hewldanên me nebin. Ji wê jî wêdetir ew birêxistinkirin, veguhertina hêza çalekiyê û anîna asta jiyanek madî zêdetir çi derdê me heye? Ji bo pêkanîna vê, mezinbûna divê ku mirov xwe bigihînê kî dikare me asteng bike. Ew êşên me yên ecêb, tengaviyên me, bêhêziya me ji bilî vê jiyanê weke din kîjan jiyan dikare derbaz bike?

Wê demê ya ku dibe berhema meşa me ya maratona panzde salan ji bo xwe gihandina hêza bîrdozî, polîtîk, rêxistinî û înşaya çalakiya Partiya me û hêza rêvebirin û meşandinê ye. Xwe di nava wê de helandin, bi rastî jî yên ku xwe ji nexweşiyên zarokatî pak kirine, devji karanîna rêbazên xwe yên ecemî berdane, milîtanên xwe gihandine her cure asta sekeftina rêxistin û çalakiyê, ji bo xwe gihandina asta milîtanên demê yên kamilbûyî ji hemû milîtanên xwe re dibêjim; “Vê demê bi xwe bafirînin, ber bi pêş de biçin û bê ku hûn ti astengiyan binasin encamên serkeftî bigirin.” Em di wê baweriyê de ne ji bilî biryardariya Partiyê, ew jiyana ku bêrîkirinên me hemûyan îfade dike, bi qasî vê jî mîna fermaneke dîrokê ye ji me re û ji bilî pêkanîna wê zêdetir em tiştekî din nabêjin.

Partiya me bi vê baweriyê, ya ku paşeroja wê bi pêşketinên ku divê qet biçûk neyê dîtin ve dagirtî û bi rastî jî ya ku pêşketinên pir cidî yên ku divê mirov pê serbilind be afirand. Di van rojan de gavên xwe yên despêkê ber bi sala 1985’an ve davêje. Qonaxên herî girîng ên xebatê li şûnve hiştin, bi çalakiya berxwedanê û êrîşa 15’ê Tebaxê ya herî navûdeng, ji dost û dijminan re mizginiya îlana pêvajoya nû dide. Ji bo dema pêşiya me bi serkeftinan ve bê dagirtin, hemû partîvanên di nava biryardariya esîl a herî

kûr û keda wê de ne, ji bo vê salê jî li gorî daxwazên me guncav bi pêşketinan ve dagirin, xwe û ruhê xwe yê girîng peyitandin. Ji sedên salan ve dixwazin gelê me bêdeng bikin, bifetisînin, ji ruh û awatên wan zêdetir ya ku nayê wateyeke din, ji pêwendiya bi mirovatiya pêşverû wêdetir nayê ti wateyê. Bi hemû hêza xwe ve bangawaziya tevlîbûnê dikim. Hêvî dikim ku vê bi hemû curên xebatan re, bi xebatên me yên çalaki, rêxistinî dijwar pêşwazî bikin.

Li ser navê xwe ji bo ku ji niha û şûn ve jî bi pêşketinan em dagirin em ê hemû behremendiyên xwe heta dawî bidin diyarkirin. Ji bo afirandina qonaxên têkoşîna gelê me ewqas ber bi pêş ve dibe û her roj hîn zêdetir gavan bi dijmin paş de dide avêtin, em ê hemû henaseya xwe û diyardeyên zindîbûn heta dawî raber bikin û ji bo serkeftî pêk bînin ticar xwe paş de nedin.

**Wê Serkeftin Bibe Ya Gelê Me Yê Ku Di Rêbertiya Partiyê De Hevgirtî Û Berxwedêre!**

**Adar 1985**

## PÊNGAVA NAVDAR A 15’ê TEBAXÊ Û SERKEFTINA SIYASETA ŞOREŞGERÎ YA RAST

**Despêk;**

8. Salvegera berxwedana çekdarî Partiya me û ya ku dibe navê ber bi pêşvebirina vê em yekemîn sala pêngava 15’ê tebaxê li şûn xwe dihêlin. Rastiya me ya rojane û dîrokî, di vê pêvajoyê de di derbarê pêşerojê de ya ku diviyabû ji aliyê fikrî ve bê jiyîn, bi çalakî bê derbazkirin, binesaziyên dirizin çibûn, ji her demê zêdetir ronak hatine destnîşankirin. Ji berxwedaniyeke çekdarî wêdetir, ev pêngava ku xwedî gelek taybetmendiyên cur bi cur bûn, hem ji bo ronikirina paşerojê û ji vê jî giringtir, ji bo hesapkirina destkeftên şoreşgerî yên dema pêşiya me çibin, bi kûrahî fêmkirin xwedî girîngiyeke jiyanî ye. Bi qasî fikra rast a di binê çalakiyê de, ji bo ruh û teşegirtina vê jî hema bêje mîna dilê xwe tazî danîna holê berxwedaniya ku hat raberkirin û mînaka wê nîne gelek tiştên ku ji vê bê fêrbûn jî hene.

Divê diyar bikim ku, berxwedanî ne tenê li beramberî hêzekî dagirker a hema jixweber, pêwîste neye jibîrkirin ku ev li hember hovîtiya herî mezin a ku dîroka mirovatiyê nas kiriye û zextên faşizan ên di roja me de tên meşandine. Li hember ên herî zêde mêtîngerî pêş xistî, li dijî serdemê û bi qasî li dijî serdemê ye, çîna serdest a ku xwe bi rêbazên herî zirav ve vedişêre tê meşandin. Li beramberî nokerê herî xeter ê emperyalîzmê, li ser navê gelê Kurd ku ji dîroka xwe û pêşketinên serdemê dûr hatiye hiştin û jibîrkirin tê pêşxistin. Vaye ger ev rastî weke di mejiyê me de bê kolan bê têgihiştin û her tim bi rêbazekî baş bê ziman, ancex wê demê dikare girîngiya pêngavê derkeve holê.

Pênvaga 15’ê Tebaxê, çalakiyeke ne tenê pêkanîna rista dîrokî ji aliyê partîya me û gelê me ve sînordare. Di serî de jî dagirkeriya Tirk di nav de, hemû nûnerên pergala kapîtalîst-Emperyalîst hejandiye û rê ji mezinbûna pêtên agirek ku wan di nava lezgîniyê de bifetisînê vekiriye. Ev agir tenê bi cîhê ku lê ye ve sînordar nemaye, germahiya vî agirî di serî de gelê Kurdistanê, Tirkiyê û Rojhilata Navîn, dilê hemû gelê cîhanê yên peşverû gerim kiriye û xwêdan bi hemû dagirkeran, noker û xulamên wan daye rijandin. Li beramberî pêşketinên ku vê pêngavê afirandiye û bûye sedem ku hêzên cur bi cur polîtîkayên xwe li ber çav derbaz bikin, ew naçar kirine ku bikevin nava lêgerinên çareseriyên nû yên cuda. Ji bo fêmkirina bandora

vê çalakiyê ji gelek aliyen ve û encamê wê nirxandinê, divê ku mirov li taybetmendiyên dema ev derxistiye holê û navenga ku tê de derketiye binêre û li beramberî van çalakiyan helwestên ku hêzên cuda ketine navê lêkolîn bike. Dema ku ev hat kirin encax karekterê wê ku mohra xwe li dîrokê da û rista wê bê fêmkirin.

Pêngava 15'ê Tebaxê, di nava çêkera dewleta mêtîngeriya Tirk de di asteke girîng de sazûmaniya faşîst pêk anî û bi armanca veşartina cewhera xwe ya faşîst bi pêşxistina hinek guhertinên şêweyî de plansazî pêk anîn. Piştî darbeya 12'ê Îlonê, bi xebatên lez hatin meşandin ve pergala faşîst a çar serî nefsmezin li ser hemû civakê serwer kiribûn. Lê ji bo ku muxalefeta derve û hundir serde biçe bê bandor bikin, diviya bu pêkanîn bi rêbazê çav bigire nehatiba meşandin. Bi vê armancê serî li xapandina " Vegera ji demokrasiyê" re didin, bi partiyên ji aliyê pergalê ve hatine avakirin ve, ber bi hilbijartinan ve diçin. Ji hinek bajarên diyar ên Tirkiyê despê dikin û qaşo hewl didin li ber çavan rewşa awarte ji holê rakin. Li gorî pêwîstiya pîlanên hatî kirin, ji ber ku muxalefet bêbandor hatiye hiştin, bi 83'yan re dibêjin; "Di welat de dê demokrasî bê înşakirin." Ji ber ev jî weke yek ji êrîşên har ên cuntayê bû, di van xebatên çavgirtinê de jî hem ji hevkarên xwe yên derve hem jî yên hundir alîkariya tam digirin. Bi vî rengî di nava hewldana desthilatiya xwe saxlemkirinê de ye.

Tevgera çepgir a ku bê amadekarî rû bi rû êrîşên cuntayê dimîne jî, berdêla dema borî ya nebesiyên parçebûyî bi rêbazekî pir giran dide, tenê di bin darbeyan de bi çewsîneriyê ve sînordar namîne, dikeve asta ku nikaribe xwedî li doza xwe ya esîl derkeve. Beşe ji derveyî yên girtî dimînin, bi awayekî bê rêxistinî li Ewrûpaya ku diçinê bi tasfîyegeriyê re rû bi rû dimîne û radest tê girtin. Tevgerên çepgir ên ku ti car nekarîn ji dorpêçiya tasfîyegeriyê rizgar bibin, tenê xwe bi xwe tinekirinê re jî namînin, weke ku di dîroka borî de jî derketiye holê, hema bêje bûn mîna pêkhînerên polîtîkayên 12'ê Îlonê. Hema bêje mîna ku bi hev re ketibin pêşbirkê li ser navê şoreşgeriyê çi nirxên pîroz hebûn, li dijberî hemûyan ketin êrîşê, xiyanetkarî û radestî mîna marîfetekê xwestin rewa bikin. Cuntaya faşîst, pişta xwe da rêxistinkirina şoreşa dijber, hêviyên xwe bi "vegera demokrasiyê" ve gire dan û di hilbijartinên 1988'an de bi hêviya berêndamên xwe ji parlementoyê re dayîn dest bi jiyanê kirine.

Ji bilî PKK'ê cuntaya faşîst a ku hemû hêz bê bandor kir, xwe gihandina di hedefa xwe de dizanin astengiya herî mezin li pêşiya wan PKK'ye û bi armanca darbeya dawî li wê jî bide, li nav bibe, di Gulana 1988'an de destwerdana Başûrê Kurdistanê dike. Armanc; tevahî qadroyên PKK'ê di

vê qadê de linavbirin, radestbûn ferzkirin, yên ku nikare ser bixe jî bi şûr serxistine. Lê ev pîlan, bi windahiyên giran ên artêşa Tirk ve bi encam dibe. Bi vê êrîşê re, di heman demê de tevgera provakasyonê ya ku li ser tevgera me ya şoreşgerî tê ferzkirin jî tê valaderxistin.

Ji aliyê din ve rêberên wan, yan jî tevgerên wan ya linav hatine birin, yan jî hatine tasfîyekirin û girseyên ku pêwendiyên wan hatiye qutkirin, dibin êrîşên dijwar ên cuntayê de û di encama polîtîkayên pasîfîkasyonê de hatine serkutkirin. Ber bi êş, hejarî û bêhêviyeke metirsîdar ve hatine kêşan. Her çiqas li beremberî pêkanînên cûntayê yên dervî mirovatiyê hêrs bibin jî, ji ber ku bê rêberin vê dernabirin, di bin demogojiyên cuntayê de, hêviyên wan ên di derbarê têkoşîna şoreşgerî de di asteke girîng de hejiya ye. Bi darbeyên ku li tevgerên şoreşgerî dane, êdî wisa dizanîn ku dê bi muxalefeteke bi hêz re rû bi rû neminin. Bi reşa girseyên bêdeng cuntaya faşîst a ku hêviyê wê zêde bibûn êdî di baweriya bi rehetî meşandina desthilatiya xwe de ye û serde jî raya giştî ya cîhanê jî di vê mijarê de daye bawerkirin.

Vaye pêngava 15'ê Tebaxê di nava şert û mercên wiha de pêk hat. Di nava navengeke bêhêvîtî, bêzarî, tasfiyegerî û ewrên radestiyê de di nav civakê û tevgerên çepgir de digerî, mîna tirs û xofek li ser hemû kesî ketibû, ya ku hat kirin ji bo gelek kesan weke mûcîzeyeke jê nebawer bû. Dîsa ji bo dijmin û ezbeniyên wî mîna xofekî bû. Despêkê bawer nekirin, piştre wisa zanîn mîna îsyanên dema borî ne. Artêşê got: "Îsyan heye" û rabû ser piyan. Berê xwe dan Kurdistanê. Lê di holê de ne îsyan, ne jî yên çalakî kiribûn hebûn. Xwestin pêşketinan sivik bigirin dest, vê carê jî di dema ku herî zêde xwe rehet didîtin de, yên ku dikarin ewqas çalakiyeke bi hêz û rêxistinkirî ve encam bidin û serde jî bê ku windahiyan bidin şoreşgerên paşve kêşane li beramberî wan nekarîn vê jî bikin. Komara Tirkiyê cara yekem çalakiyên wisa ku pê re rû bi rû dima, nexwest fêm bike ku ev çirûska yekem a şewata ku dê dawiya wan bîne. Lê rastî bêrehmin û neçar man ku ji van rastiyan re serî bitewînin. Beşeke mezin a artêşa xwe ber bi Kurdistanê ve veguhestin, li her cihî derketin nêçîra şoreşgeran. Operasyonên ku tevahiya Kurdistanê digire berfirehiya xwe pêşxistin. Bi baweriya ku tevahî mercên xwe bi cihkirina şoreşgeran ji holê rakirine, dest bi gotinên mîna çalakî kirine û vekişîne derveyî sînor kirin. Ji bo rewşa artêşa bêzar veşêrin, ji vê baştir hêceteke din nedikarî bê dîtin. Dawiya propagandayên weke "Me girtin, dorpêş deng dibe, dawiya wan hat" nedihat û nekarîn şoreşgerekî tenê jî bigirin. Dema ku nekarîn bigirin di nava artêşê de bi zehmetiya mercên erdnîgariya Kurdistanê ve jî girêdayî di

nava artêşê de kelandin, bûhran, revan despê kir. Mehmetcîkên leheng hîn di gava xwe ya yekem de likumîn û valatiya wan derket holê. Bi vî rengî ew efsaneya "Artêşa Tirk a bin nakeve" bi erdê re bû yek.

Ev hejîna ku di nav artêşê de hat dîtin, di tevahiya çêkera dewletê de jî derket holê. Otoriteya dewletê bi erdê re bû yek. Di çar salan de ew propagandayên ku dikirin û digotin bi qasî ku careke din nikaribin zindî bibin me wan "tine kir" û valatiya vê demogojiyê derket holê hemû rayedarên dewletê bihev ketin. Dest bi gera berpirsyaran kirin. Ji serkêşê cuntayê, îlahê ku kesî nekarî destê xwe bidê ji Evren re jî bertek nîşan dan, ew bi nebinketîbûna hedefên li pêşiya xwe danî û pêk ne anîna wan hedefan tawanbar kirin, di heman demê de gotin ew dewletê dixe xeteriyê. Di nava hikumetê de pêşiya hejînan nehat girtin û di bin navên cuda de tasfîyegeriyê despê kir. Baweriya bi rejîma faşîst a ku xwe mîna yekane hêza çareseriyê dida pêş bi erdê re bû yek. Ezbeniyên cuntayê jî li beramberî hêzên emperyalîst ketin rewşeke zehmet.

Ev pêşketinên nû yên di Kurdistanê de, tenê cuntaya Tirk bi xafîl girtin û şaşwaz hiştina wan ve jî sînordar nema. Derdorên emperyalîst ên ku baweriya xwe bi demogojiya me şoreşger xilas kirin anîbûn û hêzên nav-netewî, raya giştî jî kete nava şaşwaziyek kûr. Derdorên emperyalîst, bi fêmkirina taybetmendiya rast ên bûyeran ve devji dayîna pereyên dahatuya kar ya li Tirkiyê kiribûn berdan û dîsa di weşanên çapemeniya cîhanê de dest bi vegotina çalakiyên li Kurdistanê tên lidarxistin û têkoşîna gelê Kurd kirin. Rastiya Kurd û Kurdistanê ya ku dixwestin bi hemû cîhanê bidin jibîrkirin, bi vî rengî bi hilweşîna dîwarê tecrîdê re bû mijara nîqaşan, bal kêşan ser têkoşîna ku dihat meşandin. Welatên emperyalîst, neçar man ku polîtîkayên xwe yên di derbarê Kurdistanê de di vê çavçovê de ji nû ve liberçav bigirin.

Ji çar aliyan ve, bi salan derdorên sosyalîst ên ku çavê xwe li rastiya Kurdistanê poşîbûn, bi van pêşketinên nû ve girêdayî, ketin pêvajoyek wiha ku ji nêz ve bi pêşketinên li Kurdistanê re eleqeder bibin. Pêngava 15'ê Tebaxê, bi vî rengî di navbera Têkoşîna Rizgariya Netewî ya Kurdistanê û hêzên sosyalîstên cîhanê, rizgariyên netewî û şoreşgerên pêşveçûyî de rista bûna pirekê lîst.

Çalakiyên 15'ê Tebaxê, bûn çalakiyên hemû rûpêşên li ser rûyê dewleta Tirk bi erdê re dikin yek. Heta wê rojê, ew teretûrên ku di derbarê vegera demokrasiyê de dikirin, ên ku raya giştî ya cîhanê pê dixapandin, cuntaya faşîst a Tirk bi êrîş û operasyonên dij mirovî ku li ser gelê Kurdistanê pêk tanîn ve di vê mijarê de çawa di nava xapandinekê de ye hemû raber kirin.

Nûnerên herî dawî yên vê çîna serdest, bi rêbazên heta wê demê nehatî dîtin tepisandin. Bi ji rêderketinên demogojîk û sergirtina bûyeran ve, bi şêwazên cur bi cur kar anîn, ket nav hewldana berepêçkirina rastiyên berxwedaniya me ji bo ku bi gelê Kurdistanê û gelê cîhanê jî wiha bide nasandin. Îdîa kirin ku çalakiyên ji aliyê me ve tên pêşxistin bi armanca rê girtin li hewldanên wan ên dixwazin derbazî demokrasiyê bibin û em bi eşqiyatiyê tawanbar kirin. Lê ev zimandirêjiyên wan jî rê li derxistina rûyê wan a dijminatiya li dijî gel û astêngên pêşiya demokrasiyê negirt û bertekek mirovatiya pêşverû li dijberî vê hêza hoveber a dervî serdemê ji nû ve zêdetir kir.

Lê yên ku çalakiyên me bi vî rengî nirxandin û êrîş kirin tenê ne mêtîngerên Tirk bûn. Çepgiriya bi destûr û burjuvaziya biçûk ên reformîstên Kurd jî, hemûyan bi yek dengî gotin ku, ev çalakî provakasyonin û darbe li hewldana vegera demokrasiyê didin û bi vî rengî berê xwe dan êrîşên herî xirab. Ev hêzên çepgir ên sexte ku bi dûv burjuvaziya biçûk a lîberal ketine û hemû plansaziyên xwe li gorî hilbijartinên 1988'an çêkirine, heta dawî ji sorbûna navengê tengav bûne. Ji qral bêtir qralperest êrîşî ser van çalakiyên ku ji bona wan jî banga têkoşînê ye kirin. Ev hêzên ku diviyabû li dijberî pergalê rawestin, ji ber sedema ferasetên xwe yên reformîst û sosyal-şovenî li beramberî rastiyan kor û ker man, heta bi vê ve jî sînordar neman, êrîşî berxwedanê kirin. Li dijberî tevgera şoreşgerî tifaqên pîroz pêş xistin. Ev jî ji bona wan bê şansiyek mezine.

Tevahiya van helwestan, tenê ne ji bo nirxa berxwedaniya hêzên çekdarî yên di bin rêbertiya PKK'ê de û pêngava Tebaxê bişkînine. Di heman demê de çiqas berevajî berjewendiyên gel dikevin vê jî derdixe holê. Ew rewşa wan, li beramberî gelê xwe ew erkên ku divê bînin cîh, lê bi israr jê direvin jî çiye wê derdixe holê. Ev di heman demê de, di herêma me de, dîrok û roja me de, bi mebesta nokerên emperyalîzmê girêka nakokiyan çawa aloz kirine, dê çawa negihêje çareseriyê di vê mijarê de jî mirovên ku kêmekî xwedî hişyariyê ne jî, bi ezmûnên dewlemend ve dagirtîne.

Di mijara têkoşîna ji hezar sal û vir ve didomê de, di serî de çapemeniya Tirk, bi wî re hema bêje heta awazên wî yên ku di heman demê de hêmanên weşana bizavên çepgirên sexte û reformistin jî heman deng derdixistin. Van weşanan serî li înkargeriyê dida û çelexwarî dikirin. Berdêla wê çi dibe bile bibe her tim êrîşî rastiya gelê me ya ku dixwaze bijî, mafdare û divê rêz lê bê girtin dikirin. Şîroveyên weke "Tevgera eşqiyane, derketineke cihekare û hilweşînere", ji bona burjuvaziya Tirk komkujiyên xwe veşêre di

çapemenî, radyo televîzyonên xwe de rojane dûbare rêz dikirin. Ji hêlek din ve jî kesîmên xwecihî, noker û reformist ên li dijberî PKK'ê û APO'geriyê tifaqên pîroz ava dikirin û sosyal-şovenên ku her tim pêre nokertî dikirin pirsgirêk berevvajî dikirin û ti carî nexwestin navê pirsgirêkê ya rasteqîn lê bikin. Weke ku ev pêşketin bê rêbertiyekê jixweber derketine holê nêzîkbûn raber dikirin. Bi qasî burjuvaziya biçûk jî bi namûs nebûn. Çi dibe bila bibe tenê di asta nav de li berxwedanê xwedî derketin, di mijara hêza ku ev berxwedanî pêk aniye û egîdên vê berxwedaniyê bi erdê re yek kirinê de, bi qasî ku bikaribin serî li hemû curên harbûnê didin û rastiyek ji hişyariyê dûr raber kirin. Di vê mijarê de gelek tiştên bên gotin hene. Gelek tiştên ku her dilopa xwîna hatiye rijîn, her egîdê ku ketiye binê axê ku ji van kesên rast nabin re bêjin heye.

Pêngava 15'ê Tebaxê û pêşketinên ku piştî wê hatin jiyîn, PKK di Rêbertiya xwe de di rêya hilweşandina bêşansiya gelê xwe ya vajî de, gaveke dîrokî avêtiye. Zenga li ser dilê me, ji wê jî wêdetir bi gotina burjuvaziyên Tirk qalibên betonê parçe kiriye, kevirê ber serê qebra gelê me girtiye û avêtiye, zanîbûye bibe îfadeya rastiya gelê me ku dê mirinê bi asanî nepejirîne.

Eşkereye ku hêjî nebesî, lewazî hene û pir zêde pêdivî bi xurtbûnê heye. Hêjî bi qasî ku dijmin dev ji evîndariya xwe ya linavbirina me bernedaye, ji me re mafê jiyanê nasnake. Her çiqas mîna berê bi rêbazê înkarkirinek korane nebe jî, ji aliyê mirovatiya pêşverû ve, hêjî bi şêweyek ne rewa bê eleqeyiya wan li beramberî çarenûsa gelê me û rastiya domdariya vê heye. Lê tevî van hemûyan jî rastî bi înadin. Îcar, rastiya gelan a şoreşa pêşverû, hîn zêdetir bi înade û di mijara girtina mafê xwe de, ji hemû hêzên zextkar, rêbazên hoveberiya pêşketî bi hêztire. Pêşengê ku ji vê bawer têkoşîna xwe didomîne, eşkereye ku dê bêdeng nemîne. Helbet wê van hovîtî û fêlbaziyan derxîna holê, lewaziyên xwe veguherîne hêzê, ji bo xwe ew rastiya ku mîna çarenûs jê re hatiye diyarkirin derbaznedariya wê dayne holê û ji bo ji holê rakirina bê rewatiya serdema me, heta dawî bizanibe şerê mezin ê anûr û namûsê bimeşîne.

## 1- Di Dîrokê De Rastiya Berxwedaniya Me û Hinek Taybetmendiyên Wê;

Tevgera PKK'ê, weke tevgerek berxwedanê ji dayik bû. Ji dayikbûna wê û heta roja îro jî ya ku mohra xwe li têkoşîna ku bilind kirî da, dîsa ev ruhê berxwedêre. Ev ruh, bi sedên sale tevî xiyanet û ji xwe bêganebûna ku dixwestin li ser civaka me serwer bikin, ew bi erdê re kirin yek û wisa

bilind bû. Li ser vî esasî mohra xwe ji nû ve ji dayikbûna civaka me da, yanî ruhekî berze. Ev ruh bi berxwedaniya çekdarî ya Partiya me hîn zelaltir bû û bi pêngava 15'ê Tebaxê ve xwe gihand lûtkeyê. Ruhê ku têkoşîna me xist ser rêyeke jêneger û xwe gihand wateyeke dîrokî ya berze. Têkoşîna me ya çekdarî li ser vî esasî pêşket û pêl bi pêl di nav civaka me de belav bû. Nirxên ku di nav sedê salan de neyê bicihkirin afirand, mohra xwe li çarenûsa gelê me da û risteke dîrokî lîst.

Wê demê berxwedaniya saleke dawî û tevgera PKK'ê ya ku em berpirsyarin dema ku em 8. Sala berxwedaniya çekdarî ya ku li şûn xwe dihêlin, divê ku em bersiva pirsa "Wateya wê ya dîrokî û hemdemî çiye" bidin. Ji bo derbikevin holê jî, pêwîste di destnîşankirina polîtikayên dijmin ên ku di dîroka borî de li ser gelê me pêk aniye û dijberî van taybetmendiyên cur bi cur ên têkoşînên ku hatine meşandin bên lêkolînkirin û pêwîstî bi kirpandina vê heye. Dema em hinek taybetmendiyên di rastiya dîroka berxwedaniya xwe de berçav bigirin wê bê dîtin ku, hoveberiya li hemberî me, hêzê dagirker û fetihkar, çînên serdest ên Tirk weke nûnerên herî dawî ketine Kurdistanê ji Selçûqiyên mezin heta niha bi înad taybetmendiyekê berdewam dike.

Dema begên serdestên Tirk Rojhilata Navîn dagir kirin, li gorî xweseriya her herêmê xwe bicîh dikin, pêwendiyeke taybetmendiyên Kurdistanê jî li ber çav digirin, siyasetek mêtîngerî û zextê jî pêş dixin. Hîn di wan salan de, li Kurdistanê begên Kurdan ên pêşketî hukmê xwe didomînin. Rêxistinên bi hêz ên eşîretan û erdnîgariya Kurdistanê ya ku bi asanî nayê destxistin weke di dagirkerên borî de pêkhatî, dagirkerên Tirk jî dibînin ku ne welatekî wisaye bi asanî bê dagirkirin. Ji ber vê begên dagirkerên Tirk, di despêkê de bi begên Kurdan re, hema bêje di asta du hikumetên wekhev de, li ser esasê pêwendiyên wekhev di navbera began de pêşxistin weke polîtîkayekê meşandin. Ji aliyê begên Tirkan ve otoriteya giştî bi rengekî sembolîk naskirin têr kiriye, li ser vê xelat û derfetên di nava seferên leşkerî de jî dema ku lê zêde dibin, begên Kurdan di pêşxistina pêwendiyan de bi wan re xwe paş ne dane. Begên Tirkan di gelek qadên din de bi xwe re nabînin hêza pêkanîna wan polîtîkayên xwe yên kolonîkirin, belavkirin, xirabkirin û şewitînê di Kurdistanê de pêk bînin. Lê ji ber di zanebûna nirxê herî mezin ê şerkeriya Kurdistanê de ne, ew di dagirkeriya xwe de karanîn û dema pêwîstî pê hat dîtin mîna hêzekî cîgir bikaranîn esas girtin û di vê mijarê de bi aqil tevgeriyane.

Selçûkiyên mezin, dema hîn di sala 1040'î de Kurdistan mîna eyaletekê sazûmankirin, ji begên Kurdan re heta dawî xweseriyeke berfireh nasîne,

nemaze çarçoveya pêşketina feodalîteya Kurdan pêk anîne. Yên ku ev polîtîka piştre ji dema Yawûz Sûltan Selîm yên ku dewr girtî û berdewam kirin desthilatên Turk ên Osmanî, heman polîtîka bi hostatî di rêvebirinê de qet zehmetî nekêşane. Taybetmendiyeke begên Tirkan a ku di navbera xwe de li hev nakin û nakokiyên xwe çareser nakin heye. Ji ber vê taybetmendiyê, di vê demê de li hember pêşketina dewleta Sefewî Şîî ya Îranê, bi armanca saxlemkirina seferên Îslamî yên Yawûz, ji bo serkeftina seferên Rojhilat, bi bandora nakokiyên mezhebî yên Kurd re, heta radeya dawî bandora xwe weke hêzekî li berdest dan hîskirin. Ji ber vê sedemê Yawûz jî xwe ji ber dayîna her cure tawîzan nade aliyekê. Ji ber vê ye ku Îdrîsê Bîtlîsî nûnertiya ruhê vê siyasete dike û di nava hemû împaratoriya Osmaniyan de, gelek hikumetên serbixwe, bi şêweya îmaratan afirandina statuyeke Kurdistanê watedare.

Statuya ku ji Erebîstanê, Anadolê û Balkanan re nayê nasîn, çima ji begên Kurdan re dinasin? Divê ku mirov vê di nava rastiya begên Kurdan a ku ber bi rojhilat belavbûnê de weke xala sereke rist lîstinê de bigere. Kurd di heman demê de hêza wan ên li berdestin. Ji ber vê taybetmendiya wan, di despêkê de astên herî pêşketî ji wan re tê dayîn. Bi berjewendiyên împarator ve girêdayî, ev ast tê tengkirin yan jî tê berfirehkirin. Vaye, bingehê dîroka di Kurdistanê de bi awayekî bihêz otoriteyên bêganeve girêdan, ji aliyê serdestên Tirk ve wiha hatiye pêşxistin.

Dema em digihêjin sedsala 19'an a ku ev girêdan pir zêde dibe, teqîna îsyanên belav hema bêje weke rewşeke jênerev derdikev holê. Begên Kurdan, taybetmendiyên xwe yên klasîk ji dest didin, asta xwe ya hikumetbûnê ji dest didin. Tifaqa di navbera wan de têk çûye. Ji bo dûbare bigihêjin asta xwe ya berê dê biperpitin, lê serdem hatiye guhertin. Kapîtalîzma rojava, pêwendiyên bazirganî, parastina gelên kêm û bi Fermana Tanzîmatê (pêşnûme biryara ku ji bo çaksaziya nava dewletê ji aliyê Sûltan Hemîd ve hatiye weşandin) û ji bo jîndarkirina mafên di fermana Islahatê (guhertinên ji bo xwe gihandina rewşeke baştir hatiye amadekirin) de hatî dayîn wê hemû curên alîkariyê bi polîtîkayên pergala Osmaniyan re bê kirin. Wê îsyanên Kurdan ên di demê de biçewsînin. Nokerên kevneşop ên Kurdan, di tevahiya sedsala 19'an de tevahî berxwedaniyên dimeşînin winda dikin. Pêşketin vê neçar dikin. Berjewendiyên çîna feodal a ku nûnertiya wê dikin, ji ber ku di wê serdemê de berxwedanî neket pêvajoya Rizgariya Netewî serketina wan jî bê derfet bû.

Beriya her tiştî, çêkera civakî ya feodal û eşîrgerî, bi awayekî objektîf ji pêşketina tevgereke Rizgariya Netewî ya nûjen, heta radeya dawî teng dikê û bê derfet dihêle. Vaye ev rewş di destê yekî weke Ebdûlhemîd, fêlbazê herî baş ê padîşahên Osmaniyan, bi qasî ku fêlbaze ewqas jî mucidê polîtîkayên nû yên millî ye de, dibe amûrek baş. Bi armanca çewsandina tevgera Netewî ya Ermeniyan û serkutkirina berxwedaniya netewî ya Kurdan, di deme Yawûz de hêzên begên Kurd ên Îdrîsî Bîdlîsî pêş xistîn, vê carê di bin navê Alayên Hamîdiye de, dê yên ji nû ve derbikevin û rizgariya netewî li rojhilat nû serî hildin bitepisîne. Bi vî rengî wê vê derê ji bo ku jê re weke hêzekî berdest bimîne jî pêk bîne. Berhemên vê polîtîkayê, piştre ji aliyê Mustafa Kemal ve wê bedewrgirtin. Vê carê jî di şerê Rizgariya Netewî ya Tirkan de Kurdên mîna hêza li berdest di rêya destxistina serkeftinê de bên karanîn û ji bo damezrandina Komara Tirkiyê xizmet bi wan bidin kirin. Û dê ev jî li ser esasê linavbirina Kurdan bi xwe pêk were. Dîrok li vir, ji ber xiyaneta ketî ya serdestên xwe, dawiyeke metîrsîdar ji gel'ekî re amade dike.

Ya hêza bingehîn a rizgariya netewa Tirk ji hêla Rojhilat ve dayî destpêkirin gelê Kurd, ji hêla serdestên xwe ve berdêla giran a bê şert û merc bikaranînê wê bi tinebûna li ser bingeha komkujiya hebûna xwe ya netewî û bişaftinê bide. Her wiha dê berdêla hemû encamên bi êş ên wê polîtîkayê jî di serdema şoreşan û serdema rizgariyên netewî yên di roja me de jî bide.

Di Kurdistanê de ji dema borî û heta niha piştî her pêleke zextê, berxwedanî rawestiyane. Lê hemû berxwedanî, di nava demeke pir kurt de ji ber karakterê pêşengên xwe, ji aliyekî ve hatine çewsîn, ji aliyê din ve bi rêbazekê bê bandor hatine hiştin. Ev jî taybetmendiya herî girîng a dîrokê ya duwemîne. Yên di nava berxwedaniyê de cîh digirin dikin du beş, hinek ji wan bi şûr ji holê tên rakirin, ji yên din re jî derfetên madî tên pêşkêşkirin, ewleya jiyanê ji wan re tê dayîn û derfetê bi destê wan berxwedanê ji hundir ve bişkînin didin pêkanîn.

Dema ku em li berxwedana tevgerên sedsala 19'an dinêrin, hema bêje rastiyeke hevbeş a di hemûyan de derketiye holê heye. Şûr û kirîn, polîîtkayên sereke yên di vê serdemê ne. Mînak weke ku di îsyana Bedirxan beg de tê dîtin, seferên ku jê re tê gotin yên hereşeyê dema ku çend caran ser wan de diçin xiyaneta begên serkêşiya îsyanê dikin, berxwedanî di nîvê rê de dihêlin, rewşa bêrêxistiniya wan xwe dide der. Ji xwe di vê demê de li Ewrûpa berxwedaniyên gelek mezin tên jiyîn. Rêberên îsyanan ên ku ji berxwedaniyê ber bi radestiyê ve dişemitin, piştî

ku berjewendiyên xwe yên çînî digirin bin ewlehiyê hema lingê xwe tavêjin Stenbolê. Bedirxan begê ku ji îsyana herî mezin a sedsala 19'an re şerkêşî kir, dema radest dibe diçe Stenbolê, ew jiyana şexsî ya di serdema Ebdûlhamîd de rêxistin kirî, îfadeya xwe ya herî vekirî di bûna xwedî 120 neviyan de derdikeve holê. Vaye ji we re mînakeke herî balkêş a xiyaneta ji nava dilê Kurdistanê derketiye. Ev rewş di gelek îsyanan de xwe dûbare dike. Politikaya ku di îsyanan de serî lê didin, di demeke kurt de serî tewandin, hereşe, komkujî, beşek ji wan kirîn, ber bi Stenbolê ve birin, niha Enqere ye, di wan deran de bi şêwazek nîv dîlgirtî ew terbîyekirin û polîtîkaya wan kirina xulamekî baş ya Komara Tirkiyê ye. Encama vê jî, domdariya serdestiya bêganeyan li ser Kurdistanê ya sedên sale û heta roja îro hatina vê serdestiyê ye. Polîtîkaya ku li jorê qala wê hat kirin, ji dema borî heta îro, ji aliyê KT ve heta radeya dawî bi hostayî hatiye karanîn. Ev polîtîkaya ku li dijberî tevgerên gelên Anadolî hatiye karanîn, hîn di qonaxa despêka damezrandina komarê de, li beramberî nûnerên gel ên Komînîst û demokratan jî bi kar anîne. Bi heman şêwazê di serhildanên gelê Kurd de jî, ev polîtîka bi rengekî zêde û di asta ku dilê mirov jê hevkevê de xistine rojevê. Hêzên serdest ên Tirk weke pêdiviya vê polîtîkayê, ji aliyekî ve nûnerê gelan qetil kirin, ji aliyê din ve ew vexwendin nokerî û radestkariyê. Em ji Mustafa Sûphiyan bigirin, heta tevgera Dev Genc'ê, ti tevgerên gel ên ku serdestên Tirkan bi awayekî zirav ev polîtîka li ser nemeşandibin nemane.

Xapandina gel, bikaranîna muxalefeta gel û ew kirina qurbana berjewendiyên çîna serdeste… Vaye di nava hemû tevgerên gelên Tirkiyê de rastiya berxwedanên ji li navbirinê rizgar bûne, rewşa nûnerên wan ê dawî di nav de ev e. Ev polîtîka, ma kêm li ser PKK'ê hat ceribandin? Na berevajî, ya herî ketî, ji despêka derketina PKK'ê ve despêkir û heta pêşketina wê ya îro jî, hewl dan li ser wê serwer bikin. Heta mirov dikare bêje, yek ji rêbazên vê polîtîkayê ya herî ketî û hovaber, heta xirabkarên herî zirav, şêwazên wê yên bi bandor, weke şêweyên herî pêşketî yên şerê taybet li ser rastiya PKK'ê hatin ferzkirin. Ev ferzkirin tenê ne ji derve ve, di hundir de jî hatiye kirin. Ev xebat çawa hatin pêşxistin di gelek weşanên Partiyê de hatine vegotin, tên zanîn. Dijmin hemû amûrên xwe yên weşan û çapemeniyê serferber kir. Heta ji qonaxên despêkê yê cûntaya faşîst, rejîma faşîst a 12'ê Îlonê di gel operasyonên radestgirtin û belavkirinê, Partî bi destê çend xayînên navxweyî ji hundir ve ruxandin, meyla berxwedaniyê tinekirin û ev jî pêl bi pêl xebatên tasfiyekarî li ser hemû Partiyê meşandin.

Ev înkarî, piştre veguherand ketîbûnek li nav hemû dîroka Partiyê belav bibe.

Dijmin, van xebatên xwe di demên dawî de bi qanûna poşmaniyê ya ku derxistiye ber bi xaleke jortir ve bir. Li gorî xwe tawana wê çiqas giran dibe bila bibe, dixwaze bila 100 leşker û serbazê Tirk kuştibe ger PKK'yek qetil bike, yan bide girtin, di astekê de zirar bide Partiyê dê wî kesî efû bike. Bi qasî ku hêviyên wisa bide wan dijminê ku ketî ye, ev di asta qanûnê de derxist. Serkêşê cûntaya faşîst di demên dawî de dibeje; "yên ku gule li ser leşkerên Tirk direşînin ma em ê wan daneleqînin xwedî bikin", bi vê qanûnê re ji vana yên ku jê re nokeriyê bikin dan ber qanûna efûyê. Bi vê ve hemû bîrdoziya xwe, polîtîka xwe hema bêje bi qasî ku di yek hevokê de bi cîh bike eşkere kir. " Tu kî dibî bibe, ger tu li dijî PKK'ê yî were nav refên me! Himêza me ji te re vekiriye. Em dikarin hemû paşeroja te jibîr bikin, te bigirin ber sînga xwe." Belê, dijmin li beramberî PKK'ê ketiye rewşeke ewqas bê reng, aciz û ketî.

Rêbazên linavbirina tevgera şoreşgerî, vala derxistina têkoşînê bi van ve jî ne sîdordare. Bi cerdevanên demî yên gundan û qanûna îzaleî Şekavet ( Li ser mulkekî ji holê rakirina şirîkiya hardûyan, yan jî diziyê) dijmin dîsa di nav hewldana rêxistinkirina Alayên Hemîdiye de ye. Hem jî mûçeyeke bi qasî ku dide karmendên xwe! Ev jî yek ji xebatên KT yên ketî û dij qanûniye. Cûntaya faşîst-dagirker di bin vî navî de û bi pereyan, milîsên faşîst ên ku gelê xwe pê bide gulebaran dafirîne. Di demên borî de MHP'ê ev bi dilxwazî dikir. Niha ji şêwazê MHP'ê hîn ketîtir û weke berhema fermî ya polîtîkayên dewletê ev derdikeve pêşberî me. Li ser esasê dijberî tevgera PKK'ê bikar bînin, îro di wan cihên ku berxwedaniya me ya binavûdeng lê tê meşandin, di 13 bajaran de dixwazin qanûna cerdevanên gundan pêk bîne. Mirovên Kurd ên ku bêkar û hejar hatine hiştin, derfetên madî ên berfireh ji wan re tê dayîn û dixwazin bi rêbazekî herî qirêj bikar bînin, mîna milîsên faşîst wan rêxistin bikin û bêrê wan bidin tevgera şoreşgerî. Serde jî xwe bi van ve jî têr nabînin, rêbazên jiyana herî ji rêderketî li ser ferz dikin, ji bo ku ciwan û gundî di nava vê çêkera ku dikarin bijîn de pasîfîkasyona wan pêş dibînin.

Ev dijminê ketî yê ku mîna xofekî li ser serê gelê me rûniştiye, ji aliyekî ve tevahî van pêkanan li nav çavê cîhanê dinêre û wisa pêk tîne. Ji aliyê din ve jî bi gengeşeyên sexte yên silma Bûlgar-Ermeniyan ve bi qasî ji dest tê hewl dide şovenîzmê gûr bike. Û ser de jî bi van, dikeve nav evîndariya sergirtina hoveberiya xwe, pêkanînên dij mirovahiyê. Ji egîdên berxwedaniyê yên ku mînakên wan di dîrokê de pir kêmin re dibêje;

“Eşqîya, cihekar” û rûpoşa xwe ya tawanbariyê bi qasî ku veşêre dijminekî me yê ewqas ketî derdikeve holê.

Em bi şebekeyeke hiqûq serûbin dike, rastiya siyasetê serûbin dike, eşqiyatiyê çavsorî pêk tîne, di çarçoveya netewî û nav-netewî de, bi zorê ji xwe re statuyeke qanûnî nas dike, bi qasî ku vê bi mirovatiya pêşverû jî bide qebûl kirin bûye komek bêrû, rêxistineke tawanbarî, dijminê exlaq, dijminê namûsê, dagirkerek herî har, nirxên civakê dirizîne, maşikê herî baş a hêzên emperyalîst û gangasterên qanûn-qûralan nas nakin re rû bi rû ne. Ev ji bo têkoşîneke pir rewa, bi derfetên teknîkî yên ku di dest wan de heyî berevajî bikin, wê her roj bi qasî dikarin qîr bidin û hawirdor tevlîhev bikin. Ew hesabê vê dikin ku wê bikaribin me ji mirovbûna me dûr bixin, ji bo vê ger pêwîst be gav bi gav dê me bi komkujiyan re derbas bikin û pêk bînin. Ya ku tê jiyîn êrîşeke bi niyaz û rêbazên xirabe, linavbirin û li beramberî vê sekneke esîl, ya ku her yek ji wan dikare bibe destanin. Ev berxwedanî ewqas esîl û dîrokî ye ku, ji hemû aliyan ve ew fêmkirin, naskirin, armanc û pêşketina wê baş fêmkirin, erkeke devjêneger û nayê paşde xistine.

### 2- Di Têkoşîna Me Ya Rizgariya Netewî De Cihê Pêngava 15’ê Tebaxê, Ji Aliyê Kî Ve, Bi Çi Sedeman Êrîş Li Ser Çalakiyên 15’ê Tebaxê Pêşketin û Pêşketinan Çi Selmand?

Pêngava 15’ê Tebaxê ne weke her pêngavekê ye. Dîroka me, ji aliyê dagirkeriya Tirk a hoveber û faşîzma 12’ê Îlonê ve, ji bo ku careke din zindî nebe xwestin tarî bikin, lê di heman demê de hêviyên gelê me yên dawî di derbarê rizgariyê de jî şîn kir. Bi polîtîkayeke şoreşgerî ya rast, bi Rêbertiyê re di zemînên guncav de û li ser esasê xwe sipartina hêza xwe ya xas, li ser esasê serkeftina esasî, ji bo ku despêka dîroka herî bi wate bê pêkanîn, hêza ku ji dest hat hemû hat seferberkirin. Ev jî diyardeyeke berxwedanê ya wisa ye. Tevî hemû kêmasî û nebesiyên xwe, weke ku di dîroka me de gelekî tê dîtin û îro jî dixwazin di pratîka me de serî pê bidin hildan bê ku rê bide nokerî, teşîr û tecrîdê, bê ku kêliyekê jî agirê berxwedanê vemirîne, li dijberî darbeya taybet a ku ji aliyê dijmin ve dihat ferzkirin, berxwedaniyeke ji aliyê gelê Kurdistanê ve şêwaza şerê xas ê qezenckirinê bû. Ya ku heta roja îro berdewam kiribû û hema bêje weke qûralêkî jênerev lê hatibû qanûna berxwedan û binketinê vê carê hat berevajîkirin. Ji bo careke din dîroka me neyîniyan nede dûbarekirin, di rêya serkeftinê de xwe gihandina serkeftina dawî ye pêngava binavdar a 15’ê Tebaxê.

Pêngava 15’ê Tebaxê, di heman demê de eserekî ji aliyê hewldanên awarte yên pratîkî ve şêweyek hatî diyarkirine. Di demê pêş de dema ku bîranînên afirêner û amadekariyên vê pêvajoyê bên nirxandin, keda pratîkî ya ku ji bo vî eserî hatiye raber kirin, cesaret û fedakarî wê bi hemû hûrkariyên xwe ve bên destnîşankirin. Lê ger mirov bixwaze bi hevokekê îfade bike; pêngava 15’ê Tebaxê di dîroka berxwedaniya me de di heman demê de wê weke egîdiya kedê derbaz bibe. Ji aliyê taybetmendiyên welatê me yên erdnîgarî û yên din ve di nava mercên herî dijwar û paşverû de, heta radeya dawî mirî û ji zanînê mehrûm, di naverasta Kurdistanê de pêngava 15’ê Tebaxê ya ku hat pêkanîn, çiyayên mezin ên bi berfê dagirtî derbazkirin. Bi rojan birçî hat jiyankirin. Bi mehan meşîn. Bê dawî hêza propaganda hat karanîn û hêza qanekirinê hat karanîn û wisa pêk hat. Yên ku xwe, dîroka xwe û serdem ne dinasîn, rastiya me ya netewî û civakî û ji bo danasîna têkoşîna me, ji bo wan bi şerê xwe dayîna qezenckirin, serî li maratoneke mezin hat dayîn. Welat ji serî heta binî hat gerandin, sînor, astengiyên erdnîgarî, sêncên feodal-eşîretgerî yek bi yek hatin derbazkirin. Dikare bê gotin ku di wateyekê de, li beramberî zehmetiyên ecêb ên madî û manevî ya vê erdnîgariyê, şerekî dijwar hat dayîn. Pêngava 15’ê Tebaxê ku hat afirîn, bi taybet jî bi ferasetên jiyana asan bê esil ên reformîzma bujuvaziya biçûk, di navengeke dixwest refên şoreşgerî birizînê de bi durişma “nirxê herî mezin kede” bi awayekî baldar rast derxistiye. Li

beramberî zehmetiyên xwezayê, paşverûtiyên di hemû qadan di şer de, qadro û sempatîzanên PKK'ê hemû zehmetiyên vî şerî ji despêkê ve jidil pejirandin. Bi sebir, fedakarî, berxwedaniya ji zanîn û baweriyê pêk dihat mînaka berxwedaneke mezin nişandan. Dema pêwîst kir jiyana xwe danîn holê bi bawerî û fedakarî di çavê gelê me de bawerî û jê baweriyek ku dest nayê dayîn pêk anîn. Vaye li ser esasê kedeke ewqas zêde pêngava 15'ê Tebaxê ya ku pêş ket, bi awayekî xwezayî li ser girseyan bandoreke erênî çêkiriye, şop hiştiye di nava refên gel de reh berdaye.

Lê burjuvaziya Tirk a ku taybetmendiyên rastîya pêngavê nedît, tevger şibandin berxwedanên dîroka me ya nêz ya Seyît Riza û Şêx Seîd, wisa zanî ji amadekariyan dûre, tevgereke jixweber derketiye holê û heta jê hat qêriyan û gotin; "Wehşî, eşqîya rabûne ser piyan, paşverûtî serî hilda." Borezanên ji aliyê çepê ve yê van hêzan, di serî de jî Ecewît gotin; "Perpitînên dawî yên bermahiyên feodalin." Şevşevokên reformist, xayîn û nokerên xwecihî yên xwe rûpêşayîn, weke baranê êrîşî gelê xwe -êdî guman heye ku ev ji gelê Kurd bin- nirxên xwe yên netewî, mirovek di asta herî jêr de jî bi nirxên xwe ve girêdayî ku rêz ji van çalakiyan re raber bike, ev çalakiyên ku seat bi seat nirxên netewa Kurd bilind dikin û bi hemû cîhanê didin nasîn van çalekiyan kirin. Gelek ruhên paşverû ji nû ve rabûn ser piyan.

Êrîşên dişibin yên begên Osmaniyan, di seferên artêşa Tirk ku heta wê demê mînakên wê nehatibû dîtin de hatin ziman. Ruhê xayîn û nokerên Kurdan, ew ruhê Îdrîsê Bîdlîsî yên ku ji heman koka Kamûran Înan'an tê û ji devê nokerên bê hejmar ên wisa hatin bilêvkirin: " Em bi hev re serkut bikin, rabûne ser piyan." Wisa zanîn ku dê bi rêbazên berê bikaribin serkut bikin, meşîn û bi mehan, sernivîs li ser sernivîsê, nûçe li ser nûçeyê weşandin. "Me eşqiya tengav kirin, çiyayê Herekolê hat dorpêçkirin, 72 demjimêr temenê wan ma, ber bi tinebûnê ve diçin, hindik maye hemû radest bibin." 72 demjimêran cihê xwe ji mehan re hişt, mehan cihê xwe ji salan re hişt. Encam; li beramberî mercên zivistana herî zehmet a 50 salên dawî, hema bêje mîna ku alîkariyê bide şerê taybet tevî vê jî, berxwedanî neşikest, her ku çû belavtir bû. Berevajî ji Qersê heta Dîlokê, ji Dersimê heta Colemêrgê di dîroka KT de bi berfirehiya ku nehatiye dîtin û zêdebûnê de serdegirtina nêzîkî 100'an qereqolan, cezakirina 1000'aran sîxûr û îşkenvanan, linavbirina serbaz û polîsan yek navçe û bajarê ku xwîn têde nehat rijandin nema. Li ser esasê axên welat bi xwîna şehîdan hatiye avdan, di nava salekê de destaneke bêhempa hat nivîsandin.

Di sala dawî de, berxwedaniya PKK'ê ya navdar derket lûtkê, li beramberî dost û dijminan, bi şêwazê herî merdane nûnertiya wê hatiye kirin. Ev rastiyên mezinin, rastiyê eslîne, rastiyên pîrozin ku divê ji aliyê dost û dijminan ve rêz lê bê girtin. Ev rastiya ku KT jî neçar maye bipejirîne, li beramberî Şerê Taybet ê ku xwe ferz dike, rastiya berxwedaniya pîroz a ku ji aliyê gelê Kurdistanê ve hatiye bilindkirine. Û 15'ê Tebaxê hilneweşiya. Bi hûrkariyek li pey hev berdewam kir. Ev bûyereke mezine. Îro em meha Tîrmehê li şûn xwe dihêlin û nêzî 15'ê Tebaxê dibin. Di vê demê de em dibînin ku, meha Tîrmehê ji pêşketinên ku berxwedana Xeyrî, Kemal, Akîf û Elî'yan a ku di azweriya jiyana gelê me de şênber bû, veguherî hesabpirsîneke mezin. Ji serî heta dawî, di hemû Kurdistanê de bi qasî ku nehêle deng ji dijmin derkeve, wî bêdeng bike bû şahide pêşketinan.

Belê di vê mehê de tenê li Dersimê serdegirtina nêzîkî deh qereqol û binkeyên polîsan hat kirin. Bi dehan xayîn hatin cezakirin. Tenê bi awayekî sînordar tola komkujiya Dêrsimê nehat hildan, di heman demê de ji bo KT berxwedaniyeke bi wate hat raberkirin. Tevî hemû pêşketinan jî ji dagirkeran tenê dengek jî derneket, lê tevî hemû tiştan jî, tevahiya gel ji van pêşketinan xeberdarin. Li Qersê jî pêşketinên heman cureyî tên jiyîn. Di tevahiya Kurdistanê de zindîbûna dehan bajaran bi berxwedaniya şoreşgeran di rojevê de ye. Lê dîsa jî denge KT dernakeve. Tenê bi gotinên; "li filan derê 2, li bêvan derê 5, dîsa li wir 3 cihekar hatin îmhakirin." Bi weşana nûçeyên bi vî rengî ve sînordar dimîne, rastiyan vedişêre, bi taybet jî bi israr ji destnîşankirina windahiyên xwe direve. Wateya vê bêdengiya KT a bêbext ne vekiriye? Kar weke ku texmîn dikir pêş neket. Çima ev wisa bû? Di mehên Îlonê, Cotmehê û Mijdarê de ew sernivîsên ku rêz dikirin û nûçeyên wan ên ku hemû cîhan radikir ser piyan çima niha nînin? Çalakî kêmtirin? Eşkereye ku na, berevajî hemû welat bost bi bost dikele. Sedema sereke pêşketin dijberî Tirkiyê veguherî û li xweşiya wî nayê? Bêdeng dimîne, ji ber ku naxwaze bê lîstoka gêrîla. Bêdeng dimîne, ji ber ku bi vî rengî dixwaze armanca porpagandayê bişkîne û bi vî rengî jî wisa dizane polîtîkayeke aqilane dimeşîne.

Vaye yekemîn salvegera pêngava 15'ê Tebaxê, di kêliya herî lewaz de weke zimanê gelê me ya ku nayê bêdengkirin û berxwedaniya bilind dibe, bi şanazî tê pêşwazî kirin. Di dîroka Kurdistanê de cara yekem berxwedaniyek nayê tepisandin, bi şax û bal dibe, kûr dibe û pêş dikeve. Rastiya hêviyên mezin afirand, rastiya gelek tiştan destnîşan kir. Tevger û

fikir ji bingeh ve bandor kir û bandora wê jênerev bû. Rastiyeke ji aliyê ti pozbilindî ve neyê sergirtine.

Lê yên ku li beramberî van rastiyên esîl xwe di bêdengiyê de veşartine, tenê ne dagirkerin. Çapemeniya şovenên sosyal a bê şerm, ji bo doza Komaleyeke Aşîtiyê, ji bo doza DÎSK'ê ewqas rondikên çavan dibarîne. Li beramberî xwîna ji aliyê hezaran ve ber bi berxwedaniyê ve tê herikandin, ji aliyê du artêşên Tirk ve êrîşên ji serî heta binê Kurdistanê tê meşandin bêdeng mayîna wan, yan jî bi pênûsekê du pênûsan rêzkirina wan ger ne sextekariye gelo çi ye? Yan jî divê ji ew ên ku xwe ji ruhê Îdrîsê Bîdlîsî rizgar nekirine, dûvik, sextekar, reformîst, xulamên bi rûpoş, mîna bilbilê tû xwarî dengê xwe dernaxin re divê çi bê gotin? Em ji wê taxima ketiyên navê Kurd û Kurdistanê pir zêde bikartînin dipirsin: Hûn ê dijminatiya xwe ya li hember netewa me her roj ewqas bi gelê cîhanê dide nasîn, rastiya wî diqîre, aciziya dijmin ewqas kûr dike, rastiya berxwedaniya bêhempa çawa rave bikin? Hûn ê vê bêşermiya xwe bi çi vebêjin. Bi qasî serê derziyê mirovbûna we, welatparêziya we heye? Misoger divê ev pirs bên bersivandin.

Em li ser soza xwe man, me zanî xwedî li gotina xwe derkevin û me ev pêşketin tev afirandin. Qadroyên me yên egîd, dibe ku mîna çemekê li her dera welatê me biqulipin, lê xwîna ku hatiye rijandin pir bi wateye û neçare herkes li gorî vê tevbigere. Ev ji bo ku em ji nû ve bibin netew û xwe bigihînin azadiya xwe fatûrayên ji hezaran sal ve divê ku em bidine. Em ê hîn zêde xwîn birijînin û divê em xeletiyeke herî biçûk nekin, em ê nekevin helwesta bi tirs a windakirinê. Berevajî, me şehîdekî xwe kir sedema serkeftinê weke ku me kir durişme û ragihand. Îro egîdên ku hejmara wan digihêje 500'an şehîdên me yên berxwedaniyê jî xelatek wan heye ku êdî serkeftin ne dûre. Gelek rastiyên kûr û mezin ên fêrî mirovên ku bi gel ve girêdayî kirin hene. Serûbinbûna li Kurdistanê ti carî bi mirovahî re nayê girêdan û li nêvenga her roj her demjimêr ku mirov ji qehra dikuje, ev berxwedaniya ku bêhna lehengiyê jê tê, cewhera herî binirx a bê jiyîn û bide jiyîne. Berxwedaneke wisa ye, ruhê mirov ronî dike, dilê mirov hênik dike. Bi kurtî mizgîniya ruxandina dîroka gelê me ya bê şanse.

Wê demê, yên ku nesîbê xwe ji van nirxên esîl negirtine, divê ji nû ve nirxandina vê bikin. Rastiyan ji nêz ve bibinin. Ji ber di dîtina wan de feydeyên jiyanî hene. Di nava vê sala dawî de gelo kêmasî, nebesî nînin? Eşkereye ku pir çêbûne. Gel'ekî mîna Kurd, hebûna wî heta niha nayê hesabkirin gel'ekî wisa ye, bê amadekarî û rewşa wî ya bê hêz li ber çav tê girtin. Di vê navengê de berxwedaniya bi amadekariyeke pir kêm ku hatî

arastekirin pêkanînên pêşengên wê gelo mirov dikare li benda seknek bê kêmasî be? Ger ev bendewarî hebe jî, ma derfetê pêkanînê dikare zêde be? Eşkereye ku weke ku di hemû tevgerên gel de heyî, di vir de jî ji bo pêşveçûnê, ji bo xwe gihandina xaleke bê binketin asta ku hatiye girtin girînge. Tevî hemû kêmasiyên xwe jî girînge. Lê dîsa jî ji derdorê rexne hene. Ne dema wê ye, bê gotin maceraperestî bilindtir bû, ev jî provakasyoneke. Di demên borî de ji van re bersiv hat dayîn. Dûbare dûbare bersiv dayîna van êdî bêzar dike.

Ev hêz neçarin vê rastiyê qebûl bikin. Pirsgirêkên welat û azadiyê misoger bi xwînê tên çareserkirin. Ev, di hemû pratîkên Rizgariyên netewî de bi vî rengî bûne û di Kurdistanê de jî bi awayekî sotîner dê wisa be. Di welatekî weke Kurdistanê de dagirkerî ewqas wehşiye, hûn ê îdîa bikin ku têkoşîn dikin. Lê heta dema pîrozbahiya 10-15 saliyê jî tenê rijandina dilopeke xwînê hûn ê negirin berçav. Serde jî zimandirêjî li ser partizanên xwîn dirijînin bikin û bêjin vala vala diçin mirinê. Hûn ê wan weke windahiyên ne di cîh de binirxînin. Hûn ê bêşerim êrîşî şehîdên me yên bi xwîna xwe tevkarî ji şoreşa vî netewî re kirine bikin. Ketîbûnek ji vê mezintir nîne. Ew kesên ku hûn dibêjin çavgirtî diçin mirinê mirovên me yên berzin, naçin mirinê. Berevajî li beramberî mirina ku li ser wan tê ferzkirin jiyana herî bi anûr, serbixwe û jiyana azad, weke gel ji nû ve ava dikin. Di vê rêyê de bûyîna pir, ji bo kendalên di navbera gelê me û serdemê de bê rakirin hatine afirandin. Ji bo ku em van axan ji xwe re bikin welat ma ti rêyeke din heye? Di cîhanê de yên ku ji me paşketîtir, hatiye jibîrkirin, ji bo rizgariya xwe gelekî ewqas dereng mayî heye? Eşkereye ku di lûtkeya welatê me de yên ku ala berxwedanê li ba dike û li pênavê têkoşînê xwîna xwe rijandin hebûnên me yên herî binirxin û her kes ji bo vê berxwedanê û berxwedêrên wê neçarin rêz bigirin. Ger yên ku ji vê re rêz nagirin hene, ku mirov ji mirovbûna van bi gumane, divê demekê zûtir devji zimandirêjî û bêrêziya li ser berxwedêran berdin û bêdeng bimînin.

Wê demê divê ku durist tevbigerin, şêwazê jiyana henekê xwe bi rastiyên me dike û ewqas ji têkoşînê dûr bên terikandin. Divê ku ev hêz vê weke ferzkirineke PKK'ê li ser xwe nebînin, weke pêwîstiya girêdana bi qasî serê derziyê a bi mirovatiya pêşverû bi wate û pêdiviyên wê pêk werin bicîh bînin. Ji bilî vê ti fedakariyeke din nayê payîn. Lê qet nebe, divê rewşa xwe ya her tim di nav tawanbariyê de ne li beramberî mirovatiyê û heta radeya dawî xetere bê derbazkirin.

Dîsa şovenîzma sosyal, rastiya me ya netewî bi qasî ji dest wan tê înkar dikin. Xwediyên vê ferasetê, divê xwe ji şovenîzma sosyal paqij bikin. Ma

rizgariya gelê Tirk dê li ser çi esasî be, derneketiye holê? Wê demê heta niha çima hûn nikarin rêxistinekê damezrînin? We yekîtiyeke li ser navê yekîtiya çepgiran ava kiriye. lê tenê derketineke we çalakiyeke we ya ku tirsê dixe dilê dijmin heye? Bi bêbehremendiyên xwe ma ev 60 sale hûn burjuvaziya Tirk bi cesaret nakin? Dawiya hezîn a şoreşgerên burjuvaziya biçûk, îro jî li ser esasê Qanûna Poşmaniyê di xwe mikurhatinê dikin de nayên ziman? Li beramberî qanûna poşmanî û radestiya ku li ser PKK'ê hat ferzkirin bi berxwedana şahmerdanên du kesî, sê kesî, pênc kesî nayê bersivandin? Bi berxwedaniyên partizanên PKK'ê ve ev qanûnên burjuvaziya faşîst a Tirkan bi erdê re nabe yek? Wê demê divê rêz ji vê re bê dayîn û neçarin van rastiyan bibînin. Divê bê zanîn ku, rêya rêzdariya li beramberî gelê xwe di rêzdayîna ji gelên din re derbaz dibe.

Wê demê bila ti kes nebesiyên me, kêmasiyên me ji xwe re nekin hêcet û serkeftineke tam a burjuvaziya biçûk hêvî nekin. Xwe bi sipartina vê re di siyasetên tasfiyeger de israr nekin û devji van ferasetan berdin. Hûn jî mîna burjuvaziya biçûk bi hêvî li bendê ne. We texmîn kir ku, tenê çend roj temenê berxwedaniyê heye. We şiband berxwedaniya Mahîr Çayan û li Maltepe û Kizildere yê. We got ku "terorîstin, maceraperestin, dê dawiya wan bînin." We wisa zanî berxwedayîna Sînan, Hesen, Basrî, Îlker Akmana ye û we çend roj temen jê re danî ji vê pêngava berz re. Hîn we fêm nekiriye rewş weke ku hûn texmîn dikin nîne? Ev saleke, tevî her cure xebatên du artêşên Tirk, bi kelogirî daxwiyaniyên rêveberiya awarte diweşînin jî hûn rastiyan fêm nakin? Çima hûn ji berxwedaniya ku ji aliyê burjuvaziya biçûk ve di bin navê qanûna Poşmaniyê, efûyek pêşkêşî we kiriye re rêz nîşan nadin û minet nagirin? Me li navbirina dozên DÎSK û Komeleya Aşîtiyê pêk anî. Ji van hemûyan re pêşketinên berxwedaniya navdar rê jê re vekiriye. Berxwederiya PKK'ê di gelek mijaran de hûn dan efûkirin. Tawanên we yên ku dê qet ji aliyê burjuvazî ve nehata efûkirin, di encama berxwedana pêşketî de hûn efûkirin û azadiya we ji we re bexşandin.

Belê, ger we wateya wê û nirxa wê bizaniya, vana destkeftên ji tevgera şoreşger a Tirkiyê re xwîn û can dida qezenckirin. Ger encamên têkoşîna me ya esîl, wisa bidest girtiba ji bo têkoşîna xwe ya rizgariyê veguheranda xala derketinê, we yê lîstokên dijmin vala derxista û ji bo me jî we yê karêkî barê me sivik dike û êşên me kêm dike kiriba. Lê ji ber ku hûn ji feraseteke şoreşgerî ya wiha dûrin ku, we cesareta ji nû ve derketina holê ya lîstok û pêkanînên paşverû yê sedan sal da dijmin. Ataturkê duwem, dema ku bi ser îsyanên Kurdên yekem de diçû komînîst efû kirin û girt gel

xwe, piştî ku îsyan linavbirin bi Dadgehên Îstîklalê yên ava kirin de, hewl dide lîstoka karê herdukan bi hev re qedandinê piştî 60 salan ji nû ve bilîze. Tevgera Rizgariya netewî ya Kurdistanê heta Rêbertiya wê herkes rista xwe ya di vê lîstokê de bê qusûr dileyze. Lê rista ku li ser Tevgerên Rizgariya Netewî di Kurdistanê de hat ferzkirin jî têk diçe. Partiya me tevî xefleta we, Evrenê faşîst û şûreka wî bi çend xwe mikurhatinên bi Qanûna Poşmaniyê kiriye bi hev re dihêle. Ji ber ku dizane ew jî ji aliyê me ve vala hat derxistin, ev lîstoka kevin a ku didomand Qanûna poşmaniyê û pêkanînên wê hewl dide paşve bikişîne. Qet nebe ji bo vê ma hûn nabînin deynê we yê minetê ji ber berxwedaniyê ye. Wê demê rewşên ji bingeh ve rast destbigirin, nokerî û şovenîzma sosyal a sedan sal kun bikin yên ku neketine nav navenga berjewendiyên refên serdestan li ser esasê berjewendiyên taybet têkoşîna pêşketî rêz bigirin. Ji pêdiviya têkoşînê bawer bikin û misoger di nav refan de cîh bigirin.

PKK dema ku vê berxwedaniyê bilind dike, raste ku bi tena serê xwe amadekariyên sînordar ve tevdigere. Lê ev çi diguhere? Ger dozek mafdar be, di despêkê de ya dîyarker eşkereye ku ne hejmar û hebûna amadekariyên teknîkî ne? Di dîrokê de her dozeke esîl, ma di despêkê de bi amadekariyên kêm û ji aliyê çend kesan ve nehatiye despêkirin? Berxwedaniya PKK'ê tenê bi vê ve sînordar nemaye, ji niha ve li ber çavane ku bûye malê mîlyonan. Serde jî li beramberî teknolojiya herî pêşketî û li beramberî her du artêşan bi qomandoyên hejmara wan 40'lî derbaz dike û tevî di dorpêçiya yekîneyên helîkopteran de ye jî, saleke berxwedanî pêş dikeve, kûr dibe û beşên berfireh digire nav xwe. Belê, hêza vê berxwedaniyê çawa pêş dikeve, wê çawa pêşkeve û piştre jî teknolojîya bêmaf û serdestiya hejmarî ve jî çawa aciz dimîne, di pêvajoya berxwedaniya sala borî de bi awayekî eşkere hatiye raber kirin.

Dersa ku divê ji vir bê derxistin, ji doza gelê me ya rewa re, bi dil û can mirov li beramberî pêngava 15'ê Tebaxê objektîf fikirandin, durist û tevgera serdestiya wê pêwîste nîşan bidin. Divê dîroka berxwedaniya gelê Tirk û Kurdan rast bê fêmkirin, pişgirî bê dayîn, bê bilindkirin û silavkirin. Ne ji bo xatirê PKK'ê, ji bo xatirê gelê me ev bê kirin. Divê hinek sepanên PKK'ê yên şaş û kêm nekin hêcet û wisa mezinbûn neyê kirêtkirin. Hebûna gelek nebesiyên me vî mafî nade we. Ya ku dikeve ser milê we bi rexneyên bê rehm, divê pêşxistina berxwedaniyeke hîn li pêş be. Vê bikin, ji erdê heta ezman em ji we re rêz bigirin. Û ger ev pêk were, misoger em ê vê rêzdariyê ji we re raber bikin. Dev ji demogojiya "PKK me ji zilaman hesab nake, li dijî her kesî derdikeve, hêzeke êrîşî ser nekir nema" berdin.

Li beramberî faşîzma 12’ê Îlonê li ber xwe bidin, li beramberî hovîtiya xayîn ên Tirk û Kurdan, tifaqên herî ketî yên ji aliyê emperyalîzmê ve tê pêşxistin li ber xwe bidin, em jî hûn çi dixwazin bidin we.

Çima hûn çavê xwe li beramberî rastiyan digirin û di neyîniyan de israr dikin? Di demên herî hestyar de, hûn ewladên xwe yên herî bi nirx nakin qurban? Di lûtkeyên çiyayan de, bi qasî mercên zivistanê yên qerisînok, havina di nav mercên ku ji tîna dimirçiqînê de hûn li ber xwe nadin? Û çavên we van nabînin? Belê, hûn ê van rastiyan teva înkar bikin? Kî yê ji we bawer bike ji dervî kulmek xayînên dil û ruhê wan reş bûye wêdetir?

Ger hûn bi doza gel ve girêdayîne, li beramberî faşîzmê bi kîn û nefret dagirtîne, ji vê baştir xelateke din dikare pêşkêşî we bê kirin? Başe hûn çima ewqas cuce dimînin. Çima hûn di nav bêdengiyeke şermok de dimînin. Na, rastiyê îtîraf bikin, qebûl bikin û li beramberî wê rêzdar rawestin. Ev we biçûk nake, berevajî dê we mezin bike. Ger hûn nêzîkatiyeke wiha raber bikin, hûn ê tenê ji me feraset û alîkarî bibînin. Di vê salvegera pêngava Tebaxê de, dixwaze berxwedaniya li beramberî faşîzmê, dixwaze di tevlîbûna Têkoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê de, em amadene hemû curên alîkariyê bidin we. Ger niyaza xwe ya berxwedaniyê heye serî li sextekariya “dema wê nehatiye, mercên wê nîne” nedin. Serde jî ev 15 sale hûn îdîa dikin ku rêxistinin, ma ewqas sale hîn dema têkoşînê nehatiye? Di ser cuntayê re 5 sal derbaz bûn, ma hêjî derfetên berxwedaniyê nînin? Ger hûn bi xwe tiştekî nakin, ma dilê ku alîkariyê bide ya esîl jî bi we re nîne?

Wê demê divê ser rastiyan neyê girtin, neyên berevajîkirin, mafê Sezar ji Sezar re bê dayîn. PKK, di despêka xwe de, di nava mercên gelek zehmet de dema siyaseta xwe înşa dikir û pêk anî, gelek kêmasî kirin, nekarî bikeve xala pêkanînê. Dema ku derbazî 15’ê Tebaxê bû, ev heta asteke girîng jî dewam dikir. Lê tevî van hemûyan jî, encamên ku hatin afirandin qet pêwîst nekir ku em îdîa bikin. TAZ (tageszeîtung) ji aliyê hêzên cur bi cur ên li Ewrûpa demekê li dijberî PKK’ê ev rojnameya ku kar tanîn em serî li wê bidin û bibînin. Bi îmzeya Serge Arnold re di dîroka 19.7.1985’an de di rojnameya Tageszeîtung de gotarek hatiye weşîn cîh ji van re dide:

… Ji bo yekî ji Başûr ber bi herêmê ve tê, cîdiyeta rewşê hîn ji navçeya kêleka robara Dicleyê Cizîrê despê dike. Piraniya wê ji gelê Kurd pêk tê, ji bilî Mûş û Bîdlîsê, li hemû herêman reveberiya awarte hukmê xwe didomîne. Di vir de jî rewşa şer tê jiyîn. Hejmara leşkerên heyî, li gorî herêmên din hîn zêdetire, rewşa ruhî ya leşkeran li gorî herêmên din hîn bihêrs, fikar, hereşekar û xeternake. Kontrolên tên kirin, lêgerîn û

desteserkirin her ku diçe zêde dibin. Şêwaza xîtabên weke "dakeve xwarê, bikeve rêzê, nasnama xwe bide, destê xwe dane ser serê xwe, lingê xwe bi kêlekê de veke û hwd" ên bi vî rengî hema bêje dîmenên jiyana rojane ne. Zilam ji serî heta ling di kontroleke zêde re tên derbazkirin, Jin û zarok niha ya ku ji bo zilaman bûye qural ji dervî wî dimînin. Kesên ku di yek rêzê de hatine rêzkirin piştî baş li ser wan digerin endamên ewlekariyê yên ku vê pêk tînin, dubare tên serê rêzê, nasnameya yên ku li wan digerin digirin destê xwe bi lîsteyeke dûvdirêj a kesên pir tê gerîn ve rû bir û dihêlin. Piştî çend kîlometreyan pêş heman tişt dûbare dibe û ev rewş wisa didome. Dema ku tu ji vir ber bi milê Qileban û Şirnexê ve diçî, bi du qelhên nû yên gêrîla ve mirov rû bi rû dimîne. Dema ku rêya Qileban û Şirnexê bi dawî dibe, ber bi çiyayên bilindahiya wan digihêje 3000 metrî û asê bi qasî ku neyê bawerkirin qadek bi zehmetiyan dagirtî despê dike, qereqolên leşkeran ên li lûtkeyên herî bilind ên li çiya hatine çêkirin çavdêriya rewşa şerê tê jiyîn dikin. Di sengerên li derdora qereqolan de hatine kolan leşkerên ku xwe vedişêrin, di serê wan de mîxferên ji şerê cîhanê yê duwemîn mane ve çekên otomatîk ên di destê wan de ber bi geliyan ve xwar kirine û di bendewariyê de ne. Hema bêje ji ber ku piraniya wan ji herêmên din ên Tirkiyê hatine, weke ku di nava jiyaneke ji dojehê de ne…

Bêşebab tam ji salekê û vir ve operasyona rojê her demjimêrê ji nû ve dijî…

Li ser yekane rêya herêmê yekîneyên taybet ên leşkeran, bi mercê çekên otomatîk û telsiz di dest de, bi şêweya sê rêzî di rewşa nişan lê girtinê de amade ne, di rewşa gulebaranê de, di rewşa çeperên êrîşê de tên sekinandin. Her yek ji wan ji serî heta binî bi çekan hatine xemilandin, maşînên deh leşker tê de ne û bi torbên qûmê dixwazin biparêzin, maşînên biçûk ên leşkerî her tim ber bi çiyayan ve di nava tevgerê de ne.

Yek ji gundiyê bi navê Yawûz ku em pê re axivîn ji salekê û vir ve her roj ew dîmenên ku dûbare dibin, bi awirek tûj û dil şikestî ve dişopîne. Dibêje ew ê qet tehamula vê rewşê neke û qet fêr nebe. Di nava vê pêvajoyê de weke piraniya gelê di gund de, ew jî dibêje ji aliyê doza APO'geriyê ve hatiye qezenckirin, bê ku veşêre vê îfade dike, û wisa dibêje: Ew APO'cîne, yên herî bihêzin, di çiyayan de leşkerên Tirk li beramberî wan qet ne tiştekin." Piraniya gelê ku li herêmê dijî, di gundên vê beşa Kurdistanê de, di fikra jiyankirina şerekî pratîkî de ne. Parlementerê ku di mûxalefeta çep de cihê xwe digire nûnerê Partiya gel ê Mêrdînê daxwuyaniyeke wiha dide; "Di navbera Kurd û Tirkan de, êdî giştine xaleke vegera wê nîne. Dîsa doxtorê ku ji Rojavayê Tirkiyê hatiye û

niha li wanê erkdare, îro gihiştina vê baweriya xwe bi vî rengî vedigot: “ Di dema borî de piraniya gel dijberî îsyangeran bû, ji ber ku têkoşînên gelan pevçûnên navxweyî yên di navbera Kurdan de û peyitandina wê nedihat paşçavkirin, lê ji dema despêkirina operasyona rojê û vir ve, ji ber ku tenê APO’cî li dijberî artêşa Tirk şer dikin sempatiya gel li beramberî PKK’ê bi lez zêde dibe”

Belê, weke ku ji vê jêgirtinê jî tê fêmkirin, hêzên din neman, PKK’ya ku li ber xwe da li ser vî esasî ya ku alîkariya gel qezenc kir hebûna xwe didomîne. Hem jî her roja ku derbaz dibe bi afirandina şerekî dijberî dagirkeriya Tirk vedigere. Ji demên borî heta niha hûn PKK’ê bi sererastkirina êrîşan li ser hêzên çepgir û her tim lêdana çepgiran tawanbar dikin. Niha ew çepgir, ew şoreşger li kîderê ne û dijberî çine, bi kêre têkoşîn dikin, li beramberî kê tifaqan pêş dixin? PKK ji dema borî û heta niha, li beramberî kê têdikoşe, darbe li kîjan hêzî daye, ma bi qasî ku ji ti curên demogojî û berevajîkirinan re rê veneke ne eşkereye? Belê, PKK ji dema borî heta niha li dijberî dagirkeriya Tirkan têkoşîn dike û îro jî darbeyên encamgir ên herî girîng ên ku dîroka Tirk şahidiyê jê re dike lê dide. Hêza we ya înkarkirina vê heye? Ger hûn ne di lûtkeya bênamûsiya xwe de bin, li xwe mikur werin, ma hîn dikare çi bê kirin? Li baremberî dagirkeriyeke faşîst a ewqas wehşî, ji aliyê benî adem ve ya bê kirin çibe ew nayê kirin? Ev jî dibe provakasyon?

Di nava têkoşîneke bê aman de, her roj di berxwedaniyên egîdane de şehît tên dayîn. Serde jî ne li ser ew sînorê ku we pir li zimanê xwe gerandiye, li çar aliyê welatê me ev şer tê meşandin. Niha wê çawa bela xwe li me bide, wê kîjan xala êrîşkirinê bibînin? KT jî êdî qebûlkiriye ku ev şereke û ji aliyê xwe ve jî pêwîstiya wê pêk tîne. We hêviyên xwe bi provakasyonê ve girêda û got; “ PKK dikele û ji bo nakokiyên navxweyî ji holê rake serî li êrîşên bi vî rengî dide.” Rastî wisa bûn? Hûn bi xwe ji van tiştên ku îda dikin bawer dikin? Na, na rastî bi qasî ku çavên kor bibînin, seriyên ku herî zêde xwe qane kirine bi qasî ku qebûl bikin zelalin. Şer di hemû xetên Kurdistanê de û li dijberî dagirkeriya Tirkan bi hemû leza xwe ve didome. Wê demê hûn neçarin rastiya qebûl bikin. Çepê Tirkan jî, ji bo ku di şoreşa Kurdistanê de derketinekê bikin pir ji nêz ve girêdayî pejirandina vê rastiyê ye. Ger hûn di van helwestên xwe de israr bikin û neyîniya xwe bidomînin, wê tenê rûpêşên we nekevin hûnê tazî nemînin, di heman demê de bi qasî ku careke din hûn di wijdanê gel de nikaribin cîh bigirin mehkûm bibin. Ji bo ku hûn hukmekî ewqas xirab nexwin, we di huzura pêngava 15’ê Tebaxê ya mêrxas, bi anûr û rûmet de ji bo ku hûn

careke din xwe di berçav re derbaz bikin û helwesta rast raber bikin em we vedixwînin.

### 3- Hinek Taybetmendiyên Ku Pêngava 15'ê Tebaxê Derxistiye Holê Û Destkefên Wê; Nebesî Û Kêmasiyên Ku Divê Bên Derbazkirin

Diyardeya ku bi pêngava 15'ê Tebaxê ve piştrast bû û her ku çû xwe gihand taybetmendiyeke girîng a dîrokî ya Têkoşîna Berxwedaniya me ya Netewî, eşkereye ku wê bi şêwaza pêngavên şoreşa me pêşkeve. Têkoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê ne bi şêwazê serhildaneke giştî ne jî weke ku em di gelek welatan de dibînin, belav û ji aliyê gêrîla ve tê karakterîzekirina şêrê gelan pêşkeve. Belê, di nav me de şerê gel û gêrîla, hem jî wê mîna şerê esasî pêşkeve, lê wê hera dawî di şênberiya mercên Kurdistanê de destdayî be. Taybetmendiya herî diyarker a şerê me û asteke girîng, weke ku di dîroka nêz ya Partiya me de jî hatiye peyitandin bi şêwazê pêngavên pêkhatina wê ye. Serkeftina pratîkê, weke şêwazekî piştrastkirî ev rêbaza şer ku li ser me ferz dike, têkoşîna me wê dem bi dem, pêngavên demkî, ji hêsan ber bi aloz ve, ji yê demkî ber bi yê dayîmî ve çûyînê, ji yê lewaz ber bi yê bi hêz ve çûyînê pêş bikeve.

Burjuvaziya Tirk a ku hêviya xwe bi qirkirinên serhildanên giştî rê jê re vedikir girêdayî, ket nava hêviyeke dê PKK jî weke tevgereke wisa pêş bikeve, ji bo pêkhatina vê çi pêwîst bû hatiye kirin. Ji ber ku ew bi komkujiyên ku difikirî pêk bîne, pêşxistina bê hêvitiyê dikir armanc. Di serî de Sêwerek, di gelek qadan de ji neketina nav vê kêmasiyê gelek ked hat raberkirin û divê rastiya serkeftina vê bê dîtin.

Çawa ku serhildan ne şêwazê esasî yê têkoşîna şoreşa me ye, di heman demê de şêwazên têkoşîna aşîtiyane ya ku çavkaniya xwe ji mercên netewa serwer digire komele, hilbijartin, parlemento, tenê xwepêşandan û mîtîng lidarxistin jî di pêşxistina berxwedaniya netewî de nikarin bibin şêwazên esasî. Têkoşîna me ya borî derxistiye holê ku wê bi van rêbazan berxwedaniya netewî pêş nekeve, her çendî serî li van bide jî, di heman demê de rastiya ku divê bi berxwedaniya çekdarî re bê sepandin derxistiye holê. Destnîşan kiriye ku wê ev rêbaz bi tena serê xwe li pêşiya şoreşa me jî bibe asteng. Pratîka DDKO û (Ocaxên Komînîst Ên Şoreşgerên Rojhilat) DDKD'ê (Komela Komînîstên Şoreşgerên Rojhilat) ya hilbijartin, xwepêşandan, li darxistina mitîngan, ev eşkere daniye holê. Di gel ku hinek bandorên objektîf yên erênî jî hene, ev rêbazên ku di demên borî de pir

zêde hatine karanîn, bi tena serê xwe xeteke têkoşînê, xeteke berxwedaniyê ava nakin. Bi êrîşeke ji rêzê ya dagirkeran ve dema rû bi rû dimînin bi erdê re dibin yek. Em pir baş dizanin bi qedexeyekê yan jî bi biryara Rêveberiya Awarte re dawî li jiyana wan hat anîn. Lê pênvaga 15'ê Tebaxê pêngava şoreşgerî ya di roja me ya îro de xwe gihandiye asta herî pêşketî, dê têkoşîn di gel me çawa pêş bikeve bi awayekî zelal derxistiye holê.

Di despêka derketina me de li beramberî pêngavên bîrdozî ku me kirî, hinek pozbilindên bujuvaziya biçûk, hinek ferasetên weke; "Burjuvaziya Tirk bibihîze di demeke herî nêz de wê we bike dûman. Ger hûn fîşekekê biteqînin, ev ê rê li ber komkujiya gelê Kurdistanê veke", ferasetên heta radeya dawî radestkar û bêhna koletiyê jê dihat raber kirin. Pêvajo derxist holê ku, ti qîmeta fikrên bi vî rengî yên pênc filisan nîne. Piştî pêngava bîrdozî, pêngava polîtîk û ev jî bi têkoşîna çekdarî re bilindkirin, qetandina şîdeta dagirkeriyê bi xwe re aniye û ji bo şîdeta şoreşgerî ya gel dernekeve holê bûna rêya yekane ya rizgariyê îspat kiriye. Ev ferasetên ku mîna ji vebayê direvin ji têkoşîna çekdarî reva wan, hinek deman tevî ku xwedî ewqas hêz bûn, niha îzaha hûrûmûr bûna wan divê ku mirov di vir de bigere.

PKK çiqas weke ku ti kes nikare xwe nêzîkî bike tê dîtin bila bê dîtin, berxwedaniya çekdarî li gorî pêngava bîrdozî-polîtîk guncave û di bingeh de jî ya ku ji wan re xizmet dike, wan diparêze û pêş dixe hatiye destgirtin. Vê dahûrîna rast ji bo veguherîne pêkanîneke rast ked daye û her tim rêya pêşketinê vekirî hiştiye. Terora ji aliyê şoreşa dijber ve hatiye ferzkirin, dema ku me got encax bi teroreke şoreşgerî bê astengkirin, di heman demê de ya ku xwest bê gotin rêgirtina li komkujiyane. Ne tenê komkujiyên fîzîkî, bi vê re girêdayî di her astê de dê rê çawa li komkujiyên madî û manewî bê girtin ev jî hatiye destnîşankirin. Hişmendiya wan kesên ku digotin, ger hûn dilopek xwîna dagirkeran birijînin, tenê ne xwe, hûn ê gel jî ber bi tinebûnê ve bibin, hişmendiyek koletiyê bû ev îro baştir tê fêmkirin. Bi bêdengmayîna li beramberî dagirkeran, her tim mîna koleyên kedîkirî mayîn ve ti maf nayê destxistin. Serde jî meyla li ber xwe nedayînê, xeteriya komkujiyan heta radeya dawî zêde dike û dagirker li ser koleyên xwe yên bêdeng hemû curên linavbirinan ferzkirinê xwe şûnde nade. Dîrok bi mînakên van ve dagirtîne. Komkujiya çandî, komkujiya ziman û komkujiya nirxên netewî ma ne mînakên vekirî yê van in? Îro hikumeta faşîst a 12'ê Îlonê, neçarî gelek tawîzan bûye, di Kurdistanê de Projeya Anatolya Başûrê Rojhilat, Projeya Bendav û hwd. berê xwe dabe razemeniyên bi vî rengî, ma ev ne ji ber tirsa li beramberî berxwedaniyê

dibihîzê ye? Wê demê dîroka me û bi taybet jî weke taybetmendiyeke dîroka berxwedaniya me ya netewî, girîngiya mezin a pêngavên şoreşgerî derketiye holê.

Her çiqas hinek şibandinên wekhev ên dîroka me ya berxwedaniyê hebe jî, weke ku li Vîetnamê de hat dîtin, divê bê zanîn hin ji despêkê ve em ê bi rêbazê êrîşên zêde û bê navber yekîneyên çekdarî pêş nexin. Ev ji ber li beramberî artêşa dijmin heta dawî bi amûr, rêxistinkirî, bê hevsengiya hêza ku çavkaniya xwe ji lewaziya hêzên şoreşger digire wisa ye. Dîsa ji ber milîtanên ku ji nava dilê gelê me derdikevin li gorî tê xwestin pêşketinan fêm nakin, xwe amade nakin û paşverûtiyên ku dijîn ev bi vî rengî ye. Ji ber vê sedemê hem ji bo li beramberî hêzê dijmin ên har bin nekeve, hem jî ji bo komkirina berhemên pêngava hatiye avêtin veguherînin rêxistinê ev pêwîste. Ji bo perwerdekirin û serferberkirina girseyên herî berfireh, dem bi dem pêkanîna pêngavên şoreşgerî, piştî wê jî kûrkirina xebatên zanîn û rêxistinî neçare xebatek bi vî rengî bê meşandin.

Dîroka me ya Partiyê heta niha bûye şahide pêngavên cur bi cur. Mînak, di salên 1978-79’an de bi qasî têkoşîna polîtîk pêngaveke şîdeta şoreşa çekdarî jî ketî rojevê jiyan kiriye. Ev pêngav, ragihandina damezrandina Partiya me digihîne mîlyonan, hemû taktîkên reformîst-oportonîst, rêxistin û şêwazê xabatên wan bi erdê re dike yek, ne tenê ew şîdeta şoreşa dijber jî derxistiye holê, rêya ku divê gel bikevê çiye ew jî nîşan daye. Piştre li dijberî radestkarî û tasfiyegeriya li ser zindanan hatî ferzkirin yek ji pêngavên berxwedana herî esîl a dîroka me pêk hat û ev pêngav mohra xwe li hemû demê daye. Serkeftinên herî şanaz di zindanan de qezenc kir, bi vê pêngavê rêhevalên me tenê bi rizgarkirina anûra Partiyê ve neman, di heman demê de rêya jêveneger a berxwedaniya netewî jî vekirin û fermana di vê rêyê de meşa serkeftinê jî dane. Ev berxwedaniya netewî yek ji pêngavên herî bi hêz ê dîroka me ye. Ew bê ku ji ruhê Partiya me tiştekî ji dest bide di qadên herî gerim ên Rojhilata Navîn ên şer de, di bin mercên herî zehmet de xwe ji pêvajoya dema nû re amadekir. Kom kir tevgera perwerdê û sewqkirin serkeftî rêvebir, ji nû ve dest bi pêngava agirê şoreşê kiriye. Pêngava ji nû ve vegera welat jî, di bin dorpêça zêde ya hêzên artêşê de û rêbazên veşartî, heta radeya dawî ketî û provakasyonan de, tevî zehmetiyên mezin serkeftî pêk aniye. Lewma di dîroka me de pêngaveke rêzdariya wê heye.

Di zemînên welat de jî a ku hedefên xwe serkeftî pêk aniye ev pêngav, zemîna pêngava 15’ê tebaxê jî afirandiye, bûye yek ji sipartekên herî bi hêz ên ku pêşketinên roja me ya îro xwe dispêriyê. Pêngava 15’ê Tebaxê ya ku

bi waneyên bê hejmar ve dagirtî û li ser van esasan pêşket, bû sedema pratîkên nebes ên berxwedaniyê yên dema borî berçav bên girtin. Li ser esasê lêhûrbûna dîroka Partiya me, dîroka me li ser kîjan esasên çalakiyan pêşve biçe, ji bo vê çi curên xebatan bê esasgirtin, amadekariyên vê, xebata pratîkî yên rojane wê li beramberî çi pêşve biçin jî destnîşan kiriye. Ger bi kurtî em îfade bikin, Têkoşîna Berxwedana Rizgariya Netewa Kurdistanê, li ser esasê hinek amadekariyên diyar bi pêngavên hatin pêkanîn ve, şoreş ber bi asta jor ve birine. Fêmkirina ders û ezmûnên di nava wê pêvajoyê de derketî holê, bi şêwazê pêkanîna pêngavên di asta jortir de pêkanîn dê rêyekê bişopîne.

Mamosteyên mezin ên proleterya Marks û Lenîn, di despêka dest bi şerkirinê de proleterya dişibînin şervanên bê ezmûn. Di şerê yekem û duwem de dibêjin dê bilikumin, bikevin, lê di şerê sêyem û çarem de zû yan dereng zexm bibin bi qasî ku careke din ji cihê xwe nebin dê bikevin ser rêya serkeftinê. Ev ji bo têkoşîna me ya berxwedana netewî jî rastiyeke derbazdare. Di serî de ya lewaz, sîs, hema bêje şerkeriya gundiyên seretayî derbaz nedikir û bi çend kulman, bi dujînekê, kînekê ve pêngava sînordar dima, bi pêngava duwem de vediguhere tevgereke cesur. Di ya sêyem de ev hinekî din tê pêşvebirin. Piştî wê di bin darbeyên dijmin ên hişk de likumîn, ketin tên dîtin, lê ji nû ve radibe ser piyan û pêşketina derbazî çalakgeriyê dibe bi giranî derdikevin holê. Xeta pêşketina têkoşîna me jî weke ku li jor hatiye diyarkirin bûye, dê bibe. Ev xet bi qasî hewce dike li cem me pêngav baş bên amadekirin û plansaziya wê, ewqas jî derxistiye holê ku ne bi serhildanên berfireh ên giştî, ne jî ji hêza pêngava pasif dûr û bi rêbazên bê ruh ve berxwedanî pêş dikeve. Her wiha dê nekare ji binkeftinê jî rizgar bibe.

Têkoşîna me ya berxwedaniya netewî dem bi dem, parçe parçe, bajar bajar û di qadên bejahî de ji ber sedemên bêhevsengiyên ku ji aliyê dagirkeriyê ve hatine afirandin, neçare li gorî xwe rêbazên xweser ên pêşketinê bibîne. Ji aliyekî ve di beşahiyê de berxwedanên gundiyan, bi pêngavên cur bi cur ber bi propagandaya çekdarî, gêrîla û her ku çû vegiherî şerê hereketlî, di bajaran de jî xebatên propaganda, xwepêşandan, mîtîng û her ku çû serhildanan serî rakir û ev ne ji nişkê ve, di her qadê de ne bi kordîne, dê parçe parçe û demkî pêş bikevin. Pêşketina di herêmekê de, di qadên bejahî de bi lez, lê di bajaran de hêdî hêdî be, di herêmeke din de di bajaran de lez, di qada bejahî de hêdî dibe. Di demekê de, bi taybet dema pêşketina bîrdozî-polîtîk de, bajar risteke girîng dileyzin, di dema têkoşîna çekdarî de jî girîngiya qadên bejahî zêde dibe. Dîsa di hinek

demên diyar de qadên ku kapîtalîzm tê de pêşketî, qadrobûn û rêxistin lez dibe, di qadên herî zêde gundîtî ji feodalîzmê bandor bûne û tê de tên dagirkirin de, berxwedaniyên gundiyan, gêrîla dê lez pêş keve. Di Kurdistanê de hema bêje divê her bajar û gundek neçare bi pêngavên şoreşgerî bên rizgarkirin û qezenckirin.

Li Erûh û Şemzînan pêngava 15'ê Tebaxê ya ku bi van rastiyan hat despêkirin, piştre gelek gund û navçe kirina qadên bandorker ên şoreşê rastiya vê teoriyê îspat dike û ev wane derxistiye der. Ji niha û şûn ve jî amadekariyên bajaran ên berxwedaniyê, divê bi serê xwe mîna hunerekî bên destgirtin û pêşxistin. Rewşa her bajarekî ya xweser, girêdana xwe bi bejahiyê re, asta pêşketinê esas bê girtin û pilansazî bên amadekirin. Bi heman şêwazî erdnîgariya qada bejahî, hejmara niştecihan û rewşa çînayetî li berçav bê girtin. Di Kurdistanê de rêbazên şêwe, mekanîk, bi taybetî jî bi rêbazên ku mîna di henek welatan de pêk hatî, ev rêbaz li gorî pirtûkan di vir de pêk anîn, bi destxistina serkeftinê li aliyekî bimîne, dê rê li ber windahiyên ne di cîh de veke. Bi şemayan tevgerîn na, bi rêbazên xweser ên di berxwedaniyê de encam bigirin, ên ku di pratîkê de hatine ceribandin hene. Wê demê divê rastiya me bi kûranî bê fêmkirin, li ser vî esasî ber bi plansaziyê ve çûyîn çêbe û derbazî meriyetê bibe.

Pêngava 15'ê Tebaxê, di vê watê de deriyên pêşketinên bi bandor û hostane pêkanînê ve heta dawî vekirine. Ev pêngav ji bo pêngavên girîng ê şûnde wê çawa pêş bikevin û bi van pêngavên nû re, kîna nirxê sereke weke kombûn ragihandiye jî derxistiye holê. Bi nebesî û destkeftiyên xwe ve, ji pêngavên pêşerojê re kombûnên bi hêzê pêşkêş kiriye. Encamên ji rexneyên bi hêz ên ezmûnên vê, ezmûnên salakê yên pêngava 15'ê Tebaxê bên derxistin, di dewlemendiya pêkanîna destkeftên bêhempa yên pêngavên piştî xwe jî diyar dike. Lêkolînkirina çalakiyên di gelek qadan û gelek taybetmendiyên pêngavê de, li ser esasê destnîşankirina nebesî û xeletiyan, derfetên ji dest hatine dayîn û windahiyên ne di cîh de derxistina holê, dikare ber bi pîlansaziyeke bi hêz a pêşerojê ve biçe. Ji niha şûnde dê pêngavên bi hêz û bandor çawa bên kirin jî derdixîne holê.

Bi giştî di tevahiya dîroka me de, bi taybet jî di dîroka berxwedaniya PKK'ê re 15'ê Tebaxê pêngava gihişt xala lûtkeyê, ger baş bê lêkolînkirin, encamên pêwîst jê bê derxistin û pêdiviya wê bê pêkanîn, em bawer dikin ku, pêşketinên ji niha û şûnde dê serkeftî bin. Ev di heman demê de dibe bi awayekî rast, serkeftî pêkanîna xeta me ya Partiyê, xet bi pêngavên pratîkî yên bi vî rengî xwe piştrast bike û xwe bigihîne serkeftinê.

Pêngava şoreşger a 15’ê Tebaxê, di bingeh de gel bi şerê xwe dayîna nasîn û ev şer pêdayîna fêmkirinê ye. Bi gotineke din, şerê pêşeng ên zanîn û rêxistinkirî, hevgirtina herî bi wate ya fedekarî û kîna kûr a girseyane. Dikare bê gotin ku pêngava 15’ê Tebaxê bû pira pêkanîna vê. Partiya me di sala 1979’an de pêngava vî alî despêkir, di Tebaxa 1984’an de di asta herî jor de tevger bi girseyî kir.

Bêgûman pirsgirêk bi van ve dawî nebû. Pênvaga 15’ê Tebaxê hemû pirsgirêk çareser nekiriye, şer ser nexistiye û bi encam nekiriye. Berevajî yek ji taybetmendiyên wê jî, pirsgirêkên ku dixwestin ser bigirin eşkerekirina wan e. Lê bi vê ve jî sînordar nemaye, rêyên çareseriyê yê van pirsgirêkan jî nîşan daye. Pêngava 15’ê Tebaxê ya şoreşger şerê rizgariya netewa Kurdistanê ji dost û dijminan re li ser hemû hêzan ferz kiriye, tevî hişkebaweriya qirêj a di mijara înkargeriyê de jî, ev şer bi dagirkeriya Tirkan jî daye îtîrafkirin.

Bi pêngava Tebaxa 1984’an re hêzê berxwedaniya Kurdistanê ya gihişt lûtkeyê, rûyê hundirîn ê “Efsaneya artêşa Tirk” eşkere kiriye. Di navenga bê hevsengiyeke zêde de li beramberî du artêşan û yên ku hejmara wan çil hezar derbaz dikir, li beramberî yekîneyên taybet, tevgera me ya ku salên dawiye her tim di nav şer de bû. Ew teretûra “ Li beramberî vê artêşê nayê rawestandin” ev ceribandin bi gel da jiyankirin û hilweşand. Bê çareseriya ku artêş ket nav de û tirsa ku her diçû di nava leşkeran de zêde dibû, girseyên ku panîk û bêzariya wan didît, baweriya wan li beramberî tevgerê û bi xwe zêde kir. Mêtîngerên faşîst ên Tirkan, ji bo rê li van pêşketinan bigire, ji aliyekî ve hewldan rastiyan veşêrin, ji aliyê din ve jî şer belave kirin û ketin nava seferên terikandinê. Ev jî wî hîn zêde dikişîne nava çirava şerê me yê rizgariya netewî û di nav de difetisîne. Dagirkerên faşîst ên Tirk ên ketin zanîna vê encamê, ji aliyekî de hewldan ser vê rastiyê bigirin, ji aliyê din jî şer belave kirin û dest bi seferên çewsandinê kirin, ev jî ji bo wan çiravek bû… Artêşa wan a ku ji sed hezaran pêk dihat û ket ferqa encamên vê rastiya hatibû afirandin, li serê KT bûye bela li beramberî şerê me, ev hêza xantal a ku di cihê xwe de asê maye ji bo tevgera me hedefeke vekirî ya ku di her kêliyê de ji aliyê hêzên me ve dikare bê nêçîrkirine.

Pêngava 15’ê Tebaxê bûhrana siyasî ya dagirkeriya Tirk kûr kiriye, hîn ji niha ve derî li ber pêvajoya siyasiyên mîna li Vîetnam û EL Salvador hikumetên li pê hev li navçûn vekiriye. Di polîtikaya derve de derewa KT ber bi demokrasiyê ve diçe, li ser esasê linavbirina tevgera netewî ya Kurdistanê çêbûye. Bi rewabûna faşîzmê qezenckirinê ve polîtikaya

hevsengiyê ya li ber çav di rastiyê de bi politikaya veşartî darê xwe jî dihejîne û nişan dide. Ev polîtîkaya ku di herêmê de hejmarek zêde qezenc kirî xetimîye, baweriya xwe ji dest daye. Ji vê jî wêdetir ya ku ji bo wan tê wateya mirinê di platformên nav-netewî de bûne mijara nîqaşê.

Yek ji rastiyên din ên ku pêngavê derxistiye holê, KT di dîroka xwe de cara yekem tevî ewqas dorpêçan, bi destxistina tevgerê ya domdariyê û her ku diçe pêşxistina wê ye. Çi Mûstafa Sûphî, çi jî berxwedana 1971'an hem bi hêzeke pir biçûk a di têkbirina wan de zehmetî nejiya dagirkeriya Tirk, yên mayî jî piraniya wan di girtina gel xwe de serkeftî bû, di asteke girîng de dikari tevgerê li nav bibe. Pêngava 15'ê Tebaxê ev qûral bi erdê re kir yek. Zanî domdariya berxwedanê biparêze û vê jî li hemû qada Kurdistanê belav bike. Ev destkeftiyeke mezine û ji bo derketinên şoreşgerî li her qadekê zemînekî pêşkêş dike. Bi vê pêşketinê ve girêdayî, pêngava şoreşgerî ya 15'ê Tebaxê ji pirsgirêka herî sereke re di pirsgirêka pêşeng û şer de, di asta tê xwestin û rast pirsgirêk nehatibe destgirtin jî, bi taybet qet ji rojeva çepê Tirkan neketiye. Mijara ku herî zêde li ser tê nîqaşkirine, ger polîtîka û pêkanîn rast bin, rista kulmek pêşeng qadirê çiye bi awayekî pir baş derxist holê.

Pêngava 15'ê Tebaxê, şerê demdirêj ê gel hem bi qadroyan, hem jî bi girseyan daye fêmkirin, bi taybet demdirêjîya şer bi wan daye fêm kirin. Ev ji aliyê şoreşa Kurdistanê ve destkefteke pir girînge. Di dîrokê de her tim bê amadekarî di xala ku tê tengavkirin de û di kêliya dawî de piraniya teqînên ji ber xwe ve, serhildan, di Kurdistanê de pir zêde derdikevin holê û yekane rêbazê şere. Ev, rewş bandora xwe li ser qadroyan li şûna amadekariyeke zêde, zanîn û şerekî bi rêxistinê dayîna meşînê, ya ku mirov dikare weke hişmendiya întîharê jî bi nav bike ber bi rêbazên têkoşîna erzan ve biriye. Dagirkeriya Tirk ji ber ku hêviya xwe bi vê lewaziyê ve gire dabû, derbazkirina pêngavê ya vê, ew zêdetir di goşê de asê kiriye.

Pêngava 15'ê Tebaxê, derxistiye holê ku sînorê pêşketina şerê gel nîne. Dema pêwîst kir dikare artêşên sedhazaran jî tengav bike ev jî îspat kiriye. ji bo derketinên şoreşgerî û pêşverû bûye çavkaniya hêz û spartek. Li ser vî esasî rûpoşên çepgiriya burjuvaziya biçûk ên ku qilif ji pevkirin û radestgeriya wan a ku digotin; "Dema wê nehatiye, zû ye" xistiye, rizîna wan bi awayekî vekirî nîşan daye. Bi taybet hemû nebesiyên çepê Tirkan eşkere kiriye. Pêngava Tebaxê ya ku hema bêje dîroka xwe nû dike, ger îro ji hemû aliyan ve derneketibe holê jî bi pirsgirêkên ku afirandiye, di rastiyê de ji bo ku li Tirkiyê meyla proleterya li ser esasê şoreşgeriyeke rast bilind

bibe wê bibe xwedî risteke diyarker. Pêngava 15'ê Tebaxê, di vê wateyê de tevgera henaseyeke girîng bi çepê Tirkan dayînê ye.

15'ê Tebaxê, li beramberî hewldanên herî ketî di demeke dixwestin tevgera şoreşger a Tirkiyê linav bibin, veguherînîn înkargeriyê de, ew di xwe de şênber kiriye, bi mercê ku dîsa ji gelê Tirkiyê re veguhezîne, xwedî li wê danehevê derketiye. Pêkhateyên mîna çepê û yekîtiya çepan a ku destûra xwe ji cûntayê girtibûn, ger bînin pêş çavê xwe çawa dixwestin vê mîrasê tasfiye bikin, girîngiya xwedî derketinê wê baştir bê fêmkirin.

Xeta serbixwe ya tevgera me ku dixwestin berevajî bikin, veguherînin girêdayîneke koletiyê, hewldanên hinek hêzên noker ên cur bi cur, ji aliyê vê pêngavê ve vala hatiye derxistin. Xeta me ya serbixwe, ji her demê zêdetir bi xwe sipartina hêza taybet a gelê me xwe gihandiye mercên pêşketinê û mezinbûn bi saya vê dest xistiye. Xeta me ya şoreşgerî ya rast bi vê pêngavê re, li ser parçeyên din ên Kurdistanê tenê ne ji aliyê teorîk û siyasî ve, ji aliyê pratîkî ve jî gihiştiye asta rêbertiyê, bûye yekane hêviya gelê me ya li wan parçeyan jî. Xeta serbixwe ya teorîk û siyasî, yekem car îro xwe gihandiye asta ku bikare di pratîkê de jî bandora xwe ragihîne.

Pêngava 15'ê Tebaxê ya şoreşgerî, mîlîgeriya paşverû û burjuvaziya biçûk a Kurdan, revokên şoreşê, karekterê hevkar û radestkariyê ji hemû aliyan ve derxistiye der û nasnameya wan a rast li ber çavan raxistiye.

Ji bo tevgera me ya şoreşgerî nemeşe, ew hêzên tasfiyeger û provakasvan jî dan kêleka xwe dixwestin pêşketina me ji ser dagirkeran ve asteng bikin. Yên ku pevçûnên mîna şerê navxweyî yê çepgiran geş dikirin ev hêz, bi vî rengî heta radeyekê dîtina rastiyan asteng dikirin, teşîr û tecrît zehmet kirin. Lê ev pêngav, hemû rûpêşên hêzên mijara gotinê xistin, rewşa wan a astengkar derxist holê, hem jî her ku diçû ew pêwendiyên wan ên di dagirkeriya Tirk re veşartî û eşkere bi şêwazekî herî balkêş daniye holê. Di vê wateyê de girseyên gel di fêmkirina polîtikaya Partiya me yên yekîtî û eniyê fêmkirine, bermahiyên herî dawî yên niyeta baş jî neçariya êdî avêtinê dîtine.

Hinek taybetmendiyên sereke yên pêngava 15'ê tebaxê dema ku em wiha rêz dikin, em ê vana di demên pêş de bi hûrkariyan destnîşan bikin. Pêwîste kêmasiyên nû, nebesiyên di pêkanînê de ketine nav bi girîngî serde biçin. Di derbarê van de nirxandin bi cewherî li jêr hatine kirin. Ger bi kurtî em qalê bikin, qonaxa ku têkoşîna me gihiştiyê, hunera li gorî pêdiviyan tevgerinê misoger dayîna jiyankirin weke pirsgirêkek jiyanî xwe ferz dike. Şoreşa Kurdistanê bêrîkirinên mîlyonan veguherand rastiyê. Yanî doza azadî û serxwebûna jiyanê gav bi gav ber bi serkeftinê ve bir. Di demeke

wiha de nebesî û kêmasiyên derketin holê, di encama vê de windahiyên ku hatin jiyîn taybetmendiyeke ti car nayê qebûlkirine û xeteriyên girîng bi xwe re tîne. Ev rastî di aqilan de bê girtin, nebesiya me ya herî mezin îro di pêkanînê de derdikeve holê divê ev baş bê zanîn. Ev çine bi kurtî be jî li jêr hatine vegotin. Ji ber vê jî gelek taybetmendiyên me yên bi nirx berhem nadin û rê li pêşiya pêşketinan digirin. Mecbûre ev bên derbazkirin. Divê bi qûralan neyê lîstin, milîtan misoger pêdiviyên xeta taktîkî ya Partiya me di kesayet û pratîkên xwe de şênber bikin û bikare nûnertiya wê bike.

Pêngava 15'ê Tebaxê, me neçar dike milîtanên Partiyê polîtîkaya pratîkî pêk bîne û di vê de serkeftî be. Pratîk ji bilî vê mafê jiyanê nas nake. Derbazkirina kesayetiya paşverû, pasîf, taxrîbkar ya ku KT li ser me ferz dike, xwe negihandina milîtaniya bi hêz, bandorker zorê li me dike. Bi îfadeyeke din KT û sentezên ku bi serdema navîn re dike, di her astê de qutbûnê pêwîst dike.

Partiya me di nava mercên herî nebaş û neyênî de jî, Partiya ku şoreşgeriya bi biryar û yetkîn afirandiye û mohra xwe li demê dayî ye. Ger di pêkanînê de hişyariya pêwîst, hostatî, çalakbûn û biryardarî bê raberkirin, afirandina şoreşgeriya tê xwestin û awatkirin dê qet zehmet nebe.

### 4- Siyaseta Me Ya Şoreşgerî Divê Hîn Bi Bandor Bê Pêkanîn, Mîsoger Rê Li Pêşiya Windahiyên Ne Di Cîh De Bê Girtin, Ji Meylên Provakatîf Û Tasfiyeger Re Mafê Jiyanê Neyê Naskirin!

Partiya me tevî ku ji derve û hundur ve hemû neyîniyên ku li ser hatin ferzkirin, ji bo ku bikaribe polîtîkayên xwe yên şoreşgerî bi bandor û weke tê xwestin pêk bîne kedeke mezin raber dike. Di vê pêvajoyê de, bê gûman hinek windahiyên jênerev jî derketin holê. Ev weke ku rastiyên yekî biçek bi namûs û ji aliyê her kesî ve tên radestkirinin, têkoşîna me ya ku pêş dikeve, her ku diçe aloz dibe, nemaze erk û peywirên mezintir derdixe holê. Polîtkayên me yên Partiyê pêkhêneriyeke jêhatî û qûralên şoreşgerî yên rast bi dîsîplîn şopandinê devjêneger û jiyanî dike.

Îro ji her demê zêdetir eşkere bûye ku, ewqas zehmetiyên pê re rû bi rû mane, astengî û nebesiyan jî, têkoşîna me her roja derbaz dibe mîna aşûtê mezin dibe. Bandora tevgerê her ku diçe li hemû qadan zêde dibe, ispatkirina rastiya polîtîkayên Partiya me yên pratîkî û naveroka wê ya dewlemende.

Di destê pêkhêner û Rêbertiya rast de, di serî de jî weke ku di zindanan de hat îspatkirin siyaseta Partiya me di nava mercên herî bê derfet de jî,

mîna gula “Yedîveren” vedibe, qadên herî bê berhem jî vediguherîne çavkaniyên şoreşê xwedî dike. Hêzên dijmin ên ku ev siyaseta Partiya me fêm kirine û derdorên tarî yên nîyaz xirab dema ku ser me de tên, xwe neçar dibînin polîtîkayên bandorker pêş bixin. Bi kurtî hemû çavkaniyên siparteyên polîtîkaya me ya şoreşgerî yên dîrokî û rojane divê ku em bihesibînin û aliyên neyînî bi hev re dikin yek, bi ser me de dajon û dixwazin bi vî rengî encam bigirin. Li beramberî vê hemû taybetmendiyên polîtîkaya Partiya me, divê bi hostane bikeve meriyetê, bi lez xwe ji pêkanînên nebes, ji afirêneriyê dûr rizgar bikin.

Polîtîkaya me ya enîyê, bi qasî divê di mijara li dijberî dijmin girseyên herî berfireh ên gel anîna gel hev û dana şerkirinê de, ewqas jî bikare lîstokên reformîst û paşveriyan ên li beramberî herêmê vala derbixe. Her wiha divê rê li texrîbatên komplowarî ên şovenîzma sosyal jî bigire. Weke çekeke afirîner û bi hêz bikar bîne, ji rêbazên hêsan û rêbazên asayî yên li ber çav dûr bisekine. Bi qasî qadroyan, divê girseyên berfireh jî di nava ruhê şer de bên perwerdekirin, siyaseta me ya di her qadê de bi wan bidin fêmkirin.

Ji bo rastiya Kurdistanê bi şoreşê bi rêbazekî herî watedar bê veguhertin, têgeh û qûral jiberkirin têrê nake. Divê ku mirov bibe pêkhînerê van ên kûr. Pirsgirêka herî diyarker ya ku niha di nav me de derdikeve jî, nebûna pêkhînerên başe. Wê demê divê qadroyên me yên Partiyê vê pirsê pir zêde ji xwe bipirsin; em çawa dikarin bibin pêkhînerên baş? Ji ber ku çarenûsa gelê me, bi xwe gihandina asta pêkhînerên baş ve ji nêz ve girêdayî ye. Ji bo pêkhîneriyeke wisa di asta teorîk de gelek tişt hatin gotin, di partîkê de gelek tişt hatin kirin, lê dîsa jî têr nake. Hêjî windahiyên bê wate yên çavkaniya xwe ji van nebesiyan digirin hene, gelek tiştên ku divê neyên kirin hêjî tên kirin û windahî tên dayîn. Di mijarên îstîxbaratê û tevdîr girtinê de nebes dimînin. Heta kîderê baweriya xwe bi kî bînin, di pêwendiyan de li çi dîqat bikin û çawa tevbigerin, di mijarên wiha de hostatî nayê raberkirin. Di mijara tevdîr li beramberî kesên nebawer girtinê de nebes mayîn, kêrî karê îxbarvanan tê û bi pêşengtiya van dijmin heta ber deriyê sixinaqan tê. Di çûna û mayîna cihên niştecîhbûnê de bi baldarî tevnagerin, cihên ku divê neçinê, lê nemînin diçinê û hewl didin pêdiviyên xwe pêşwazî bikin. Ev jî rê li ber windahiyan vedike. Ji ber sedema amûrên xwe gihandinê ku divê neyên karanîn, lê bikar tînin, dîsa windahiyên me çêdibin. Bê baldariyên bi vî rengî û ji sedema nepêkanîna qûralan, karê dijmin tê asankirin.

Heta niha dijmin çiqas windahî bi me dabe ne ji ber bihêzî û hostatiya wî ye, ji ber nebesiyên me bi xwe hatine dayîn. Wê demê di van hemû mijaran de heta pileya dawî baldar, hişyar û hestyar bûn û li gorî qûralan tevgerîn pêwîste. Di vir de bi girîngî divê ku xalek bê diyarkirin, gelê me hîn ji roja despêkê û dema yekemîn şehîdê me yên ketin ser axê despêkir, bi girêdanî û rêzdariya kûr a ku li beramerî şehîdan bihîst li derdora têkoşîna me her ku çû zêde kir. Lê ew bêrîkirina kûr a li beramberî rizgariyê dibihîst û yê ku dibe berhema vê her misqala hebûna me, li dijberî dijmin weke hêzekî ji xwe bawer xwesteka rawestînê, li beramberî windahiyên ne di cîh de bi hêrse, bi qiswete. Aciz pêşwazî dike, ji windahiyên bi vî rengî re rêz nagire. Weke din windahiyên bi vî rengî, ji dijmin û hêzên rizî yên reformîst noker re sînordar be jî cesaret dide, zindîbûnê dide qezenckirin. Ti kes ji ber nebesiyên ji rêzê, ne xwedî mafe ku zirarê bide nirxên tevgera me xwe û karê dijmin asan bike. Bêhevsengiya pir zêde ya navbera hêzan bê berçavgirtin, serdestiya dijmin a teknîk û madî, bi rêbazê têkoşîneke hostayî, baldarî û aqilane divê bê bandor bê kirin.

Ji aliyê din ve dijmin taktîk diguhere. Her roj taktîkên şerê taybet diceribîne. Kontrgêrîla weke mangayên mirinê her roj li çiya ne, li her derê kemîna davêjin û di kemînan de dikarin gelek windahiyan bidin dayîn. Ev jî windahiyên ku dikarin bi tevdiran bên valaderxistinin. Divê ku şêwazên herî pêşketî yên şerê taybet bê valaderxistin. Qanûna Poşmaniyê, ji bo xayîn û îtîrafkaran ew jiyana ku ji bo xwe kirine hêvî, divê ji hemû aliyan ve bê valaderxistin. Ev qanûna ku ji niha ve ketiye asta kêrnehatî, weke xeleka herî lewaz a pergalê lê kirin û li dijberî wê nebikaranîn divê pêk were.

Bi heman şêwazî Qanûna Cerdevanên Demkî yê Gundan, ya ku dibe Alayên Hamîdiye ev qanûn vala derxistin pêwîste. Ew çeka dudil û bi tirs bikartîne, divê ku bi awayekî herî baş bêrê wê lê bê zîvirandin. Misoger serxistina vê mecbûriyeteke, bê hejmar ceribandina şerkeriya gel, yên ku dikarin bê pêkanîn serkeftî pêkanîn, serkeftin belavekirin û pêşxistin demkî-dodar, ji rêzê-tevlîhev, tenê û bi komî, şêwazên rêxistin û çalakiyên cur bi cur bi rêbazekî afirîner divê ku derbikeve holê.

Bê hejmar rêbazên provakasyon û pasîfîkasyonê di vê navberê de divê bên eşkerekirin û valederxistin. Bi kurtî, di Têkoşîna me ya Rizgariya Netewî de bûyera bihêzbûna Rêbertî çi dibe bila bibe bê pêkanîn. Xwe ji nebesiyên heyî rizgarkirin, di asta tê xwestin de kar kontrolkirin û rêvebirin mecbûriyeteke. Dema ku ev pêk neyên, bi giştî di tevgera şoreşgerî de, bi taybet jî meylê tasfiyeger ên di derbarê Partiyê de wê gelek xeter bin û heta

dikare rê li ber tasfiyegeriyeke xweber jî veke. Ji ber vê pêkanîna lewaz û nebes, derketina bûhranê, berdewamkirina wê ji nêz ve bi tasfiyegeriyê ve girêdayîye. Ji bo rê li vê bê girtin, xwe gihandina asta pêkhîneriyên tam û bi bandor zanîn hewce dike.

Madem berjewendiyên gelê me yê îro, êdî bikaranîna hemû derfetan heta dawî karanînê dide pêwîstkirin û madem xeleka herî azad a dîrokê me girtiye destê xwe, wê demê ev xelek pêşdebirin û ji bo ku careke din qut nebe ya ku ji dest me tê heta dawî divê em pêşkêş bikin. Me rûpelên ronî yên dîroka xwe vekirine. Wê demê em qet ji qusûr û kemasiyên xwe netirsin. Em tevgereke dixwazin erd û ezman fetih bikine. Wê demê kîjan lewaziya me ya ku em devjê bernedin heye? Yên ku pêşengtiya ewqas fedekarî, cesaretê dikin gelo wê di bin kîjan lewazî û xeletiyê dernekevin? Yên ku ewqas bi hêz dixwazin tola dîrokê rakin, çawa şerkeriya bin naveke ya herî yeman hostatiya vê heta dawî nîşan nadin?

Belê erkeke dîrokî û esîl a me girtiye ser milê xwe û nirxên me yên esîl ku em xwe bispêrinê hene. Wê demê ti hêz nikare me neçarî kêmasiyên mîna qovek li ser pişta xwe gerandinê bike. Wê demê ti neçartiyek, paşverûtî nikare me ji xwe gihandina hêz û hostatiya pêwîst bigire. Bi vê baweriyê û hêza ku me ji yekemîn salvegera pêngava navdar a 15’ê Tebaxê girtiye em bi ser kêmasiyên xwe de biçin û weke hêza çareser a hemû pirsgirêkan û pêşengên şoreşger bin.

### 5-Siyaseta Partiya Me, Di Pêngava 15’ê Tebaxê De Careke Din Piştrast Bûye û Baweriya Bi Serkeftinê Domdar Kiriye

Pêvayoja ku bi pêngava 15’ê Tebaxê despê kir û di nava pêvajoya ku heta yekemîn salvegera wê dirêj dibe de siyaseta şoreşgerî ya rast a partiya me, bi şêweyekî peyitîn careke din piştrast bû. Belê, gelek ji van pir caran ji bo serneketina xebata Partiya me ya ku di pratîkê de piştrast bibû gelek tişt kirin. Hêzên cuda di qada netewî û nav-netewî de di asta kes nedîtî de xebatên teşîr û tecrîdê meşandin. Lê ev tev ji bo xwediyê wan li ser tawan girtinê zêdetir ti encam nedan. Şoreşa me hemû astengiyan derbaz dike û pêş dikeve û vê misoger piştrast dike; ger siyasetek rast be û xwe gihandibe pêkanîneke li gorî vê guncav, astengî çiqas zêde dibin bila bibin, dikare di rêya serkeftinê de bimeşe. Pêngava 15’ê Tebaxê û piştî wê, ev bi şêweyek peyitîn piştrast kiriye.

Pêngava 15’ê Tebaxê, tenê dema ku bê mecala şert û mercên ku di nav de derbaz dibû, astengiyên ku pê re rû bi rû dima, nebesî û kêmasiyên ku dihatin jiyîn li ber çav bê derbazkirin, bi rastî jî tevgereke mûcîzewî ye. Belê, ji bo yên ku bi zanista şoreşê ve pir girêdayî ne, pêwendiya kar bi mûcîzeyan re nîne. Lê di mercên Kurdistanê de kefenê ku ji şoreşa me û heta ji me re hatibû dirûtin qetandina vî kefenî, derketineke şoreşgerî ya bi vî rengî kirin, ne xerca her hêzekî ye. Bi rastî jî radestkar û burjuvaziyên biçûk nexwestin jê bawer bikin, bipejirînin û mohra xwe ya weke “ temenê wan çend roje, çend mehe” lê dan. Ev yan tevgereke çiye nediyar, provakatîf, maceraperest a ku vala vala pêsnê xwe dide yan jî karek fêlbazî tê de ye, yan jî mûcîzeyeke. Na, di rastiya şoreşan de cihê mûcîzeyan nîne. Bi heman şêweyî ewqas bê tirs û egîdî, di nava bê hevsengiya hêz de bi ser dijmin de çîyîn ti pêwendiya xwe bi maceraperestî û provakasyonan re nîne. Ji îtîrafên dijmin fêm kirina vê ewqas ne zehmete. Wê demê divê bê qebûlkirin, ya ku qewimî bi awayeke balkêş piştrastbûna siyaseta Partiya me ye. Serde jî tevî hemû curên dorpêçî, provakasyon û serîlêdanên dijmin ên linavbirinê bi vî rengî bûye.

Belê pêngava 15’ê Tebaxê siyaseta şoreşgerî ya rast di Kurdistanê de divê çawa bê pêkanîn careke din derxistiye holê. Di dema borî û roja me ya îro de li Kurdistanê gelek caran serî li berxwedanê hat dayîn, lê hema tev jî ji binkeftin û binpêkirinê rizgar nebûn. Ev bêgûman, bûyereke ji nêz ve bi siyaseta ku hatî karanîn ve girêdayî ye. Di dema borî de Rêbertiya eşîret-feodal, rewşa wî ya polîtîk-bîrdozî û çînî weke sedema sereke ya binketinê derdikeve pêşberî me. Di dema borî a nêz de jî, bi taybet li ser esasê redkirina rastiya me ya civakî û netewî, yan jî bi rêbazekî zirav yên ku li ser esasê înkarkirinê derketin rê dixwaze bila bi zanebûn, yan jî bê zanebûn, yên ku di rewşeke wisa de eşkere bû ku dê nikaribin li Kurdistanê berxwedaniya ku her diçe pêş dikeve pêk bînin.

Bi taybetî, çêkera Kurdistanê ya erdnîgarî û mirovî, li berçavgirtina guncavbûna mercên destdayî ji bo têkoşîna çekdarî, gelek pêşengên berxwedanê yê Tirkî, di salên 1970’î de xwestine di vê qadê de têkoşînê pêş bixin. Lê rêbazê fikrîna şovenên sosyal û ev ferasetên rastiya me ya netewî hesab nekirin, xwe ne sipartin tahlîlên çînî. Ev derketinên ku tenê têkoşîna gêrîla li ser esasê qûralên rast pêkanîn li ber çav girtin, her çiqas hinek pêşketinên sînordar bi dest xistibin jî, berxwedaniyeke netewî dê nikaribin pêş bixin. Ger pêş bixin jî dê nikaribin domdar bikin ev rastî danîn holê. Çi ji aliyê Sînan’an ve li Nûrhaqê, çi jî ji aliyê Îbrahîm Kaypakkaya li Dêrsim û qadên din berxwedaniya ku xwestin pêk bînin,

gêrîlatî û têkoşîna çekdarî rast dest girtibin jî, ji binketinê rizgar nabin. Ev tenê nikare bi sedemên teknîkî û mercên objektîf ve bê girêdan, berevajî, di bin siyaseta wan de kêmasî hebû. Rastiyeke civakî û netewî, bi rêbazekî rast di cih de nedayîna rûnûşkandin heye û di vê bingehê de binketin di vir de lê bê gerandin.

Li beramberî vê PKK, di Kurdistanê de têkoşîna çekdarî esas digire û dema pêş dixe, vê jî beriya her tiştî li ser rastiya netewî û tahlîlên rast ên çînî digire dest. Esasgirtina siyaseta Partiyê, bi mercên netewî, civakî-aborî ên cuda yê Tirkiyê, ji hev cudakirina mercên vir û yên Kurdistanê û li ber çavgirtina parçeyên din ên Kurdistanê ferqa di navbera Rojavayê Bakur li ber çav hat girtin avakirina xeteke têkoşînê ragihandin û pratîka vê jî rast hatiye pêk anîn. Ji ber ku xwe sipart bingehekî polîtîk, bîrdozî yê bi vî rengî saxlem nebesiyên xwe, bi taybet tevî ku di mijara têkoşîna çekdarî de bê ezmûn jî bû, zanî her ku diçe lez bide pêşkatinan. Gelek zêde qala wê têkirin ku Partiya me xwedî bandoreke bi hêz a bîrdozî-polîtîke. Ev bandor çavkaniya xwe ji rastbûna wê digire. Rast anîna ziman a rastiyên me sedema esas a hêza pratîkê ye jî.

Dîsa tiştekî pir zêde tê gotin, tevî ku me gelek nebesî di têkoşîna çekdarî de kir jî, dîsa jî pêşketin ranewestiyan. Belê, tevî hemû kêmasiyan jî, ji ber ku xeteke rast bû, pêkanînên nebes jî bi awayekî objektîf pir pêşketin bi xwe re afirandin. Nepêkanîneke têrker bi rastî jî di Kurdistanê de wê pêşketina pêngavên şoreşgerî ya pir bi hêz ava bike. Ji niha ve îspat bûye ku dê ti astengî û mercên objektîf nikaribin vê rawestînin. Êdî rastiya divê bê pejirandin, dê di Kurdistanê de serkeftina têkoşîna çekdarî pêk were û ev jî encax li ser esasê Siyaseta Têkoşîna Netewî pêş bikeve.

Hêza şovenîzma sosyal a ku bênh jê te û reformîzmê ya pêşxistina vê nîne. Ji ber ku ne xwedî siyaseta berxwedaniya netewî û rizgariyê ne. Bi kurtî ne ji ber ew kêm derfet, xwedî ezmûneke kurtin, ji ber ku ne xwedî siyaseteke rastin, îro di Kurdistanê de pêş nakevin. Ger tevî ewqas zext, linavbirin, teşîr û tecrîdê, em îro qala têkoşîna Partiya xwe ya ku bûye malê mîlyonan dikin, ev beriya her tiştî çavkaniya xwe ji siyaseta wê ya rast digire. Di nava vê siyasetê de cîh girtin, ew pêşxistin, weke sedema sereke ya pêşketinên pişt wê jî girêdan, helwestekî şoreşgerî ya rast û polîtîk girtine. Ji niha û şûnde ev rastî zêde nexistina nava zehmetiyan û pejirandina wê mecbûriyeteke. Di serî de jî enî, bi tifaqên cur bi cur hêz dayîna qezenckirin û ger em dixwazin vê bi berxwedana gelê Tirkiyê re bikin yek, beriya her tiştî li ser vê rastiyê tevgerîn, vê bi rêbazên cur bi cur ên demogojîk û ew ku nexweşiya despêkê bi şovenîzma sosyal re

şêlonekirin û divê ser neyê girtin. Bi heman şêwazî, divê bi taktîkên bersiva vê pêşketinê nade, li gorî rastiya ne ya netewî neguncave jî neyê îhmal kirin. Di Kurdistanê de ya ku dibe şêwaza herî esasî ya berxwedanê têkoşîna çekdarî yên ku wê esas negirin, li gorî mercên xweser pêkneyên, şansê ti taktîkên bi vî rengî yê pêşketinê nîne. Tevî ezmûn, ewqas derfetên madî yên gelek hêzan jî hêz komnekirin û tifaqên di navbera wan de jî, sedema nekarkirina wan ev e.

Siyaset û taktîkê şoreşgerî, mercê jênerev a pêşketinê ye. Û ev rastî careke din bi çalakgeriya 15'ê Tebaxê îspat bûye. Di gel ku careke din rastiya xetê piştrast kir, Pêngava Şoreşgerî ya 15'ê Tebaxê, bêbinkeftin û egîdiya gelê me, ruhê cesaret û fekadariya bilind a Partiya me, ji aliyê tevgera me ve di dema pêkanîna vê pêngavê de, nêzîkî sedî ewladên xwe yê ku da vê axa pîroz, di asta herî jor de careke din îspat kiriye.

Belê, gelek xwîn hatiye rijandin, êşên mezin hatine kişandin, fedakarî û cesaretên mezin hatine raberkirin. Eşkereye ku dê ji niha û şûnde jî hem pirsgirêk û hem jî windahî çêbibin û heta wê zêdetir jî bibin. Lê êdî weke encamê arasteya pêşketina derxistiye holê û bi hemû rastiyên ji ezmûnên şer derketine bi girseyan tê tamandin di navenga roja me ya îro de, ev hemû dibin bersivên ku pêwîste li pêngavên têkoşîna şoreşgerî bên dayîn. Ger vana hemû li ser esasê pêkanîneke rast û têrker bin, ne dervî taktîk, di nava qûralan de derkevin holê, wê ji bo me ji windahiyê derkeve û heta her ku biçe dê veguhere destkeftiyan. Ji bilî vê formulê mezinbûna têkoşînê nîne û ev ji bo me çavkaniya sereke ya hêze.

Mijara sereke li pêşiya tevgera me, niha pirsgirêka veguhestina pêngava 15'ê Tebaxê ber bi pêşerojê ve ye. Divê hema bidin diyar kirin ku, dîroka me şansê rastiya xwe nûkirinê cara yekem dest xistiye. Ji ber wê jî di serî de Rêbertiya Partiyê, milîtanên wê yên berpirsyar, fedekar û cesûr xelekek nû ku girtine xelekên din lê zêdekirin. Mewziyên qezenckirine mewziyên din lê zêdekirin û ji bo vê jî ger pêwîst kir dê xwîn birîjînin. Li beramberî destxistina kedeke esîl bê ku xwe jê paşde bidin pêşxistin, bi kurtî jiyana xwe li ser esasê xwedî li sozên xwe derketinê jiyankirin gîrînge, ji bo vê jî neçarin jiyana xwe deynin holê.

Meha Tîrmehê, di dîroka me de meha ku berxwedaniya esîl tê de hatiye bilindkirine. Nirxên berxwedaniya mezin a gelê me, ew berxwedaniya ji aliyê Xeyrî û Kemal'an ve bi armanca ji nû ve zindîkirina dîroka me ya despê kirin beriya ku demeke dirêj serde derbaz bibe weke pêwîstîya şayanî wan bûyînê, bi bîranînên wan ve girêdayî mayînê qismî be jî bi ser wan erkên ku wan ji me re ferz kiribû de çûyîn çêbûye. Begûman, berxwedaniya

ku me bilind kir bersiveke dilnizm a ku ji wê berxwedaniya mezin re hatiye dayîne. Lê hinekî derengmayî be jî, xwesteka bi bîranînê wan ve girêdayî mayînê û pêdiviya wê pêkanîn derketiye holê. Di mijara pêdiviya bîranîna şehîdên berxwedanên pêkanînê de, ji tiştekî nayê revîn û ji van bîranînan re, encax bi awayekî metirsîdar rakirina ser piyan a behremendiyan bersiv bê dayîn.

Me dema yekemîn şehîdê xwe yê mezin Hevalê Heqî winda kir di derbarê ku em ê vê bikin garantiya serkeftin û berxwedana netewî me ji gelê xwe û hemû şoreşgeran re soz da. Weke ku pêşketinan jî derxist holê, ji bo pêkanîna vê sozê em ji tiştekî nerevîn û encamên pêwîst jî yek bi yek me girt û em hîn jî digirin. Îro di salvegera yekemîn a pêngava 15'ê Tebaxê de ji bo sedan milîtanên ku me dane axê, em heman tiştî dibêjin û bi heman ruhî tevdigerin. Me ji niha ve ew kirin çavkaniya jiyanê. Dîrok, êdî di Kurdistanê de wê li ser milê abîdeyên berxwedanê bilind bibe û hêza ti xirabkar û keda înkargeran têra guhertina vê rastiyê neke.

Ev egîdên me yên di bilindahiyê de bi şeref pêl didin, çawa gihiştin vê mertebê, di kîna mercan de, li beramberî xiyanetên çawa, şereke çawa meşandin û gihiştin vê ne gengaze ku ji hemû aliyan ve em bikarin li vir destnîşan bikin. Çîroka her yekî ji wan bi qasî ku bibe mijara romanan bi hûrkarîne. Wêje û dîroka me ya şoreşgerî, di pêşerojê de wê yek bi yek wan li cihê wan ê rast deyne. Lê em, ji aliyekî din ve û ji niha ve vê bi asanî dikarin bêjin; yek bi yek ferdên ku ketin ser axê, weke tevgera ku ev ji xwe re kir sedema despêkirina berxwedaniyên mezin, bîranîna sedan, li dijberî vî dijminê hoveber dê bizanibe veguherîne teqîneke metîrsîdar. Ti hewldanên dijmin, ji bo encam bi vî rengî bibe dê nikaribe asteng bike. Ger şoreşgerên jiyan dikin, bibin şopdarên yaman ên bîranîna şehîdên me, ji bo Xeyrî, Xelîl, Kemal û Heqî'yan derengmayî be jî, yên ku ev pêk anîn li beramberî bîranîna şehîdên me yên nû, hîn kûr, berfirah û zûtir pêkanînê dê pir zehmet nebe.

Êdî ma em dikarin ji bo şehîdên xwe hêsir barînê qebûl bikin û ji vê re destûr bidin? Ev ger hebe, hebe dibe berhema hişmendiya wê koma reformîst, a ji rêderketî ku dibêje: "Welatparêz bûn, egîd bûn, lê li pêy dozeke vala ew şandin mirinê." Di kevneşopiya berxwedaniya me de, girêdana bi bîranînên şehîdan, tê wateya nabe ku têkoşîn bê binxistin, destpêkirina berxwedaniyên mezine. Rewşa ku vê nagire nav xwe û tenê bi hêsir barandinê ve sînordar dimîne jî, belengaziye, divê ku bê zanîn ev jî taybet ji bo van ketiyan tê nirxandin.

Li beramberî êrîşên di asta nedîtî yên cûntaya faşîst û artêşa wê de, di nava rastiya gelê me yê ku heta atomên xwe hatiye parçekirin de cihê şehîdên me yên Berxwedana Pêngava 15'ê Tebaxê, elbet pir bijare û girînge. Dema ku îmza şehîdên me yên 15'ê Tebaxê li bin daye, ya ku dîrokî û watedar dike, ji aliyê şehîdên me ve bi bihayê xwîna xwe bilindkirine. Di bin Rêveberiya leşkerî ya herî temendirêj a Tirkiyê de, ji bo linavbirina pêşeng, di navenga zextan de, dîroka me li ser esasên serbixwe ji nû ve zindîkirin, bi serdemê re pira wê dayîna avakirin, bi berxwedana çekdarî û zanîna pêşeng, bi hevgirtina kîn û hêrsa gelê me kirina yek re, ji bo ev qonaxa dîroka me navdarkirinê yên di vê rêyê de hatine dest xistinin. Şehîdên pêngava 15'ê Tebaxê, vaye mîna egîdên mezin ên demeke wiha pêk anîne, wê di dîrok û hişê me de cîh bigirin, weke nirxên me yên bê mirin bimînin.

Ew di xeleka şehîdan de, piştî şehîdên zîndana Amedê, xaleke lûtkeya nû pêk tînin. Hem îfadeya afirandina berxwedaneke nû ne, hem jî îfadeya şayanbûna berxwedaniya Amedê ne. Ti hêz wê nikaribe vê asta wan biguherîne. Ew dîrokin û nirxên yekane yên ku ji aliyê gelê me ve wê esas bên wergirtine.

Belê, bi şahadeta hevalê Mazlûm re, hemû tiştan bi me bidin devjê berdan, xwestin me ji rêya serkeftinê bigirin. Lê ji mirinê re meydan xwend, ji hemû gelê me re çawa, li kîderê û divê çima xwîn bide pêwîstiya vê nîşan da. Şehîdên pêngava 15'ê Tebaxê îspatkiriye ku civatên ku dizanin di vê rêyê de bimeşine.

Ew bûn pira herî saxlem a navbera dema 1980'î û ya piştî wê. Xwe gihandina dema nû wê bi pira ku wan di navbera gelê me û navbera cîhana hemdem de avakirine pêk were. Mezinbûna wateya şahadet û berxwedaniya wan, ji ber encamên dîrokî yên afirandine.

Şehîdên me dema ku jiyana xwe bê dawî kirin, rêya jêneger ku li pêşiya me danîn û berxwedaniya ku li ser mîlyanan ferz kirin, ji bo me yên li şûnve mayî berxwedaniyên hîn mezin çawa û di kîjan qadan de bilind bibe emir dikin. Bê dem derbazkirinê ev erkên ku divê bên pêkanîn divê çawa mirov ber bi wan ve bazde vekiriye. Bi teoriya şoreşgerî bi qasî tê xwestin ev hatiye ronîkirin û veguheriye diyardeyeke bi asanî bê fêmkirin. Mirovên me ji her demê zêdetir di vê rêyê de meşîn û weke pêwîstiya girêdana bi bîranîna wan ji her demê zêdetir nêzîkî artêşbûnê ne. Wê bi çi, çawa girêdayî bin û çawa bimeşin ji her demê zêdetir fêr dibin û dizanin. Diyardeya ku jê re têgotin "dema wê nehatiye" êdî çawa bûye dem bi xwe, dîsa ew tişta ku jê re dibêjin lez dikin çawa ji bo ku pê re bigihêje divê

çirkeyek jî neyê windakirin êdî bûye diyardeya ku ji aliyê hemû kesî ve tê dîtin û bihîstin. Lê ji bi dem û derfet bi berxwedaniyeke herî bi wate re hevbigirin û li ser esasê berjewendiyên taybet veguherin, encax bi çalakiyên çerxa şoreşgerên mezin dikare bê pêkanîn.

Girêdana me bi şehîdên me yên bexwedanê re mezine. Erê, ji her yekî ji wan re encax bi çikandina abîdeyên serkeftinê encax şayanî wan bibe. lê ji bo ku em vê ji axaftinê derxin û her roj gav bi gav veguherînin destkeftên şoreşê û di pratîkê de pêk bînin, vê jî bi rêbazên herî rast ên şer pêş bixin, erkên pir mezin ên li ser milê me hatine danîn hene. Şertê pêkanîna van erkan jî, amadekirina mercên pengaveke ji ya 15'ê Tebaxê jî derbas dike û afirandina çalakiya xwe vediguherîne hêza gele. Bingeha heyî heta radeya dawî em di vê astê de bi cesaret kirine. Weke di dema borî de, di roja me ya îro de jî pêşeng divê bi avêtina gavên pêwîst pêngavan bafirîne, watedar bike, veguherîne rastiyeke şênber û ti car şûnde nemîne. Di dema borî de ev di asteke mezin de hat afirandin. Pêwîste dema borî di vê mijarê de mînak bê girtin û bi şêwazekî afirêner bê fêmkirin û li ser vî esasî pêngavên bi hêz bên pêkanîn. Bê gûman a ku divê bê kirin ne dûbarekirina dema borî ye, bi rêbazekî afirêner fêmkirin û pêkanîna pêngavên nû yên bi hêzin. Mezinbûna milîtanên Partiyê û xwe gihandina hedefê êdî bi vê ve girêdayî ye.

Partiya me û gelê me yê welatparêz ji bo ku jiyanake bê tawîz, serî bilind, bi anûr sînga xwe bilind kiriye. Ji bo ku bikaribe wî keriyê hov ên ku dibêjin naheje û têk naçe bîne rê, ji bo henase girtin û dayîneke rehet û ji vir jî ber bi binxistina şansê makûs ve çûyîn ji her demê zêdetire. Bi girêdanî û biryar gavên xwe avêtinê û bi ewqas xwîna hatiye rijandin, êwqas êşên hatine kişandin re bi berxwedaniya xwe jê re bersiv dayînê wêdetir ti rêya me ya din nîne. Divê ev rastî bê zanîn û pejirandin.

Dema ku em yekemîn salvegera pêngava 15'ê Tebaxê li şûn xwe dihêlin, em xwe bi zanîna van rastiyên kûr li ber çavan re derbaz dikin. Ji bo ku pêngaveke di asteke jortir de pêk bînin, hem jî di demeke herî kurt de, di qada Kurdistanê de, em ê çawa bixin dest û dilê mîlyonan ên hesabê vê kûre. Em soza hişyarî û hostatiya wê didin. Bi hemû milîtanên Partiya me yên cesûr û fedekar re, yê ku dostê me yê herî mezine gelê me, ji bo ku careke din girêdana xwe bidin diyarkirin, ji bo ku bibin hêza mezin ên pêngavên me bang li wan dikin.

**Bijî Çalakiya Navdar a 15'ê Tebaxê!**
**Bîranîna Pêkhînerên Pêngava 15'ê Tebaxê Bê Mirine**

**Tebax 1985**

## PKK, Dİ RASTİYÊ DE BERHEMA KEDA HEVBEŞE, DİLÊ KU HETA DAWÎ Jİ BO BAŞÎ LÊ DİDE Û BERHEMA MEJİYÊ HERÎ PÊŞKETİYE

PKK qonaxeke xwe ya herî girîng a dîrokî, tevî astengiyên zêde yên hundirîn û derve serkeftî pêk aniye.

Dema ku em pênaseya têkoşîna sala 1985'an dikin, hem damezrandina Partiyê û pêvajoyên pêşketinên piştre û dema nû ya têkoşîna pêşiya me, di ronahiya van destkeftên esîl û yên şoreşgerî de, derfetên fêmkirin û destgirtina wan ya bi hêz jî derketine holê. Ev di asta têrker de pêkanîn mecbûriyete. Di pêşketina pratîkî û teorîk de, aliyên nebes û lewaz çine vekirî divê bên diyarkirin. Li ser esasê xwe sipartina vê, bi rexneyên di derbarê dema borî de, pêvajoya rexnedayînê ya ku çavkaniya xwe ji vê digire bi hêz pêşwazîkirin, hêza ku di vir de hatiye destxistin, bi destkeftên giranbûha û cesaret bi ser pêşerojê de çûyîn derfetên serkeftinê pêşxistin, xwe girseyî kirin, pêvajoya ciwanî û zarokatiyê, nemaze neyîniyên vê demê derbazkirin, xwe gihandina jiyana partiyeke pêgihiştî, weke partiyeke bi vî rengî şerkirin êdî di nava derfetan de ye.

Weke ku ev rastiyeke, hem nirxandineke dema borî û hem ya dema bê bi hêzkirin, bi taybet jî aliyên neyênî derxistina zanabûnê û lewaziyên bingeha wan a dîrokî, siyasî û civakî bihêze. Her ku diçe ev bi erdê re kirina yek, bi qasî dewlemendkirina berfirehiya teorî û pratîkê dikare gengaz be. Têkoşînên şoreşgerî çiqas pêşkevin, weke ku Lenîn jî dide diyarkirin, pêdiviya zanîna teorîk, siyasî, û rêxistinî jî ewqas zêde dibe. Nemaze ev welat Kurdistan be, ev girîngîyeke devjêneger û ferzker qezenc dike. Ne di wateya dûbarekirina qonaxên borî de, lê ravekirineke wê ya kûr kirin, ji bo derketineke pratîkî ya bi hêz esase.

Em neçarin jibîrnekin ku, karekterê herî diyarker ê hêza siyasî ya dijberî me, ji ber ku rûpêşên xwe hene, xwe cuda nîşan dide û bi qasî ku vê bi saziyên polîtîk, ewqas jî di yê çandî û jiyana kesî de xwe dide peyitandine. Diyardeya ku di KT de şênber dibe, di rêbazekî ku di cîhanê de hema bêje mînaka wê kêm tê dîtin de xwe ji weke heyî cuda dana diyarkirin, bi taybetî

jî ji serdemê û civakên di bin serweriya wê de, şerê vê rastiyê dana pejirandin bi rêbazên demogojîk dide der. Dikare bê gotin ku, di vê de jî gelek serkeftiye û diyardeyeke her ku diçe weke tê xwestin nayê teşîs kirine. Ger ev diyarde hem di pergalên sosyalîst û hem jî di yên kapîtalîst-emperyalîst de ewqas tê nîqaşkirin, yekane encama ji vê bê derxistin weke tê xwestin nepênasekirine.

Belê, em bi diyardeyeke demogojîk ser hatiye girtin û rûpoşî yê re rû bi rûne. Lê ya mijara gotinê ye tenê bê mafî, xeletî, bê şêweyî û endamên herî paşverû yên derveyî serdemê, di serî de jî derfetên polîtîk jî di navê de, hemû derfetên zanistên hemdem bikar tînin KT û her ku diçe nûnerê di bin bandora wî de cûntaya faşîst, diyardeya ku di wan de şênber dibe, îro weke makanîzmayek bêhempa ya çewsandinê û şêweya rêveberiyek faşizan sazûmankiriye û ev jî bi rêxistinkirin û perwerdeyeke çeloxwarî ve, heta goşeyên herî dûr ên dil û hişmendiya girseyan de ferz kiriye. Bi vî awayî li ser civak û gelan ji hemû cure mafên wan ên pêşketina azad û demokratîk bi destwerdana herî xeter bendav çêkiriye. Dema şîroveyên weke “KT sosreteke, bûnewerekî hemşêweyên wî gelek kêmin” hatine pêş xistin îşaret bi asta wî ya herî zehmet hatiye kirin.

Weke hemû gel û çînên din ên ku ji vê diyardeyê bandor bûne û heta ji ber sedema xweseriya xwe ji wan gelek zêdetir rastiya gel û welatê me di çi astê de nayê nasîn û çêkereke çawa raber dike dîtin û diyarkirin zehmet nîne. Di hemû xebatên Partiya me yên bîrdozî û çînî de, ji bo baş fêmkirina vê cewherê gelek ked hatiye dayîn. Bi taybet dahûrîna diyardeya ku jê re Kemalîzm tê gotin, rista vê ya xweser di tepisîna têkoşînên azadî û serxwebûna gelan de, hem jî bi rêbaza xweser ên di nava welatê xwe de tevgera komînîst çawa bi erdê re kirin yek, ji cîhanê re pêşengtî kirin û hem jî lîberalîzma burjuva xistin asteke nenas, her ku diçe ev di roja me ya îro de hema bêje ji aliyê hemû nûnerên emperyalîzmê ve weke modeleke mînaka cîhanê pêşkêş kiriye. Divê bi taybet li ser bê rawestandin. Ger ev diyarde bi qasî tê xwestin neyê fêmkirin pênasekeye mîna faşîzma Hîtler û binkeftinên têkoşînên li dijberî van windahiyên bi mirovatiyê da jiyîn, êşên hatin kişandin gelek zêdetir rû bi rû hevbûn ev hêz, îro çiqas biçûk xwiya dibe bila bibe jênereve. Ev meseleyeke sereke ya pêşketin û xweseriya têkoşîna me dide diyarkirine.

Têkoşîna ku em dimeşînin ne têkoşîneke ji rêzê ye, di nava hebûna atmosfereke wiha de pêk hatiye û xwe dispêre rastiya ku di safoka wiha re derbazbûyî, nemaze têkoşîneke hinek taybetbendiyên taybet hene. Ji vî alî ve derketina PKK’ê, pêkhatina û pêşketina wê jî herî kêm bi qasî hebûna

KT'yê divê ku bi awayekî xweser bê lêkolînkirin. Nemaze ji aliyê endamên vê tevgerê ve lêkolîn, pênase û fêmkirin tenê bi pênasekirina tevgera Partiyê û têkoşîna rizgarî ve ne sîdordare. Yekser di kesayetiya xwe de ji nû ve pêkanîn, bi lingên xwe meşîn, bi mejiyê xwe fikirîn û bi dilê xwe bihîstin serxistine.

Bi vê sedemê dema ku em van destnîşan dikin, em nakevin nava hêceta xwe nepixandin, pêşdeajotina tiştên propagandewarî û tenê rave kirinê. Berevajî ya ku hemû kes di bin de dipelciqe, tê de asê dimîne nemaze binketin, neyînîbûn, lewazî, nemeşîn, nexebitîn, uslûbê wê negirtin ku ev taybetmendiyên serwer ên kesayeta Kurd'in, li hemberî van ji bo bi erdê re bikin yek, her ku diçe çeka xwe ya herî bi hêz rexnekirinê bi armanca baş bikar tînin. Bê ku ev çek baş were karanîn em devjê berdin baş tayînkirina pêşeroja Şoreşa Kurdistanê, hebûna xwe ya kesî parastin, zikê xwe têrkirin heta pileya dawî zehmet dibe. Wê demê, diyardeya Rizgariya Netewî ya ku ji aliyê PKK'ê ve hatiye pêşxistin pir zêde destnîşankirin, rexnekirin û beriya van jî pêdiviya wê bi pênaseyê heye. Mirovên me û nemaze endamên me yên Partiyê, ger dixwazin mezin bibin neçarin ku vê çekê bi bandor û têrker kar bînin.

Vaye, di qonaxeke di têkoşîna me de demeke dîrokî pêk tê de, tişta ku em dibêjin; "ji nû ve binirxînin" ev diyardeya bi zanîneke kûrtir fêmkirine. Eşkereye ku, ev ne tiştekî ji rêzê ye, ji bo ji niha ve afirandina şansê serkeftina dema pêşiya me, tê wateya di mercê vê de berxwedaniyê.

Ji ber ku pir zêde li ser tê rawestandin, li vir dîsa pêwîstî bi dûr û dirêj vegotinê nîne. Lê ger di ronahiya pêşketinên niha de bi kurtî be jî em bibîr bînin, piştî çînên serdest ên Tirk derketin holê, bi pêkhatin û pêşketina wan ve girêdayî, dema ku em di derbarê rewşa wan a roja îro û taybetmendiyên wan ên çînî de nirxandin dikin, hatibû diyarkirin ku; "ew rastiya ku em weke komara duwemîn dikarin nav lê bikin rejîma 12'ê Îlonê, hatibû diyarkirin şêwaza wê weke ya derketina Komara 1'e." Dîsa me diyar kiribû ku derketina Komara duwemîn di asteke girîng de weke dijberiya tevgera me hatiye pêşxistin. Partiya me, bi nerînên dîrokî û rojane û bi têkoşîna xwe ya ku xwe dispêre van rastiyên ku hewl dide bin bixe, derxistiye holê ku xwe ji rûpêşên xwe rizgar bike û bide dest.

Pêkhateya PKK'ê ku li ser KT'yê hat ferzkirin bi derxistina hemû lewazî û neyîniyên ku xwe dispêre derxistina holê re sînordar nema. Ji wê jî girîntir li dijberî wê divê çawa bê şerkirin, kesayeta milîtanên ku di vî şerî de li beramberî nebinketinê, çawa şer bike derxist holê û pêşketina xwe domand. Ji pirsên bîrdoziya wî bin bixe, polîtîka û pratîkeke ji aliyê van ve

divê teşe bigire Partî û milîtanên çawa pêwîstin re, bi awayekî herî zelal bersiv hatiye dayîn. Vana tev her çiqas di despêkê de pir zêde derneketibin jî, ti guman ji pêşketina rastiyan a vî rengî nîne.

Ev erkdariya têkoşîna me li beramberî KT'yê, di roja me de ji her demê zêdetir piştrast bûye. Xebatên hundirîn û navxweyî yê KT'yê û weşanên wan ên fermî yên çapemeniyê ger seranser jî bê şopandin, çawa şerekî jiyanî yê kêlî bi kêlî dimeşîne û dîsa çawa helwestên xwê yên kêliyê bi şêwazê li dûv hev rêzkirî dest digire derdikeve holê. Berê rastiyên teorîk ku yek alî me rave dikirin, îro yekser ew bi xwe dinirxînin, bi nav dikin û didin axaftin. Di van deman de em dikarin bêjin di van qadan de xeta Partiyê piştrast bûye. Hem jî bi awayekî herî peyitîn piştrast bûye.

Dema ku em dibêjin rewşa KT'yê, têkoşîna li dijberî wê asta xwe gihandiyê, zanîneke kûr û bi pratîkeke bandorker bê pêşwazîkirin, hîn şênber em dixwazin balê bikişînin ser van: Beriya her tiştî KT, di nava pergala emperyalîst de hem hewl tê dayîn ji nû ve bê pênasekirin, hem jî weke encamekî vê polîtikayê nêzîkatiyên nû lê tê kirin. Ji aliyê Parlamentoya Ewrûpayê ve, di dîroka vê parlementoyê de nîqaşên herî dûr û dirêj di derbarê mijara bêka wê KT demokratîze bibe, an nebe û nîqaşên di mijara gotinê de, nîqaşên Yûnaniyan ên di derbarê Roma yê de jî bi qasî ku li şûn xwe bihêle ye. Ev vê rastiyê vekirî datîne holê.

Ewrûpa zemînê ku herî zêde demokrasiya burjuva tê de pêş ketiye. Îro çiqas şûn ketibe jî, bi qasî muhafezekar, demokratên Xirîstiyan, demokratên sosyal, yên ku ji gelek aliyan ve nûnertiya van baskan dikin, nîqaşên di derbarê KT'yê de dimeşînin, pênasekirina wî ji vir derketin û polîtîkayek diyarkirin, heta niha jî ji aliyê van hêzan ve pir zêde nehatiye çareserkirin.

Nîqaşên di derbarê KT'yê de, bi vê kûrbûnê di pênc salên dawî de tên kirin. Lê di bin navên meseleyên Şerq de nîqaşên di derbarê vê diyardeyê de tên kirin, divê ku bê bîra me ji demên gelek kevin ve tên kirin. Em dikarin bêjin despêkirina van nîqaşan, xwe dispêrin Îttîhat û Teraqî, heta Tazmînatê jî diçe. Encamê ku ji vê bê derxistin çiye? Emcama herî sereke ya vê ev e; pergala siyasî ya çîna serdet a Tirkan, di tevahiya dîroka xwe de mutlaqiyet, bi Komar û meşrûtiyet weke paşverûtiyekê hûnandiye û ev pergala siyasî taybetmendiya xwe ya mijara gotinê ye, di roja me ya îro de bi awayekî hişktir didomîne. Ji M. Reşît paşayê ku Tazmînati Hayrîyeyî derxistiye, heta Mîthat Paşayê Merûtiyeta 1. ji damezrînerên Komara Meşrûtiyetê, ji wir jî heta demokratên cûntaya roja me ya îro hemû nûnerên vê pergalê her tim çarenûsek anîne ziman. Ji aliyê pêdiviyên di asta herî jêr

ên demokrasiya burjuvaziya biçûk ve rastiya ku bi qasî bejna ceh rê negirtine.

Hişmendiyeke taybet a pergala Emperyalîst-kapîtalîst heye. Hem cûntayên leşkerî û hem jî cihê faşîzmê di nava vê pergalê de, girêdayî hinek mercên ne heyberî û demên taybete. Ji vî alî ve bûyereke nehatiye dîtin de li ser rewşa KT'yê bahozan radikin. Diyardeya mijara gotinê ye yekser ji aliyê van hêzan ve bi pênaseyên weke; "zilamê nexweş ê Bogazîçî û meseleya Şerq" tevî ku xwestin gelek navê wiha lê bikin jî, bi wateya rast nehatiye pênasekirin û dahûrîn. Di rastî de jî, pergal ne dikare dev ji KT'yê berde, ne jî dikare li gorî daxwazên xwe bişibîne xwe. Tevî ku bi qasî dikare jê sûd werbigire jî, li beramberî vê diyardeyê ne rehete.

Lê em dibêjin, ev rewşa tîpîk dikare bi bûyera ku jê re tê gotin Kemalîzmê ve bê ravekirin. Belê, ev rastiya sosret îfadeya xwe, hemû azadiya xwe di Kemalîzmê de dibîne. Bi rastî jî ev hem di rêbazê karanîna kapîtalîzmê û hem jî ya sosyalîzmê de, xwe bi wê ve jî têr nedîtin weke rêbaza sêyem derdikeve holê. Ev jî taybetmendiya ji vê re pêşengtî kirin çavkaniya xwe digire. Weke ku bi awayekî vekirî di kovara "Qadro" de hatiye ziman, yên ku parêzvantiya bîrdoziya vê dikin, ji rewşa sosret ya mijara gotinê ye re dibêjin: "Rêveberiya Tirk, Rêbeza Tirk." Xweseriya pergala serdest a Tirkan ku qala wê tê kirin, çavkaniya xwe ji pergala pêlîstinê digire. Eşkereye ku ev, bûyereke ji nêz ve bi mîsyona dîrokî a çîna serdest a Tirkan ve girêdayî ye.

Ji aliyê van ve heta ku di bin fermana feodalîzma îslamê de mîna şûrekî hejandin ji xwe re guncav dîtin, bi sedên salan di bin navê rûpêşa îslamê de talan û ji bo talanê bazdana wan tê çi wateyê? Êdî dema fêmkirin ku ji îslamiyetê dê ti sûd neyê wergirtin, vê carê jî weke pêşdehatiyên seferên Selîbiyên Rojava li dijberî Rojhilat şer kirin. Dîsa di sala 1920'an de dema ku ji bo wan zengilê mirinê lê dida tevî ku nûnertiya diyardeyeke din dikirin, despêkê Enwer Paşa, piştre jî M. Kemal xwe weke Bolşevîkî nişan dan. Di cîhana îslamê û Rojhilata Navîn de, vê carê jî xwe bi sipartina vî hêzî ve ferzkirinên pêşengtiyê hemane. Ev rastî çiqas guncave ku wan çawa di bin şûrê pergaleke din de bide şerkirin. Ji ber berjewendiyên xwe çiqas dikarin çavsor tevbigerin, kesayetiyeke wan a xweser nîne û şaristaniyeke ayîdî wan nîne. Bêtirî xwe di destê pergalên din de çawa dibin sosret radixe ber çavan. Di roja me ya îro de jî stratejiya ku diparêzin, bi pêş de ajotina asta xwe ya erdnîgarî û li ser esasê xwe sipartina vê tiştên ku dixwazin bikin dîsa ev e. Niha jî van, li ser vî esasî Rojhilat li beramberî Rojava, Rojava li beramberî Rojhilat çawa kar bînin, dê çawa bikaribin di navbera

Ewrûpa û Rojhilata Navîn de bibin pir, di girêdana Bakur bi Başûr ve dê risteke çawa bilîzin û li ser parzemînan, yan jî di navbera wan de cambaziyeke çawa bikin bi hesabê vê re mijûl dibin û nikarin ji xwe re li rêya jiyanê bigerin.

Bi diyardeya KT'yê re pêwendîdar nîqaşên heyî û bê encam mayîna wan, kevneşopiya dîrokî ya çîna serdestên Tirk hatiye diyarkirin, ji ber ku di roja me de jî bi awayekî herî xeter didomîne. Lê ev hêz, di roja me de bi pêşketina herî xeter re rû bi rû ye û gihiştiye dawiya çîrokê. KT'yê îro cara yekem di dîroka xwe de bi têkoşîneke serdestiya wî ya siyasî û netewî bi erdê re bike yek re rû bi rû bûye. Ev têkoşîn, têkoşîna Rizgariya Netewî ya bi Rêbertiya PKK'ê tê meşandine. Vaye ji bo vê xeteriya cidî berteraf bike, KT'yê di roja me de kuna neketiyê, deriyê lê nade nahêle. Ji bo vê serbixe dîsa weke harbûyî, hewl dide agir û barûdê li gel hev bigire. Dema ku diçe Sovyetê dibin navê "Cîrantiya baş de" hemû cure hîlekariyê dike, li beramberî Bûlgarya jî, "Darê pêş çavê xwe nabîne" li ser darikên di çavê wî de dibîne qiyametê radike. Dema ku ji Rojava re dibêje; "Hûn nikarin bê min bikin" ji dest û lingan de dikeve û bi qasî pênc quruşa nirx nade pergala wan jî dikare curetkar be. Dema ber bi Çînê ve diçe di her mijarê de dibêje em di heman fikrî de ne, di heman demê de mûcîzeya Japon û gengaziya wê ji bo Tirkiyê jî pêş dajo. Îdîa dike ku ji bo civaka îslamê modeleke dema ku xwediyê vê îdîayê ye, hewl dide bibe nûnerê bijare yê demokrasiya Rojava. Di her firsetê de xwe weke mutefîkê bijare yê DYE'ê dayîna diyarkirin, mîna rêgezekê diyarkirina wî jî tiştekê dê qet KT devjêbernedê ye.

Çîna li beramberî me ji bîrdozî heta polîtîkayê, rewşeke ewqas nakok û raberkirina vê rewşê her ku diçe xwe digihîne rehên Ebdulhemîd û Împaratoriya Osmanî. Lê KT'yê ji vê encama ku dê serê wî bixe çêkera bi nakok û pevçûyî rizgarbûna wê ne gengaze. Berevajî ev rejîm di roja me de tevî vê çêkera xwe jî, bi hemû derfetan li ber xwe dide. KT bi taybetmendiyên ku tê gotin ji dîrokê girtiye, di roja me de bi bandortir didomîne. Di vê wateyê de KT yeksan têkoşîne. Pêkhatina wî ya dîrokî, bîrdozî, çînî, pratîkî û çandî xebatên di her astê de, xwe hosta kiriye. Koma serwer ya ku li ser vî esasî pêk hatiye, çîn û tebeqeyên cuda yên ku peyda kirine, dîsa li ser navê yên ku ji bo xizmetê jê re bikin derketine holê leşker, dîplomat, bi kurtî zilamên wî yên ji aliyê siyasî-civakî û jiyana çandî ve pêşde ne xwe dixin nava hemû rengan û ketina bin barên gelek zehmet de jî çavkaniya xwe ji vê digire.

Di nava xwe û derve de, li beramberî çînên cur bi cur ên bindestkirî û gelên bindest ji linavbirina bi pergala ya çandî heta li navbirinên fîzîkî yên herî cinawarî, hemû rêbazên ti qûrala nas nake KT dixe meriyete. Ji bo hebûna xwe li ser pîyan bigire ji kem-netewên herî lewaz, heta netewên ji aliyê çandî û şaristanî ve herî pêşketî, dîsa ji pergalên herî emperyalîs-kapîtalîst heta pergalên sosyalîst, li ser hemûyan zext, linavbirin, şantaj, hereşe û nokeriya durû xwe dispêre pevçûn û rikberiya ku di nava pêwendiyan de ye. Hinek caran mînaka êrîşkariya ti sînoran nas nake raber dike, bi vê re li gel hev, mînaka xulamiya vekirî raberkirinê jî şûn de namîne. Rejîma roja me ya bi Enwer û Ozal'î, mînaka vê ya herî tîpîk raber dikin. Li derve weke ku vekirî li beramberî Yûnanîstanê raber dike, gelê lewaz ên ku pê diwêre, hema bêje mîna pisîka bi mişk dileyze ev hêz, di hundir de Evren li ser sivîlan, weke ku li xulamên xwe yên hundir Ecewît û Demîrel dike. Di bin navê KT rojeke din bide jiyîn de, serî li rêbazên qet nehatine karanîn dide. Di vê xalê de cinewariya dayika ku destê xwe xistiye qirika zarokên xwe raber dike.

KT'yê vî şerê xwe di asta ku nehatiye ditîn de li ser PKK'ê jî ferz kir. Yên ku wî avakirine û tîpên mirovên sosret ku bi ser PKK'ê de dajo li beramberî têkoşîna Partiya me, di nava şerekî çawa de ye tê zanîn. Ev şerê xweser bi xwe jî, KT şerekî jiyanî çawa dimeşîne bi awayekî vekirî raber dike. Belê, di roja me de ji sîyonîzma Îsraîlê, ji nijarperestiya Efrîqa Başûr, dîsa di dema borî ya nêz de qala faşîzma Hîtler tê kirin. Hemû pergalên emperyalîst-kapîtalîst û di vê navberê de, rêbaza şereke taybet a van mîhrakan heye. Lê ti ji wan, bi qasî pergala Kemalîst di hêza raberkirina sînsîbûnê û helwestên dij mirovî yên xayîn raberkirinê de nînin. Weke pêdiviya mantiqê pergalê, pêşketina van mîhrakan hemûyan û li cihekî rawestîna wan mijara gotinê ye. Lê rewş ji aliyê wan ve ne bi vî rengî ye. Bê mubalexe dikare bê gotin ku, ger çîna serdest a Tirk'an bikevin ferqa vê ku tenê rêya çareseriya wan girêdayî pêşxistina pergala sosyalîste, li pênava nîviyên sermeyadaran hûrkirinê be jî, xwedî taybetmendiyeke bangewazî kirin ji pergalê re şûn de nasekinin. Tenê bila hinekî din bijîn. Rêgeza wan a tekane ev e. Çîroka Tirkitiya ji Asya Navîn qutbûn û hatin, hema bêje vê neçar dike.

Erê, vaye serê din ê vê nakokiya sosret yên din jî, rastiya Kurdistanê ye. Tevî ku Kurdistan yek ji qadên herî kevin ê şaristaniya dîrokê ye, di cewher de qadeke herî zêde ser wê hatiye girtine. Di bin zext û dagirkeriyê de ji xwebûnê hatiye derxistin, heta dawî ji dagirkeriyê re vekirî hatiye hiştin û kesayetî heta dawî hatiye taxrîbkirin. Di vir de li heq û hiqûq nayê gerîn, tu

di asta şaristaniyê de rastî ne sosyalîzm, ne kapîtalîzm, ne jî feodalîzmê dibî. Di binê her pergalekê de bi qasî karîne bixin xistine û ji bo endamên ketîbûnê li ser hebûnê ferz bikin xebitîne. Di roja me de jî ji aliyekî ve nûnerên herî sexte yên lîberalîzmê, kapîtalîzm-emperyalîzmê, hemû nexweşiyên sosyalîst ên di nava pergalê de ne, ji aliyê din ve jî meylên oportonîst, şovenên-sosyal, cihê ku tê de bejna xwe li badikin.

Bê gûman di vê qadê de ne şoreşgeriya demokratên burjuva, ne jî şoreşgeriya proleterya ger weke tê xwestin di vir de pêş nakeve sedemên vê yên pir kûr ên dîrokî hene. Ev beriya niha pir baş hatin vegotin. Lê divê neyê jibîrkirin ku, ev tinebûna neyînî, hejarî û zemînê bêkasayetiyê dafirîne, di heman demê de zemînên dîrokî yên ku PKK xwe dispêrê ye. PKK, di vê wateyê de ji geşedana polîtîka, çand û madî û manewî, bi kurtî yên ku para xwe ji pêşketina negirtine zemînekî wiha dewr girtiye. Û neyîniyên vê zemînê piştre li ser xeta Partiya me di asteke girîng de bandor kiriye. Diyardeyeke ewqas kêm hatiye fêmkirin, lê pir lewaz hatiye xistin, teşegirtina wê li beramberî KT'yê jî, eşkereye ku dê bi qasî ecêb û balkêş be, ewqas jî bi eş be.

Rewşa tevgera Partiya me jî, di navenga bi nakok de gerîn, navenga tê de pêş ketiye, jiyan kiriye û ji bo fêmkirina rastiya ku tê de têkoşîn dike, mîna ku vê rastiyê di mejiyên xwe de bikole divê bê fêmkirin. Dema ku em xwe li ser dema damezrandina Partiya me didin avakirin, serdema ku xwe dispêrê li ser Tirkiyê û Kurdistanê me tehlîl kirin, em ê li vir dûbare nekin. Dîsa Partî di pêvajoya xwe ya ciwantiyê de, kîjan lewaziyên wê hene, çawa bi neyîniyan re têdikoşe, di têkoşînên çînî û netewî yên nûjen de gelek pêşketinên bêhempa bi awayekî xwezayî û bê jan, li gel me çiqas nayê qebûlkirin û fêmkirin û vaye ji ber van sedeman em çawa neçar bûn ku lewaz derkevin da diyarkirin. Lê derketineke ji rêzê bêka rê ji pêşketinên çawa re vekiriye me destnîşan kir. Her wiha li beramberî vê derketina biçûk, rêveberiyên awarte û rejîmên leşkerî-faşîst bê navber xistina dewrê van piştrast dike. Ji bo dayîna jiyankirina Partiyê, di derve û hundir de derfet çawa hatin tengavkirin, tevî hemû zehmetiyên pêşketina derfetan çawa hat afirandin me vegot û nivîsand. Encama van pêşketinan, bi taybet di yekemîn konferansê de, piştre di civînên amadekariya xebatên kongrê de, li gorî pîvan û mercên wê demê me weke belgeyên nivîskî amade kirin û vegotin. Di dîroka têkoşîna Partiya me de asta wan deman û cihê wan di nava dîroka giştî de girînge. Têkoşîna me îro ya ku pêş dikeve, girîngiya wê demê zêdetir derdixîne holê.

Di derbarê rewşa hêzên dijmin û mûxalîf de, di wê demê de nirxandinên ku hatine kirin de îro bi awayekî peyitîn piştrast dibin. Bi taybet mûxalefeta çepgir, ji hemû aliyen ve weke ku hatiye destnîşankirin, ji ber ku di asta herî kêm de jî bi esasên şoreşgeriyê vê girêdayî nema, îro ber bi rewşa herî çareser nabe ve şemitiye. Dîsa mûxalefeta burjuvazî, îro bi mehû rezîltiya xwe derketiye pêş çavan. Ev tev di nirxandinên wê demê de weke yên îro derketine holê. Îro li ser navê cûntayê di pêvajoya sazîbûna ku jê re dibêje derbazbûna demokrasiyê, em dibînin ji hemû aliyan ve xwedana dest û bûna encama çîroka xwe nikare rizgar bibe. Belê, îro cûnta beşa dawî ya çîroka serdestiya Tirkane. Lîstok xilas bûye, rûpêş ketiye. Em dibêjin dîrok dê niha bi hemû aliyên xwe ve bê nivîsîn. Di roja me de xala ku gihiştinê ev e.

Tovên berxwedaniyê ya ku ji niha ve hemû herêm girtiye bin bandora xwe û wê di hemû aliyan de bigire, eşkereye ku ji pêşwext rizînê wêdetir, KT ku bênh ketiyê dorpêç kiriye. Îro berfirehiya pêngavên tên avêtin çiqas biçûk dibin bila bibin, ew bi xwe çiqas lewaz dibe bila bibe, hem ji aliyê dîrokî ve, hem jî ji aliyê rizîna hedefa pêşberî xwe ve, hem jî yên ku neçarin li ser van axan bijîn, ji ber ku hatiye û xwe sipartiye radeya mirinê, ev şer jênereve.

PKK ya ku berendamê rista ku Rojhilat dixwest bileyzê ye, gelek taybetmendiyên zemînê ku li ser dijî tevlî xwe dike û bilind dibe. Têkoşîna ku her roja wê soza jiyaneke nû dide pêş dikeve. Xwe gihandina nasmaneya xwe ya rast, di ser de û herêmê de ev ji xwe re çêkirin; xwe gihandina hunera polîtîk a ku dikare vê pêk bîne, fêmkirin û têkoşîna afirandina vê ye ev têkoşîn. Û ji bo serkeftina vê, şerekî divê hemû şêwazên wê bên ceribandin, em li beramberî şerêkî gel ên bi vî rengî re rû bi rûne. Gelê me yê ku hem obje, hem jî sûbjeya vî şeriye, hewl dide li dijî ji derveyî serdemê mayîna hezaran salî rabe û bi ser xwe ve bê.

Ev hemû pirsgirêkên cidî ne. Û ger partiyek, bi rastî jî di îdîaya nûnertiya vî gelî kirinê de ye, bi xwe derxistina ji pirsgirêkên vê navengê, bi vana re di encama şerkirinê de bûna bersiv, bi qasî ku dîrokî ye, neçare ku xweser û rojane be. Rastiya wî ya şênber çiqas hatibe parçekirin, kêr nehatî be jî, ew di karkeriyeke sekinî de gihandina hev, em ji tamîrkirinê bigirin, heta bi darbeyên şoreşgerî yê şahnaz ew ber bi guhertinê ve tengav kirin, divê ku bikaribin têkoşîneke dîrokî ya ku bergeha wê fireh bigirin berçav. Divê ku bizanibe serî li beramberî yên ku wî/ê înkar dikin, serdemê rake û bizanibe ji bilî vê ti derfetên jiyanê yên din nînin û pêdiviya vê pêk bîne. Dema ku em berê xwe didin vê pêwîste em xwe bispêrin wan

behremendiyên mirov ên ku bi dawî nayên û bizanibin bibin berendamên nûnertiya bijare ya mirovatiya pêşverû. Vaye, PKK tevgera daxwazkarê vê ristê û yên ku di bin daxwazkarê vê ristê ye. Ew di rewşek wisa de ye, îro ji her demê zêdetir, xwe ber bi axa xwe ve veguhestiye, dijmin nas kiriye, bi gelê xwe re hevgirtiye, têkoşîn û jiyan bi kûrahî di têkoşînê dana qezenckirinê de zêde hîn bûye.

Diyardeya PKK'ê, tenê ji hinek çalakiyan û kombûna kesên van çalakiyan pêk tîne dîtin, ger ne ji rêderxistineke bi zanebûn û înkarkirine, nefêmiyeke mezin û xwe xapandine. PKK, tevgera dîroka xwe gihandiye zanebûnê, serdema ku li ser welatekî û li ser gelê ku bê mafî li ser hatiye ferzkirin, bi zanebûnek pêşveçûyî û mafdar dijberî derketin, ji rastiya gel'ek bê têkoşîn xwe gihandina rastiya gelê şerker, ji tîpek mirov ê xilas û qediyayî xwe gihandina kesayetek herî şerker û milîtaniyê ye. Kombûn û pêkhateya van e. Yên ku ev fêm nekirine rojane çawa kul bi kul jê diweşin, hinek ji wan nefesa xwe li gel KT'yê didin, beşê din jî çawa xwe di nava piyan de dibînin rastiya ku tê zanîne. PKK, vana tev li şûn xwe hiştinê, bi erdê re kirine yek, pêşketineke abîdewarî ya ku di dîroka mirovatiyê de cîh bigire raber dike. Ev ji bo wê devjênegere. Ew neçare bibe cewhera hemû dadperwerî, mafdarî û ji vê jî wêdetir ji bo mirovatiyê, ya giştî û pêşketina herî baş û tevgereke divê bi van taybetmendiyan şer bike ye.

Belê, weke ku me beriya niha jî da dîyarkirin, me îro qonaxeke pir girîng a vî şerî bi dawî kiriye. Pêşketinên pratîkî hatin ravekirin. Heta dema nêz jî, bi talîmatên cur bi cur têkoşîna ku hatî meşandin û taybetmendiyên wê hatin ziman. Dîsa ji bo şerekî serkeftî, ravekirina PKK'ê ya bîrdozî-polîtîk û rastiyên pratîkî, di dema nêz de dûbare dûbare û bi kûrî hatin kirin. Wekî din pirsgirêkên tevgera me pê re rû bi rûye, bi çavkanî û hemû aliyên wê yên gerdûnî ve hat destnîşankirin û rêyên çareseriyê eşkere hatin diyarkirin. Pirgirêkên çavkaniya xwe ji tevgerên komînîst ên cîhanî digirtin, rewşa çêpê Tirkan, di şoreşa Kurdistanê de ji hemû aliyan ve di asta raporekê de hatin diyarkirin. Helwesta bê girtin, tevdirên bên pêşxistin hatin diyarkirin. Ji bo vê em ê van dûbare dûbare li vir negirin dest.

Ji bo derbazkirina derbenda pêngava 1985'an, yên ku çavkaniya xwe ji Rêveberiya pratîkî digirt, Partî ber bi rewşeke xeter ve bir, bi armanca rêbazekî şoreşgerî derbazkirina zivistana zehmet talîmatên biharê hatin weşandin. Hema bêje di vê dema ku hindik mabû tengavîvû lewazî tê de serwer bibe de, divê bi rûhekî êrîşê çawa derdeçûyîn çêbe hat diyarkirin. Li ser vî esasî, me berê xwe da pêngavên pratîkî. Û bi vî rengî pêngava 85'an, bû dema herî girîng a berxwedaniya navdar a dîroka Kurdistanê. 1985 bi

rastî jî berbanga têkoşîna me hatî sorkirin hemû bêhnên rizînê hatin binxistin, di asteke girîng de bê bawerî, bêcesaretî û lewazî hatî derbazkirin, diyardeya berxwedaniyê mîna nan û ava xwezayî û devjêneger lê hatî kirin bû. Dibe ku yên di nava pêvajoyê de cih girtin hejmara wan û nîtelîka wan zêde mezin neyê dîtin, lê ji aliyê dîrokî ve bi vî rengiye.

Ev sal, ji aliyê KT'yê ve bû saleke yek ji darbeyên herî mezin ji aliyê gelê Kurdistanê û ji aliyê mirovatiya pêşverû ve jî pêngavên herî pêşde hatin avêtin bû. Ji bo radeya wê û di nava rastiyê de rewş ev e. 1985, weke ku di dîroka gelek bîrdozî û tevgeran de heyî, di nava me de jî ji bo careke din qet vegera koletî û tarîtiya dema borî ser hate xîzkirin. Pir hatin hilweşandin, lê ger dixwaze jiyan bê berdewamkirin, divê ku bi cesareteke mezin ser pêşerojê de biçe û ev jî bibe rêgeza jiyanê. Ev jî divê tenê li ser pêşeng na, li ser hemû gel hatî ferzkirin, piraniya wan jî bi biryardariyeke mezin pejirand, ev jî navê salek û demekê ye.

Belê, heyfe ku ev dem dê bi raberkirina şervantiya hostayên mezin neyê navkirin. Lê dem ruhê berxwedêr, mirovê berxwedêr û taybetmendiya berxwedêr a şoreşa Kurdistanê, ji bo ku di nava xwe û serdemê de cîh bigire pêk aniye. Em dizanin gelek kêmasî hatin kirin, em ê bidin diyarkirin. Di gel zarokatiyan de, xiyanetên ketî ku hatin ferzkirin em bi awayekî vekirî dizanin û dibînin. Dikare bê gotin ku; di vê wateyê de bi qasî yên kesane, di nava xwe de yan jî di zemînên nav-netewî de, nexweşiyên sosyalîzmê, cinewariya emperyalîzmê û bi demokratgeriya burjuva, şoreşgeriya sade ya proleterya pêkanîn û ne pêkanînê, yan jî di mijara rastiya wan a xas çiye de, yek ji salên ku herî zêde van xwe tê de dane deste. Em di sala 1985'an de mirovatiyê hîn baştir dinasin. Em di vê salê de berjewendiyên ku ji aliyê bîrdoziyan ve nûnertiya wê tê kirin ên çînî û netewî baştir dibînin. Di vê salê de mijarên ku em ji pirtûkan fêr bibûn û me bersiva wan nedida ji her tiştî re, bi baweriyeke mezin û newestiyayî biryar didin.

1985, bi qasî ku şahidê me ye, sala ku herî baş me pênaseya dost û dijmin jî tê de kir, di meziniya bîrdoziya ku em tê de çarenûsa xwe, ya ku baweriya me bê dawî bû, tişta ku jê re tê gotin lafû-gûzah gelek tiştên bi vî rengî yên ku pênc quriş nakin, asta biryardariya me tê de derket. Me xwe ji xapandinan rizgar kir û bi vî rengî rêya ku ber bi şoreşê ve diçe hat vekirin. Di heman demê de di vê rêyê de bi gavên mezin ber bi pêş ve çûyîn tê de hat destxistin, ev jî heta radeya dawî hat asankirin. Êdî ji aliyê ti hêzan ve hêza wan a berevajî kirina van rastiyan dê têr neke jî derket holê. Ji hemû aliyan ve bû saleke bi vî rengî. Ev sal di heman demê de di rêya şerê ku bi

biryardariyeke gelek mezin em ketibûn navê de, ger serkeftin bê destxistin, divê ku ev şer ji hemû aliyan ve bê pêşxistin û bi yatbet jî neçariya meşandina şerekî rast ku xwe ferz dikir, di vê wateyê de êdî xwe ji nebesî û zarokatiyan dê encam neyê girtin. Kesayet nikaribe ber bi encam ve biçe, ser nebaşî û xirabiyan bê nixumandin baş jî dê nikaribe encam biguhere ev hemû jî di vê salê de derketin holê. Di vê wateyê de dem, derketiye holê ku êdî ji aliyê hêzên şoreşger ve ji bilî bi şer rêgirtinê ti çareyeke din nîne.

Di sala 1985'an de tenê ne di parçeyê Bakurê Rojava de, ji aliyê hemû Kurdistanê ve yên nexweş û nebes, rûpoşên nokeran ji hemû aliyan ve hate xistin, li beramberî vê ya rast û heta ketina rê û rêbaza rast bû şênberbûna sala van hemûyan. Bi kurtî, yên ku teqabûlî çînên serdest dike, ya herî seretayî, endamên bermahiyên serdema navîn, gel jî bê berxwedanî, di gel welatparêziya lewaz yan jî sexte û nokeriyê, berxwedaniyeke ji rêzê herî zêde jî rawestgeha aliyên berxwedêr û bû qonaxeke vê. Di salekê de pêşveçûna ku hatî destxistin, ji gelek girêdanên lingê xwe rizgarkirî, qonaxa ku herî zêde şerê azad tê de gengaz kiribû. Azad şerkirin bûyereke mezine, deskefteke mezine. Ev di heman demê de weke tê xwestin û têrker şerkirin, şerê gel ê ku taybet bi Kurdistanê tê wateya bê dudilî pêşxistinê. Vaye, pratîka dema borî ku hat jiyîn, bi destkeftên ewqas dewlemend afirînere. Di binê vê bîlançoyê de îmzaya xwînên ku hatine rijandin û îşkenceyan hatine jiyîn heye.

Dema ji aliyê her diyarde û kesî ve ya ku pêş ket, li gorî xwezaya şoreşê guncav nûjeniyek ferz kir. Ji ber van sedeman her kî ji ber lewaziyên kevin, cîhana kevin, wisa bifikire ku dê bikaribe nêzîkatî raber bike, bimeşe û vê îdîa dike, di vê rastiyê de ya zimanê safbûnê, yan jî înkargeriyeke çavkorî tê de heye. Her kî, weke dema borî bi lingê çeloxwarî, bi zanîn û dilê nebes bizanibe ku dê rê bigire, ew jî bi qasî ku nikaribe komkujiyên ber difna xwe bibîne yan bê amadekariye yan jî mîna qurbanek ji her cure xeteriyê re amade ye. Vana li beramberî şoreşa ku pêş dikeve û di navenga gerim a têkoşînê de, meylên ku nikarin derfetên jiyan ji xwe re bibînine. Ji niha û şûn ve ya ku bê pêşxistin şoreşgeriyeke zelale. Ev jî di nava me de tê wateya şerkeriyê. Eşkereye ku hêzên dijberî şoreşê yên destê wan bixwîn, ji nû ve bi dagirkirina Kurdistanê li dijberî vê şerkeriyê, wê komên faşîst yên nû derkevin pêşberî wan, her tişt di nava navengeke pevçûnê ya pir dijwar de diyar bibe. Yên ku dixwazin di nav vê navengê de jiyan bikin, pêşkevin neçarin baş şer bikin, baxivin, xwe baş rêxistin bikin û baş li ber xwe bidin. Dijberiya vê, bi ketibûn û dijminiya herî mezine. Di holê de mayîn jî, xwe mahkûmî mirinên herî xirab kirine. Gotina, "Bila rewş weke berê bidome,

ez ne alîgirê KT'yê me, ne jî yê Têkoşîna Rizgariya Netewî me, ez di nîvê de bimînim bejna xwe li ba bidim" ji dervî bûna kesê herî binketî yê vê dîrokê, bi neyêniyên binkeftî ve dagirtî, peyitîna çêkera objektîf a li ser vê bi şêwazek herî xirab wêdetir tiştekî din nîne. Ev jî di serdema me de, di pêşketina mirovatiya pêşverû de sosreteke û derveyî xwe pêkanîna şaristaniyê ye.

Dema em dibêjin: "destkefta herî mezin, di navenga şerê azad de destxistine" ji bo me em qala bûyereke gelek mezin dikin. Ev jî tê wateya ew jiyana heta ku li ser me jî tê ferzkirin, xwe ji sosreta serdemekê rizgarkirinê ye. Û vaye ev ne deskefteke kême, heta dawî ya ku divê bê ronîkirin û deskefteke divê ku nirxa wê bê zanîne. Ger azadî objeya herî bi nirx a cîhanê ye, bi destxistina berhem û axa ku dibe dayika wê azadiyê jî, herî kêm bi qasî azadiyê binirxe. Ev diyarde hem ji aliyê KT'yê ve, hem ji aliyê noker û xayînan ve hem jî di nava Partiyê de bi şêwazên cur bi cur tê nîqaşkirin. Herkes bi qasî ku berjewendiyên netewî dest dide daxive. Lê ya divê di vir de bê esasgirtin, nêzîkatî û helwestên şervane. Vaye em nûnertiya vê dikin. Ji ber vê jî em, hemû şervanên di nava Partiyê de, dixwazin bi çavê şervanekî rast li bûyerê binerin. Yên ku ji niha û şûnde wê linge xwe deynîn ser pêvajoyê, ji bo ku bibin şervanên pêvajoyê taybetmendiyên ku divê bi xwe re pêş bixin em ji wan dixwazin. Em ê ji bo ku van a bi bandor fêm bikin Rêbertî bikin, rê nîşanî wan bidin, cesaret bidin wan. Lê êdî bila tu kes ji me nexwaze ku em wan bi darên bin çengan bimeşînin, ji me nexwazin ku em wan bi lingên çeloxwarî bimeşînin, ti kes nikare vê ji me bixwaze. Êdî tişrika vê derketiye. Taybetmendiyeke li bejna ti kesê têkoşer û şervanekî nayê, taybetmendiyeke divê jê bê şermkirine. Hîn vekirîtir, êdî ev bîrîneke divê bê jêkirin û avêtine. Êdî ev dil û serî bi vê eleme nikare bijî, di navengeke ewqas azad de, êdî bi nexweşiyên bi vî rengî nayê meşîn. Şerkeriya navenga azad, ji vê re derfet nahêle.

Ger em bîlançoyê çêkin, di demên borî de qezenckirina pêşeng pêkhatiye, qezenckirina girseya me li ser esasê tecrûbeyan gengaz bûye. Ev girîngin. Lê divê baş bê zanîn, ev tenê despêkirineke neçarî ye. Ji hemû serpoşên dîrokê xwe rizgarkirin, ji bo herikîna çemê xwezayî despêkeke diviya bû sebrek wê bê kirin! Ger em di asteke teknîkî de bêjin, ev tê wateya rastbûna xeta Partiyê ya taktîkî. Lê di têkoşîna çekdarî de, tenê çalakî û gera grûbên çekdar, yan jî ji civîna tenê pêk nayê. Gelek ji dervî van û di ser van re, ji aliyê gelê Kurdistanê ve wayeteke xwe ya bûna sembol jî heye. Ya ku em jê re dibêjin propagandaya çekdarî, hinekî din jê

re dibêjin gêrîla, dijmin jî dibêje eşqîya tevgera me ya çekdarî, di emcamekî gelek kurt a pratîkê de jî, hema bêje bû ala gelê Kurdistanê.

Di Kurdistanê de çek xwedî wateyeke egîdî û merdiyê ye. Û ger ev di arasteya bîrdoziya Rizgariya Netewî ya partiyeke weke PKK'ê de pêş bikeve, wateya ku ji bo gel îfade dike, eşkereye ku dê bandora wê mezintir be. Ji serkeftin û binkeftinê wêdetir, bi çekbûn, bi çek gerîn bi xwe weke ku di çavdêriyên gelek milîtanên me de tê dîtin, gelê me vedixwîne berxwedaniye. Hema bêje mîna hêza motorê rista xwe dileyîze û rê li ber encamên bi vî rengî vedike. Bîrdoziya ku ev afirandiye û mezinbûna Partiyê, êdî ji aliyê piraniyan ve tê pejirandin û bi milyonan li derdora vê tekoşînê ref digirin. Tevî ne hevsengiya awarte ya di navbera hêzan de, dijmin nikare vê pêşketinê rawestîne.

Ev eşkereye, ne ji ber ku şer pir jêhatî hatiye meşandin, bondora mezin ya xeta bîrdozî-polîtîk ava kirî, ev heta ku gel teşwîqî çek rakirinê bike bilindbûn, ji bo têkoşîneke wiha cesaret û fedaekariya hewce avakirin û her ku diçe ev li ser dema herî har a rejîmê û înkargeriya serdemê ya xwe ferz dike ye.

Serkeftinên hîn bilindtir, şekereye ku ji nêz ve girêdayî plansaziya teknîkî û pêkanên pratîkî ye. Di vê mijarê de jî, em dizanin gelek nebesî tên jiyîn. Tevî ku hemû taybetmendiyên şerê gel di teorî de tê zanîn jî, di pratîkê de berevajî vê tê raberkirin ji aliyê hemû kesî ve tê zanîn. Ev ji xebatê gund ê eşîr û qebîleyan, ji xebatên bajêr heta şêwaza tevgera qada bejayî û heta usûlê meşa di çiyan de, di şêwaza kar û tevgerê de gelek nebesiyên heyî li holê ne. Qûrala herî ji rêzê ya şerê gel: "Dema ku dijmin kom bûn ne tu, dema ku ew paşve kişiya tu êrîş bikî" ji ber îhlalkirina vê rêgezê heta pêkanîna gelek şêwazên nebes tên zanîn. Dîsa di pirsgirêkên xwecihkirinê de gelek qûral nayên pêk anîn, ji derve tên hiştin û çewtkirina wan derdikevin. Lê ger pospêrin qûralê herî hov ên şêwaza şerê gundiyan jî, divê ku mirov van hemûyan weke pelekanên yekem ên şerek cidî pêk tînin binirxîne. Bi vê ve girêdayî divê neyê jibîrkirin ku, weke ku ev hinek caran jênerevin, di gelek rewşan de helwestên xayîn û rasetkar, dîsa di hinek rewşan de nebesiyên rêveberiyê xwe xwedî dikin, derdikevin holê û rê ji vê re vedikin.

Lê ev hemû jî, ji astengkirina pêşketina cewherê şoreşgerî dûrin. Heta gelek xebatên sererast ên dijmin li ser tevgera me ya şoreşgerî jî, xebatên çapemeniyê, xwepêşandanên hêzên leşkerî û hwd vediguherin amûrên bi hêzkirina şoreşa me. Encama ku ji vê derdikeve ev e: Şoreş, ger xwe

bigihîne axa xwe, bi lez mezin dibe. Ti zordestên paşverû, kedên sînsî û xayînane nikare wê ji vê pêşveçûna wê paş de bide.

Dema ji niha û şûn de, dê bibe rêgeha dîroka têkoşîna me ya nû. Xeta giştî ya Partiya me rastiya xwe didomîne. Rewşa şênber a siyasî, ya serdemê, Rojhilata Navîn, Tirkiyê û Kurdistanê di nivîsên Partiyê de, di ronahiya vê xetê de bi qasî tê xwestin hatiye destnîşankirin. Rewşa tevgerên cîhanî, tevgera komînîst di pîlana giştî de li herêmê, tirkiyê û rewşa wan a di Kurdistanê de, di belgeyên nivîskî yên Partiyê de hene. Bi demê re girêdayî dûbare pêwîst nake em vana bigirin dest û binirxînin. Ger dixwazin van rewşan ji nû ve bên xêzkirin, bi xwe spartina erkdarên Partiyê ya van nirxandineke rewşê pir zehmet nîne.

Di pratîka dema borî ya Partiyê de, bi taybet di derbarê aliyên pêkanînê de rexneyên ku hatin kirin diyarin. Ev rexne, taybetmendiyên cur bi cur ên di derbarê pratîka berê xwe dayîna welat de hatine ziman û nebesî hatine destnîşankirin. Di vê mijarê de jî bi qasî tê xwestin nirxandin hene. Di pratîkê de zehmetiyên ku hatine jiyîn, nebesiyên her grûbê, bi taybetî jî windahiyên me aliyê ku çavkaniya xwe ji wan digire hatine vegotin û em ê hêjî vebêjin. Ji gelek aliyan ve xeletî hatine gotin. Beşek ji van jî hatiye nivîsandin û dê hêjî bên nivîsandin. Bi kurtî dem hatiye belgekirin û bi qasî ku ji ti rêxistinê re nebe nesîb dewlemend hatiye nivîsandin. Van dûbare weke ku di dema beriya konferans û kongreyan de, dûr û dirêj nivîsandin wê me ber bi xwe dûbarekirinê ve bibe. Lê yên ku hatine destnîşankirin sentezeke wan a watedar, ji aliyê gelek erkdarên Partiyê ve dikare bê kirin û divê bê kirin.

Em gîştin dawiya pêngava sala 1985'an bi wateyeke din em gihiştin dawiya salê. Eşkereye ku ev tenê ne bi dawîkirina salekê ye, bi dawîkirina demekê û amadekariyên demeke nû dayîna despêkirinê ye.

Beriya niha jî hat diyarkirin, pêngava sala 1985'an, biryarên ku di kongreya duwem de hatin girtin, li ser esasê amadekariya pratîkeke hûrûkûr ber bi welat ve veguhestin bû. Ev jî dê bi pêngava 15'ê Tebaxê re ber bi qonaxeke jor ve birin, di sala 85'an de lezdayîna pêşketina bi vî rengî Partî xistina pêvajoya herî navdar û watedar, di wateya ewlehiya serkeftinê di dest de girtin û cewhera dîroka şerê me ya heşt salan.

Ji roja ji dayikbûyî despê kirî ve, ji xwe re di nava navenga terora şoreşa dijber de tevgera me ya ku xwest pêşketina xwe pêk bîne yanî şîdeta şoreşê ya ku gihiştiye lûtkeyê ye. Tevî hemû astengiyan jî siyaset, rêxistin û çalakî di nava hemû zorî û zehmetiyan de ya ku di vê salê de pêşxist tevgera me ya Partiyê bû. Di derbarê taybetmendî û pirsgirêkên dema borî de nirxandin

di nivîsên din de hatine kirin. Bi kurtî dema ku serdemek tê girtin nerînên sereke yên ku taybetmendî û nêzîkatiya sereke pêk tîne şênberin.

Pratîka me ya welat, îro bi têkoşîna çekdarî, têkoşînên din ên pêve girêdayî, weke ku pênaseyeke baş a qonaxa baş a ku em dikevinê amade dike, bi rêbazê kevin xebat meşandin û têrnekirina wê jî bi kûrahî dide hîskirin. Hem şerê ku dijminê ku dixwaze Kurdistanê li ser me ferz dike, taybetkirin, hem jî helwesta ku ji aliyê gel ve li beramberî vê tê raberkirin, hem jî ji aliyê Partiyê ve bi armanca derbazkirina van xebatên tên meşandin, dide diyarkirin ku em dikevin nava rewşeke nû. Dema ku em derbazî vê pêvajoya nû dibin ne binketinek, berevajî tevî windakirineke hêz a diyar jî, dide diyarkirin ku serkeftineke mezin hatiye jiyîn. Hem qanûna poşmaniyê ya ku li ser tevgera me tê ferzkirin û cerdevaniya gundan, hem jî her roj ji aliyê dijmin ve hema bêje dagirkirina gundan asta şerê me raber dike. Kûrbûna rewşa jêneder a KT'yê di siyasetê de, di polîtîkaya navxweyîde êdî gihiştiye rewşa ku nikare ser lingan bigire, bi awayekî hevgirtî ku êdî nikare bide xwiyanîkirin, bi awayekî peyitîn dide diyarkirin ku polîtîkayên Partiya me piştrastin. Ev pratîk bi qasî têkoşîna çekdarî têkoşîna siyasî jî, dide diyarkirin ku xwedî taybetmendiyeke pêşketinên mezine. Bi asanî dikare bê gotin ku bîrdoziya Partiyê hem weke pergala sosyalîst û hem jî nirxandinên serdem û herêmê yek ji nirxandinên şoreşgerî yên sereke ne. Çêkera Partiya me ya bîrdozî, dibe çavkanî û zemînê hemû curên serlêdanên me yên şoreşî. Derketinên me yên polîtîk û çalakiyên serkeftî, ji bo xwe hemû xalên pêwîst ji vir digire.

Dema ku em derbazî pêvajoyeke nû dibin, di gel xeteke polîtîk-bîrdozî ya piştrastbûyî, em pratîkeke serkeftin bi destxistî ya girîngî jî esas digirin. Ev kombûneke pir girînge. Bi taybet divê ku di vê mijarê de ji hişmendiya înkarger re bi ti awayî derfet neyê dayîn. Me bi israr bal kişand ser vê mijarê û me got; Dayika hemû pêşketinên ku Partiya me jê re pêşengtî dike, kombûn û bingeha dîrokî ya PKK'ê ye. Pêvajoyên pêşketina PKK'ê û pêkhatina wê henase bi henase, gav bi gav, seet bi seet Rêbertiya hat kirin û xeta Partiyê ya ku tê de şênber bû qet nayê paşçavkirin. Lê weke neyîniyeke heyfe, di vê xalê de hişmendiya ku dixwaze di nava PKK'ê de hebûna xwe îspat bike divê bê kirin. Ya ku dixwaze vê pêşketinê her tim bi xwe re bide despêkirin, ya ku dixwaze PKK'ê her tim li derdora kesayeta xwe ya lewaz bizîvirîne, her tim dibêje; "Ez" hişmendiya ku xwe dixe rewşa kêrnehatî ye. Me ev hişmendiya li ser me û Partiya me bi şêwazên cuda xwest xwe li ser me ferz bike bê wateyî û nebesiya wê bi dehan car

diyar kir. Em rastiya li derdora xwe nezivirînin, me got em li derdora rastiyan bizivirin.

PKK bi bingeha xwe ya gel, êşên xwe, îşkence, şehîd, milîtanên xwe yên ku dijîn, bi xet û kombûnên xwe ve bûyereke mezine. Nemaze divê ku ev bûyer baş bê fêmkirin. Ger ev rastî baş bê fêmkirin ti guman tê de nîne ku, yên ku vê serxin dê bibin mirovên mezin. Lê her kî kesayetiya xwe ya nebes û kêrnehatî li ser vê rastiya mezin ferz bike û bêje; "Min wisa kir, wiha kir, ew tenê pozbilindî xwe îspat nake. Di heman demê de weke endamekî herî zêde zirar daye PKK'ê jî rastiya xwe îspat dike. PKK kesayetiyên wiha qebûl nabîne û ev nîne. Di PKK'ê de tenê xwe ji rastiya wê re tevlîbûn heye û dîsa mîna moriyan karkirin tê de heye. Tenê ji van re cîh heye. Ji van re cîh heye, lê " Ez wisa fikirîm, min got dê wisa be, wisa rast kir, ti kêmasiyên min nînin", bi vî rengî li ser her pêşketinê û saziyê, dîsa li ser qadroyan xwe ferzkirin, xwe û rastiya xwe weke tê xwestin nasnekirin, hişmendî û kesayetiya ku naxwaze xwe nas bike re cîh nîne. Ti kes bi niyetên xwe yên sûbjektîf nikare bi avahiya Partiya me ya mezin bileyze. Belê her çiqas îtîraf nekin jî, rewşa gelek endaman bi vî rengiye. Ev endam yan qet pêşketinan nabihîzin, yan jî weke ku dixwazin dibihîzin û dixwazin araste bikin. Misoger dixwazin bibin damezrînerên PKK'a ku dixwaze derbazî dîrokê bibe. Di nava PKK'ê de cîh ji îdîayên bi vî rengî re nîne.

PKK, di rastiyê de berhema keda hevbeş, dilê bê dawî ji bo başiyê lê dide û mejiyê pêşverû ye. Navê diyardeyek ku hewl dide tiştên bi dilê paqij qezenckirî, bi îdîayên ezezî ve bikemirîne, lê mixabin ser neketiye. Di vê mijarê de neyêniyên ku derketine holê û bûyerên îbret divê ku ders bê derxistin, ti kes nekeve nava îdaya ezeziya burjuvaziya biçûk, bandorên herî kêm bilez bê derbazkirin, bi baldarî û samîmiyet ji xwe dûr bixe. Me ji roja despêke heta îro, pêkhateya ku ji nav xwe û derve tê de cih girt, pêlbûnên pir mezin ên derve û hundir û mehandinan jî, me xizmeteke gelek mezin da, me gelek tişt bi PKK'ê dan xizmetkirin û em hêjî dikin. Wê demê ger pênaseya PKK'ê ev e û Serokê wê jî bi vî rengiye, divê ku milîtanên durist bikevin nava feraset û helwestên dibe, beriya her tiştî tenê li xizmetkirinê û pêkanîna vê bifikirin. Bi rastî jî PKK'yî bûn û bi rastî bawerkirin tê wateyeke çawa? Ji pêşketin, xeta ku rêbertiyê jê re dike bawerkirin, tê wateya bûna şervanekî nebez. Weke dîyardeyeke dema kêr wî/ê tê dema ku kêr nehat jî nikare cuda nêzîk bibe. Mirov bi xwe sipartina PKK'ê dikare mezin bibe, bi wê re anûr û şerefê qezenc bike, lê bi

fêlbaziya gundîtî, yan jî bi pozbilindiya burjuvaziya biçûk ji bo ezeziya xwe mezin bike nikare kar bîne.

Bi rastî jî bi qasî ku ji ti rêxistinên din re nebe qismet, di PKK'ê de gel'ek jiyankirin, ketina nav, ji bo wê axaftin û derfetê ji bo wê jiyankirinê jî heye. Û dîsa bi qasî ku ji ti rêxistinê re nebe qismet, derfetê bûna xwedî înîsîyatîfa pêşverû ya kes û hevbeşî heye. Pêwîste rastiya me wisa bê fêmkirin. Weke pêwîstiyeke vê, hewceya pênaseya her hevalekî rast bê kirin heye. Di vê mijarê de ji serî heta binî, rexneyên berfireh hatine kirin. Rê û rêbazên ku dibe serkeftinê hatine diyarkirin. Fêmkirin û pejirandina van hebe, dengên falsol, meşên çeloxwarî, xelaya ferasetan û di ser hemûyan re ji xwe hezkirinên takekesî gihandina asta ku nayê naskirin, yan jî ji asta xwe ketin, rewşa herî xirab ya ku nayê rê ye. Dibe ku em biçûk bin, lê em hewl nedin çêkerê jî biçûk bixin û hedê xwe bizanibin. Divê ku herkes bizanibe wê çawa bibe kevirê herî baş ê çêkerê û misoger wisa jî serkeve.

Dema ku rastî di vê astê de ne, îca em îdaya hemû avahî li ser milê me bilind dibe nekin. Ger bi îadayên bi vî rengî derkevin holê, ev ji kompleksê zêdetir ti wateyeke din îfade nake. Em nûnertiya kesayetan bikin, bibin rêveber û kesên dimeşînin, lê ne rêvebirekî birokrat, mecbûriyeke bûna kombûna hemû nirxên heyî û hevgirtina wan em ti caran jibîra xwe nebin. Di PKK' ê de pêşengbûn; bûna hevgirtina dilê esîk û fikra cewherî bi giştî ya gel, bi taybet jî ya militana ne. Di PKK'ê de bûna pêşeng; bê ku ber bi rast û çep ve li ber ba kevî, li beramberî hemû curên radestî û xiyanetê, di rêya paşverû de bi wate meşîn, bi qasî ji dest tê gelek kes tevlîkirine. Di PKK'ê de Rêbertî tê wateya rêveberiyê, rêveberî ji her kesî re di nava rastiya xwe de, mafê herkesî dayîn, cîh û şervaniya wî/ê dayîne. Û di encam de di PKK'ê de bûna Serok; berjewendiyên gel û şoreşê, li beramberî hemû astengiyên çavkaniya xwe ji derve û hundir digire û heta yên ku çavkanî ji wî/ê bi xwe digire tevî hemû nebesiyan jî, bilindbûna wê bi zanabûn parastine. Çêkera rêxistinî ya Partiya me ya navxweyî, yan jî bi kurtî em qala karîgeriya wê ya demokratîk dikin; her rêxistina şoreşger dema ku pêş dikeve, dîsa em qala navendgeriya demokratîk a di nava xwe de pêş bixe dikin. Ev rêgez, di nava me de jî bi şêwaze kî baş neçare ku bi karîger bibe. Lê gelek heval, yekser van rêgezan di kesayeta xwe de bê karîger dikin. Vaye ev bûna kesê civaka çînayetî ya herî biçûk, gihiştina asta kêrnehatî û dibe nemezinbûn bi xwe, ji çêkerên xelet re rê vekirin dibe sedema gelek windahiyan. Neçare ku ev bên derbazkirin. Ev rêgez bi baldariyeke mezin, divê ku ji şêwe bê derxistin bi awayekî afirîner, dema

ku pêwîst kir navendî, dîsa dema ku pêwîst kir jî, bi civînên aliyê wan ê demokratîk li pêşin biryarên rêxistinê, çalakiyên taybetmendiyên wan ê rêxistinî li pêş bên karîgerkirin. Berevajî, wê gelek kedên erênî ji holê bên rakirin. Di serî de jî xeta Partiyê û yê ku ji pêkanîna wê re Rêbertî dike divê ku bi awayekî rast bên pêkanîn.

Eşkereye ku em bi vê xwe ferzkirin û pêkanînê na, bi cîhanîna keda hevbeş û pêdiviya zanîna vê diparêzin. Em dixwazin mafê şehîdan, bersiva êş ya îşkenceyan bidin. Em ji pêkanîna vê berpirsyarin, berpirsyarin û ti kes bi ti biyaniyan li beramberî vê dê nikaribe ber xwe bide, em dibêjin divê ku dîsîplîn û otorîte jî li ser vî esasî misoger pêk bê.

Dema ku em plansaziya dema nû dikin, nêvenga di nava Partiyê de saxlemkirin û bi taybetî jî di qada rêxistinî de ji bo xwe gihandina asta pêşwazîkirina pêvajoyê, heta dawî em dikevin sezoneke destdayî. Di van mehên ku em dikevinê de ya ku bê kirin cewhera kar ev e; nirxandineke baş a dema borî û pêşeroj li ser vî esasî ji hemû aliyan ve diyarkirin û pîlankirine. Heta ku em vê nekin em ê nekarin tiştek din bikin. Di dîroka Partiya xwe de me gelek pêvajoyên rexne û rexnedayînê jiyan kir. Her pêvajoyên xebatên teorîk û demên pratîkî piştî xwe nirxandinê dixwazin. Ev xaleke divê ku xwezayî bê pêşwazîkirin û taybetmendiya ku herî zêde me bi hêz dike ye. Ev di heman demê de rêgezeke hemû Partiyên Marksîst û Lenînîstin. Niha jî em neçarin vê rêgezê careke din bi awayekî herî hêz derbazî meriyetê bikin. Ji Rêveberiya Partiyê heta sempatizanên bingehîn, asta hemû kesî nirxandin, rista wan diyarkirin û divê rêxistina wan bê pêkanîn.

Bi taybetî di mehên pêşiya me de leza çalakiyên me ku wê kêm bibin, bi vê armancê civînên cur bi cur bên li darxistin, nirxandinên kûr bên kirin, bi ruhêkî baş rexnedayîn û bi armanca bandorbûnê, hemû araste û xebatên ne tendurist derxistina zanînê xwedî girîngiyeke mezine. Pirsgirêkên me weke ku me berê jî diyar kir, ne pirsgirêkên çavkaniya xwe ji xeta leşkerî, rêxistinî polîtîk û bîrdozî digirine. Pirsgirêka me weke ku pir zêde hat gotin û ya ku di roja îro de jî bê ku ji girîngiya xwe tiştekî winda bike didome pirsgirêka pêkanînê ye. Ev jî herî zêde xwe di qada têkoşîna çekdarî de, ya ku dibe şêwaza sereke ya rêxistina pratîkî ya me de derdikeve holê.

Dikare bê gotin ku PKK’ê, îro ji her demê zêdetir, wê bibe diyardeyeke hêza xwe ya taktîkî îspatkiriye yan na, dîsa qadroyên PKK’ê di heman demê û şêwaz de wê bikaribin xwe bigihînin asta qadroyên ku kariyera xwe îspatkirine, yan na? Bi bersiva vê pisrê re rû bi rûne. Gelek heval wiha dizanin ku bi çareserkirina pirsgirêkan ji aliyê teorîk ve dê çareseriya

pratîkî jî bi xwe re bîne. Ev du qadên ji hev cuda ne, divê ku pratîk tena serê xwe bê fêmkirin. Pratîk kedek mezin, mijûlbûn û ferasetekê dixwaze. Danasînên teorîk di vir de hinek caran astengiyê jî ava dikin. Teorî di cihê pratîkê de bicîhkirin, vaye yek ji van astengiya ne. Ji ber vê ye ku divê rasterast li ser pratîkê xebitîn û ji vê re cesaret bê kirin. Ev jî tê wateya perwerde, rêxistin û çalakiyê. Ji bo Kurdistanê, îro pêdivî bi vê heye, ne ji dîtina xetên nû û çêkirina tesbîtên nû.

Xeta PKK'ê ya ku piştrast bûye, bê nîqaş li pêşberî me ye. Lê pratîka serkeftî, hostayî, rêxistina têrker, bi qasî tê xwestin qadro derxistina holê, sewqî çalakî û rêxistinê kirin, ji bo vê pîlansaziyên pêwîst kirin, taktîkên xebateke saxlem destnîşankirin û pirsgirêka xwe bi cîhkirinê çareserkirin, pratîzekirin di asta devjêneger de li pêşberî me radiwestin. Di dema borî de, meziniya windahiyên me misoger çavkaniya xwe ji wan pirsgirêkên ku qala wan hat kirin û çaresernekirina wan digirt, ev ji aliyê hemû kesî ve tê zanîn. Di nava windahiyên me de asta ku çavkaniya xwe ji tevgera bi pergal û zanîna KT'yê digire hema bêje ji sedî ne pênc jî. Ji serî nod û pêncê windahiyên me jî, berhemê nebesiyên me yên bê zanebûnin, divê ku em vê jî qebûl bikin. Di vê wateyê de bê ku bê pirolekirin, dijminê me yê herî mezin di nava me de ye. Lê kesayet weke tê xwestin ev tê çi wateyê li ser nafikirin û araste nabin. Hewldana hevalan a bi kesayetiya xwe ya nebes jiyankirinê, bûyera ku herî zêde me dihejîne. Kes xwe nagihînin asta pêkhîneriya hostane, kariyerên xwe yên taktîkê îspat nakin û nemaze gelek tiştan winda dikin. Hem heta niha di xebatên têkoşîna çekdarî de û hem jî yên rêxistinî de hem jî di pêwendiyên polîtîk ên cr bi cur de, me êşa vê bi dayîna gelek windahiyan jiyan kir. Ev ê yek bi yek di raporên her kesî de bên ziman, her yeke di pratîkê de kêmasiyên ku ketiye nav, di ronahiya xeta Partiyê de dê bigire dest û pêşkêş bike.

Em li benda raporên di vê mijarê de ne. Lê em neçarin ku bi girîngî, windahiyên me yên ku çavkaniya xwe ji Rêveberiya Partiyê digire û nebesiyên dibin çavkaniya sereke bi girîngî destnîşan bikin. Di bingehê de ev pirsgirêk neyê çareserkirin, heta ku dê herkes çi çiqasî û çawa bike eşkere nebe, em dixwazin bidin diyarkirin ku di PKK'ê de dê kar zêde pêşde neçin. Bi niyet û hinek nêzîkatiyên xeyalî, ger hûn dibêjin em ê bibin xwedî hêza rêveberiyê, em ê tenê bi xwe xapandinê re rû bi rû nemînin, ji vê jî wêdetir em ê bibin sedema bi awayekî êş windahiya gelek qadroyan û bê navber jiyankirina binketinên trajîk jî. Wê demê rêveberiyeke Partiyê ya bi hêz û bandor, bi taybet jî ji bo Rêveberiya bîrdozî û çalakgeriyê divê ya pêwîst bike. Di rewşa çaresernekirina van pirsgirêkên navxweyî yên

rêxistinî, di têkoşîna xwe ya di derbarê derve de bi windahiyên mezin re rû bi rûbûna me dê bibe rewşeke jê nerev. Wê demê milîtanên Partiyê yên bi bandor, di serî de ji bo ku bibin milîtanên rêvebir ên Partiyê hemû tişta pêwîst divê bikin.

Me pirsa, em ê çawa bibin navendek herî baş bi hemû bingehên wê yên dîrokî ve şîrove kir. Em ê vê dûbare nekin. Wekî din ev mijar hem di axaftinê ku xîtabî navendê dihat kirin de, hem jî di talîmatên biharê de bi awayekî berfireh hatine destnîşankirin. Ji ber vê em pêwîst nabînin di vir de dûbare bikin. Mirov çawa dikare bibe milîtankî baş, uslûbê xebata milîtan, rêbazê jiyanê û pirsgirêk jî, dîsa çi ji aliyê teorîk, çi jî di nivîsên di asta pratîkî û talîmatan de hatiye destgirtin. Li ser pirsgirêka kesayet û rêbazê xebatê pir tişt hatine gotin. Em ê vana dûbare nekin. Di xebatê me de ronîkirin û zanakirin weke ku hemû girîngiya xwe diparêze, di van mijaran de bi rastî jî pirsgirêk ne ya ronîkirin, dayîna fêmkirin yan jî ya ravekirinê ye. Pirsgirêk weke ku me berê jî dabû diyarkirin, pirsgirêka xwe gihandina hêza pêkanîneke bi hêz û bandorkere.

Di vê çarçovê de, bi taybet di van mijaran de, nebesiyên ku çavkaniya xwe ji pratîkên Rêveberiya welat digire, kêmasî û mecbûriyeta misoger derbazkirina van, bi kurtî be jî em ê careke din destnîşan bikin. Dema ku em nirxandina dema borî dikin û dema nû diyar dikin, ev yek ji pirsgirêka me ya divê ku herî zêde em li ser rawestin, derxin zanebûnê û ji aliyê erênî ve çareseriya wê misoger pêş bixine ye.

Beriya her tiştî, nivîs û talîmatên Partiyê rast destgirtin, lêkolînkirin, encam derxistin, derxistina zanînê û ji aliyê erênî ve pirsgirêkeke misoger divê ku em çareseriya wê pêş bixine. Beriya hemû tiştî, di mijara rast destgirtin, lêkolînkirin û encam derxistina talîmat û nivîsên Partiyê de, dîsa di dema xwe de bi şêwazekî rast derbazî pratîkê kirinê de îhmalkariyên cîdî hene. Ji dema borî de talîmatên Partiyê weke emrekî nefêmkirin û her ku diçe nepêkanîna wan, weke ku bi partibûnê re nehevgirtin, xwedî taybetmendiyeke zirar di de vê ye jî. Divê ku bê zanîn ev rewş dibe çavkaniya hemû tengavî, têrnekirin û pêşneketinê, di serî de talîmat, hemû nivîsên Partiyê, li gorî cewherê ku hatiye diyarkirin guncav bên pejirandin, mercekî bi vî rengî heye. Îca yên ku ji aliyê Rêbertiya Partiyê ve tên kirin, divê ku weke emrekî jiyanî bên destgirtin, bi rêbazê herî berhemdar û guncav bên pêkanîn, mecbûriyeteke mîsoger divê bê pêkanîn û merca sereke ya di asta herî kêm de bûna Partî û partîbûnê ye. Di derbarê çawa pêkanîn, fêmkirin û destgirtina pozîsyona Rêbertî de, di talîmatên berê de bi awayekî berfireh hatine nirxandin. Eşkereye ku ev vala vala nehatine

kirin, ji ber ku di pêkanînên rast de ji rêderketin hene. Divê ku her kes baldarî nêzîk bibe û rista xwe bileyze. Disa divê ti kes xwe neke navend hele hele xwe nexe şûna sekreterya. Hema bêje ev di nava gelek qadro û milîtanan de nexweşiyeke berbelave. Ne pêdiviya Partiya me bi vê heye, ne jî ev mijareke bi van îdayan pêk were ye.

Di PKK' de otorîte, hemû curên çavkaniyên dîrokî û rojane yên rêbertiyê û wateya wê hat destnîşankirin. Ev jî ne weke zanyari dayîneke dîrokî, weke bûyereke diviya bû şênber bibe û pêkanîna sazîbûnê, fêmkirina pozîsyonê, ji bo avakirina sazîbûneke wiha û bi armanca misoger pêdiviyên wê pêkanînê hatiye kirin. Di Kurdistanê de bi rastî jî çawa dikare bibe navend hat vegotin. Heya ku şertên wiha neyên pêkanîn, li ser navê navendê meşandina xebatan, yan jî bi van îdaya tevgerîn li ser jiyan û xebatên Partiyê wê rê ji çi texrîbatan re veke hatin diyarkirin. Dîsa hat diyar kirin ku, ya jê tê bawerkirin, rista dîrokî ku qala wê tê kirin, ya ku serkeftina xwe îspat kiriye, li dûv Serokatî meşîn û di vê wateyê de yekane û hevgirtina Serokatî, nemaze bi rêxistinbûn û mecbûriyeta vê, Rêbertiya Partiyê ne weke hebûnekî fanî, yê ku ji pêkanînên rojane re fermandariyê dike, di vê wateyê de weke saziya divê emir û talîmatên wî bi awayekî bandor û di nava hemû şert û mercan de bên pêkanîn bê destgirtin. Ji ber ku li gorî pêdiviya pozîsyona xwe ya dîrokî-rojane û hem jî ya rêxistinî-pratîkî hemû xebat û pêkanîn di binê berpirsyariya Rêbertiya Partiyê de ne. Bi helwestên şexsî û tasarûfan li ser van destwerdan nayên kirin.

Yekser ji aliyê çavdêriyên milîyanan ve jî derdikeve holê ku, tevî ewqas pêkanînên xeter û bi kêmasî, dîsa ewqas êrîşên arasteyî têkoşîn û rêxistinê tên kirin. Di dema xwe û asta têrker de bersiv nayê dayîn. Ger em di hemû qadan de qala pêşketinan dikin û ev jî diyardeyeke ji aliyê hemû kesî ve tê pejirandine ev di encama xebatên berfireh û pêşbîniyên Rêbertî de, xeta Partiyê di navengê de bi pêkanîneke serkeftî ya li ser şertan hukum dike. Di encam de bi xebatên pratîkî yên rojane, bi kombûnên bingehîn ên çalakî û rêxistinî pêkanîn ve gengaz dibe, êdî divê ev bê dîtin û pejirandin. Ev ji bo ku bi taybet em balê bikişînin ser vê mijarê diyar dikin. Rêbertiya Partiyê ji aliyê mekan ve dibe li vir ango li wir be. Lê ew hem li Ewrûpa, hem li derveyî welat û di welat de di nava xebatên rojane de ye. Divê ku ev rastî neyê jibîrkirin û dema ev rewş tê nirxandin pêwîste kêmasî neyên kirin. Yên ku mekanê Rêbertiyê weke filan cîh didin diyarkirin, meylên dagirkerî û yên çavkaniya xwe ji wê digirine. Bi zanebûn ango bê zanebûn bi gotin û tevger, bi kurtî bi fermiyeta Partiyê dîsa neketina nav rewşên bi Partiyê re

dikevin nakokiyê, rist di cîh de destnîşankirin û erkên wê divê ku êdî bên pêkanîn.

Bi qûralên herî kêm ên partîbûnê re bi awayekî misoger dikeve nav nakokiyan, rê li ber gelek texrîbat û windahiyan vedike. Ev meyla takekesî û her ku diçe Rêveberiya ferdî weke neyêniyeke dibe sedema jiyîna xeteriyên cur bi cur û pêşketinên rêxistinî asteng dike, tevî hemû hişyarî û ravekirinan jî hêjî hebûna xwe didomîne. Em di derbazkirina vê de bi israr û ferzkerbûn û ji niha û şûnde jî em ê vê bidomînin. Di bingeh de ya ku berhema nerîna teng a burjuvaziya biçûke û bi gîştî weke ferdiyeta rewşenbîran xwe dide der ev meyil, îdaya wê çi dibe bila bibe, ji bingeh ve rêxistinbûnê, tabîbûna otoriteyê qebûl nake yanî meyleke heta vê radeyê jî xwe ferz dike. Di asta rêveberiyê de derketina vê jî, xeteriyê asteke din zêdetir dike. Bê encamiya vê meylê, ji paşeroj û bûyerên ku hatine jiyîn jî diyare û li holê de ye. Divê ku mirov nekeve nava hesabên şaş û di meylên şaş de israr neke. Ji ber israrkirina di van meylan de, windahiyên rê jê re vekirî, dem û qadroyên ku ji dest hatî dayîn, di nava Partiyê û rêhevalan de texrîbatên ku hatin avakirin tên zanîn. Divê ji bûyerên dema borî ku bi îbretan dagirtîne û pêşketinan ders bê derxistin.

Ji aliyê herkesî ve xwe navend dîtin, xistina şûna sekreteryayê rewşeke pir zêde tê dîtine. Bi heman şêwazî talîmatên rêbertiyê û biryarên Partiyê, di serî de bi safoka xwe re derbazkirin, yan jî li rendeya xwe dayîn, bi qasî ku guncav dibîne û bi şêwazê ku guncav dibîne nexweşiya pêkanînê jî bi vî rengî ye. Lê ev qet nayê qebûlkirin û divê neyê qebûlkirin jî. Ev rewş, encax dema ku biryara tevlîbûna partiyekê bê dayîn helwest wê bê raberkirin. Lê pîştî tu bûyî partî îca tu di asta pêşde di qademeyên rêveberî, navendê de cîh bigire û bikeve nava helwestekî bi vî rengî. Ancax weke cudabûna nerînan, di hemû astê de cudabûnê re derkeve holê, wê demê ev vekirî destnîşankirin, di nava qûralên diyarkirî de, divê ku rewş ji rêxistinê re bê vekirin. Kesek herî zêde di nava Partiyê de dikare vê bike. Ger na hem li gorî pêdiviya talîmatên Partî û Rêbertiyê tevnegerîn, nepêkanîn û hem jî ravenekirina vê nayê qebûlkirin. Ev bê xwestekbe jî dê rê li xirabkarî û hilweşêneriya herî xirab veke.

Bê ku di ferqa wê de bin jî ketina rewşên bi vî rengî xeter û şaş hatine jiyîn. Divê ku rexnedayîna vê bê kirin. Ji vê jî wêdetir, divê ku dev ji vê pozîsyonê bê berdan, misoger xwe gihandina pêkanîneke serkeftî û hêz, feraseta vê ya rast. Ji bo serxistina vê, hîn bêtir di bin bandora çînên bêgane de, di dervî qeyd û bendên kes ji xwe re ava kiriye zêdetir ti asangî nînin. Ger bi rastî jî bawerî bi hêza Rêbertiya Partiyê ya ku hatiye îspatkirin heye,

ji bo bûna milîtanên serkeftî û afirînera vê, ji rêzê ne teqlîkgeriya rêbertiyê, lê yê ku ew baş fêm kiriye, bi biryar, taktîkger û weke pêkhînerê vê tevgerîn çêbibe. Ev jî ne bi îdakirina mirovên bi vî rengî bûnê ye, ev bi helwest û tevgerîna xwe dayîna hîskirinê re jî na, bi pratîkeke serkeftî û îspatkirî, pîvanên Partiyê di kesayetiya xwe de di asta herî jor de temsîlkirine. Xwe gihandina kesayeta milîtaniya ku pênaseya wê hatiye kirin dikare bê serxistin. Ger na, ne bi teqlîtgeriya ji rêzê ya rêbertiyê, ne jî hêjatiya xwe dispêre siloxantiyê, ne jî bi neqebûlkirina pîvanan, ya ku hîn zêde lihevanîna wan bi xwe ye ku xwe mîna qasidên rêbertiyê dîtinê jî nabe.

Ji asta jor heya herî jêr, dîsa feraseta Rêveberiya ferdî, birokrat û mudîr jî, misoger divê êdî dest jê bê berdan. Bi vê îca di nava şert û mercên me de ne dikare şer bike, ne jî şer rêve bibe. Ji ber van sedeman divê ku ya ku di hevbeşiya pêwîst de derbaz nebûye, nehatiye erêkirin û di fermiyetê de derbaz nebûye, otoriteya şexsî neyê qebûlkirin û bê rexnekirin. Rêveberiya Partiyê li gorî esasên hevbeş meşandin merce. Mercê vê yê sereke jî, di gel yên din de bi qasî ku şert û merc guncavin hemû şoreşgerên ji biryaran berpirsyarin tevlîkirin, bi qasî ku derfet hene wan tevlî pêvajoyên biryardariya pratîkî kirin, bi vî rengî xwe gihandina biryardariya hevbeş derdikeve holê. Yanî dawî anîn li meyla biryargirtina kêyfî ya ferdî, ji Rêveberiya kêyfî ya ferdî re mecal ne dayîne.

Zirara van helwestan, hilweşîneriya wan dûbare dûbare pêwîst nake em vebêjin, bi encamên xwe ve di holê de ne. Pêkanînên çors ên rêveberî, helwest û ferasetên erzan ên Rêbertîkirinê, dema ku mirov li pratîka hevalên di asta herî pêş ên rêvebir û qadroyan dike, bi taybetî pêwendiyên bi qadro re û ji aliyê navenga navxweyî ya Partiyê, tê dîtin ku rê li texrîbatên gelek mezin vekiriye. Tevî ku gelek caran hatiye diyarkirin jî, ji aliyê rêbertiyê ve bi giştî, bi taybet jî di Kurdistanê de ji aliyê tevgera me ve mercên mecbûrî ku divê pêk bîne heye. Heta ku ev neyên pêkanîn, li bermaberî qadroyan hinek caran jî heta ku digihêje hilweşînkariyê ferzkirinên rêbertiyê li ser wan kirin, hebe nebê otoriteya Partiyê, rêzdariya ku rêbertiyê afirandiye û hêza otoriteyê, bi awayekî herî xirab karanîn yan jî dibe xwe spartina “kerameta wî ji wî maqûltir.” Di vê mijarê de di serî de sekreterya giştî, jiyana kesên ku di pêkhatina rêbertiyê de alîkarî kirine, mecbûre baş bê fêmkirin û pêk anîn. Nêzîkatiyên nebes û sûbjektîf heta radeya dawî xeterin û heta niha gelek zirar dane. Qet nebe ji niha şûn ve devji van meylan berdin, xwe bigihînin asta pêkanîna pratîka tê xwestin û rista xwe bileyzin.

Bi vê pêşengtiyê bi taybetî jî bi pêwendiya kadro re û mijara rast wan di rêvebirinê de, bi qasî têr dike bi wan re eleqedernebûn, bi awayekî rast erkdarnekirin û venerîn nekirin, ji wê jî wêdetir nêzîkatiyên neyênî û yên ku rê li ber texrîbat û windahiyên giran vedike, nebesî û kêmasî hatine raber kirin. Qadroyên me, bi şêwazekî qet me qebûl nekiriye û em ê qebûl nekin fedekarî ji wan hatiye xwestin yan jî vi awayekî vekirî bi tirsonekiyê hatine tawanbarkirin. Ev li gorî me rêveberiya nebes, kevnarên xwe, ji pîlan û bernamê, ji lêkolîn û lêgerînên cidî mehrûm, ferasetên Rêbertiya evîndarê xwe, sergirtinê dike armanc hêjabûnên eşkerene ku hatine kirin. Propaganda “qadroyên li Başûr hema bêje bi zor di sînor de tên derbazkirin, bi zorê kar bi wan didin kirin” dikin, daxivin û heta ji me re jî dinivîsînin. Taybetmendiya diyarker a qadroyên me, fedakarî û cesarete, îro ji aliyê dost û dijminan ve hatiye qebûlkirin, tabloyên serkeftina erzan xêzkirin, tevî vê meyla qadroyên me jî, ji bo belavkirina vê îmaj, xebat û çalakiyan, ev helwesta ku tê raberkirin û hêjadîtin. Hem di mijara fêmkirin û ya rast pêkanînê de, wê kedeke têrker raber neke hem tevî vê jî wê îdayên wiha bike, ev nayê qebûlkirin.

Li gorî ku egîdî îro bi awayekî zelal derketiye holê, xwediyên vê îdayê divê ku bisekinin û bifikirin. Vaye ya ku ji qadroyan hêvî dikin tam jî ev e. Berxwedaniya pevçûnekê! Ji ber ku qadro tengbûna vê ferasetê, seranserî, bê pîlaniya vê dibînin, bi awayekî mafdar û tengezar tevdigerin. Qadro û şervanê ku ne xwedî xwe bicîhkirineke diyar, rêveberî, pîlansazî û veneriyê ne, îro weke kesên ku hemû rastiya şer dijîn, ger rista xwe bi egîdiya çend pevçûnan ve sînordar nekiribe, xwe ji hişmendiya întîharê dûr girtin, bi şoreşgeriyeke aqîlane û pîlan xebitîn, xîretkirin mane hewlesta herî rast û ya tê bendewarkirine? Wekî din ruhê êrîşê jiyankirin dikare ewqas teng bê destgirtin? Mane divê talîmat wisa bên fêmkirin?

Carekê divê ev qet neyê jibîrkirin. Ger ne niyet xirabek yan jî rastgirekî sererast nebe be, ji bo yekî bi armanca şerkirinê tevlî refên PKK’ê bûye, nemaze ji bo qadroyên wê yên hatine ceribandin, mijarên fedekarî û cesaretê nîqaşkirin, bi taybet jî di vê qonaxê de bi zanebûn an jî bê zanebûn kar ji şûnde destgirtin, berevajîkirin, şoreşgeriya erzan û ferasetên rêveberiyê rista xwe ya di neyênî de û berpirsyariya xwe veşartine. Mînak; dema ku di derbarê qadroyan de ewqas darizan dike, hevalê Hemîd Avci çawa şehît ket, girêdana vê bûyerê bi rêbaz û pêkanînên rêveberiyê re, polîtîkayên li Başûr tên pêkanîn û demeke dirêj di derbarê vê qadê de, pêwendiya bi ferasetên li vê qadê re heyî, qet destnîşan nekirin, agahiyeke rast û durist nedayîn tê çi wateyê? Divê ku ev nêzîkatiya li beramberî

qadroyan bê terikandin, rêzdar bin û pirsgirêk rast bên fêmkirin û rast bên destnîşankirin. Jiyana navxweyî ya Partiyê bi girêdana hevaltiyê re hûnandin mecbûriye. Wateya vê diyare. Li şûna hevkişandinên rê ji zirardayînê re vedikin, fesadî û tengezariyan, ya ku her kes her kesî bi hêz dike, rêzdarî û kelecanê ji hev re şîret dikin nêvengek Partiyê misoger serwer kirin neçarî ye. Bi kurtî ji aliyê Partiya me ve pîvanên ku li ser milîtanan tên ferzkirin neçariya xwe gihandina van pîvanan heye. Tê zanîn di demên borî de ketina nav gelek helwestên bi vê re nakok û heyf ku hêjî dikevin nav. Lê divê ku bê zanîn ev tawanekî rêxistinî ye. Di gel ku dijmin gelek ji vê sûd werdigire, yekser ji ber van helwestan gelek rev û hwd jî di nav de, rê li ber gelek texribatan vekiriye.

Dîsa weke rêbazeke pêkanîna rêveberiyê ya şaş, însîyatîf û rola qadroyan, heta radeya dawî hatiye tengkirin. Lê eşkereye ku ev nayê wateya kar nedayînê, lê ji wan re weke pêwîst rola xwe lîstina wan, di nava navenga feraseta şoreşgeriya pêgîştî û li ser esasê kargeriyek rêxistinî ya rast, perwerdeya qadroyan berdewamkirin û van hemûyan, bi tevlîkirina wan a ji xebatê û biryarên hevbeş re di asta têrker û amadekirî de tevlîkirin, di wateya wan mezinkirinê de eşkereye ku heta dawî hatiye tengkirin. Ji wan re nêzîkbûnek leşker an jî şervanekî ji rêzê nayê kirin. Ev weke ku kombûna wane, rêberê ku şoreşgerç şoreşa me ye, tê wateya pêdiviya qadroyên damezrîner înkarkirin û paşçavkirinê.

Di vê xalê de divê ku qadro jî, devji bendewariya xwe ya ku hemû tiştî ji jor û rêveberiyan hêvî dikin berdin. Xeta Partiyê ya ku bi talîmatên berfireh hatiye vekirin, di qadên peywirê de divê cesûr, afirîner û hewldanvan bê tevgerîn. Dema ku karê herî ji rêzê tê kirin jî li şûna fermanê çibe xwe paşdedayîn û ketina nava bendewariyê, divê ku ji xwe bawer bi ser pratîkê de biçin. Ji kêmasiyên ku dê derkevin netirsin. Bi awayekî girêdayîmayîn bi qûralên kargeriya Partiyê û navendgeriya demokratîk, li beramberî biryar û pêkanînên xelet, dîsa li beramberî helwestên xwe ferzker ên şaş, di dem û cihê xwe de, li gorî terbîya tê xwestin bi qasî têr dike divê helwest bê dayîn, bê rexnekirin û raporkirin. Ji bo nebesî û xeletiyên bi vî rengî dernekevin holê, bi giştî qada peywirê û berjewendiyên Partiyê parastinê de, bi taybet di mijara rast pêkanînê de divê ku bandorker bin. Ji bo vê însiyatîf bi awayekî rast karanîn, hem mecbûriyeke hem jî erke. Divê ku li gorî hêza xwe ji pêşxistina pratîkê ti kes xwe paş de nede. Bi qasî dikare pratîk pêşxistin, gelek pratîk kirin û pêşxistin bibe taybetmendiyeke me ya girîng. Qadro di vê çarçoveyê de di qadên xwe yên peywirê de divê ku şêwazên çalakî û rêxistinî yên demkî, aloz ên rêxistinî û çalakiyê bibînin û di qadên

xwe de pêk bînin. Misoger divê ku xwe bigihînin kariyera vê ya taktîkî. Tevî ku hemû curên fedekariyan dikin jî, berhema ku ji wan tê xwestin dernexistina holê çavkaniya xwe ji vê digire. Weke din bandora me ya bîrdozî-polîtîk a bi hêz, di pratîkê de jî pêşketineke ewqas bi hêz afirandinê divê ku xwe tamam bike. Qadro di dema pêşiya me de, divê ku di taktîk de jî xwe bigihînin asta bandorkeriya ku dikarin vê nebesiyê derbaz bikin. divê xwe bigihînin asta milîtanên ku pir dixebitin peywirên aloz dimeşînin, karan li gorî despêkê dixin rêzê û encamên pratîkî denetim dikin. Dema pêşiya me hinekî jî bi derbazkirina vê nebesiyê dê bê qezenckirin.

Bi mijarê ve girêdayî, yên ku ji aliyê rêveberiyên pratîkî tênê ve bi şêweya gazincan tînin ziman, lê yên ku derbazkirina wan di nava berpirsyariyê de ne, di asta bîrdozî de li jêr mayîn, yan jî paşde mayîn divê ku li ser esasê rexne û rexnedayîneke têrker bê derbazkirin. Ev kêmasî yek ji sedemên esasî yên ku Partiyê dikeritînine. Divê ku yeke pratîkên xwe rapor bikin, nebesî û destkeftiyên xwe, di ronahiya xeta Partiyê de binirxînin, hedefên ku li pêşiya xwe danîne di kîjan astê de pratîze kirine, nekirine û sedemên wê deynin holê.

Li gorî ku sedema windahiyên me çavkaniya xwe ji rêveberiyê, berpirsyarên yekeyan, mercan û ji îhmalkariyên kesan digire windahî ji çi re dibin mal, bi dersên ku ji van tê derxistin divê bi hûrkariyên xwe ve bên belgekirin. Di hêmanên weşanên Partiyê de windahiyên me û wateya wan nirxandinên giştî hatine dayîn. Bi van ve girêdayî, şehîdên demê cihê wan ên di têkoşîna Partiyê û berxwedaniyê de, divê ku berfirehtir bê nirxandin. Endamên xayîn û radestkar, çavkanî, nîşane, tevdirên ku hatine girtin, texribatên ku rê jê re vekiriye, pêwendiya wê bi xiyanetên dema borî ên têkoşîna rizgariya netewî û Partiyê re, muqayesekirin, dijmin çawa dixwaze ji vê sûd werbigire, di vê astê de derketin holê. Divê di xiyanetê de para bê tevdiriyê, nebesî, asta berpirsyariyê, di dem û cihê xwe de helwest negirtinê, ger di vana hemûyan de serkeftî nebûne, sedemên wê, ger serkeftîbûne encamên ku derketin holê dê çawabûna bên ravekirin.

Belê, divê vana hemû bi ruhê rexne û rexnedayîneke rast bên destgirtin ji Rêbertî û hemû Partiyê re bên raporkirin. Bi vê ve girêdayî, ya ku divê li gorî rewşa şênber a xeta Partiyê guncav bên pêşxistin, danasînên Rêbertiyê, di nirxandinên hemû milîtanan de esas girtin, weke pêwîstiya kevneşopa partiyên Marksîst-lenînîst û quralên Partiyê ne. Peywirdarên Partiyê, hemû nirxandin û raporên xwe divê ku bi jêgirtin û danasînên dewlemend ên Rêbertiya Partiyê pêş bixin. Divê ku ev di asta kevneşop de werin pêkanîn. Hevbeşî û nemaze esasê yekîtiya Partiyê ev e. Ne ku her kes li gorî xwe

rapor bigire, rapor û nirxandinên xwe li ser esasê spartina belgeyên fermî amade bike. Ev di heman deme de amûrekî perwerdê ye.

Yek ji xalên herî zêde tê îhlalkirin, lê pêkanîna wê jî mecbûriye, rapor, nirxandin û di nivîsandinan de, di xitaba sazî û yekeyan de bê uslûbî heye û pîvan nehatine girtin. Di serî de Rêbertiya Partiyê, ji hemû yekeyan re di asta saziyan de, divê ku li gorî xitabê fermiyeta Partiyê guncav be. Êdî em Partî ne, ev rastî divê di hemû astan de baş bê fêmkirin û peyitandin. Piraniya nivîsên ku ji sekreteriya Partiyê re tên şandin bi sernivîsa “ ji hevalê A” re despê dikin, yan jî ger bi niyeta rapor hatibe nivîsandin jî di asta name de girtina dest heye. Eşkereye ku di serî de sekreterî, ji van sazî yan jî ji hevalên cuda re name dikarin bên nivîsandin, lê divê vana li şûna raporan neyin danîn û bi vê re neyê tevlîhevkirin. Şêwazên xelet ên di vê mijarê de pêwîste bên derbazkirin. Belê, Rêbertiya Partiyê jî di nav de, naveroka xitapkirina saziyan, bi xwe sipartina Partiyê diyarkirin, rastiya pratîka xwe şaşiyên wê, nebesî û têrkariya wê, divê bispêre vê û îspat bike. Yek ji rexneyên girîng jî pêwîste di vê mijarê de bên dayîn.

Diviya bû ku navenda me ji van mijaran re pêşengtî kiriba. Di vê astê de israra hevalan di ferdiyetê de çêkerê jî bandor dike. Ji niha û şûn ve her peywirdarek Partiyê, dema ku fikrên xwe û gavên xwe yên pratîkî şênber dike, guncavbûna van bi danasînên Partiyê re, mecbûre vekirî û nivîskî bike rapor. Ji aliyê Rêbertiya pratîkî ve jî pewsîte di vê mijarê de di asteke fêrker de talîmatek bê pêşxistin. Tevî ku mijarek demek beriya niha jî hatibû diyarkirine, pêşxistina herkesî ya rapora xwe pêşneketiye, ji defter girtina bîranînan heta lêgerîn û lêkolînan, daxwaza belgekirina xebatan û jiyana şoreşgerî nehatiye pêkanîn. Vana erkên divê ku bi girîngî li ser bên rawestîn û pêkanînin.

Dema ku em mijarê bi dawî dikin careke din dîyar bikin. Bi rastî jî gelek helwest û tevgerînên divê rexnedayîna wan bên kirin hene. Di serî de jî milîtanên Partiyê yên pêş, divê ku her kes ji Partiyê re vekirîbe. Pewîste ti kes vêna weke guneh derxistinê negire dest. Berevajî, ji bo derxistina zanîna van pêşketinan yek ji amûrên herî bi hêze. Weke din çiqas zehmet bê dîtin jî rexnedayîneke vekirî û durist, sozeke ji Partiyê re hatiye dayîne, ji bo bi hêz ji vê derketinê jî, neçare ku vê çekê jî bi hêz kar bîne. Rexnedayîn divê ne weke xwe rehetkirinê, ne eciqandinê û ne jî weke amûrekî rê li ber tawanbariyê vedike bê dîtin. Rexnedayîn di nava me de amûrekî bandorkirinê ye û pêwîste ev amûr bi awayekî herî hêz bê karanîn.

Îro, roja ku em demekê bi dawî dikin û dikevin zîvroneka despêkirina dema nû. Nirxandina ku bê kirin, bi rexne û rexnedayînan re, bi armanca

pir bi hêz destnîşankirina dema nû, di derbarê pêkanînên dema borî û yên ku hêjî di meriteyê de ne, rexne û nirxandinên xwe dîsa em ê hewl bidin di çend xalan de bi kurtî bînin ziman.

Di serî de, şêwaza tevgera grûbên çekdar, di bûyer û pêşketinên rojane de jî weke ku bi asanî derdikeve, ji nirxandineke cidî, plansazî û tevdîran dûre. Çawa dikeve gundekî, êrîş li ser hedefekê çawa tê kirin, hinek caran di van mijaran de taktîkên leşkerî jî nehatine pêkanîn. Mînak; em ê êrîşî ser hedefeke dijmin bikin. Carekê her kes dizane dijmin milîs avakirine, kemîna davêje derdorê û di her gundekî de têlsizek bi cîh kirine. Lê tevî van hemûyan jî, bêtevdîr û bê keşif ketina nava gundan, ne rewşeke kêm tê dîtine. Divê baş bê zanîn ku, piraniya windahiyên me ji ber vê çêbûne. Lê rastî rêveberiyeke ji rêzê jî, di vê mijarê de girtina tevdirên pêwîst de zehmetî jiyan nake.

Beriya daketina gundan, li derdorê kemîn hene an nînin, telsiz û milîs kîne tesbît kirin gelek zehmet nîne. Bi heman şêwazî, bê bandorkirina van jî wisa ye. Yek ji van tedbîrên sereke jî, mînak, hedefa ku divê lê bê xistin hêzên dijmin ên di gund de hatine cîhkirin ne bi qasî hejmara wan, bi giştî xwe gihandina serdestiya jimarê û tevgerîn, darbeyên mezin lêdan û bê ku windahiyan bide paşvekêşan pêkanîne. Çiye xwe gihandina serdestiya hejmarê? Di dema çalakiyê de hêzên me anîna gel hev komkirin û pêkanîna vê, bi kurtî bi komî êrîşkirine? Em nikarin rêbazên feodalan ên yeke yek şer dikin bipejirînin. Weke ku ev berevajî feraseta me ya şer dikeve, tê wateya ku derfetên me yên heyî rast naxin tevgerê. Ji bo xwe gihandina serdestiya hejmara ku qala wê tê kirin hêza me heye. Milîsên ku qala avakirina wan tê kirin, ji niha ve goşegir bûne. Feodal û reîsên eşîretan ên ku qala wan tê kirin, ancex dikarin malbata xwe, qabîle û di astekê de jî ji derdora eşîreta xwe hinek grûbên milîsan ava bikin. Ev jî herî zêde dikare xwe bigihîne hêzekî 40-50'î kesî. Di Kurdistanê de ji vê qelebalixtir hêzê milîsan nayê avakirin.

Wê demê dema ku bi ser avaniyeke wiha de çûyîn çêdibe çima bi hêzeke kêmtir biçin? Ger li gorî qûralên wê tevgerîn çêbe û pêwîstî werin pêkanîn, bi vî taktîkî ti hêza milîs nîne ku ji holê neyê rakirin. Dîsa ger ev hatibana pêkanîn, di mehên dawî de windahiyên li dûvhev Partiya me pê re rû bi rû ma dê bihatana jiyankirin? Jiyankirina van li aliyekî, pêşketina Partiya me bi yekeyên çend kesî re hereketkirin û ketina wan a nava kemînan dê çawa bê ravekirin? Ma em ê van bi awayekî cidî îhlalkirina taktîkên şoreşgerî ve nenirxînin? Başe, mafê ti kesî ya kirina vê heye?

Yek ji xisûsên girîng jî pirsgirêka xwe bicîhkirinê ye. Eşkereye ku heta xwe bicîhkirineke baş dernekeve pêş em ê zehmetiyan bijîn. Dema ku em qala xwe bicîhkirinê dikin, yekser em qala xwe bicîhkirinên sabît nakin. Yên ku em qala wan dikin hîn zêdetir, di noqtên cuda de yên ku bên afirandin, yanî yên hereketlîne. Di qonaxa ku têkoşîna me giştiyê de, pêdiviya tevgera me ya xwe cîhkirinê di holê de ye, hema bêje mîna çûkên ber bi bahozê ketiye, jixweber li derdora her gundekî xwe bicîhkirinê re çi pêwîstî heye? Çiyayên me ji bo xwe cîhkirina qala wê tê kirin heta dawî guncavin. Bi kurtî cihên binerd ên veşartî, çareseriya pirsgirêka me, ji bo serxistina peywirên leşkerî-siyasî û rêxistinî mecbûriyeteke. Ji bo vê gelek herêmên me yên xwedî girîngiyeke stratejîk hene. Qûrmayên me yên şer ku diviya bû ji sê sal berê hatibana avakirin, çareseriya van pirsgirêkan, êdî divê bi şêwazê herî guncav bê pêkanîn. Heta ku ev pêk neyê rê li windahiyên xirabtir nayê girtin. Ji ber ku di vê xalê de xisûseke cîdî tê binpêkirin.

Dikare bê gotin ku, di van mijara hemûyan de dema me nû dest bi şoreşgeriyê kiribû jî, rewşa gelek tiştên ku em fêr bibûn nepêkanînê heye. Ger hinekî din zehmetî bihata jiyîn, pêkhate û hejmara herî serkeftî afirandin, hedef tengkirin û tecrîtkirin, perçe perçe herêmên ku hatibûn qezenckirin gihandina yekparetiyê, beriya navçeyekê çend gund xistin, beriya çend navçeyan tenê navçeyek xistin, bi kurtî parçe parçe qezenckirin û bi vî rengî di hemû qadan de belavbûneke wekhev û hevseng pêkanîn pir jî zehmet nebû. Di mijara şer bi vî rengî berfireh, di hemû herêman de bi hevsengî pêşxistinê de, em dizanin ku gelek peywirên bi vî rengî nehatine pêkanîn. Heta niha jî em li bendê ne ku hevalên pratîkê jiyan dikin, di serî de jî Rêveberiya pratîkî ya li welat, vana hemûyan li ser esasê agahdarkirinek perfireh di raporên xwe de binivîsin. Bi taybet ji bo berê xwe dana pêşerojê û afirandina plansaziyeke bi hêz, divê ku nebesiyên di vê mijarê de û peywirên ku nehatine pêkanîn bi awayekî baş bên vegotin. Tevî ku zêdetir dikarê bê serxistin, çima me ewqas winda kir, tevî ku me dikarî em derfetên serkeftinê zêde bikin çima me kêm kir? Di van mijaran de hebûna mînaka pir neyîniyan nayê înkarkirin. Wê deme ev hemû li ser esasê rexnedayîneke samîmî destnîşankirinê ve divê em rastiya xwe ronî bikin.

Heta ku ev neyên pêk anîn, weke ku di dema nû de pêkanîna meşeke serkeftî gelek zehmete, wê di demên pêş de windahiyên me zêdetir bibin û heta gelek bêşansiya ku di zivistana 1984-85’an de hatin jiyîn xiraptir bê jiyîn. Ger naxwazin bikevin nava van rewşên ku hatin diyarkirin, neçare ku

xwe bigihînin taktîkên xebata rast, rêveberiyeke têrker, hêza venerîn û rêvebirinê.

Dema ku em ber bi demeke nû ve dimeşin, têkoşîna me weke ku di salên 1979-80,1981-82'an de bû rewşeke ji 1983-84'an gelek pêştir dijî. Îro ji her demê zêdetir ji xwe bawer me xwe gihandiye xala şerkirinê. Ev hem gengaze û hem jî pêşketina encamek xwezayî û neçariyê ye.

Pêşketin dê ji niha û şûn ve çawa bin? Eşkereye ku, rizîna rejîmê ya navxweyî dê bidome. Di asteke girîng de bi fikar be jî, bi taybet pevçûnên di navbera koma leşkerî-medenî ya xwe dispêre Emerîka de modela Evren-Ozal derbaz bike. Ger bermahiyên demokrasiya burjuva jî bigire nav xwe, pêşketina koma di pêşengtiya Demîrel û Ecewît de ya ku hîn zêdetir ji aliyê Ewrûpa ve tê destekirin, dîsa nakokiyên di navbera komên din de, dê têkoşînên navxweyî zêdetir bike. Vana wê rejîmê di nava xwe de lewaz bikin û di asteke girîng de zirarê bidin hevgirtin û yekîtiyê. Dema ku li vana hemûyan pêşketina mûxalefeta dînî û hewldanên rêxistinên faşîst ên ji nû ve xwe rêxistinkirina yên mîna MHP'ê, ji aliyê din ve tevî hemû lewazî, kêmasî û reformîstiya xwe, mûxalefeta çepgir jî, dîsa weke hêzeke xwedî potansiyeleke girîng li pêşberî wan raweste. Heta em îhtîmala her ku biçe radîkalbûna çepgiran jî tevlî bikin, ew yekîtiya ku KT'yê weke mînak dixwaze, diwarê hevgirtinê dê negire, li milê rast û çepê ve ew xwe li hev rakişandinên ku kûr dibin, eşkereye ku wê ji bo me heta dawî rewşeke guncav bafirîne.

Dîsa polîtîkayên KT'yê ên derve, bi dewletên cur bi cur re astengî û komployên ku dixwazin di derbarê me de ava bikin, wê dîsa sernegirin. Pêwendiyên wî ên bi armanca taktîkî û demkurt, bi qasî ku niyeta wan derbixe holê wê têk biçin û ew qadên ku dixwaze ji bo me bike qadên ku tê nayê jiyankirin, wê bibin qadên pêşketina me. Îro Ewrûpa hatiye vê astê. Di biryarên dawî yên parlementoya Ewrûpa de ev eşkere derketiye holê. Ya ku weke rapora BAF'ê tê pênasekirin, rapora herî dawî parlamento pejirand, di asteke girîng de di binê bandora têkoşîna me û xebatên me yên şênber de derketiye holê. Pirsgirêka Kurdistanê veguhastina navenga navnetewî, bi vî awayî di asteke girîng de hatiye pêkanîn. Di serî de Yûnanîstan, gelek hêzên di eniya NATO de ber bi qadeke bandorkirina wisa ve hatine kişandin. Weke ku di mînaka Bûlgaristanê de vekirî derdikeve holê, her çiqas li ser esasekî rast xwedî li pirsgirêkê dernekevin jî, di asta nav-netewî de bi pirsgirêkê re eleqederbûn, xwe ji helwestên dema borî rizgarkirin giştiye xaleke pêş de. Di Rojhilata Navîn de rewşa destdayî ya tê zanîn hêjî didomîne. Eşkereye ku, di van qadan de di dema

pêşiya me de têkoşîna me wê bi ti awayî paş nekeve, berevajî, qadên ku mijara gotinê ne karê têkoşîna me weke qadên karê yêdek destgirtin, em ê karên hîn serkeftî lê bimeşînin. Di vê mijarê de em ê ne bikevin nava xeyalên xam, ne jî em ê rastiya qada nav-netewî paşçav bikin. Weke demên borî ji niha û şûn ve jî em ê van qadan hemûyan bi sebreke mezin bixin xizmeta şoreşê.

Wêjeya rejîmê ya di derbarê geşedana Kurdistanê de zêde ser nagirin. Hêmanên jiyana aborî û civakî ya li Kurdistanê, bi qasî ku neyê tarîfkirin xirabe. Ji aliyê mêtîngeran ve êdî tiştekî ku bidin wan nemaye, gelê welatê me ji her demê zêdetir di ferqa vê de ye. Di asteke girîng de taybetmendiyên mêtîngeriya Tirkiyê û kapîtalîzmê fêm kirine. Bi pratîka taybet a ku dijî, tecrûbeyên ku bihaya wê nîne dest xistiye. Naveng bi qasî ku bi ti demê re neyê muqayesekirin destdayiye. Teqîn, hêzên sosyal yên ku ji tevgera rizgariya netewî û Partiyê re bibin bingehê sereke ewqas zêde bûne ku, bi karekî ji rêzê bi qasî bikaribe berhemên gelek mezin dest bixe guncav bûye. Îro ji dervî dagirkeriya leşkerî ya vekirî, ti hêz û pêkanîn ne di rewşa li ser pê girtina dagirkeriyê ne. Hêzên kevneşop, feodal-komprador, noker di nava revê de ne. Bi rastî jî êdî dema girse bi rêya hêzên eşîret-feodal, di binê otorîte û venerînê de girtinê derbaz bûye.

Çalakiyên Partiyê ev pêvajo lez kiriye. Poltîkayên Ozal ên veberhênanê ku dixwaze pêk bîne, di derbarê sekinandina vê revê û hilweşînkariyê de ne, lê ew nokeriya klasîk a di dema DP (Partiya demokrat) û AP'ê(Partiya Adaletê)) de heyî pêk anîn, bi qasî ku careke din nikaribe zindî bibe hilewşiya ye. Ji ber vê ye ku rejîm xwe dispêre cerdevanên çekdar ên gundan. Ev pêşketineke vekirî ya bingehê civakî bûna dewletê di Kurdistanê de nîşan dide. Tevî hewldanên xwe yên bi vî rengî jî, mêtîngeriyê bi tevdirên di qada aborî û civakî de girtine, her roja ku derbaz dibe çawa ji kar dikeve bi awayekî vekirî dide nîşandan. Heta dizane bi zindîkirina Partiyên burjuva û hewldanên wan ên hêvî ji çepgirên sexte jî zêde rewşeke bawerî bide nafîrîne. Ji ber vê jî hewl dide hêza xwe ya artêşê belav bike. Di hemû gundan de bi cîh bike, bi awayekî vekirî hêza milîsan pêş bixe. Di dema borî de weke ku li Vîetnamê, îro jî li Salvadorê û Fîlîpînan tê dîtin bi kurtî bi qasî ji dest tê hêmanên şer berfireh bike û vê bidomîne.

Ger bi kurtî em bînin ziman, dema ku em ber bi dema têkoşîna nû ve diçin, navenga objektîf heta dawî kamil buye. Ji bo şikandina vê dijmin bi polîtîkayên xwe re bikeve nav nakokiyê jî, berê xwe dide polîtîkayên razemeniyê. Tevî hemû hewldanên rejîmê û spartekên derve û hundurîn

kombûnên şoreşgerî ku hatine destxistin, ji ber pratîkên zehmet ku hatine jiyîn, girse mîna kevan vedizelin, bawerî û zanîna gelê me pêş dikeve.

Li dervî welat, ji bo pêşxistina alikariya madî û manewî, di serî de jî Ewrûpa, raya giştî ya nav-netewî digirin bin bandora xwe. Ger hinekî din bê taybetkirin, Ewrûpa di hemû qadan de pirsgirêk û alikariya girse di wateya ber bi platformên nav-netewî ve veguhestinê de rolên baş dilîze. Di xebatên propaganda, xebatên siyasî û di rêxistinkirinê de ji aliyê xebatên di derbarê Tirkiyê de rewşeke dest dayî ferz dike. Xebatên li qada …. bi alikariyên ji aliyê madî û manewî ve dide rista xwe dilîze. Xebatên …… tevî hewldanên paşverû ên di vê qadê de serwerin jî, weke berhemê bandora me ya polîtîk li Rojhilata Navîn pêş dikeve, alîkarî dike. Partiya me di Rojhilata Navîn de vediguhere alîkariyeke madî û manewî û alîkariya girsêyên ku digihêjin sedhezaran afirandiye. PKK ji aliyê herêmê ve ji aliyê hemû hêzên ku giraniya wan heye, weke hêzeke girîng û rista çareseriyê dilîze tê dîtin.

Partî û têkoşîna me, di vê qadê de êdî giştiye xaleke wiha ku ti kes nikara înkar bike. Rojhilata Navîn di pîlanên pratîkî de perwerde, xwe bicîhkirin, ragihandinê de rista xwe ya dîrokî lîstinê didomîne. Dîsa Rojhilatê Kurdistanê di nava rewşa şerê niha heyî de ji ber rewşa xwe ya objektîf, ji aliyê têkoşîna me ve risteke biçûk neyê dîtin dilîze. Li Başûrê Kurdistanê jî bi çavekî ji hemû aliyan ve hatiye windakirin nayê nerîn. Bi taktîkekî hostane û bi xebatên kûr, mirov dikare di vê qadê de jî teqînên mezin pêk bîne.

Hêza pêşeng a Partiyê ku xwe dispêre vê çarçoveyê, di ezmûnên girîng re derbaz bû. Di nava pratîka welat de, me çêkera civakî û arazî baş nas kir, xwe gihand taktîkên şer ên hostane. Di vê navberê de, hejmareke girîng qadro jî me ji dest da. Lê xebatê telafîkirina vê hat domandin, didome. Bi govdeya sereke ya tevgerê re, di welat de bûyîn, ji bandorên neyînî yên Başûr xwe rizgarkirin, di welat de îspatkirina pêşketin û xwedayîna jiyankirina tevgerê, yek ji destkeftên herî girîng ên di dema borî de me bi dest xistiye. Di asta bîrdozî û siyasî de, teşîr û tecrîda hêzên reformîst-noker ên rastgir, hem ji aliyê pratîkî hem jî ji aliyê nivîskî ve di asteke girîng de hat pêkanîn. Li ser esasê têkoşîna pratîka bîrdozî-polîtîk şovenîzma sosyal hatiye teşîr û tecrîtkirin, hişmendiya înkarger a şovenîst tenê hatiye hiştin.

Jiyana Partiyê, xwe gihandiya naverokekî dewlemend û radeyek mezin. Bi taybet jî di rêxistinkirina ciwanan de, ev veguheriye hêzêke amade.

Di dîroka Partî û gel de zemînekî bi hêz ên bi derfetên mezin dagirtî hatiye afirandin. Ger kêmasiyên cîdî neyên kirin û ji xirabûnên dema borî li gorî tê xwestin dersên têrkar bên derxistin, ev ê gelekî me bi hêz bike. Em dikarin bi taybet û girîngtir diyar bikin, ji pratîkên borî dersên pêwîst derxistin, hêmanek wisa ye dê yekser bi qasî vî zemînî me bi hêz û berhemdar bike.

Em dikevin demeke ku em taybetmendiyên wê wisa diyar dikin. Dema ku ev taybetmendî bi qasî tê xwestin bên dîkatkirin, girîngiya dema nû, hinek nîşaneyên wê hêj ji despêkê ve tespîtkirin gelek zehmet nabe. Eşkereye ku têkoşîna me, ji aliyê nûnerên rejîmê ve jî rasterast nebe jî weke ku ji neçarî qebûl dikin, tevî rêbazê xebata nebes jî ne binketin, xwe gihandina asta pêngaveke mezin û hêzeke wiha qezenc kiriye. Vê têkoşînê, tevgera me ya rizgariya netewî gihandiye qonaxeke dîrokî. Rêbertiya ku partiya me ji vê jî dike hatiye îspatkirin. Bi derbazkirina van hemû astengiyên derve û hundir ve serkeftina ku xwe gihandiyê, polîtîkayên dijmin ên zirav û çors ên hêzên şovenên sosyal bi erdê re kir yek. Berdevkên rejîmê yên pêşhatî, Kenan Evren di vê mijarê de gelek tengav bû. Bi nokeran re polîtîka û komployên dimeşandin hatin deşîfrekirin û teşîr kirin. weke encamekî taybetmendiya dîrokî ya vê nejêderketina mezîn a nokeriya kevneşop, meylên milîsên har di parlementoya KT'yê de bi awayekî vekirî anîn ziman.

Bi kurtî ji bo ku qonax serkeftî bi dawî bibe, rewşa van hemû hêzên ku qala wan tê kirin serûbin kir. Weke ku di hewldanên Paûl Henze de bi awayekî vekirî anî ziman, DYE'yê jî xist nava nirxandina rewşa nû û lêgerînên polîtîkayên nû. Tê zanîn ku ev li Ewrûpa ji kûr ve tê jiyîn. M. Alî Bîrandê ku berdevkê bijare yê burjuvaziya Tirkane û li gorî polîtîkayên lîberal ên Tirkan tevdigere, di nivîsa xwe ya di derbarê ketina rojeva perlamentoya Ewrûpa ya pirsgirêka Kurdan de, tinebûna polîtîkayên înkarger ên çors ya KT'yê, di van platforman de li Tirkiyê feraseta pirsgirêka Kurd nîne bêçaretî û bêzariyê eşkere radixe ber çavan. Bandora pêşketina li ser polîtîkayên welatên sosyalîst, dîsa hatin diyarkirin. Lê dikare bê gotin ku, pêngavên ji aliyê têkoşîna me ve hatin avêtin û pêşketinên hatin jiyîn, herî zêde jî bandora xwe li ser nokeran ava kir, ger gotin di cîh de be li dilê wan da.

Di Kurdistanê de çînên serdest, bi taybet jî hêzên eşîret, nîv feodal-koprador, yên di rewşa netewaparêzên noker û hov nûnerên wan ên di roja me de di qonaxa tinebûnê de ne. Şerê Iraqê yê dawî aqûbeta ku qala wê tê kirin heta tu bixwazî nêzîk kiriye. Li Rojavayê bakurê Kurdistanê çêkera

çepê Tirkan û yên di nava pêwendiyên nokeriya kapîtalîst de hatine helandin ev hêz, di roja me ya îro de ne di rewşa ku bikaribin bersiv ji denglêkirinên lewaz netewparêz ên ji aliyê Îran û Iraqê ve tên kirin bidin. Ne jî di rewşa bersiv dayînê de ne. Di Başûr û Rojhilat de, ji aliyekî ve Îran, ji aliyê din ve Iraq di asteke girîng de ev hêz di nava mekanîzmayên xwe yên şer de helandine. Weke hêzeke serbixwe qala van hêzan kirin jî êdî gelek zehmete. Texribatên çavkaniya xwe ji van digire hêjî didomin. Di asta ku xwe bispêrin hêzên hemû curên faşîst û mêtîngeriyê de ne. Bê ku em nav diyar bikin hemû, li derve bi emperyalîzmê re, di hundir û herêmê de jî bi hêzên mêtînger re bê ku ti qûralan nas bikin dê bikevin nava hevkariyê û li ser vî esasî bixwazin darbe li tevgera şoreşgerî bidin divê bê zanîn. Dibe ku gelek caran weke pêwîstiya taktîkê wan eşkere lê nedin, lê ji aliyê feraset û nêzîkati ve, ji vê re vekîrîbûna wan, bi taybet jî dema ku dest li berjewendiyên wan ên madî û bazirganî hat dayîn, yan jî di kêliya ku mêtîngeriyê ji wan re rêya berjewendiyê nîşan da wê bibin qatlîamkerên herî mezin, divê ku ev bê zanîn. Di van mijaran de gelek tişt hatin gotin. Ji aliyê dîrokî û civakî ve bingeha van hat diyarkirin. Ji ber vê em ê careke din amaje pê nekin.

Divê ku mirov vana weke blokekê bibîne. Li bermaberî pêngava me vaye PDK'yî û bi şêwazê Yekîtiyê û bloka ku li derdora van kom bibû hema bêje şok man. Vana ji ber sedema cudabûnên ku xwe dispêre demên berê û rewşa xwe ya nebes dikare bê gotin ku belawela li beramberî pêngava 15'ê Tebaxê hatin girtin. Tevî vê jî li beramberî pêngava me ya şoreşgerî, ev heta dawî ketin nav bertekeke paşverû. YNK'ê (Yekîtiya Nîştîmanê Kurdistanê) li Ewrûpa xwest tevgera me bi tawanbariya terorîzmê tecrîd bike û rê li ber pêşketina wê bigire. Yekîtiya çepgir û pêncan pêş da û ev kampanyaya xwe kûr kir. Berteka paşverû ya baskê xwe raformîst dizanî bi vî awayî şênber bû. Lê li dijî neteweparêziya noker-reformîst, ji dema borî ve, bi taybet têkoşîna ku di eniya bîrdozî û siyasî de hat meşandin, teşîr û tecrîda wan pêk anî. Bi vî awayî li derdora beşek ji xulamên navdar ên Ewrûpa partiyeke nû, yan jî tevî hewldanên avakirina blokeke din, di asteke girîng de ev bê bandor hatin hiştin.

Partiya me di Rojhilatê Bakurê Kurdistanê de derketineke serkeftî û hemû curên hewldanên linavbirinê, tasfiyekirinê vala derxist, pêşketinên ku hatin destxistin herî zêde jî li ser bingeha PDK'a Iraqê kir. Vê blokê, pêşketin rasterast weke bûyerên darbe li pêşketina berjewendiyên wan dixe dît û ev ji kûrahiyê ve hîs kir. Çiye taybetmendiyên vê blokê, kêm be jî divê bê destnîşankirin.

Ev beş, yê ku hişyariya xwe ya çînî heye û ya ku rastiya civakî û dîrokî di asta herî jor de dijî, hêzekî çînî yên ku taybetmendiyê wan tê zanîne. PDK ya Iraqê rêxistina vî çînî ye. Weke din ew, Partiya ku herî zêde rûpoşê Kurdîtiyê daya ser rûyê xwe ye. Rewşa xweser a vî hêzî di nivîsên din de jî hat diyarkirin. Lê divê ku em dîsa jî bidin diyarkirin ku, şerê vana yê serweriya giştî li ser Kurdistanê didome. Ya ku ji serweriyê jî fêm dikin, hakîmiyeta mûtlaq a îfadeya xwe di serdestiya feodal û hev de dibînê ye. Di tifaqên taktîkî yên ku ketine nav de hêzên ku bi wan re ketine pêwendiyê weke amûrê helandinê dibînin. Weke ku pir paş tê zanîn PDK'a Iraqê ji dema borî heta roja me ya îro di hemû tifaqên bi hêzên cur bi cur re pêş xistine her tim ew hêzên din mîna cîgirê xwe hiştinê bûye. PDK ya Iraqê ji vana hemûyan encam girtiye, derketiye jor. Vana xwe weke begên divê ku di Kurdistanê de her kes ji ber xwe ve wan binase û serî li beramberî wan bitewîne dibînin. Ji bo vê ye ku di vê qadê de kî çi bike, ji wan pirsînê hema bêje mafekî xwe yên rewa dibînin, hemû pêşketinan bi destura xwe ve girêdayî dihesibînin.

Ji ber di sala 1975'an de ew binketina mezin a anûr şikand, devji vê helwesta xwe berdana wan û ev feraset gelek belave bû. Lê di 1985'an de, bi taybetî di kurdîstana navîn de, weke ku ji hewldanên wan ên ambargo dayînê jî derket holê, ji bo ku berjewendiyên xwe yên malbatî û xanedanî bigirin bin ewlehiyê, bi qasî ku bi hêzên emperyalîst û heta yên faşîst re bikevin nava hevkariyê giştibûn asta çavsoriyê. Yek ji taybetmendiyê wan a girîng jî, di dema borî de ji Osmaniyan, di roja me ya îro de jî bi KT'yê re mîna pêwendiya hukumdarê biçûk bi yê mezin re tê dîtin û kêm be jî li ser esasê xweseriyê pêwendî û girêdana wan e. Di vê wayetê de, di roja me ya îro de helwesta wan li beramberî KT'yê û pêwendiyê wan bi vî hêzî re, di bingeh de berhemê kevenşopeke dîrokî ye. Di Başûrê Kurdistanêde dema ku tevgera gel herî zêde pêşketiye de jî vana, pêwendiyên xwe bi DYE û KT'ê re gihandine lûtke.

Vaye PDK'ya Tirkiyê jî di zemînekî wisa de ji dayik bû. Di 1972'an de kêm be jî yê ku welatparêzî temsîl dikir Dr. Şivan bi komployekî tasfîyekirina wî, li şûna wî Derwêşê Sado, S.. û kesên weke wî derbazkirin, rasterast li ser esasê daxwaza MÎT'ê pêk hatin. Ji wê dîrokê heta niha ev rêxistin, li dijberî gelê Kurdistanê û tevgera welatparêz-şoreşger, di kontrola MÎT'ê de veguherî komploya hevbeş, amûrê tasfîyê û linavbirinê. Ev amûr, ji bo rê girtina li pêşketin û girtina bin venerîna xwe ji rêxistinên hatin çêkirinê yên mîna MHP'ê hîn bandortirîn û amûra rasterast a venêrîna MÎT'ê li ser Kurdistanê ne.

Ev amûr, heta 1985'an ji aliyê tevgera PDK ya Iraqê ve di 1985'an de darbe xwar û xwe di radestkariyê de razand, di rewşeke bê bandor de ma. Lê ya ku ji vê valatiyê xwest sûd werbigire bi pêşengtiya YNK ya ku reformîzma burjuvaziya biçûk, dema ku xwest bikeve qada serweriya wê, vê amûrê bi rêya Samî Ebdûrahman ve, hevkariya bi MÎT'ê re ji nû ve zindî kir. Di encama hevkariya ku hat pêşxistin de, darbeyeke mezin li YNK'ê dan. Yek ji sedemên herî mezin a vê jî, ji ber ku YNK ne di bin kontrola vê şebekeya hevbeş de bû, hîn zêde di bin venerîna Sûrî de bû. Bi vê darbeyê re, pêwendî û hêza YNK'ê ya di wê qadê de bi erdê re kirin yek. Dikare bê gotin ku, ev hêz ger heta roja îro jî nekariye bi ser xwe ve bê û ewqas ketiye nav neyêniyan jî, yekemîn pêngav bi vî rengî pelçiqandine.

Hewldanên Samî yên komîteya demî veguherandina serweriya xwe, ji aliyê Barzaniyan ve qebûlnekirina vê û ji derve jî xwe sipartina serweriya Îranê, nakokiya ku di nava vê blokê de derket holê heta sala 1984'an jî dewam kir. Ji ber vê jî amûra PDK'a Tirkiyê, di vê demê de zêde wate qeznc nekir û nekarî bixebite. Vana hemûyan ji bo ku em xwe di wê qadê de bicîh bikin heta radeya dawî rewşeke guncav afirand û me jî ev fersend baş kar anî. Yek ji sedemên herî girîng ê xwe bicîhkirina me ya wir jî, eşkereye ku nakokiyên vê komê ne. Dîsa ji ber sedema nakokiya vê komê, hevgirtina PDK'ya Tirkiyê ji holê rabû. Di demeke vê belavbûnê de di vê komê de serwer bû pêngava 1984'an teqî. Di dema derketina pêngava 1984'an de nakokiyên di navbera PDK'a Iraqê, YNK'ê û Samî de giştibûn xala pevçûnê, Îran jî, ji tifaqa bi Tirkan re di asteke girîng de qut bibû. Tevî xebatên sîxuran ên xwe ji vê qadê xwedî dikirin û li dijberî tevgerê kar tanîn, di serkeftî pêkanîna pêngava 15'ê Tebaxê de bandoreke girîng a vê parçebûnê heye.

Vana di despêkê de pêngava 15'ê Tebaxê weke serlêdaneke dê dawiya wê neyê girtin dest, tevî şaşwaziya jiyan kirin jî, zêde neketin telaşê. Li gorî wan li dijberî KT'yê şer nedibû. Heta zivistanê jî ew di nav bendewariyeke wisa de bûn. Weke din jî ji ber rewşa wan a me qalê kir, ne di rewşeke pêşxistina tevdîrên rê girtinê de bûn. Lê dema ku tevger bê ku ji holê bê rakirin zivistan pêşketî derbaz kir, berê van da tevdirên cîdî. Di vê navberê de yê ku tapuya Kurdistanê li ser xwe hesab dikir IKP û hêzên weke din darbeyên siyasî yên kujer li wan dan. Dema ku amadekariyên wan ên 20 salan vala derketin, hêviya van jî piştî çend meh berxwedaniya tevgerê, bi şêwazê ku wê piştî çend mehên din tevger bibe Başûr bû, ev jî wan ber bi nirxandineke bingehîn û hewlest girtinê ve bir. Helwest ev bû; di Rojhilatê Bakurê Kurdistanê de, pêşketinên di pêşengtiya PKK'ê de pêşketinên ku

dawiya wan bi aniya bû. Wê demê ji bo rê lê girtinê, diviya bû tevdîrên lezgîn bihatan pêşxistin û misoger pêkanîn. Ev tevdîr jî ev bûn;

Pêwîste bi rêya CUD, PKK li Başûr bi sazûmanî bê tasfiyekirin.

Divê demekê zûtir devjî nakokiyên nav xwe berdin û dest bi hevdîtinan bikin. Dema ku van pêşketinan despê kir, Samî tevlî CUD'ê kirin, dîsa yekser di navbera PDK Irak, PDK Îranê û YNK'ê de hevdîtin despê kirin, KUK û Bênc jî tevlî vê yekîtiyê kirin, tê zanîn ku vana hemû girtin Başûr û xwestin li dijberî me rêxistin bikin.

Vana hemû wê di asta jor de bi ferzkirinên Tirkiyê re di nava hevde bên destgirtin. Belê, yekser di bin perpirsyariya Rêveberiya PDK Iraqê de tedbîrên xistin meriyetê, PKK ber bi tasfiyê ve birin dikirin hedef. Ji bo vê gelek civîn lidarxistin. Generalên Tirk bi reîsê eşîretên Kurdan re hevdîtin çêkirin û biryarên cur bi cur girtin. Ji me re jî di gel bangewaziyên vekirî ku em xwe radestî wan bikin, dest bi hejandina darê destê xwe kirin. Lê ev rewş ji aliyê Rêveberiya me ya Partiyê ve li wir di demê de nehat dîtin, bi tevdîrên bi hêz persiv jê re dayîn û di demê de helwest girtinê de, ketin nav nebesiyên cîdî. Vê jî em, di biharê de li beramberî rewşeke xetar rû bi rû hiştin. Lê xebatên Rêbertiya Partiyê, ji bo ku di Rojhilata Navîn de navendi bibe, tesfîyegeriya li Ewrûpa rabibû ser piyan vala derxistin, hêzên me ber bi welat ve veguhestin û ji bo bilindkirina berxwedanê ser bikeve û ji aliyê rêbertiyê ve helwestê rast ferzkirin serîlêdanên bi vî rengî vala derxistin. Ger vana hemû pêk nehatibana û ber bi Başûr ve vekişandin çêbiba wê hêzên me her yek ji wan ketiban bin baskê tasfiyeger, komplogeran, wê ber bi kesên weke Silêman û Ziyat ve bihatana kişandin û belav kiriban.

Van hêzan ji bo pêkanîna armancên xwe yên ku qala wan hat kirin, li ser sînor xebatên eşkere meşandin. Polîtîkayên xwe yên li navbirinê li vir eşkere derxistin holê. Şehîtkirina hevalê Hemîd Avci, encamê vê polîtîkayê ye. Weke din ev daxwaz û pêkanînên KT'yê ne û bi KT'yê re di nava hevkariyeke çawa de ne diyar kiriye. Mijara 30 km. PKK ji Kurdistana navîn dûrxistin, bloka ku qala wê tê kirin, weke dirêjiya CUD'ê hewldanên serwerkirina wan e. Bi wateyeke din, dîsa bi Tirkiyê re di nava hevkariyê de hewldana bi rûpoşa Kurd avakirina pergala venerîn û linavbirinê ye. Bi kurtî tevgera me di xala xebat û rewşa van hêzan de bi mînaka "Balî Kombetar" re rû bi rû ye. Nêzîkatiyên van hêzan ên di derbarê tevgera me de danîna çekan û hwd. bi KT'yê re hevbeş tê meşandin. Li beramberî vê KT wan hîn zêde bi çek dike, aligirên xwe di asteke mezin de efû dike, bi polîtîkayên aboriyê yên Ozal re, di qada civakî de jî dixwazin zindî bikin. Li beramberî têkoşîna me, îro Paûl Henze li parlemento, konseya

ewlekariya mîlî, çepgirên tasfiyeger û neteweparêziya noker gotin bi gotin heman tiştî dibêjin. Lê têkoşîn tevî vana hemûyan jî, bi taybet jî di mehên Îlon û Cotmehê de, bê ku windahiyên zêde bên dayîn hat meşandin. Ji bo xwe gihandina hêza girseyî şerên serkeftî hatin meşandin.

Belê, ev pêşketin tevî hemû astengiyan jî hatin destxistin, lê ger dixwaze dema borî baş û bi şêwazekî rasteqîn bê zanîn, divê ku bê diyarkirin, bi taybet pratîka Başûr û di mijara pêwendî bi PDK'ê re, di demên borî de kêmasiyên mezin hatin kirin. Di van mijaran de ketina nava meyla rastgir derket pêş. Di cewherê xwe de bi windahiyên mezin re rû bi rûbûna me îhtîmalekî mezin bû, ger me ev bi windahiyên pir kêm derbaz kiriye ji aliyekî ve tesadufe, ji aliyê din ve jî ya esasî ji ber pêşketinên giştî yên Partiya me û bicîhbûna wê bûye. Ger na xefkên ku di Başûrê Kurdistanê de hatibûn dayîn, xefkên ku rêxistinek ji binî ve îmhakirinê bûn. Heval îro rewşê baştir dibînin. Dizanin ku tevgerîna hevalên rêveber ên bê dem û nebes yan jî gelek derengmayî di windahiyên me de xwedî pareke mezine. Dîsa tevdîrên ku em qala wan dikin û rewşa me ya giştî nebûya, wê ev windahî hîn zêdetir bana.

Bi mijarê ve girêdayî, di derbarê taybetmendiyên xebatên li ser sînor, her çiqas demên borî gelek tişt hatibin gotin jî, bi kurtî em careke din diyar bikin. Qûralêkî li sînoran kar nayê kirin nîne û ti carî jî tiştên wisa nehatine gotin. Ji aliyê du heta sê hêzên mêtînger ve em dizanin hevdîtin tên çêkirin, armancê van jî li dijî tevgera me avakirina herêmên sînorin. Ev bi rêya nokeran li ser me ferz kirin. Lê me ji wan re got ku em ê vê qebûl nekin, ji bo ku sînor veguherin qadên berxwedanê, avakirina taktîkên guncav û ji bo vê çi pêwîst be kirin, bi taybetî jî di xala Kurdistana Rojavayê Bakur û Başûrê Kurdistanê de ji xwe bicîhkirinê guncav heta pêşxistina şerê gêrîla, me got ku ji meşandina gelek karan xwe şûn de nedin. Di van mijaran de talîmat û nirxandinên pêwîst hatine ragihandin. Ji bo vala derxistina van polîtîkayên paşverû ya ji dest tê divê ku bê kirin, wê bê kirin jî. Ji aliyekî din ve di avaniya van de gelek endamên durist û meylên welatparêziyê jî hene. Bi teşîrkirineke têrker a rêberên vê tevgerê, wan gihandina asteke êdî kêr nayên, divê ku neyê jibîrkirin mirov piştî vê dikare wan ber bi şoreşê ve jî kanalîze bike. Ji bo xwîna gelê me di van qadan de rijandiye vala neçe, em dûbare diyardikin ku divê meylên welatparêziyê bên pêşxistin. Ji bo avakirina yekeyên guncav bi baldarî nêzîkatî bên raberkirin, li gorî derfetên me nêzîkatî ji pirsgirêkê re û bê ku bigihînin asteke xeter, bi awayekî pîlansaz nêzîkatî bê kirin û qad bi şêwazê herî bi hêz bê nirxandin.

Di meseleya pêwendiyên bi PDK Iraqê re asta ku hatiyê careke din xalên ku em dixwazin diyar bikin bi kurtî ev in; PDK Iraqê ne tenê Başûr, bi şêwazekî hemû Kurdistanê digire berfirehiya xwe, hêzekî berjewendiyên nokerî, aborî, civakî û siyasî yên çîna feodal diparêze ye. Weke ku di sala 1975'an de bi awayekî vekirî derket holê, pêwendiyên wan ên xeter bi emperyalîzmê û başverûtiyê re hene. Bi vê ve girêdayî, helwesta reaksîyoner a ku ev hêz li beramberî têkoşîna me ketiye nav, divê ku tenê bi ferzkirinên Tirkiyê ve girêdayî neyê destgirtin. Pêwendiyên wî bi Tirkiyê re, bi xerîzeya parastina hebûn û berjewendiyên xwe yên weke mîrasa ji dîrokê dewr girtiye kevneşopa nûkeriyê û sentezeke wê lê bê nerîn. Ev hevkarî jî herî zêde di mijara sînoran de şênber dibe, divê ku ev baş bê fêmkirin.

Belê, weke ku Îsraîl di sînorên Lubnanê de herêmên tampon çêkiriye û kesên mîna Antûan Lahad kirine bekçiyên wê, vana jî bi KT'yê re di nava pêwendiyan de li ser esasê zorê, dixwazin herêmeke wisa bafirînîn û zîrevantiya wê bikin. Ji bo ku ew rista qala wê tê kirin bilîzin li benda firsendên guncavin. Ev jî ji hemû aliyan ve girêdayî rewşa miqabilî hêzane. Pratîzekirina vê çêkera wan û rista xwe lîstin wê bi şêwazên pir cuda pêk were. Asta rêxistingeriya wan, rewşa pêwendiyên derve û navxweyî, dem û taktikên wan, her daîm divê bê dîkatkirin û helwestên li gorî vê guncav werin raberkirin. Ji aliyekî din ve jî rewşa van hêzan, di heman demê de di asteke girîng de guhertinan raber dikin. Ji ber vê sedemê divê ku pêşketin baş bên şopandin û zanîn. Mînak; di navenga niha de dema ku rewşa wan a derve û hundirîn li ber çav bê girtin, biryardariya PDK Iraqê ya li navbirina me di çi astê de ye û çiqasî di rojevê de ye? Di van mijaran de agahî girtinên yekser û agahî dayînên yekser hene. Divê ku xwe gihandina rêbazê xebateke hemû îhtîmalan hesab dike bê pêşxistin.

Wekî din pêwendiyên Tirkiyê û PDK Iraqê, di heman demê de bi polîtîkayên DYE'yê ve girêdayî pêwendiyeke her ku biçe wê di vê çarçoveyê de pêş bikevê ye. Dibe ku encamên vê hema dernekevin holê. Lê divê ev girêdan neyê paşçavxistin. Ji ber vê çêkera xwe ya aloz, hêza ku mijara gotinê ye rista wan di Têkoşîna Rizgariya Netewî de, di bingeh de li ser esasê bi hêzên emperyal û mêtînger li ser esasê nokeriyê diyarkirin gengaze. Weke ku nêzîkî rastiyê ye, gelek zêde taybetmendiyên bê îstîkrar raberkirina wan jî divê bê zanîn. Hinek caran dibe ku heta bangewaziyên dostanî û bê alî jî biçe. Divê ku em jî helwesta xwe li gorî mercên şênber, dem bi dem, qad bi qad, kes bi kes binirxînin, disa hêz û derfetên xwe li berçav bigirin û dîyar bikin. Divê em di rewşeke wisa de bin dema avaniya

wan qut dibe, dîkat bikin bi mercan ve girêdayî, hişyar û di cewher de jî li ser esasê xwe sipartina hêza xwe, dema ku hat xwestin bikaribe destwerdana pêşketinan bikin. Dema ku rûniştin bi van re pêwîst kir, yan jî hat rûnişkandin divê ku li pişt me hêza me hebe. Encam wê ne ji aliyê rêgezên rastgir ve be, eşkereye ku wê hêz û çek diyar bike. Ger hêza me têr nake û xeteriyên wê hene, dema pêwîst kir divê mirov bizanibe dûr bisekine. Ji bo nêzîkatiyeke wiha derfetên me yên pir alî guncavin. Nebesiyên me dema wê ye yan na, di cîh de ye yan na û di derbarê çawaniyê de ye.

Em nabêjin hûn fêm nakin, nizanin, yên ku em dibêjin pêwîste rast bên fêmkirine. Dema ku niyaza wan a xirab fêm bû kêliya ku berê xwe dan helwesteke hevbeş a vekirî bi KT'ê re, divê ku em jî bikaribin di xala herî lewaz de wan tehdît bikin. Ji bo vê dibê ku pîlan û amadekariyên me yên baş hebin. Dema ku em berê xwe didin vê xebatê, divê ku em hemû aliyên wan ên lewaz û bi hêz hesab bikin. Di kêliya ku dest avêtin qadên ku em tê de têkoşînê dikin, vê serlêdanê bi hemû hêza xwe ve divê ku em berteref bikin. Divê ku em niyetên xwe, weke rastiyên wan daneyînin holê. Ev pir giran dikeve li ser me. Yên hatî gotin ger di asta têrker û bi hostayî bê pêkanîn, dê rêxistinên MÎT ên li ser sînor û derdora sînor bên felckirin, hêzên eşîretan girtina bin venerîn û însîyatîfa xwe zêde zehmet nebe. Eşkereye ku di van xebatan hemûyan de, bi taybetî jî di vê qadê de li gorî qûralên veşartîbûnê tevgerîn û misoger di demên pêş de xwe sipartina xwe bi cîhkirineke baş divê ku pêk were. Xwe negihandina vê rêbaza xebatê, pîlanên PDKI (Partiya demokrat a Kurdistana Iraq'ê) a ku ji despêkê ve di derbarê me de hebû bi qasî tê xwestin nedîtin û tevdîr negirtin, bû sedem ku şahadeta hevalê Hemîd Avcî rû bide.

Çareseriya van pirsgirêkan teva, yekser ji aliyê hevalên ku di nava pratîkê de ne li ser esasê xwe sipartina xeta taktîkî ya Partiyê dikare bê dîtin. Desnîşankirinên hatine kirin, pêşeroja Partiya me, pêşeroja wê ya ku bi serkeftinan dagirtî bi qasî ku bi demên borî neyê berhevdan eşkere destnîşan dike. Êdî ev tenê ne tesbîteke ji aliyê me ve tê kirine, dijmin jî di nav de, rastiya ku ji aliyê hemû hêzan ve tê pejirandine. Lê ji ber ku ev bi vî rengiye, em ne dikarin xwe zêde binepixînin, ne jî ji ber windahiyên zêde dane bi qasî ku em bêjin; "Gihiştina asta ku nikare xwe bi meşîne" bê hêvî bibin. Lê dîsa jî em bêka pirsgirêkên me çiqas mezinin nikarin ji nedîtî ve bên. Berevajî, ji niha û şûn ve jî weke partiyeke şerê têkoşîna rizgariya netewî û çînî di nava hev de dimeşîne, rêve dibe, em ê pêşketina xwe li ser esasê gelek kêmasî, xeletî, şaşitiyan û bi xiyanetê re di nava têkoşînê de

bidomînin. Partiya me misoger nêzîkatiyên înkarger red dike, ji ber vê sedemê jî bi qasî ku di demên borî de îro jî bi giştî ji hemû nirxên xwe re ji bo hişyar nêzîk bibe dê girîngiyê bide.

Ti xirabî bi qasî înkargeriyê xirab nabe. Hinek caran nirxa ku ji pêşketinên şoreşgerî re tê diyarkirin ewqas bê tenduristiye ku, bi ti awayî pejirandina wan nabe. Me gelekî zirar ji vê dît û ger ev helwest berdewam bike zirarên mestir jiyan kirina me jênereve. Dîroka Partiya me tê wateya îroya me û pêşeroja me. Ti kes nikare bê tendurist nêzîkî vê bibe, pêşketina bispêre berjewendiyên xwe yên takekesî. Nemaze ti kes nikare bikeve hartiya vê ji xwe despêkirinê. Ji ber vê sedemê dema ku em berê xwe didin pêşerojê û hewl didin pêşerojeke baş ji xwe re xêz bikin, ji niha ve gelek pirsgirêkên derketine holê, nêzîkatiyên nebes, sivikbûn, seranserî, zarokatî, ecemîtî û hovîtî divê ku ji bo careke din qet nikaribe rabe ser xwe di qebrê de bê binçalkirin. Divê ku ev bi ti awayî neyên veşartin, ser wan neyê girtin. Em dilnizm û di rexnedayînê de bi cesaret bin. Ji ber ku rêya pêşketin û mezinbûnê di vir de derbas dibe. Pêşeroj encax dikare bi pêşketin û rêbezên xwe gihandina vê rastiya mezin û milîtanan bê qezenckirin.

Dema ku em hewl didin despêkeke nû xêz bikin divê hema bêjim, serkeftina vê demê, di cewher de girêdayî çareserkirina hinek pirsgirêkane. Em van pirsgirêkan encax dikarin bi xetên giştî bidin diyarkirin. Plansazkirina van jî, bi nirxandinên berfireh ve em neçarin ji xebatên paşê û yekser ji amadekariyên pratîkî re bihêlin.

Beriya her tiştî, pêşketina têkoşîna çekdarî di Kurdistanê de êdî xebatên gêrîla di asta herêmî de û bi vê ve girêdayî bi pêşxistina tevgera milîsan ve girêdayî ye. Têkoşîn gihiştiye xaleke bi vî rengî, çarenûsa pêngava piştî vê bi çareseriya van herdu pirsgirêkan ve dê pêş bikeve, divê ku em vê jî diyar bikin.

Erkên komîteyên gundan û girêdayî van ên milîsan ku bi hev re girêdayîne çiye? Vana hem cerdevanên gundan û hem jî dijmin, vala derxistina hinek rêbazên pasîfkirinê, cendirmeyên dijmin, leşker û sîxûrên wî, di asta xwecihî de bê bandorkirina wan û ji rêxistinkirina bi rêbazekî zanyarî berpirsyarin. Komîtebûna gundan a ku bingehê serxistina van erkane êdî divê bê afirandin.

Pêdiviya me bi hêzên çekdar ên ku bikarin di asta herêmî de tevbigerin heye. Ev jî tê wateya xwe gihandina gêrîlatiya herêmî. Bi xwe cihkirinê, hevgirtin, hejmar, taktîkên tevgerê û rêvberiya xwe ve, li gorî berê divê ku bi bandorker bê çareserkirin û ev jî yek ji pirsgirêkên me yên herî sereke

ne. Tevgera me ya ku heta niha weke yekîneyên propaganda çekdarî xwe didomandin, eşkereye ku hinek caran mîna gêrîla, milîs û yekîneyên rêxistinî tevgerîne. Aliyê vê yê ku bê darizandin nîne, lê ji ber ku asta têkoşîna me berfireh bûye, propaganda çekdarî heta radeyekê bê dewamkirin jî, neçare ku cihê xwe ji gêrîlatiya herêmî re bihêle. Gêrîlatiya herêmî yek ji mijarên ku divê herî zêde em li ser rawestin û pêş bixine. Di dema pêşiya me de, pêşketinên di Kurdistanê de, divê ku neyê jibîrkirin wê bi avakirin û pêşketina vî hêzî ve girêdayî be. Wê demê di civînên me yên ji niha û şûn ve avakirina gêrîla, amadekarî, xwecihkirin, rêveberî, di navenda Partiyê de komîteyên gundan, heta xebatên bajar û milîsan, di derbarê pêwendiyên wan xebatên din re, çareseriya gelek pirsgirêkan divê bê hedefkirin û em berê xwe bidin pêşxistina van xebatan. Em hêvî dikin ku civîn vana bi awayekî herî bandorker bigire dest.

Xebatên bajaran, di despêkê de weke nûnerên ji rêzê, kesên legal ango yên ku zêde ne eşkere meşandin, rêveberiya wan jî bêtir ji derve, di Ewrûpa de pêşxistin, dibistan, karxane û semtên ku şênî tê de zêde ye bi şêwazê rêxistinkirina esasî yên Partiyê dest girtin pêwîste. Ev xebatên Partiyê girîngin ku divê bi têkoşîna çekdarî re bên meşandin û ev li benda çareseriyê ne. Em bidin diyarkirin ku ev ê bên destgirtin û çareserkirin. Di van qadan de bi sedhezaran potansiyela me veşartiye, herî kêm bi qasî qada bejayî, dikare rê ji pêşketin û teqînên şoreşgerî re veke. Ji bo meşandina xebateke serkeftî ku bikaribe rê li encamên wiha veke, divê ku em bidin diyarkirin yekîneyên me yên niha heyî ne kêmin. Qadrobûneke berfireh dîsa wê di vir de şitil bide, bi taybet jî qadroyên siyasî, dîsa wê ev piraniya xwe ji nav ciwanan derkevin, tesbîtkirina vê gelek zehmet nîne. Bi awayekî lezgîn pêdiviya me ya divê mijarê de heyî ti kes nikare ji nedîtî ve bê.

Di bingeh de ev hemû xebatên me, di nava espîrîya eniyê de ya bê kirin rêxistinkirina eniya rizgariya mîlî de wê şênber bibe. Di vê mijarê de, ji pirsgirêkê re tenê ne di asta çend komîteyan de, divê ku di asta rêxistinên cur bi cur de lê bê nerîn. Komîte, di despêkê de di cihekî navber de yan jî piştre dikare bê çêkirin. Ev zêde girîng nîne, ya girîng, bi qasî ji dest tê gelek kes, di bin ala eniyê de ya ku hatiye daliqandin de kirina welatparêz, kişandina nava rêxistinên ku dê bên avakirine. Wan bi rêxistinên guncav re gihandina hev, kordîne kirin û her ku diçe di asta herêmî û netewî de ew gihandina heve.

Çareseriya van pirsgirêkan teva, yekser ji aliyê hevalên ku di nava pratîkê de ne li ser esasê xwe sipartina xeta taktîkî ya Partiyê dikare bê dîtin. Desnîşankirinên hatine kirin, pêşeroja Partiya me, pêşeroja wê ya ku

bi serkeftinan dagirtî bi qasî ku bi demên borî ne neyê berhevdan eşkere destnîşan dike. Êdî ev tenê ne tesbîtek ji aliyê me ve tê kirine, dijmin jî di nav de, rastiya ku ji aliyê hemû hêzan ve tê pejirandine. Lê ji ber ku ev bi vî rengiye, em ne dikarin xwe zêde binepixînin, ne jî ji ber windahiyên zêde dane bi qasî ku em bêjin; "em hatin asta ku nikarin xwe bimeşînin" û bê hêvî bibin. Lê dîsa jî em bêka pirsgirêkên me çiqas mezinin nikarin ji netîtî ve bên. Berevajî, ji niha û şûnde jî weke partiyeke şerê têkoşîna rizgariya netewî û çînî di nava hev de dimeşîne, rêve dibe, em ê pêşketina xwe li ser esasê gelek kêmasî, xeletî, şaşitiyan û bi xiyanetê re di nava têkoşînê de bidomînin. Partiya me misoger nêzîkatiyên înkarger red dike, ji ber vê sedemê jî bi qasî ku di demên borî de îro jî bi giştî ji hemû nirxên xwe re ji bo hişyar nêzîk bibe dê girîngiyê bide.

Ti xirabî bi qasî înkargeriyê xirab nabe. Hinek caran nirxa ku ji pêşketinên şoreşgerî re tê diyarkirin ewqas bê tenduristiye ku, bi ti awayî pejirandina wan nabe. Me gelekî zirar ji vê dît û ger ev helwest berdewam bike zirarên mestir jiyan kirina me ji jênereve. Dîroka Partiya me tê wateya îroya me û pêşeroja me. Ti kes nikare bê tenduristî nêzîkî vê bibe, pêşketin sipartina berjewendiyên xwe yên takekesî nemaze tu kes nikare bikeve harîtiya vê ji xwe despêkirinê. Ji ber vê sedemê dema ku em berê xwe didin pêşerojê û hewl didin pêşerojeke baş ji xwe re xêz bikin, ji niha ve gelek pirsgirêkên derketine holê, nêzîkatiyên nebes, sivikbûn, seranserî, zarokatî, ecemîtî û hovîtî divê ku ji bo careke din qet nikaribe rabe ser xwe di qebrê de bê binçalkirin. Divê ku ev bi ti awayî neyên veşartin, ser wan neyê girtin. Em dilnizm û di rexnedayînê de bi cesaret bin. Ji ber ku rêya pêşketin û mezinbûnê di vir de derbas dibe. Pêşeroj encax dikare bi pêşketin û rêberên xwe gihandina vê rastiya mezin û milîtanan bê qezenckirin. Dema em hewl didin destpêkirinek nû destnîşan bikin, yekser divê bêjim ku, serkeftina vê qonaxê di rastiyê girêdayî çareseriya hinek pirsgirêkane. Em tenê dikarin van pirsgirêkan, li vir bi xetên giştî ve dikarin bal bikişînin ser. Plansaziya van jî, bi nirxandinên wan ên berfireh ve, em neçarin ku ji xebatên peyre û amadekariyên pratîkî re bihêlin.

Dîsa di seranserê welat de, hinek yekîneyên propagandaya çekdarî yên pêşketî avakirin, weke pirsgirêkeke bê çareserkirin dibê ku bê destgirtin. Rasterast bi navenda Partiyê ve girêdayî û bi giştî yên ku bi fermanên wê tevdigerin, espriya Artêşa Rizgariyê digire nava xwe, ber bi înşaya yekîneyên wiha ve diçe bên avakirin. Bi taybetî girêdayî leza xwe pêkanîna peşketinên siyasî, ji niha ve dikare amadekariyên çûna ber bi yekîneyên bi vî rengî pêk werin. Beşek ji yekîneyên propagandaya çekdarî, bi vî rengî di

asta herî jor de gav avêtina wan divê ku bên hesabkirin. Di despêkê de bi hejmarên zêde li darxistina civînan, pirsgirêk baş bên fêmkirin, plansaziya pêwîst bê derxistin, her ku diçe dabînkirina pêwîstiyên amadekariyê, pêşxistina xwe cihkirinê û beriya hemûyan jî, perwerdeya lezkirî ya qadro, ber bi partîkê ve bê veguhestin. Bi taybet pêwîste li ser perwerdeya qadro bê rawestandin. Ji ber ku windahiyên me yên di vê qadê de pir zêde ne. Em neçarin qadro li ser esasê perwerde û rexnedayînekê, ji dema pêş re baş amade bikin, pêgihandin û bi bandor pêş bixin. Ev amadekari divê di asta teorîk de jî bê kûrkirin. Xebatên weşana Partiyê jî, ji bo vê zemînekî pir bi hêz ava dike. Li gorî ku ev xebat wê kûrtir bên pêşxistin, nêzîkatiyên me yên teorîk, bi qasî tê xwestin bi qadro dayîna fêmkirin û her ku diçe ev gihandina hejmareke zêde kesan, bi taybetî jî gihandina ciwanên di welat de û rewşenbîran heta radeya dawî girînge. Divê ku ev weke xwîna taze tevlî Partiyê kirin bê fikirîn.

Bi rastî jî em dixwazin bal bikişînin ser xisûsa girîngiya perwerdeya qadro. Ji ber sedema neyêniya zemîna civakî ya ku em xwe dispêrinê, diyardeya welatparêzî ya ku heta dawî bi şêweyek lewaze, dûbare û kûranî ji nû ve destgirtin û astengkirina lewaziya li nava partiye dipeyîte pir girînge. Ev li ser her yek endamên Partiyê welatparêziyeke bi hêz, di wateya herî berfireh de serwerkirin mecbûriyeteke. Bi dudiliyên ji rêzê û li hevnekirina welatparêziyê û neçariya her kesî xwe gihandina asta welatparêziya têrker, divê ku hemû rê û rêbazên guncav bên karanîn, xebat bên raberkirin derbikeve holê û misoger xwe gihandina vê were pêkanîn.

Yek ji xalên din divê ku em bal bikişînin ser jî, pirsgirêka hêza îhtîyate. Ji bo her grûb û yekîneyan avakirina yedekên xwe, ji bo vê domdarkirina xebatên perwerdê, di nava xwe de avakirina grûbên perwerdê, bi vî awayî amadekirina dagirtina cihên windahiyane. Divê hîn zêdetir berendamên qadro derxînin holê. Berpirsyariya perwerdê ya di vê qadê de, yek ji parçeyên devjêneger ên berpirsyariya siyasî ye. Di vê çarçoveyê de perwerde, ji bûyereke navendî derxistin, di asta hemû qadan de xwe gihandina asta pêkanînê mecbûriyeteke. Di perwerdê de, ji endamên ceribandinê re bi qasî tê xwestin cih veqetandin, heta ku ev neyê pêkanîn endamên perwerdê, jixweber neyên şandin ser kar û xebatan, hostayî, behremendî, cesaret bi wan bê dayîna qezenckirin û rêbazên bi pergal werin pêkanîn.

Dema ku em plansaziya dema pêşiya xwe dikin, ji yekeyên herî biçûk ên eşîret û qabîleyan em destpê bikin heta gund, bajar û tehlîlên herêman divê bi qasî yên tên xwestin bê kirin. Ji ezmûn û kombûnên dema borî sûd

wergirtin, li şûna nêzîkatiyên nebes û ne rast, li şûna van li gorî taybetmendiyên me yên herî guncav divê bi nîqaşên pêşketî bên destnîşankirin. Bi taybet divê ji jiyana eşîret û qabîleyan re nêzîkatiya rast a şoreşgerî bê tesbîtkirin, di vê mijarê de ji hewldanên bê berhem encam bê girtin, nêzîkatiyên encamgir û bi berhem misoger bên dîtin.

Xebatên me yên gundan, divê ku taybetmendiyên baş û yên cuda bên nirxandin. Bi vî awayî, xwe gihandina rêbaza xebata gundan a ku standarteke bê pêşxistin. Dijmin li beramberî rastiya me ya gund bi şoreşa dijber dixwaze vala derxîne, xebatên şoreşgerî yên milîsan û yên ku di rêya herî pêş de cih digirin divê pêş bixin. Plansaziya gêrîla, li ser esasê xwe spartina pratîka xwe û qada gerdûnî divê ku di vê berfirehî û taybetmendiyê de be. Bingeha gêrîla ya erdnîgarî û mirovî, girêdana wê bi xeta Partiyê re, lihevkirina wê bi mercên siyasî re, pêkhateya wê, rêveberî, amadekarî, heta bi vana hemûyan re girêdayî amadekirina talîmat û rêziknameyan, divê ku plansaziyeke xebateke ewqas berfireh û bi bandor bigire nava xwe.

Di rêxistinkirina Partiyê de bê ku tu bikevî nava şematîzmê, di serî de komîteyên navendî, komîteyên herêmî, dîsa komîteyên xwecihî, di avaniya grûpbûn, komîteyên gundan û şane jî bi şêwazekî guncav û girêdayî şert û mercan divê bên pêşxistin. Ji bo pêşketineke bi vî rengî mercên heyî bên tengavkirin. Bi taybet herêm êdî di asta nûnertiyan de, ji rêxistinê re divê bên vekirin. Tora rêxistinan, ji komîteyan ber bi grûban ve, ji rêxistinên taybet heta şaneyan divê ku bên berbelavkirin. Ji bo xwe gihandina asta rêxistiniya tê xwestin ger em zêde lez nekin jî, êdî divê li gorî mercan bên rêxistinkirin, ji bo afirandina vê jî, divê ku em zêdetir bikaribin destwerdana nûnertiyan bikin. Lê di vê mijarê de pêwîste, mirov xwe ji şematîkbûnê dûr bigire û şêwazên cûda biceribîne.

Dema ku ev hemû hatin kirin, di heman demê de têkoşîna me ya ku tê gotin di Tirkiyê de sala hilbijartinên 1987’ne, wê ber bi sala 1988’an ve lez biçe. Hem wargeha burjuva, hem jî muxalefeta çep di bingeh de li gorî pêşketinên ku di têkoşîna me de derkevin holê wê heta dawî pêvajoyê tengezar bikin. Me di talîmatên borî de gotibû ku; “ wê bibin salên di gel pêkanîna gêrîla li her derê, bibin salên serhildan jî dikevin rojevê.” Me wisa pênase kiribû. Eşkereye ku ev ne weke mecbûriyetekê, lê ger rewşên em li bendê dernekevin û amadekariyên pêwîst bên kirin, me gotibû encama xwezayî wê pêşketinên wisa derbixin holê. Rastiyên ku tên jiyîn destnîşan dike ku em di van texmînên xwe de nexapiyane.

Bi taybet, ji bo ev pêvajoya ku me diyar kir bê amadekarî neyên girtin, bi qasî tê xwestin ji ezmûnên dema borî ders derxistin, pêşketinên rêxistinî

bi awayekî hostane berdewam kirin hewce dike. Valatî di demê de girtin, nêzîkatiyên derengmayî veguherandina di demê de nêzîkbûn raberkirin, bê pîlanî derbazkirin û xwe gihandina pîlan û di van mijaran de em neçarin pêk bînin. Di vê mijarê de bi rastî jî hemû milîtanên girêdayî Partiyê ne, divê ku heta dawî xwe bêşînin, ji ezmûnên xwe yên borî jî sûd werbigirin. Ji bo xwe gihandina encama em li bendê ne, em di wê baweriyê de ne ku dê hemû hêza xwe bixin tevgerê.

Yên ku kevirên sereke yên Partiyê ne milîtan, bi rakirina ser piya hemû behremendî û ruhê şoreşgerî, divê ku xwe bigihînin asta şervanên mezin û hostane. Dema ku pêwîst kir divê milîtanên Partiyê bi qasî navendên Partiyê bikaribin însiyatîf kar bînin, dîsa dema ku pêwîst kir weke neferekî şer dike, xwe bigihînin piralîbûn û taybetmendiya vê ya herî bi hêz. Weke Rêbertiya Partiyê, em hemû qadro û sepmatîzanan vedixwînin bêrêxistin nemînin, ti kesî bê rêxistin nehêlin û ji bo vê bi xerckirina kedeke mezin xebat bikin. Em dixwazin erkên bîrdozî, çalakgerî û rêxistinî hemûyan fêm bikin. Ji ber kêmbûna agahiyan, xwe bê amadekarî hiştin, lêhûrbûn nekirin, lihevnekirin û yên dibin mînakên vî rengî devjê berdin. Em mîsoger wan vedixwînin afirandina yekîtiyê, rêzdarî, pêkanîna lihevkirineke mezin û pêngavan.

Weke Rêbertiya PKK'ê, em jî weke ku heta niha bûye, ji niha û şûnde jî heta dawî zorê bidin zanebûna xwe. Ji bo hêviya rizgariya ji jiyana bi îşkenca ya gelê me û şervanên me û ya ku dibe îfadeya vê a zanînê hebûna Partiya me ji bo ku em hîn zêde nêzî serkeftinê bikin, behremendiyên xwe di ronahiya ezmûnên dewlemend de, hîn berhemdar bikin. Hemû curên astengiyan, bi têkoşîneke aqilane derbazkirin xwe gihandina hedefa bi dûrişma û sonda vê ve girêdayîna xwe diyar dikin. Di derbarê serxistina vê de em ji xwe bawerin. Hemû endamên partiye jî bi vê baweriyê, ji bo ku ala têkoşînê derbixin lûtkeyan, bê dudilî, xwe pêgihandî, pêgiştî, hostane û lez meşa wan hêvî dikin û ji hemûyan re jiyanake têkoşeriyê dixwazin.

**Mijdar 1985**